



K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

**SERBORÎYA HEWLDANÊN STANDARDKIRINA
KURDÎYA KURMANCÎ LI TIRKÎYEYÊ
(JI KOVARA HAWARÊ HETA 2022YAN)**

Behçet TOPRAK

Şêwirmend
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN

Mardin 2022

K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

**SERBORÎYA HEWLDANÊN STANDARDKIRINA
KURDÎYA KURMANCÎ LI TIRKÎYEYÊ
(JI KOVARA HAWARÊ HETA 2022YAN)**

Behçet TOPRAK

Şewirmend
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN

Mardin 2022

T. C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
TEZ ONAYI

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 19711004 numaralı tezli yüksek lisans programı öğrencisi Behçet Toprak’ın hazırladığı “Serborîya Hewldanên Standardkirina Kurdîya Kurmancî li Tirkîyeyê (Ji Kovara Hawarê Heta 2022yan)” başlıklı Yüksek Lisans tezi ile ilgili Tez Savunma Sınavı, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 22/11/2022 Salı günü saat 12:00’da yapılmış, tezin onayına oy oybirliğiyle karar verilmiştir.

Başkan

Prof. Dr. Hayrettin KIZIL

Üye

Prof. Dr. Tahirhan AYDIN (Danışman)

Üye

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

ONAY

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu’nun __/__/202_ tarih ve sayılı kararı ile onaylanmıştır.

.....

Enstitü Müdürü

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmada kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,
- Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığını ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

Behçet Toprak

2022

KURTE

Teza Lîsansa Bilind

Serborîya Hewldanên Standardkirina Kurdîya Kurmancî li Tirkîyeyê (Ji Kovara Hawarê Heta 2022yan)

Behçet Toprak

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

159 Rûpel

Standardkirina zimanî xwedî pêvajoyeka dûvdirej e. Di serdema netewedewletan da, ku ew jî ji modernîteyê welîdîne, pêwistî bi yekgirtina zimanî çê dibe. Standardîzasyon di geşedana zimanî da faktorê herî giring xuya dike. Herweha, zimanê standard ji bo neteweperwerî û nasnameya hevpar jî roleka mihîm dîlîze. Despêka standardkirina kurdîya kurmancî bi “şoreşa alfabayê” û ji alîyê nîfşê Kovara Hawarê ve pêk tê. Kêm zêde ev sed sal e kurmancî di nav pêvajoya standarbûnê da ye. Piştî Hawarê, ji ber polîtîkayên zimanî yên Komara nû, xebatên bi vî rengî qut bûn û bêdengîyek çê bû. Lê, ancax salên 1960-70yî hin kesan li gor hêza xwe xizmeta kurmancîyê kirin. Li alîyê din, ev sih salên dawî xebatên standartkirina kurmancîyê, bi derfetên nû wekî guherînên qanûnî, teşeyeka nû wergirt. Ango, rê li ber medya, rojnamegerî, kovargerî û weşangerîya kurdî vebû. Îmkanên perwerdeya kurdî yên sînardar çê bûn. Herî mihîm em dikarin îro behsa akademîyaya kurdî bikin. Herwisa, sazîyên ku li ser plansazîya zimanî xebatan dimeşînin hatin damezirandin. Armanca vê xebatê, lêhûrbûna vê pêvajoyê ye da ku tê bigihîje dînamîkên standardbûna kurmancîyê çawa qewimîye, rave bike.

Peyvên Sereke:

Kurdîya Kurmancî, Modernîte, Netewedewlet, Plansazîya zimanî, Zimanê standard

ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

Kürtçe'nin Kurmanci Lehçesinin Standartlaştırılmasına İlişkin Yapılan Çalışmaların Serüveni (Hawar Dergisinden 2022 Yılına kadar)

Behçet Toprak

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

159 Sayfa

Dilin standartlaşma süreci uzundur. Moderniteden doğan ulus-devletler standart bir dile ihtiyaç duymuştur. Standardizasyon dilin gelişmesinde en önemli faktördür. Hakeza, standart dil hem milliyetçilik hem de ortak kimlik için önemli, bir rol oynar. Kurmanci Kürtçesinin standartlaşmasının başlangıcı Hawar Dergisinin nesli tarafından gerçekleştirilen “alfabe devrimi” ne dayanır. Hemen hemen 100 yıldır Kurmanci standartlaşma sürecini yaşamaktadır. Yeni Cumhuriyetin dil politikalarından dolayı, Hawar'dan sonra standartlaşma yönlü çalışmalar kesildi ve sessizlik dönemine geçildi. Ancak 1960-70 li yıllarda kendi güçleri nispetinde bazı kişilerin çabasından bahsedilebilir. Öte yandan, son otuz yıl, Kurmanci'nin standartlaştırılması çalışmaları, kanuni düzenlemeler gibi yeni fırsatlarla yenî bir biçim aldı. Yani Kürt medyası, gazeteciliği, dergiciliği ve yayıncılığının önü açıldı. En önemlisi bugün “Kürt akademisi”nin varlığından bahsedebiliriz. Keza, dil planlaması konusunda çalışmalar yürüten sivil kurumlar kuruldu. Bu çalışmanın amacı Kurmanci'nin standardlaşma sürecine odaklanmak ki bu standartlaşma süreci nasıl gerçekleşmiştir, bunun dinamiklerini açıklamaktır.

Anahtar Sözcükler:

Dil planlaması, Kurmanci Kürtçe'si, Modernite, Standart dil, Ulus devlet

ABSTRACT

Master's Thesis

The Adventure of Studies on the Standardization of the Kurmanji Dialect of Kurdish (From Hawar Magazine until 2022)

Behçet Toprak

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Turkiye

Department of Kurdish Language and Culture

159 Pages

The standardization process of the language is long. The nation-states that emerged from modernity needed a standard language. Likewise, standard language plays an important role in both nationalism and common identity. The beginning of the standardization of Kurmanji Kurdish is based on the “alphabet revolution” carried out by the generation of Hawar Magazine. Kurmanji has been going through the process of standardization for almost 100 years. Due to the language policies of the New Republic, standardization efforts were discontinued after Hawar and a period of silence began. However, in the 1960s-70s, the efforts of some people can be mentioned in proportion to their own strength. On the other hand, in the last thirty years, efforts to standardize Kurmanji have taken a new form with new opportunities such as legal regulations. In other words, the way for Kurdish media, journalism, magazine publishing and printing has been paved. Most importantly, we can talk about the existence of the “Kurdish academy” today. Likewise, civil institutions working on language planning were established. The aim of this study is to focus on Kurmanji's standardization process, how this standardization process took place and to explain its dynamics.

Key Words:

Kurmanji, Language planning, Modernity, Nation-state, Standard language

PÊŞGOTIN

Teza me bi awayekî sereke, di çarçoveya Tirkîyeyê da, li ser serborîya hewldanên standardkirina kurdîya kurmancî û xebatên zimanî radiweste.

Li seranserê cîhanê li derûdora şeş hezar ziman tên axaftin. Standardkirina zimanan, li cîhana Rojavayî, di serdema modernîteyê da, wekî berhema netewedewletê cara ewil tê dîtîn. Ziman wekî xala sereke ya civakê tê qebûlkirin û hem teşe dide nasnameya takekesî û hem jî di hevgirtina civakî da roleka sereke hildigire.

Herweha ji ber rol û giringîya zimanî, îdeolojîya neteweperwer ji bo teşedayîna qada giştî midaxele li zimên dikin. Lewra, yekîtiya zimanî ji bo neteweperwerî û modela dewleta wê ya ku netewedewlet e, dîyardeyeka jêneger e. Weki din, ji bo bicihbûna slogan û hêvîyên neteweperwerîyê di tebeqeyên civakî da pêdivî bi “zimanê neteweyî” heye. Dîyar e ku zimanê standard xwedî çîrokeka dûvdirêj e. Modernîte, netewe, netewedewlet û neteweperwerî paşxaneya vê dîyardeyê pêk diîne.

Piştî hilweşîna dewleta Osmanîyan, di polîtîkayên zimanî yên Komara Tirkîyeyê ya nû da jî ev paşxane heye. Komara Tirkîyeyê bi polîtîka û plansazîyên xwe yên zimanî ji bilî zimanê tirkî rê nedaye zimanên din. Bi polîtîkayên înkâr û asîmîlasyonîst, li gel zimanên din, kurdîya kurmancîyê tune hesibandîye û di encama vê pêvajoya dûrûdirêj da kurmancî lawaz ketîye û wekî zimanê nivîskî bi pêş neketîye. Lêbelê, helwesta dewletê û polîtakaya înkarkirin û asîmîlasyonê piştî salên 1990î guherî û ji bo çarenivîsa kurmancîyê serdemeka nû dest pê kir.

Me di teza xwe da, di çarçoveya destnîşankirî da rewşa kurdîya kurmancîyê nixand. Bi awayekî objektîf, îro, mirov dikare behsa standardbûna kurmancîyê, hata astekê, bike. Ev dîyarde xwedî paşxaneyeka dîrokî ye ku ji Kovara Hawarê heta îro, ji alîyê standarkirina kurmancîyê ve, çî xebat hatine kirin; kesên ku di vî warî da hewl dane, sazîyên ku xebatên akademîk kirine, hewce bû ku bi awayekî tarîfker (Descriptive) bê

pêşkêşkirin. Herwisa, teza me hewl dide ku serborîya standardbûna kurdîya kurmancîyê wekî raveker (Explanatory) jî analîz bike. Bi vî awayî, ji “şoreşa alfabeyî” heta “rêbera rastnivîsînê” gavên mezin ku hatine avêtin, dê bê famkirin.

Teza me ji sê beşên sereke pêk tê. Di beşa ewil da wekî paşxaneya teorîk em li ser netewedewletê, li gel modernîteyê û têkilîya netewedewletê û zimanê standard sekinîn. Serdema Komara Tirkîyeyê û polîtîkayên zimanî yên Komarê , digel bandora van polîtîkayan ku li çarenivîsa kurmancîyê karîger bûne, di beşa duyem da hatin analîzkirin. Herweha, di beşa sêyem da, ku ji aliyê mijara me ve roleka navendî dilîze, em li ser ravekirina hewldanên standardkirina kurdîya kurmancî rawestîyan.

Lê, dîyar e ku mijara li ber destên me di çarçoveya Tirkîyeyê da bi awayekî akademîk pir nehatîye xebitandin. Herçiqa di warê standarkirina zimanî da minak û xebatên bîyanî û bi zimanê bîyanî hebin jî, bi zimanê kurdîya kurmancî xebatên ku hatine kirin, pir kêmtir in. Li gel kêmbûna xebat û çavkanîyan, me xwast ku pêvajoya standardbûna kurmancîyê rave bikin da ku ji bo xebatên siberojê bibe zemîneka kêrhatî.

Pêkhatina vê tezê bi saya çend kesayetên bi rûmet mimkin bû. Di serî da spasîya xwe ji şewirmendî min Prof. Dr. Tahirhan Aydın ra dikim. Ji dîyarkirina mijara tezê heta bidestxistina çavkanîyan û sererastkirinan, şewirmendîya wî ya daîmî û vîzyoner, li gel sebir û tehemila wî, me anî roja îro. Herweha, ji jûrîya tezê, Doç. Dr. Ahmet Kırcan û Doç. Dr. Hayreddin Kızıllı ra jî spas dikim ku kesayetên qedirbilind ên akademîya kurdî ne; bi hişyarî û pêşniyazên xwe rê li min ronî kirin. Herwisa, ji bo bidestxistina çavkanîyan û pêşniyazên wî yên bêhempa, spasîya Dr. Mikail Bülbülü jî dikim. Ji bo pêşniyaz, rexne û piştgirîya wan spasîya Dr. Sevda Orak Reşitoğlu û Dr. Zülküf Ergünî jî dikim. Herî dawî, ji bo qedandina vê tezê, bi moraldarî û teşwîqkirina xwe spasîya mamosta û hevalên hêja, Prof. Fazıl Hüsnü Erdem, Prof. Dr. Mehmet Bilen, Doç. Dr. Vahap Coşkun, Dr. Misbah Ekinci, Dr. Muharrem Tunç, Süleyman Aktürk û Murat Ekin jî dikim.

Behçet TOPRAK

Mardin 2022

NAVEROK

ETİK BEYAN.....	ii
KURTE.....	iv
ÖZET	v
ABSTRACT	vi
PÊŞGOTIN	vii
NAVEROK	ix
KURTEBÊJE.....	xi
DESTPÊK	1
<i>Mijar û Giringîya Tezê</i>	<i>3</i>
<i>Sînor û Çarçoveya Tezê</i>	<i>3</i>
<i>Rêbaza Lêkolînê.....</i>	<i>4</i>
<i>Xebatên Berê</i>	<i>5</i>
<i>Dijwarîyên Lêkolînê</i>	<i>5</i>
1. NETEWEDEWLET Û ZIMAN	7
1.1 Netewedewlet	7
1.1.1 Pêwendîya netewedewletê û zimanê standard	13
1.2 Polîtîka û Plansazîya Zimanî	18
1.2.1 Polîtîkayên zimanî	19
1.2.2 Plansazîya zimanî	22
1.2.3 Prensîbên standardkirina zimanan	27
2. KOMARA TIRKÎYEYÊ Û REWŞA KURDÎYA KURMANCÎ.....	33
2.1 Polîtîkayên Zimanî yên Komara Tirkîyeyê	34
2.2 Bandora Polîtîkayên Zimanî yên Dewletê Li Ser Kurmancîyê	46
3. SERBORÎYA HEWLDANÊN STANDARDKIRINA KURDÎYA KURMANCÎ.....	55
3.1. Pêngava Ewil: Kovara Hawarê û Danîna Normên Ortografîk	57
3.1.1. Giringîya Kovara Hawarê û bandora wê li ser standardkirina kurmancîyê...67	
3.2 Pêngava Duyem: Xebatên Piştî Kovara Hawarê	75
3.2.1 Xebatên şexsî û kolektîf	75
3.2.1.1 Xebatên şexsî	76
3.2.1.2 Xebatên dezgehî	94
3.2.1.2.1 Kovar	96

3.2.1.2.2	Weşanxane	104
3.2.1.2.3	Şano.....	109
3.2.1.2.4	Rojname.....	110
3.2.1.2.5	Sînema	114
3.2.1.2.6	Radyo	116
3.2.1.2.7	Televîzyon	117
3.2.1.2.8	Înternet	120
3.2.1.2.9	Sazîyên kurdî yên zimanî.....	123
3.2.1.2.9.1	Sazîyên sivîl ên zimanî	123
3.2.1.2.9.1.1	Enstîtuyên kurdî	123
3.2.1.2.9.1.2	Kursên kurdî û hewldanên sazîyên din ên zimanî	128
3.2.1.2.9.2	Sazîyên fermî yên zimanî.....	138
3.2.1.2.9.2.1	Beşên ziman û edebîyata kurdî yên lîsansê û enstîtuyên zimanên zindî yên zanîngehan.....	139
ENCAM.....		143
ÇAVKANÎ.....		149

KURTEBÊJE

AMD	: Amadekar
BERHV	: Berhevkar
ED	: Edîtor
HB	: Heman berhem
HG	: Heman gotar
HP	: Heman pêşkêşî
TB	: Tarîxa bidestxistinê
WER	: Wergêr
SBE	: Sosyal Bilimler Enstitüsü

DESTPÊK

Standardkirina zimanan xwedî paşxaneyeka dûvdirêj e û xwe dispêre serdema modernîteyê. Modernî qutbûna ji tradîsyonê dinimîne û ji pêvajoyên wekî kapîtalîzm, laîkbûn, pîşesazîbûn, bajarî bûn, pişporî û burokrasîyê pêk tê.

Modernî piştî hilweşîna pergala feodalîteyê di sedsala 17em da li Ewropayê dest pê dîke û li seranserê cîhanê belav dibe. Piştî feodalîteyê dewleta modern di forma netewedewletê da xwe dide der. Taybetmendîya herî bingeşîn a ku netewedewletê ji modelên berê yê dewletan cuda dîke ew e ku dewleta netewe xwedî sînorekî dîyar e û di nav van sînoran da xwedîyê desthilatdarîya mitleq e.

Ziman ji bo kes û civakê wekî referans, yek ji xalên hevpar ê sereke ye. Lewra, ziman hem teşe dide nasnameya takekesî û hem jî di hevgirtina civakî da roleka giring dilîze. Di dîroka mirovahîyê da bikaranîna zimên ji bo armancên sîyasî tenê di serdema modern da tê dîtin. Ev dîyarde hevahengê derketina bizavên neteweperwerîyê ye. Ji ber giringîya zimanî, îdeolojîya neteweperwer ji bo teşedayîna qada giştî midaxele li zimên dîke û giringîyeka taybet dide yekîtiya zimanî.

Yekîtiya zimanî ne tenê giringîyeka sîyasî û çandî ye, di heman demê da ji bo pêwîstiyên aborî û pêdivîyên pratîk e jî. Lewra, ji bo ku aborîya neteweyî di nava welatî da çê bibe û hebûna xwe bidomîne, pêwîstî bi derbasdarîya heman zimanî li hemû welêt heye.

Ji bo afirandin û parastina nasnameya hevpar/neteweyî, birêvebirina zimên û bikaranîna wî wekî amûreka sîyasî, cara yekem bi serdema nûjen ra li hev tê. Ji xeynî vê dewleta modern a navendî zimên ne tenê wekî navgîneka avakirina nasnameyê, herwisa ji bo kontrolkirina kesên ku tîr birêvebirin jî, hêsantir kirîye. Bi kurtî, di encama

bikaranîna nasnameyî û ragihandinî ya zimên ji aliyê dewleta modern ve, polîtîkayên zimanî derketine holê.

Dîyar e ku wekî netewedewlet, Komara Tirkîyeyê jî li gor çarçoveya destnîşankirî tevgerîyaye. Ji avabûnê heta salên 1990î neteweperwerîya zimanî ya Komarê, bi xwe ra windabûna zimanên din ên ku dihatin axivîn, anîye. Yanî ji bo ku her kes bi tirkî biaxive, ji bilî tirkî asîmîlekirina zimanên din wekî mecbûrî hatibû dîtin. Herwekî pêwîstîya vê rewşê, dewletê ji bo ku komên zimanên ne-tirkî bi tirkbûnê asîmîle bike, gelek pratîkên zext û tundîyê sepanîye. Ev polîtîkaya yekzimanî ya dîyarkirî jî bi metnên qanûnî hatin birêvebirin. Bo nimûne, bikaranîna kurdîyê di cihên giştî, radyo, televîzyon, kitêb, her cure materyalên nivîskî da û ji bilî wan axaftina bi wî zimanî hatîbe qedexekirin.

Lêbelê, ev pêvajoya destnîşankirî, di sala 1991 da digihêje qonaxeka nû. Sîyaseta dewletê ya ku pala xwe daye înkâr û polîtîkayên asîmîlasyonê teşeyeka nû digire. Ji hêla dewletê ve mirov dikare behsa serdemeka reforman bike. Di vê pêwendê da, nişaneyê qonaxa nû ya herî mihîm, fesihkirina qanûna bi hejmarê 2932an bû.

Piştî, “Îdeala Yekîtiya Ewrûpayê” li ser polîtîkayên zimanî karîger bûye, di têgihîştina “neteweperwerî” û “yekzimanîya fermî” ya ku Tirkîyeyê ji destpêkê ve dimeşîne, bûye sedema şikestineke cidî. Nişaneyê ya yekê ya herî zelal, pêşî di makezagonê da û piştî jî di qanûn û rêzîknameyan da gelek guherîn hatin çêkirin.

Herwisa, di van 30 salên dawî da tesîra polîtîkayên zimanî yê neyênî ber bi şert û mercên erênî ve guherî. di weşangerîya kurdî da rûpeleka nû vedibe. Rojname, kovar û kitêb tên çapkirin. Enstîtuyên kurdî li hin bajaran tên sazûkirin. Muzîk û şanoya kurdî geştir bûn. Di warê plansazîya zimanî da gelek xebatên hêja hatin kirin; ferheng, pirtûkên gramerê û herwisa klasîkên kurdî hatin çapkirin. Herweha, tevger û sazîyên zimanî hatin damezirandin.

Îro, wekî zimanekî bêpiştgirî û handanê, bi xebatên şexsî, komî û dezgehî, ji aliyê stabardbûnê ve gihîşt asteka nîrxdar.

Mijar û Giringîya Tezê

Rol û fonksiyonên zimanî ji bo pêşveçûna neteweyê mihîm e. Neteweyên Rojavayî ji ber sedemên curbicur giringîyê dane standardkirin û belavkirina zimanê xwe. Zimanê hevpar ji bo nasnameya neteweyî û çanda hevpar jî pêwîst bû.

Ji nimûneyên Rojavayî yên wekî fransî, îngilîzî û almanî, tê famkirin ku ji vê pêvajoyê derbas bûne û wekî zimanê standard geş bûne û li cihanê belav bûne. Herweha, em dizanin ku pêvajoyên zimanî hêsan nebûne.

Ji aliyê mijara me ve, ya giring, rewşa zimanê kêmîneyan çawa bûye; nexasim kurdîya kurmancîyê wekî zimanê neserdest pêvajoya standardbûnê çawa qewimîye, dînamîkên wî çê bûne, çîroka wî ya sed salî îro gihaştîye çî astî, em ê li ser rawestin.

Wekî zimanekî bêdewlet, bê statû û bêpîştgirî eger îro em behsa standardbûna kurmancîyê dikin, ev çawa pêk hatîye? Teza me li ser serborî û hewldanên standardkirina kurdîya kurmancîyê radiweste. Dixwaze ku xebatên qedirbilind ên şexs û sazîyan çî encam dane, rave bike.

Asta heyî ya standardbûna kurmancîyê têrî civaka kurd dike an hewce ye ku xebatên bi vî rengî bèn bipêşxistin, da ku qonaxên standardkirina zimanekî di mînaka kurmancîyê da ber bi kemîlînê ve biçê.

Dîyar e ku pêwîstî, di mînaka kurmancîyê da, bi xebatên bi vî awayî hene. Rewşa heyî ku bi awayekî tekûz bi analîzkirin, dê ji bo siberojê encamên baş biwelidîne.

Sînor û Çarçoveya Tezê

Celadet Alî Bedirxan û nifşê Hawarê li gel “şoreşa alfabeyê”, ji aliyê plansazîya zimanî û nexasim kodkirina zimanî ve xebatên bêhempa kirine û em dizanin ku xebat û berhemên wan di xebatên îroyîn de reng vedane.

Ji ber vê yekê, wekî pêngava ewil me ji Hawarê sînor da destpêkirin û di salên 2022an da jî bi dawî kir.

Çarçoveya teza me bi awayekî dîyakronîk xwe dispêrê serborîya hewldanên standarkirina kurdîya kurmancîyê. Ji Kovara Hawarê heta 2022an pêvajoya standardbûna kurmancîyê, hat analîzkirin û ravekirin. Li gel analîzên teorîk, serdema Hawarê, polîtîkayên zimanî yên Komara Tirkîyeyê û bandora wî li ser çarenivîsa kurmancîyê, xebatên şexsî yên ku di salên 1960-70yî da hatine meşandin, serdeme derbeya salên 1980yî û piştê ev sih salên dawî ku di çarenivîsa kurmancîyê da guherînên balkêş qewimîne û herî dawî asta standardbûna kurmancîyê mijarên çarçoveya teza me ne.

Hêjayê balkişandinê ye ku, herçi qas me çarçoveya xebata xwe bi sînorên Tirkîyeyê sînardar kiribe jî, dîyar e ku “destpêk” a me Kovara Hawarê ye ku li Şama Surîyeyê derketibû. Lewra êkol û aktorên sereke yên vê kovarê Bakûrî bûn û qada “pêkanîn” a normên ku wan danîbûn Tirkîye bû. Ji ber vê yekê sînorê xebata me ji Hawarê dest pê kir.

Rêbaza Lêkolînê

Bingeha vê xebatê li ser nirxandin û analîzkirina berhem û nivîsarên sereke yên pêwendîdarê mijara teza me ye. Têgihên wekî modernîte, netewedewlet, neteweperwerî, polîtîka û plansazîya zimanî û zimanê standard hatin ravekirin. Li ser metnan me rêça stadardbûna zimanekî li gel paşxaneya teorîk, ber bi standardbûna kurdîya kurmancîyê ve, şopand.

Bi awayekî dîyakronîk serborîya standardbûna kurmancîyê tevî aktor û dînamîken xwe hat nirxandin. Nexasim, ji bo plansazîya zimanî ya kurmancîyê li gor modelên Einar Haugen ku çar model danîne, xebat û çalakîyên aktorên hat analîzkirin; rewşa kurmancîyê ji alîyê hîlbijartin, kodkirin, pêkanîn û hûrgulîkirinê ve hat nirxandin.

Bandora polîtîkayên zimanî yên li ser çarenivîsa kurdîya kurmancî qonax bi qonax hatin derbirin. Hewldanên şexsî û dezgehî yên di derheqê parastin û bipêşxistina zimanî da hatin ravekirin. Herweha, di vê çarçoveyê de sazî, kovar û rojname, medya û kitêbên ku hatine weşandin, li gel xebatên akademîk hatin lêkolînkirin.

Ji bo rastnivîsîna vê tezê jî, Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmancîyê û Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurmancî-Tirkî (ya çapnekirî) wekî rêber hatin bikaranîn.

Xebatên Berê

Di pêvajoya xebata me da hat dîtin ku li ser mijarên wekî modernîte, neteweperwerî, netewedewlet û zimanê standard da berhemên bi zimanê bîyanî gelek in.

Bereksê vê yekê, bi kurdîya kurmancî, nexasim, di warê polîtîka û plansazîya zimanî da pir kêr in. Di pêvajoya xebata me da bi zimanê kurdîya kurmancî, tezeka doktorayê ya bi navê “*Mînaka Standardkirina Zimanekî: Hawar*” a Dr. Sevda Orak Reşitoğlu ji bo me bû palpişt. Em dikarin xebata Ronayî Onen a bi navê “*Ziman û Netewesazî, Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê (wergera ji Îngîlîz: Şehmuz Lurt)*” û teza wê ya doktorayê ya bi navê “*Türkiye’de Hâkim ve Muhalif Politikanın Gerilim Alanlarından Biri Olarak Kürtçe Dil Meselesi*” jî di vê çarçoveyê da binirxînin. Herwisa, Kitêba Ergin Öpengin a bi navê “*Rewşa kurdî ya sosyolîngûstîk li Tirkîyeyê*” û kitêba Salih Akın a bi navê “*Lêkolînên Zimannasîya Kurdî*” jî lê zêde bikin. Herwisa kitêba Cuma Çîçek jî a bi navê “*Zimanek Çima Tê Qedexekirin?*” û ya bi navê “*Kula Ziman*” a ku ji aliyê Vahap Coşkun, M.Şerif Derince û Nesrin Uçarlar hatîye nivîsîn, sûdmend bûn.

Bêguman, di zaravayên din yên kurdî da berhemên ku li ser standardîzasyona kurdî sekinîne hene. Herweha bi harfên erebî di devoka behdînî da jî berhem hatine dayîn. Herwisa, li ser vê mijarê wekî nivîsarên akademîk ên van salên dawîn jî hatine weşandin.

Dijwarîyên Lêkolînê

Ji beşa jorîn jî dê bê têgihîştin ku di warê standarkirina kurdîya kurmancîyê da berhem gelek kêr in. Di serê ewil da divê em bibêjin ku ancax çen lêkolînên kurdî ya bi vî rengî hebûn ku rêberiyê li xebata me kirin. Herçiqas di van salên dawî da tevî ku di akademîya kurdî da hejmara kesên ku di warê zimannasîyê da dixebitin û lêkolînan li ser babeta standardîzasyonê dikin, hêj di asta destpêkê da ye. Ji ber vê yekê, ji bo xebatên bi rengê teza me, qelsbûna xebatên bi zimanê kurdî yên di derbareyê zimanê kurdî da wekî

astengî dikare bê qebûlîkirin. Û herweha, tunebûna bîblîyografîya xebat û berhemên vê qadê jî ji bo lêkolera rewşeka neyînî ye.

1. NETEWEDEWLET Û ZIMAN

1.1 Netewedewlet

Li gor çarçoveya teza me, mîjara standardkirina zimanî roleka navendî dilîze. Lê, em dizanin ku standardkirina zimanekî û netewedewlet di nav têkilîyeka rasterast û xurt da ne. Herwisa, netewedewlet bixwe jî, berhemeka modernîteyê ye. Nexwe, em ê li jêrê li ser babeta netewedewletê, li gor çarçoveya tezê, rawestin. Lê, berî vê yekê, wekî paşxane, hewceye ku em bi awayekî kurt li ser têgiha modernîteyî û taybetmendîyên wê bisekinin.

Têgiha modernîteyê ji Romayê heta roja me ji bo manayên cihêreng hatiye bikaranîn. Lê, du manayên wê yên sereke hene: Ya ewil manaya hemdemîyê, wextê ku em tê da dijîn û ya din jî guherîna ji kevneşopîyê ber bi nûjenîyê ve dinimîne. Bi gotineka din, dijberîya di navbera “kevn” û “nû” da destnîşan dike.¹

Bi awayekî berfireh, eger em li têgiha modernîteyê binêrin, li gor qebuleka giştî, ji sedsala 17em vir da modernîte pêvajoya guherînê ku di warên wekî felsefe, aborî, jîyan, civakî, çandî û siyasî yên li Ewropayê pêk hatine, destnîşan dike. Di van qadên navborî da guherînê mezin, bingehîn û mayînde qewimîne.² Li gor vegotina Ramazan Çeçen jî:³

Di van guherînê mezin û bingehîn de jî rola Humanîzm, Reform û Ronakgeriyê heye. Bi mirovhezîya Ronesansê re însan biqîmet bû û bû pîvana her fezîletê. Reform bi xwe re dinyewîkirina dîn anî, rola dîn cardin saz kir. Ronakgerî li ber çiraya aqil, li dijî bawerî, adet, xurafe, hukim û dinyaya kevin şerek da destpêkirin û xwe wek çareserkerîna zanistî ya hemû nepenî û diyardayan îlan kir. Di ber van guherînê bingehîn de modernîte bû navê rewşa nû ya ku aqil, zanist, sekulerî, azadiya însan û îradeyê mohra xwe lê dane. Lewma digel serboriya wê ya têkel û pîrhêl, ji bo pênasekirina modernîteyê, çend xalên hevbeş hene di nava lêkolanan de: Rasyonelkirina civakê, sekulerbûna jîyanê, pêşketina zanistî, fikra neteweyî, guherîna fêhma zeman û qîmetbûna însan ango mirovhezî.

¹ Abdulvahap Akıncı, “Modern Ulus Devletlerin Doğuşu”, *Dumlupınar Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Hejmar 34, Kütahya, 2012, , r. 61.

² Gamze Yaşar Aslan, “Ortaçağdan Günümüze ‘Modernite’: Doğuşu Ve Doğası”, *Adıyaman Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi* Hejmar 7, Adıyaman, 2011, r. 10.

³ Ramazan Çeçen, “Di Nav Modernîzasyonê Der-Ewrûpî de Tecrubeya Kurdan”, *Nûbihar Akademi* 2016, Hejmar 6, r. 13.

Li gor Antony Giddens jî modernî di sedsala 17em da li Ewropayê dest pê dîke û li seranserê cîhanê belav dibe. Herweha, modernî nûnerê jîyaneka civakî û rêxistîbûnê nû ye jî.⁴

Herwekî ku li jorê jî hat destnîşankirin modernîte li gel qutbûna ji kevneşopîyê, ji hin pevajoyan pêk tê: Kapîtalîzm, laîkbûn (secularization), pîşesazîbûn (industrialization), bajarîbûn, pisporî, burokrasi û hwd. Digel van pêvajoyên navborî dezgeh û rêzikên tradîsyonel hildiweşin û ji dêvila wan, rêzik, sazî û pratîkên nû tên avakirin.⁵

Herwisa, cîhana wê demê pala xwe dida hilberîna çandina tradîsyonel (conventional farming/geleneksel tarım) û hunerên destkarîye. Qonaxeka statîk bû. Berevajî vê yekê, di serdema modernîyê da wekî ku hat vegotin pîşesazîbûn, bajarîbûn, xwendewarî, ragihandin û veguhestina girseyî, bi şeweya dinamik derdikevin pêş.⁶

Digel vê yekê, eger em bala xwe bidin destpêka pêvajoya modernîteyê, dîyar e ku ev pêvajo bi rexnekirina dîn, felsefe, exlaq, dîrok, aborî û siyasetê dest pê dîke. Xuya ye ku têgiha sereke û bibandor “rexnekirin” e. Rexnegirî rengê xwe daye tevahîya pêvajoyê. Herwisa, serdestkirina jîyaneka aqîlane û avakirina civateka rasyonel jî xuyangên vê serdemê ne. Jêdera têgih û hizrên sereke ên wekî pêşveçûn, werar (evolution/gelişim), şoreş (revolution/devrim), azadî û demokrasîyê “rexne” bû. Herweha, modernî li hember tradîsyona dîrokî dihat manaya daxwaza xweserîyê jî.⁷

Em têdigijîjin ku piştî hilweşîna “feodalîte”yê “dewleta modern”, piştî demekê, di forma netewedewletê da xwe dide der. Herwisa, derketina dewleta modern a bi pergala ji “şoreşa Fransî” tê destpêkirin.⁸ Îcar, di vê kêlîyê da, em ê li ser analîzên di derbareyê

⁴ Anthony Giddens, *Modernliğin Sonuçları*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 1994, r. 9.

⁵ Zeynep Erdem, *Modern Ulus Devlet Anlayışının Epistemolojik Temeli ve Eleştirisi*, Mardin Artuklu Üniversitesi SBE, Mardin, 2017, (Teza Masterê ya Çapnebûyî), r. 57.

⁶ Halil Bayhan, *Ulus Devlet, Modernizm ve Postmodernizm*, Dicle Üniversitesi SBE, Diyarbakır, 2006, (Teza Masterê ya Çapnebûyî), r. 71.

⁷ Beyhan, *hb.* r. 72.

⁸ İnci Özkan Kerestecioglu, “Modern Devlet ve Milliyetçilik”, *Modern Sisyasi İdeolojiler, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları*, Berhv. H.Birsen Örs, İstanbul, 2014, r. 325.

têgihên wekî netewe, netewedewlet û pêwendîya di navbera netewedewletê û dewleta modern da, rawestin.

Herwekî ku Salim Orhan jî vediguhêze “Têgiha ‘netewe’yê yek ji têgihên zanistên civakî yên herî bipirsgirêk û hevnegirtî ye. Charles Tilly, neteweyê wekî ‘xala herî tevlihev û alîgir a ferhengoka sîyasî’ bi nav dike.”⁹

Pênaseyên ku di derbareyê neteweyê da tên kirin, li ser faktorên "objektîf" ên wekî zimên, dîn û tradîsyon, welat û sazîyan radiwestin. Herweha, li ser faktorên "sûbjektîf" jî, yên wekî têgihîştin û hestiyariyê cext dikin, disekin. Li gor Habermas, di termînolojîya sîyasî da “netewe” û “gelê dewlet” di heman çarçoveyê da tên nirxandin. Ancax, ji pênaseya hiqûqî wêdetir, herwisa, "netewe" bi reha xwe ya hevpar tê manaya civakeka sîyasî ku qet nebe, bi ziman û çand û dîroka hevpar teşe girtiye.¹⁰

Anderson ku yek ji giringtirîn teorîsyenên netewe û neteweperwerîyê ye, bi ruhekî antropolojîk pênaseya neteweyê weha pêşniyaz dike: “Netewe civakeka sîyasî ya xeyalî ye – civateka xeyalî ku hem di cewherê xwe da serwer e û hem jî di heman demê bisînore.” Xeyalkirî ye ji ber ku endamên neteweya herî biçûk di derheqê endamên din da dê tiştek nizanibin, nas nekin an jî nebihîzin. Lêbelê, xeyala yekûna wan dê hîn jî di hişê her yekê da bijî.

Di vê pêwendê (context) da ne mimkin e ku mirov têgiha neteweyê ji têgiha neteweperwerîyê cuda binirxîne. Lewra neteweya ku civakeka xeyalî ye, bi neteweperwerîyê hatiye avakirin.¹¹

Derketina dewleta modern li ser dika dîrokê, berî netewedewletê ye. Habermas dîyar dike ku berî ku “netewe” derkeve holê, dewletên modern ên organîzekirî hebûn. Li gor

⁹ Salim Orhan, “Dil Politikaları Ve Dil Hakları Üzerine Teorik Çerçeve”, *İnönü Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi*, 2017, Cild 8, Hejmar 2, r. 332.

¹⁰ Orhan, “hg”. 2017, r. 334.

¹¹ Orhan, “hg”. 2017, r.334.

wî, hevgirtina peyvên "dewlet" û "netewe"yê wekî "netewedewlet"ê piştî şoreşên dawîya sedsala 18an pêk tê.

Li gor tezeka din rûdana "netewedewletê" di dawîya sedsala 18an da li Ewropayê wekî berhema pêvajoyeka piralî da pêk hatîye.¹²

Dîyar e ku dewleta modern ku li ser bingeha navendîbûna erdnîgarî, îdarî û yasayî ava bûye û bi bacê tê finansekirin, erkên xwe yên civakî, aborî û çandî bi serkeftin pêk anîye. Îcar, netewedewletê ji van îmkanên destnîşankirî yên dewleta modern zêdetir sûd wergirtîye.¹³

Eger bê gotin ku dewleta modern bi geşbûna têkilîyên hilberîna kapîtalîst ra hevdem derketîye holê, dê ne şaş be. Lewra pêkhatina diyardeya neteweyê û pêşketina aîdîyetên aborî damezrandina dewletên navendî, lezandine. Li Ewropayê piştî ku pergala dewleta feodal hildiweşe û binyada dewleta navendî rû dide, wê demê struktura netewedewletê tamam dibe. Piştî vê yekê, êdî netewedewlet di serdemên paşerojê da wekî model li deverên din ên cîhanê tê veguhestin.¹⁴

Li gor riwangeha Ramazan Çeçen, "Têkçûna împaratoriyan û di şûna wan de hêdî hêdî çêbûna netewe-dewletên burokratîk, diyardeyeke din a vê pêvajoyê ye. Kapîtalîzmê, bi xwe re bazareke hevbeş, hêzeke merkezî anî. Pê re hêza çeperan tesfîye an kêmbû; çîneke nû ya bajarî û erbabê ticaretê (bûrjûwazî) peyda bû."¹⁵

Nexasim, netewedewlet ji nîveka duyem a sedsala 20em li seranserê cîhanê wekî modela avabûneka (structuring) sîyasî belav bûye. Îro dewletên ku endamên Neteweyên Yekbûyî (United Nations) ne, wekî netewedewlet hatine damezirandin. Herweha, ji

¹² Vahap Coşkun, *Ulus-Devletin Dönüşümü ve Meşruluk Sorunu*, Liberte yayınları, Ankara, 2008, r. 176.

¹³ Coşkun, *hb.* 2008, r.175.

¹⁴ Akıncı, "hg". r. 62.

¹⁵ Çeçen, "hg". r. 14.

sedsala 18em heta îro ji bo avakirina wê ku micadele hatîye kirin, modela rêxistina sîyasî netewedewlet e.¹⁶

Li gor çarçoveyeka din, dewleta netewe, berevajî dewletên Serdema Navîn (middle ages/Orta çağ) û dewletên monarşîk-olîgarşîk, sîstemeka sîyasî ye ku tê da karên sereke yên cihbicihkarî (executive power/yürütme gücü), qanûnî û dadwerî di destê hikûmeteka neteweyî da ne. Li gor vê çarçoveyê, herwekî prensîp, dewleta netewe li ser bingeha wekhevîya fermî rê dide beşdariya sîyasî ya hemû hemwelatîyan.¹⁷

Herweha, dewlet sê hêmanên xwe yên bingehîn hene: Xaka welatê hevpar, gel û hêza dewletê. Bi vî awayî binesazîya netewedewletê derdikeve holê. Lê di vir da ya muhîm ew e ku hemû ferdên ku di bin serwerîya netewedewletê da dijîn xwe wekî endamên heman neteweyê dibînin.¹⁸

Senifandina netewedewletan jî weha hatîye kirin: *a.* Komek ji wan, netewedewletên ku navenda wan Ewropa û derûdora wê ya nêzîk in. *b.* Koma duyem netewedewlet in, ku bi taybetî li parzemîna Amerîkayê ku bi qirkirina gelên xwecihî û li şûna wan bicihkirina nifûsa ji koçberan pêk tê, tê dîtin. *c.* Koma dawî jî, piştî nîveka duyem ya sedsala 20em da, ji netewedewletên ku di encama tevgerên dekolonîzasyonê da pêk hatine.¹⁹

Herwisa, ji bo avakirina netewedewletan çar qonax hatine destnîşankirin:

1. Qonaxa ewil navbera sedsalên 15em û 18em di hundirîne û avabûna dewletê di vê serdemê da pêk hatîye. Di vê serdemê da entegrasyoneka aborî, çandî û sîyasî di nav elîtan da pêk hatîye.

¹⁶ Ozan Erözden, *Siyasi İktidarın Meşruiyet Temeli Perspektifinde Avrupa'da Ulus-Devlet*, İstanbul Üniversitesi SDE, İstanbul, 1996, (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî), r. 1.

¹⁷ Coşkun, *hb.* 2008, r. 175.

¹⁸ Ahmet Aslan, "Ulus-Devlet Nedir?", <https://perspektif.eu/2019/06/22/ulus-devlet-nedir/>, TB: 2.04.2022.

¹⁹ Coşkun, *hb.* 2008, r. 179.

2. Di qonaxa duyem da bi awayekî girseyî xelk beşdarî sîstemê dibe. Lewra dibistan, dezgehên artêşî û medyaya girseyî ya nû, ên ku têkilîyên di navbera elît û xelkê da pêk diînin, xwedî fonksiyon in û vê pêvajoyê hêsantir dikin. Bi navgînîya van derfetên navborî têgihîştina nasnameya nû di nav mirovan da pêk tê. Îcar, di navbera nasnameya nû û nasnameyên kevn ên serdest, wekî dêrê û mezhebê da nakokî derdikeve.

3. Di qonaxa sêyem da êdî kesên ku bindest û tebaa ne, vediguherin kesên çalak û derdikevin meydanê. Ev yek dibe sedem ji bo mixalefeteka sazûmanî. Herweha bi beşdarîyeka berfireh organên temsîlkar tên avakirin. Ev bi saya partîyên sîyasî çê dibe ku ew berjewendîyên cîyawaz li ser xaleka hevbeş li hev tînin. Di vê serdemê da di navbera çanda serdest û çanda neserdest, di navbera otorîteya navendî û dêrê da şer her didome. Herwisa di navbera kesên feodal û bûrjûwazîyê da jî pevçûn derdikeve.

4. Di qonaxa çarem da tora îdarî ya dewletê geş dibe. Amûrên jinûvedabeşkirinê zêde dibin. Li alîyekî tevdîrên ji bo temînkirina refaha gel dihatin girtin, li alîyê din jî xebatên wekhevkirina şert û mercên aborî di asta neteweyî da derketin pêş. Yanî bandora dewletê êdî pir zêde dibe.²⁰

Herweha, netewe û li gor wê jî netewedewlet, di nav şert û mercên taybetî yên her erdnîgarîyê da wekî pêvajoyeka cuda ya pêşketinê şopandîye. Bo nimûne, dema ku li Îngilîstan û Amerîkayê netewedewlet bi tevgereka ji jêr ber bi jor ve hatiye avakirin, lê, li Almanyayê û Îtalyayê jî avakirina netewedewletan ji jor ber bi jêr ve diqewime. Li alîyekî din, mirov dikare bibêje ku dewletê li Fransayê “neteweya Fransîzî” ava kirîye lê berevajî vê, “neteweya Almanî” berî her tiştî xwe wek miletekî xwedî dîrok, ziman û çandeka hevpar dibîne û dewleta Almanî diafirîne. Nexwe, ji ber vê jî mirov dikare bibêje ku mirov avabûna her neteweyekê (û netewedewletê) li gor şert û îmkanên wê binirxîne, dê çêtir be.²¹

²⁰ Akıncı, “hg”. r. 62.

²¹ Coşkun, *hb.* 2008, r. 232-233.

Wekî encama vê beşê, taybetmendîya herî bingehîn a ku netewedewletê ji modelên berê yên dewletan cuda dike ew e ku dewleta netewe xwedî sînorekî dîyar e û di nav van sînoran da xwedîyê desthilatdarîya mitleq e. Berevajî dewletên tradîsyonel, netewedewlet di qadên îdarî da xwedan sînorên teqez e û herwisa çavkanîya hêzê ye jî.

Taybetmedîyeka din a netewedewletê ew e ku bûrjûwazî bi saya dewletê, hem bû xwedîyê bazareka xwedî sînorên dîyar û hem jî ewlekarîya bazarê jî dihat dabînkirin.²² Dîyar e ku netewedewlet di warê çandî û sîyasî da yekgirtinekê dabîn dike. Herwisa yekparebûna çandî, zimanê hevpar û hişmendîya dîrokî bixwaze jî ev yek yekîtîya etnîkî hewce nake.

Ji bo serdemê di nivîsareka xwe da M.Şirin Filiz rewşa zimanê kurdî ya di serdema feodalîteyê da dinirxîne û weha dibêje: “*Di heman demê de mirov dikare bibêje ku di vê serdemê de ji aliyê statuya çandî ve zimanê Kurdî li Kurdîstanê serdest e.*” Lê, li gor wî,

Piştî serdema feodalîteyê serdema netewe dewletê tê ku vê serdemê ne tenê ji bo Kurdan her wiha ji bo hemû neteweyên bindest gelek xetere di nav xwe de dihewandîn. Piştî sedsala 16.-17. bi derketina fikra modernîteyê li Ewropayê di hemû qadên civakî de gelek guherînên mezin rû dan. Ewropa derbasî aboriya kapîtalîst bû û êdî tu derfeta jîyanê ji bo saziyên kevnare nemabû. Dewletên monarşîk di bin bandora van guherînan de man û dixwestin di nav axa xwe de yekîtîya desthilatdariyê saz bikin û ji ber van sedeman jî beg û axayên feodal hemû tesfîye kirin. Hem ji aliyê îdarî û hem ji aliyê erdnigariyê ve rexistinên navendîbûnê dest pê kirin. Êdî di parzemîna Ewropayê de dewletên modern derdiketin holê.²³

1.1.1 Pêwendîya netewedewletê û zimanê standard

Ziman ji bo kes û civakê wekî referans yek ji xalên hevpar ê sereke ye, belkî jî ya herî giring e. Lewra, ziman hem teşe dide nasnameya takekesî û hem jî di hevgirtina civakî da roleka giring dilîze. Balkêş e, di dîroka mirovahîyê da bikaranîna zimên ji bo armancên sîyasî tenê di serdema modern da tê dîtin. Ev dîyarde hevahengê derketina bizavên

²² Deniz Fırat, *Ulus Devlet, Dil Ve Kimlik Politikaları Bağlamında Anadili Kürtçe Ve Arapça Olan Öğretmen Ve Akademisyenlerin Anadilinde Eğitime İlişkin Görüşleri*, Ankara Üniversitesi EBE, Ankara, 2015 (Teza Masterê ya Çapnebûyî), r. 16.

²³ M.Şirin Filiz, “Weke Zimanê Kêmar Serpêhatiya Statuya Zimanê Kurdî”, *Nubihar Akademî*, Hejmar 4, 2016, r. 95-96.

neteweperwerîyê ye. Ji ber giringîya zimanî, îdeolojîya neteweperwer ji bo teşedayîna qada giştî (public sphere/kamusal alan) midaxele li zimên dike.

Neteweperwerî û modela dewleta wê ya ku netewedewlet e, giringîyeka taybet daye yekîtiya zimanî. Zimên xwedîyê du xalên serdest e: Berî her tiştî ziman sembolek e; ew sembola nasnameya hevpar di çîroka “netewe”yê da ye. Ew sembola hişmendîya “em”ê ye. Hişmendîya “em”bûna netewedewletê ancax bi axivîna bi yek zimanî di nav welatî da mimkin dibe. Wekî din, ji bo bicihbûna slogan û hêvîyên neteweperwerîyê di tebeqeyên civakî da pêdivî bi “zimanê neteweyî” heye.

Herwisa, li gor vê riwangehê bikaranîna heman zimanî ji hêla elît û kesên ji rêzê ve dibe sedem ji bo civîna li derdora daxwaz, hestên giştî û armancên hevpar. Yekîtiya zimanî ne tenê giringîyeka sîyasî û çandî ye, di heman demê da ji bo pêwîstiyên aborî û pêdivîyên pratîk e jî. Lewra, ji bo ku aborîya neteweyî di nava welatî da çê bibe û hebûna xwe bidomîne, pêwîstî bi derbasdarîya heman zimanî li hemû welêt heye.²⁴

Erk û fonksîyona zimanî ya duyem jî: Ziman amûrek e. Ew ji bo guhertin û veguhertina nifûsa welêt navgînek e. Ku ev nifûs jî herçiqas wekî “heman netewe” tê pejirandin jî ji nasnameyên etnîkî û zimanî yên cihêreng pêk tê. Eger ku karîgerî û belavbûna bikaranîna vê amûrê zêde bibe, cihêwazîya di nav civakê da her ku biçe dê lawaz bibe û bi awayekî jênegar zimanê standard û hilberîna çandî pêk bê.

Ji ber ku ziman hem simbol û hem jî amûrek e, her netewedewlet ji bo veguherîna civakî, di rêça monîst-standard da midaxeleyî zimên dike. Herwisa ziman tê birêvebirin, manîpulekirin û heta ji nû ve tê afirandin. Ji bo ku her kes bi vî zimanê neteweyî biaxive, mekanîzmayên cihêreng têne xebitandin. Di vê çarçoveyê da hemû xebatên dewletê bi yek zimanî tên meşandin û zimanê bijartî, li ser kesên ku li welêt bi zimanên cuda diaxivin, tê ferzkirin.²⁵

²⁴ Vahap Coşkun, M.Şerif Derince, Nesrin Uçarlar, *Dil Yarası*, Disa Yayınları, Diyarbakır , 2010, r. 13.

²⁵ Coşkun, Derince, Uçarlar, *hb.* 2010, r.14.

Herwisa, taybetmendîya neteweperwerîyê ew e ku yekîtiya zimanî wekî hêmaneka bingehîn ji bo afirandina tifaqên ferazî (hypothetical) radixe ber çavan. Di vê rewşê da, dîsa weşangerîya kapîtalîst dibe hilgirê vê pêvajoyê û bi alîkarîya bipêşxistina xebatên zimannasîyê, hişmendîya civakê ya li ser zimanê hevpar ava dike.

Dîyar e, di civakên nûjen da, ji ber ku têkilîyên di navbera kesan da asteka xurt ya pêwendîyê hewce dike, çand di van civakan da roleka pir giring dilîze û ji bo bidestxistina çandê jî "axaftina bi heman zimanî" dibe taybetmendîyeka pêwîst.

Li alîyekî din, xuya ye ku di civaka modern da pêdivîya ragihandinê, zimanekî hevpar welidandîye. Herwisa, zimanên neteweyî yên standard ku îro tên axivîn an jî tên nivîsîn, encama mecbûrî ya çapxaneyê û xwendewarîya girseyî ne. Bu gotineka din perwerdeya girseyî li ser zimanê hevpar bibandor bû. Di civakên nûjen da, ji bo ku hemwelatîyek xwedî mafên wekhev were hesibandin, dihat fikirîn ku pêdivî bi nirxên çandî û ji bo veguhastina van nirxan, pêdivî bi zimanê hevpar hebû.²⁶

Di pêvajoya neteweperwerîyê da perwerde wekî amûra herî giring a belavkirina zimanê neteweyî, di nav xelkê da hat bicihanîn. Dewletê perwerdeya rewa hema hema bi qasî tundîya rewa, belkî zêdetir, yekdestî (monopol) kir. Navendîbûna dewletê di serî da encama navendîbûna perwerdeyê bû. Bipêşxistina perwerdeya standard a bi neteweperwerîyê ra, ziman jî li gel wê tê standardkirin.

Neteweperweran ji bo kontrolkirina dewletê zimanekî standard û nivîsînê geşe pê dan. Ev yek rê da belavbûna gelek navgînên wekî medya, rojname û dibistanan. Digel vê, ji ber belavbûna sazîyên wekî dibistanên navendî, pirrengî (pluralism) her ku çûye qels bûye.²⁷

Li gor vegotina Sevda Orak Reşitoğlu, "Yek ji hêmanên herî giring û hevpar ziman e di pêvajoya netewetiyê de. Netewetiyê ku behsa nasnameya milî, çanda milî an jî çand

²⁶ Salim Orhan, *Dil Politikaları ve Türkiye'de Uygulamaları*, Ankara Üniversitesi SBE, Ankara, 2012, (Teza Masterê ya Çapnebûyî), r. 21.

²⁷ Orhan, *hb.* 2012, r. 21.

û dînê hevpar dike digihîje zimanê hevpar. Ev ziman, wexta standard dibe, rêya avabûna netewetiyê hêsantir dike.”²⁸

Têkilîya dewleta modern ya bi zimani ra ne tenê di pêwenda (context) afirandina nasnameya hevpar ya aîdîyetê da bûye. Berî her tiştî ziman navgîna ragihandinê ye. Dewleta modern a navendî dixwaze ku hemû welatîyên xwe di çarçoveya bernamêyên hevpar da organîze bike. Ev rewş pêwîstî bi afirandina zimanekî hevpar-standard dike. Dîyar e ku ji dewleta modern du meseleyên zimanî hene: “Ragihandin” û “sîyasî”.²⁹

Herwisa îdeolojîya neteweperwer ya ku armanca wê avakirina neteweya yekpare ye, di zimanî da jî giringîyeka taybet dide yekîtiyê. Lewra, yekîtiya zimanî an jî zimanekî hevpar û standard yek ji hêmanên herî giring e ku yekîtiya neteweyê ku li welatekî dijî, xurt dike. Tê dîyarkirin ku pejirandina ramana neteweperwerîyê ji alîyê beşên mezin yê nîfûsê ve ancax bi axaftina bi yek zimanî di nava welatî da mimkin e.³⁰

Li gor riwangeha Ronayî Onen jî “Ziman sembola sereke ya nasnameya çandî ye û di pênasikirina nasnameya neteweyî de ew giringîyeke siyasî hildigire ser milên xwe û dibe cudakereke ‘rasteqîn’. Ziman, ji dem û mekanê azad, hêmaneke bingehîn a pêvajoya netewesaziyê ye; û wisa tê bawerkirin ku ew di navbera sîberoj û pêşeroja neteweyekê de pirekê ava dike.”³¹

Yekîtiya zimanî ya ku heta dereceyekê bi homojenîya çandî ve girêdayî ye, bi awayekî mafdar yek ji taybetmendiyên cihêreng ên netewedewleta klasîk tê nirxandin. Mirov dikare bibêje ku, hewldanên afirandina zimanekî hevpar wekî parçeyekî ji pêvajoyên avakirina neteweyê ye û ev yek jî dibe jêdera zayîna polîtîkayên zimanî.

²⁸ Sevda Orak Reşitoğlu, *Mînaka Standardkirina Zimanekî Hevpar: Hawar, Zanîngeha Dicleyê, Enstîtuya Zanistên Civakî, Diyarbakır, 2022 (Teza doktorayê ya Çapnebûyî)*, r. 9.

²⁹ Orhan, *hb.* 2012, r. 24.

³⁰ Erdem, *hb.* r. 88.

³¹ Ronayî Onen, *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*, (Wer.) Şehmuz Kurt, Peywend Yayinlari, İstanbul, 2018, r. 23.

Têkilîya netewedewleta nûjen a bi zimanî ra bi her şeweyî, çî ragihandinî çî sîyasî be, di polîtîkayên zimanî da esas e.³²

Li gor veguhastina Filiz jî, “Modernizasyonê tenê di qadên sîyasî û îdarî de dest pê nekir, her wiha ji aliyê ziman ve jî divê standardizasyonê çêbûbûna. Ji ber vê yekê perwerdeya ku di dibistanan de dihate dayîn diviyabû bi awayekî standart bihata dayîn. Loma di vê serdemê de polîtîkayên zimanî hatine meşandin. Ev polîtîka jî bêtir bi rêya perwedeyê bi ziman û çandekê standart dihate dayîn.”³³

Wekî encama vê beşê, 'Netewe' wekî têgiheka nûjen, bi derketina faktorên bi hev ve têkildar ên wekî tevgerên reformê, weşangerîya kapîtalîst û hewldanên navendîkirina monarşiyên Ewropayê, bi awayekî xeyalî hatîye avakirin. Pêvajoya avakirina neteweyê li ser hîmê nasnameya hevpar/neteweyî û zimanekî hevpar/neteweyî bi pêşketîye.

Ji bo afirandin û parastina nasnameya hevpar/neteweyî, birêvebirina zimên û bikaranîna wî wekî amûreka sîyasî, cara yekem bi serdema nûjen ra li hev tê. Ji xeynî vê dewleta modern a navendî zimên ne tenê wekî navgîneka avakirina nasnameyê, herwisa ji bo kontrolkirina kesên ku tên birêvebirin jî, hêsantir kirîye. Bi kurtî, di encama bikaranîna nasnameyî û ragihandinî ya zimên ji aliyê dewleta modern ve, polîtîkayên zimanî derketine holê.³⁴

Digel van derbirînan hêjayê destnîşankirinê ye ku berî her tiştî netewedewletên ku li ser yek zimanî û yek nasnameyekê ava bûne, ya rast xwedî ziman û çandeka homojen nebûne. Bo nimûne, di sedsala 18em da li Fransaya ku neteweperwerî û netewedewlet derketibû holê, nêzî nîvê nifûsê bi fransî nezanîbûn.

Gotar û pratîka ku netewedewletê ya li ser nasnameya neteweyî ya homojen dixebitand, li hev nedihatin. Lewra, di nav sînoran da gelek ziman û çandên cuda hebûn.

³² Orhan, *hb.* 2012, r. 24.

³³ Filiz, “hg”. r. 96.

³⁴ Salim Orhan, “Bir Ulus-Devlet Örneği Olarak Türkiye’de Dil Politikaları ve Dil Hakları”, (Ed.)Bülent Bilmez, *Türkiye’de Dil Hakları ve Dilsel Çoğulluk, İstanbul Bilgi Üniversitesi yayınları*, 2021, r. 171.

Dewleta netewe ji bo ku binyada pirzimanî û pirçandî ya civakê veguherîne binyadeka yekzimanî û yekçandî, gelek polîtîkayên zimanî û nasnameyî bi pêş xistin.³⁵

1.2 Polîtîka û Plansazîya Zimanî

Di vê beşê da em ê li ser du dîyardeyên ji hev cuda, lê, pêwendîdar rawestin. Di navbera polîtîkayên zimanî û plansazîya zimanî da têkilîyeka rasterast û hîyerarşiyek heye. Çarçoveya polîtîkayên zimanî gelek caran bi polîtîkayên “nasnameya neteweyî” ya netewedewletan hatiye teşekirin. Polîtîkayên zimanî di encama serdema neteweperwerîyê da derketine holê. Wekî ku hat destnîşankirin, van polîtîkayan ji bo pêkanîna zimanê hevpar û nasnameya neteweyî ya netewedewletên pêwist bû.

Mirov dikare bibêje ku, di vê çarçoveyê de polîtîkayên zimanî yên li welatekî rasterast bi serpêhatiya neteweperwerîya li wî welatî ve girêdayî ye. Herweha, polîtîkayên zimanî yên ku herî zêde ji aliyê netewedewletan ve tên meşandin, polîtîkayên serdestkirina zimanî li her aliyê jiyana civakî ye.³⁶

Bi vegotina Ronayî Onenî,

Polîtîkayên zimanî pala xwe didin helwestên der barê ziman, rêzikên hevpar ên civatên zimanî, hestiyarên neteweperwer û dînamîkên sosyolînguîstîk ên din ku der barê guherînê de ne. Û jixwe plansazîya zimanî der barê van reftar û helwestên zimanî de ye. Di nava polîtîkayên zimanî de du cure plansazî hene: Plansazîya korpûs, ku der barê çarçoveya navxweyî ya ziman de ye; plansazîya statûyê, ku tê wateya hemû hewldanên guherîna bikaranîn û erka zimanî (an jî cureyên zimanî) yên di nava civaka navborî de.³⁷

Îcar, di binbeşên jêr da em ê li ser van her du têgih û naveroka wan bisekinin.

³⁵ Firat, *hb.* r. 18.

³⁶ Orhan, “hg”. 2017, r. 332.

³⁷ Onen, *hb.*, 2018, r. 36-37.

1.2.1 Polîtîkayên zimanî

Ziman, bi giştî, di dîrokê da cara yekem di serdema modernîyê da polîtîze bû û wekî amûreka sîyasî hat bikaranîn. Polîtîkayên zimanî bi pêvajoya neteweperwerîyê di çarçoveya nasnameyeka hevpar da bi avakirina “neteweyê” derket holê. Çarçoveya polîtîkayên zimanî gelek caran bi polîtîkayên “nasnameya netewî” ya netewedewletan hatîye teşekirin. Di vê çarçoveyê da polîtîkaya zimanî ya ku herî zêde ji alîyê netewedewletan ve hatîye meşandin; polîtîkaya yekzimanî ye, ku armanca wê homojenkirina zimên e û xwedî karaktereka asîmîlasyonîst e. Ev sîyaseta zimanî bû sedem ku hêdî hêdî zimanên din, ji bilî zimanê hîlbijartî, ji jîyana giştî werin dûrxistin û hin ziman winda bibin.³⁸

Polîtîkayên zimanî polîtîkayên fermî ne ku tê manaya biryarên (qanûn, çarçove) li ser statû, bikaranîn û qadên zimanî û mafên axêverên wî zimanî. Polîtîkayên zimanî bi giştî ji alîyê dewletan ve tîrên dîyarkirin.

Herweha polîtîkayên zimanî ji rêbazên bikaranînê, geşedana şîyanên zimanî ji bo pêdivîyên civakê, parastina zimanî bixwe pêk tîrên. Evan polîtîkayan hewl didin ku, bo nimûne, bersiva van pirsan bidin: Ziman dê çawa di nav xelkê da belav bibe? Mirov dê çawa zimanî bo zanist û teknolojîyê bi kar bîrîne. Sîstemeka perwerdeyê dê bi çî rengî ava bibe? Statûya zimanî dê çawan bilind bibe?

Li vir, hewce ye ku em bala xwe bidin paşxaneya dîyardeya polîtîkayên zimanî yêrên dewleta modern. Herwekî ku li jor jî hat destnîşankirin,, 'Netewe' wekî tîgeheka nûjen, bi derketina faktorên bi hev ve tîkildar ên wekî tevgerên reformê, weşangerîya kapîtalîst û hewldanên navendîkirina monarşîyên Ewropî, bi awayekî xeyalî hatîye avakirin. Pêvajoya avakirina neteweyê li ser hîmê nasnameya hevpar/neteweyî û zimanekî hevpar/neteweyî bi pêşketîye.

³⁸ Orhan, “hg”. 2017, r. 331.

Herwisa, birêvebirina zimên û bikaranîna wî wekî amûreka sîyasî ji bo afirandin û parastina nasnameya hevpar/neteweyî ji aliyê dîrokî ve cara yekem bi serdema nûjen ra li hev tê. Ji xeynî vê dewleta modern a navendî zimên ne tenê wekî navgînek avakirina nasnameyê, herwisa kontrolkirina kesên ku tên birêvebirin jî hêsantir kirîye. Bi kurtî, di encama bikaranîna zimên ji aliyê nasname û ragihandinê ve polîtîkayên zimanî derketine holê.³⁹

Di vê çarçoveyê da polîtîkayên zimanî yên ku netewedewlet bi piranî serî lê didin, polîtîkayên yekzimanî nin ku armanca wê homojenkirin û asîmîlekirina zimanî ye. Di encamê da ji bilî zimanê fermî zimanên din ji aliyê dewletê ve ji qada giştî tî derxistin.⁴⁰

Herwekî li cihên cîyawaz hat vegotin, di pêvajoya avakirina neteweyê da hem ji bo avakirin û pêkhatina nasnameya neteweyî hem jî ji bo dabînkirina yekîtiya neteweyî giringîyeka bingehîn hatîye dayîn bo homojenkirina çandî û zimanî. Bi gotineka din, neteweperwerî ji bo ku yekîtiya fiktîv çê bike û bidomîne, yekîtiya zimanî derxistîye pêş.

Herweha, xebatên zimannasîyê yên dewleta navendî ji bo peydakirina hewcedarîyên burokrasî û perwerdeyê, ji bo ragihîştina gel û girêdana gel bi rêveberîyê ra jî di avakirina zimanên neteweyî da piştgirî dane.⁴¹

Lewra, dewleta modern a navendî li ser esasê rêxistinkirina hemû welatîyên xwe di çarçoveya bernameyên hevpar da ye. Zimanê neteweyî yê avakirî, di afirandin, belavkirin û veguhestina çand/nasnameya neteweyî da ji bo nişên siberojê wekî amûra herî girîng dihat dîtin. Hilbijartin û belavkirina zimanekî hevpar bi şêweyeka meşrûkirin û sazûmanî pêkhatîye. Meşrûkirin jî, bi gelemperî, ji aliyê netewedewletê ve wekî bidestxistina statûya fermî ya zimanî tê famkirin.⁴²

³⁹ Orhan, “hg”. 2021, r. 171.

⁴⁰ Orhan, “hg”. 20121, r. 171.

⁴¹ Orhan, “hg”. 2017, r. 336.

⁴² Orhan, “hg”. 2017, r. 336.

Herwekî ku Salim Orhan jî destnîşan kirîye, hewldanên ji bo afirandina zimanê hevpar wekî parçeyekî bingehîn ê pêvajoyên avakirina neteweyê, bû jêdera welidîna polîtîkayên zimanî. Têkilîya netewedewleta modern a bi zimanî ra, çî ragihandinî çî sîyasî be, di polîtîkayên zimanî da esas e. Polîtîkayên zimanî ên dîyarkirî bi hemû dezgehên dewletê, bi taybetî jî bi perwerdeya "mecburî" kerîger dibe.⁴³

Polîtîkayên zimanî an rasterast ji hêla hukûmetan û sazîyên nîv-fermî (akademîyên zimanî ên neteweyî) an jî ji alîyê aktor û kesên ku di pêkanîna sîyaseta dewletê da bi bandor in, tên afirandin. Bêguman, polîtîkayên zimanî ji polîtîkayên nasnameya neteweyî ya dewletan dûr nakevin û ji bo pêkanîna wan alîkarîyê dikin. Herweha, taybetmendîyên sereke yê polîtîkayên zimanî bi şêwazeka hişmendî tên birêvebirin.

Polîtîkayên zimanî ên ku di encama têkilîya mecbûrî ya dewleta modern a bi zimanî ra derketîye holê, bi du awayan, wekî plansazîya madî (plansazîya corpusê) û plansazîya statûyê xuya dike. Dewleta modern ji alîyê ve dema ku ji bo avakirin û xurtkirina nasnameya neteweyî "plansazîya statûyê" dike, li alîyê din ji bo pêkanîna ragihandina bi bandor "plansazîya madî" jî dike.⁴⁴

Plansazîya madî guherandinên nû yê di warê taybetmendîyên hundurîn ên zimên ên wekî avahî, peyv, deng û bilêvkirinê ye. Li hêla din, plansazîya statûyê wekî biryarên polîtîk ên derbarê destnîşankirin an naskirina zimanî ji bo çî mebestan li herêmekê an dewletekê were bikaranîn, tê pênasekirin.

Herwisa, plansazîya statûyê, bikaranîna zimanekî wekî zimanekî neteweyî ya fermî li tevahîya dewletê an jî li hin herêman û dîyarkirina kîjan zimanî dê di kîjan fonksîyonê da were bikaranîn, dihewîne.⁴⁵

⁴³ Orhan, "hg". 2017, r. 337.

⁴⁴ Orhan, "hg". 2017, r. 338.

⁴⁵ Orhan, "hg". 2017, r. 339.

Joshua A. Fishman dîyar dike ku têkilîya van her du alîyên polîtîkayên zimanî piştgirî didin hev û wan wekî du alîyên heman pereyê (coin) dihesibîne.⁴⁶

Hewce ye ku plansazîya madî û plansazîya statûyê bi hev ra pêk bihên. Bo nimûne, beyî plansazîya statûyê, ne mimkin e ku berfirehbûn û nûjenkirina zimanekî bi plansazîya madî ya tenê bi serkeve. Herweha ne hewldaneka aqilane ye ku bêyî plansazîya madî, ji bo zimanekî, plansazîyeka statûyê (di sazîyên giştî da zimanekî serdest/yekane) bê çêkirin.⁴⁷

Wekî encam xuya ye ku li her welatekî li gel peydabûn û sazûmanbûna neteweperwerîyê nîqaşên zimanî jî pêşketine û hin polîtîkayên zimanî hatine meşandin. Ev nahê wê manayê ku ziman tenê karekî sîyasî digire ser xwe. Herwisa polîtîkayên zimanî wekî midaxeleyeka şewaza rêveberîya modernîst/pozîtîvîst e ya ku di qada çandî da bi awayekî aşkere karîger bûye.

Pratîkên wek dîyarkirina rêziman, dayîna karakter û naverokeka neteweyî ya peyvan, qedexekirina zimanên din an jî hin peyv û têgihan, avakirina sazîyên ku ji parastin û pêşvebirina zimanî berpirsyar in, bi projeya veguherîna nifûsê ya netewedewletê ra, bi awayekî hevterîb (parallel) hatine pêşxistin.⁴⁸

Weki ku em ê li jêrê jî bibînin ku polîtîkayên zimanî bi hewldan û gavên pratîk ên plansazîya zimanî tên bicihkirin.

1.2.2 Plansazîya zimanî

Ji bo têgihîştina têgiha plansazîya zimanî eger em ji Ronayi Onen sûd werbigirin:

Têgiha ‘plansazîya zimanî’ ji aliyê zimannasê emrîkî Einar Haugen ve di dawîya salên 1950yî de hatiye danasîn û ji bo hemî hewlên hişmendî tê bikaranîn ku armanca wan guherandina reftara zimên a civateke zimanî ye. ‘Ji pêşniyara peyveke nû bigire

⁴⁶ Joshua A. Fishman, “Language Policy and Language Shift”, Edited by Thomas Ricento, *An Introduction to Language Policy: Theory and Method*, Blackwell Publishing, 2006, r. 315.

⁴⁷ Orhan, “hg”. 2017, r. 339.

⁴⁸ Mehmet Berk Balçık, “Milliyetçilik ve Dil Politikaları”, *Modern Türkiye’de Siyasi Düşünce: Milliyetçilik*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2002, r. 777-787.

heta afirandina zimanekî nû' her hewldan di nava vê têgihê de cih digirin. Siyaseta zimanî tê wateya armancên berfirehtir ên zimanî, siyasî û civakî ku bingeha pêvajoya plansaziya zimanî pêk tînin.⁴⁹

Weki ku li jorê jî hat destnîşankirin, du cure plansazî hene: Plansazîya korpûsê ku di derheqê çarçoveya navxweyî ya zimên da ye; û plansazîya statûyê jî ku tê manaya hewldanên guherîna bikaranîn û rola zimanî yên ku di nava civata zimanî da.⁵⁰

Plansaziya korpûsê bi avahiya navxweyî ya zimanekî re têkildar e. Ew di koda zimanî de guhertin û çêkirina rêziman û ferhengan, ji bo zimanê hîlbijartî pêk diîne. Çalakiyên tîpîk ên plansaziya korpûsê, di nav xwe da, danîna pergaleka nivîsandinê ji bo zimanekî axaftinê, destpêkirina formên rastnivîsînê, çêkirina termên nû û weşandina pirtûkên rêzimanê hene.

Herwisa, aliyê sereke ya plansaziya korpûsê, standardkirina zimên e ku ev jî tê manaya çêkirin û sazkirina normek zimanî ya yekgirtî ji bo zimanekî diyarkirî ku hatîye pejirandin û bûye xwedî statûyeka neteweyî .

Herçend, plansazên zimanî ji hêla têgihî ve plansazîya korpûsê û statûyê ji hev vediqetînin jî, tê pejirandin ku her du pîvan ji nêz ve bi hevûdin ra têkildar in.⁵¹

Îcar, plansaziya statûyê jî tê manaya terxankirina fonksiyonên nû (bikaranîna zimên wekî navgîna perwerdeyê an wekî zimanek fermî) ji zimanekî ra. Ew bandorê li rola zimanî ya di civakeka diyarkirî da dike. Mînakî frensî vê yekê dê zelaltir bike: Berî niha, fransî di ragihandina rojane, di dua û nivîsên dînî û zanyarî da dihat bikaranîn û bi vê yekê sînordar bû.⁵²

⁴⁹ Onen, *hb.* 2018, r. 36.

⁵⁰ Onen, *hb.* 2018 , r. 37.

⁵¹ Imikan Nkopuruk, "Status Planning, Corpus Planning And Acquisition Planning: Detailed Discourse with Examples from Two African Countries-Tanzania and Bokina Faso", Tai Solarin University of Education, https://www.researchgate.net/publication/327541764_Status_Planning_Corpus_Planning_and_Acquisition_Planning_Detailed_Discourse_with_Examples_from_Two_African_Countries-Tanzania_and_Bokina_Faso/link/5b94af1a299bf147392dc8c9/download, r.3. TB: 25.09.2022.

⁵² Nkopuruk, "hg", r.3.

Herweha, ji bo vê babetê eger em awirek biavêjin literatûrê, du kes û du jargon wekî jêder eşkere dibin: Modela plansazîya zimanî ya zimanzanê Amerîkî Einar Haugen (1966, 1987) û cûdahîya di navbera plankirina statûya zimanî û plansazîya korpusê ya Heinz Kloss (1969). Ev her du zanyar bûne çavkanîyên xebatên bi vî rengî ku ji van îstîfade tê kirin.⁵³

Wekî ku me li jor jî destnîşan kir, plansazîya zîmanî, hewldan û gavên pratîk ji bo bicihanîna polîtîkaya zimanî ye. Einar Haugen ji bo terîfkirina pêvajoya plansazîya zimanî çarçoveyek kêrhatî geşe pê daye (development). Çarçoveya ku Haugen dîyar kirîye, wekî pîvan hatîye qebûlkirin û dîyar e ku, bi gelemperî, di xebatên akademîk da “şoreşên zimanî” li gor van pîvanan tên analîzkirin. Em ê li jêrê li ser çarçove û têgihên pêwendîdar bisekinin.

Li gor Haugen, plansazîya zimanî bi gelemperî (ne hewceye ku bi rêzê bin) ji çar qonaxan pêk tê:

1. Hilbijartin (selection)
2. Kodkirin (codification)
3. Pêkanîn (implementation)
4. Hûrgulîkirin (elaboration)⁵⁴

1. *Hilbijartin* (selection): Formeka zimanî ya nû yan jî formeka nûkirî tê hilbijartin. Herwekî ku Onen jî dîyar dike, plansazîya zimanî bi îhtîmala hilbijartina ji nava gelek guhertoyên (dîyalekt) zimanî ve dest pê dike. Hilbijartina formekî yan jî guhertoyeka zimanî li ser yê din û wekî “norm”a wî zimanî, pêşvebirina wî, bingeha pîranîya

⁵³ Juan Cobarrubias, “Language Planning: The State of the Art”, in *Progress in Language Planning: International Perspectives*, Edited by: Juan Cobarrubias, Joshua A. Fishman, Walter de Gruyter&Co., Berlin, 1983, r. 3.

⁵⁴ Ana Deumert, “The Process of Language Planning, Introducing Soslolinguistics”, by Rajend Mestherie, Joan Swann, Ana Deumert and William L. Leap, *Published by Edinburgh University Press*, 2004, r. 375.

çalakîyên plansazîya zimanî pêk diîne.⁵⁵ Herwisa, bi hîlbijartinê, biryara standardkirina zimanekî û hinbûn û hinkirina wî zimanê tê dayîn.

Ji ber vê yekê plansaziya zimanî dikare wekî ya bersiva normatîf ji cihêrengiya zimanî ra, bê famkirin.⁵⁶

2. *Kodkirin* (codification): Ji bo rastnivîs, telafuz, formên rêzimanî û peyvan, kodên bikaranînê tê dîyarkirin. Bo nimûne, rêber û ferhengên rastnivîsînê qonaxên giring in ji bo kodkirina formên rêzimanî.⁵⁷ Herweha kodkirin tê manaya avakirina standardeka zimanî yan jî formî ji bo koda hîlbijartî ya zimanî, û bi piranî li ser sê pêngavan tê dabeşkirin: Îmla, rêziman û ferheng.⁵⁸

Di vê kêlîyê da em ê li ser pêkhateyên kodkirinê rawestin. Grafîzasyon (graphization) ku li cihê ku curbicur ziman cara yekem di forma nivîskî de tê bikaranîn, pêşxistina rastnivîsê (orthography/îmla) çalakiyeka girîng e. Divê, îmla binyada zimên bi awayekî xurt binimîne; xwendin û nivîsandina wê hêsan be û ji aliyê civakê ve were qebûlkirin.

Herçî rêziman e (grammatication), kodkirina qaîdeyên rêzimanê, bi gelemperî di warê ziman û zimanên neteweyî yên ku wekî zimanê duyem tene fêrkin da, pêk tê. Lê ev çalakî ji bo axêverên zimanê dayîkê yên herêmî, her tim, pêk nahê.

Îcar ku em bala xwe bidin ferheng sazîyê (lexicalization), wekî ku tê zanîn, têkiliya zimanî diyardeyeka gerdûnî ye, û bi awayekî karakterîstîk, di encama pêwendiya zimanî da deynkirina peyv û îfadeyan di hundirîne. Dema ku zimanekî bibe hilgîrê fonksiyonên

⁵⁵ Onen, *hb.* 2018, r. 38.

⁵⁶ Steve Nicolle, "Sociolinguistics: Language Planning and Policies", https://www.academia.edu/6695472/Sociolinguistics_Language_Planning_and_Policies, r. 2. TB: 10.02.2022.

⁵⁷ Mikail Bülbul, "Netewesazî, Ziman û Standardîzasyona Zimanan", https://akademi.yeniyasam.org.tr/p/user_course/detail/id=21, Yeni Yaşam Derneği, 2020, TB: 10.02.2022.

⁵⁸ Onen, *hb.* 2018, r. 39.

fermî (wekî perwerde û dînî), bi awayekî siruştî tê biryardayîn, bê ka kîjan peyv orjînal e û kîjan hatîye deynkirin. Ev yek, bi taybetî, dema ku ziman bi nasnameyeka dîyarkirî ya etnîkî an siyasî ve girêdayî ye. Herweha, berhema karekterîstîk a ferhengszazîyê, ferheng e.⁵⁹

3. *Pêkanîn* (implementation): Tê manaya pêkanîna zagonî ya xurt a polîtîkayên zimanî û bikaranîna zimanê hîlbijartî di hemî warên jîyana giştî da.⁶⁰ Herwisa, ji bo zimanekî zindî bê hesabandin, divê komeka axêverên wî zimanî hebin.⁶¹ Li hêla din bi rêya dibistan, pirtûk û hwd qebûlkirin û hezmandina formên nû îfade dike.⁶²

Herwisa bi vegotina Steve Nicolle: “Pêkanîn, bi gelemperî hilberîna materyalan (pirtûk, rojname, belavok, malper, weşanên radyoyê, hwd.) bi curbicur zimanên kodkirî vedihewîne.” Ev yek jî bi gelemperî ji aliyê dewletan ve tê bicihkirin.⁶³

4. *Hûrgilîkirin* (elaboration): Tê manaya nûjenkirina zimanî, geşedanên termînolojîk û stîlîstîk ên zimanê kodkirî; bi taybetî çêkirin û xurtkirina termînolojîyê di warên curbicur da. Wekî “modernîzasyon” jî tê binavkirin. Hûrgilîkirin di hemû zimanan da pêvajoyeka berdewam e, ji ber ku daxwaza çêkirina têgihên nû, ji bo axaftin û nivîsîna di derbareyê raman, konsept û îcadên nû da ku tu car xilas nabe.⁶⁴ Herwisa, li gor lîteratûrê sê stratejî ji bo nûjenkirina ferhengê têne bikaranîn:

1. Deynkirin
2. Berfirehkirina manaya têgihêka xwemalî
3. Çêkirina termên nû⁶⁵

⁵⁹ Nicolle, “hg”. r.3.

⁶⁰ Deumert, “hg”. r. 379.

⁶¹ Onen, *hb.* 2018, r. 41.

⁶² Bülbül, *hp.* 2020.

⁶³ Nicolle, “hg”. r.3

⁶⁴ Onen, *hb.* 2018 , r. 40.

⁶⁵ Deumert, “hg”. r. 379.

Herweha, “hurgilîkirin”, hemû aliyên plansaziya korpusê dihundurîne û ji bo hewcedariyên civaka nûjen hatîye pêşxistin. Bo nimûne, yek ji wan a girîng jî pêşxistina peyvên nû ye (lexicalization), bi taybetî ji bo tiştên teknolojik ên wekî tîlefônên desta û kompîturên.⁶⁶

Di dawîya vê beşê da hewce ye ku em destnîşan bikin ku li gor Einar Haugen wekî zimanekî axaftinê veguherîna lehçeyekî ber bi zimanê standard ve tîkildarî bipêşketina nivîsînê û neteweperwerîyê ve ye. Şerteka vê modela behskirî ew e ku hebûna van çar taybetmendîyan di zimanekî standard da xuya be.⁶⁷

1.2.3 Prensîbên standardkirina zimanan

Di zimannasiyê da standardkirina zimanî tî manaya sêwirandin (design) an lêgerîna qaîdeyên rastnivîsînê (orthography) û rêzimanê yên ku ji bo hemû bikarhêneran, hevpar in û bi vî rengî armanc ew e ku bikaranîna wî di gelek warên jîyana mirovan da berfireh bibe.⁶⁸ Armanca zimanê standard ew e ku hevgirtina çandî, sîyasî û civakî bi awayekî plankirî û sêwirandî pêk biîne û wek cureyeka referansê li ser xaka ku tî da fermî ye, peyda bibe.⁶⁹

Standardîzasyon ew pêvajo ye ku tî da ziman ji bo formên xwe yên zimanî û hem jî ji bo fonksiyonên ragihandinê yên civakî tî standardkirin. Zimanek bi pêvajoya standardbûnê dibe standard. Ev pêvajo, bi gelemperî, ku bigihîje asteka baş hin prosedûrên amadekirî û birêkûpêk pewist in.⁷⁰

⁶⁶ Nicolle, “hg”. r.3.

⁶⁷ Amir Hassanpour, *Kürdistan’da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, (Wer.), İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan Avesta Yayınları, İstanbul, 2005, r. 93.

⁶⁸ Zoran Nikolovski, “*Language Planning And Language Standardization*”, https://www.researchgate.net/publication/296334037_Language_Planning_And_Language_Standardization, r. 5. TB: 25.07.2022

⁶⁹ Nikolovski, hg. r.1.

⁷⁰ Ramlan Ramlan, “*Language Standardization In General Point Of View*”, *Article in Budapest International Research and Critics Institute (BIRCI-Journal) Humanities and Social Sciences*, 2018, https://www.researchgate.net/publication/329967792_Language_Standardization_In_General_Point_of_View, r.28. TB: 25.07.2022

Standardkirin, ji zimanê axaftinê zêdetir bi zimanê nivîskî (mînak ferhengî, morfolojîk û sentaktîk) ve têkildar e. Standardkirin ew pêvajoyek e ku zimên bi rengekî kodkirî ye. Ev pêvajo bi gelemperî pêşketina tiştên wekî rêziman, pirtûkên îmlayê, ferheng û dibe ku edebîyatekê vedihewîne.⁷¹

Li gor vegotina Zoran Nikolowski, standardîzekirina zimanekî diyarkirî dikare bi çalakîyên li ser çend warên cihêreng ên zimanî pêk were. Ji van waran, a ewil, pergala nivîsandinê (writing system) ya nû an jî guhertina rastnivîsîn û alfabeya heyî ye. Piştê, standardkirin di warê *leksikalîzekirinê* da, bi danasîna peyvên nû, yên ji zaravayên zimên an jî ji zimanên din hatine wergirtin, û bi sîdwegirtina ji çalakiyên mirovî, çêkirina peyvên nû û hwd.

Herweha, bi hîlbijartina yek ji formên herêmî, di formên diyalektê da standardkirin dikare were bicihanîn û afirandina formeke nû ya standard bi gelek hêmanên ku ji guhertoyên cuda yên diyalektên herêmî hatine wergirtin.⁷²

Îcar, ji bo zelalkirina paşxaneyê pêdivîya zimanekî standard, em ê serî bidin Sevda Orak Reşitoğlu ku weha derbirîye:

Ziman di pêşketina neteweyê de xwedî roleke mezin e. Ji ber vê ye ku di dîroka cîhanê de, gelên ku xwestine bibin netewe û di nav milletên din de hêzdar bibin, wan ewil ji sererastkirin, standardkirin û belavkirina zimanê xwe dest pê kiriye. Armanca wan ew bû ku bi vî awayî bibin xwedî zimanekî hevpar û pêşî di nav xwe de hevpariyekê çêkin da ku her kes ji hev fam bike û li encamê jî ev ziman li cîhanê wekî zimanekî xurt belav bibe⁷³

Dîyar e ku netewedewletên damezrandî dema ku nasnameyeka hevpar ava dikin pêdivî bi amureka kêrhatî çê dibe. Ji ber ku di nav sînorên netewedewletan da gelek zaravayên cuda yên zimanekî hene, pêwistî bi zimanekî standard, li gor yek ji van

⁷¹ Ramlan, “hg”. r. 28.

⁷² Nikolovski, “hg”. r. 5.

⁷³ Orak Reşitoğlu, *hb.* 2022, r. 1.

zaravayan çê dibe. Loma em dikarin bibînîn ku gelek netewedewlet di pêvajoya damezrandinê da pêvajoya standardkirinê ceribandine.

Herwekî ku li jorê jî hat behskirin ziman ji bo netewedewletan ne tenê meseleya ragihandinê bû. Jê wêdetir, fonksiyonên jîyanî hildigirt. Hem wekî hêza kontrolkirinê ya ku li ser xelkê dihat sepandin hem jî wekî amûreka sîyasî ji bo afirandina nasnameya hevpar/neteweyî dihat meşandin.⁷⁴

Zimanê standard duzimanîyê (diglossia) ferz dike. Dîglosîya rewşek e ku celebên zarên (dîyalekt) zimanekî ne ku di dewletekê da fonksiyonên cuda pêk diînin. Herwisa, zaravayê ku di warên fermî da vekî navgîneka ragihandinê ya fermî tê pejirandin, dibe zimanê standard. Herî dawî, zimanê standard ji nakokîya çend zaravayan diwelide. Herweha, zimanê standard di perwerdeya neteweyî da navgîna hînkariyê ye. Li hêla din di ragihandina nivîskî da navgîna pevnivîsînên fermî ye. Zimanê standard di medyaya û ragihandina girseyî da mîna rojname, televîzyon, filim, pirtûk û kovaran da jî roleke sereke dilîze.⁷⁵

Herwisa, li gel fonksiyona wî ya ragihandinê, di nav civakê da fonksiyonên sembolîk ên pir giring pêk tîne. Biryarên sîyasî yên ku li ser zimên tînin dayîn bi vê nirxa sembolîk ya zimanî ve girêdayî ne. Herweha entegrekirin ango ji hev veqetandina civakê jî tînkildarî nirxa zimanî ya sembolîk e. Nexwe, ji ber vê yekê, plansazîya zimanî bi piranî ji bo hin xem û mebestên nezimanî yên ku bi qadên sîyasî, civakî û aborî ve girêdayî ne, tînin çêkirin.⁷⁶

Di her halî da da mirov dikare amaje pê bike ku ji bo pêkanîna ragihandineka tekûz, di warên wekî hevoksazî, morfolojî, ferheng û fonolojîyê da midaxele hatine kirin.

⁷⁴Sonel Bosnalı, “Dil Planlaması ve Standartlaşma Kapsamında Yeni Lisan Hareketine Toplumbilimsel Bir Yaklaşım”, (Amd.) Hülya Argunşah-Oğuzhan Karaburgu *100.Yılında Yeni Lisan Hareketi ve Millî Edebiyat çalıştayı Bildirileri*, Türk Edebiyat Vakfı Yayınları, İstanbul, 2011, r. 28.

⁷⁵ “Standard Language”, *Encyclopedia of linguistics*, Ed. Philipp Strazny, Published in Great Britain By Fitzroy Deraborn, 2005, r. 1036.

⁷⁶ Bosnalı, “hg”. r.28.

Pirzimanî wekî dewlemendî bê pejirandin jî ji hêlekî ve jî wekî pirsêgêrik hatîye nirxandin. Di rewşa ewil da ji bo ragihandineka tekûz hin midaxele tên kirin da ku vesazkirina yekzîmanîyeka civakî û neteweyî pêk bê. Di vê çarçoveyê da di nav lehçeyên heyî da yek jê wekî norm tê ferz kirin ku ev jî midaxeleyek e.⁷⁷

Li alîyê din, li gor boçûna filolojîk ziman bi awayekî siruştî û jixweber geş dibin û pêş ve diçin û herwisa jixweber dimirin. Lê, li gor civaknasîyê ziman bi midaxelaya însanan diguhere, geş dibe û axirê dimire. Li vir em behsa midaxeleyeka bi hişmendî ya plankirî dikin. Heqeten di dirokê û di gelek cihên cuda da ji bo mebestên cihêreng li norm û statûyên zimanan midaxele hatîye kirin.⁷⁸

Bi armanca kirpandinê (emphasize) ku careka din em destnîşan bikin; nasnameya neteweyî pêdivî bi bîreka hevbeş, nirxên hevbeş û hwd heye. Ji bo avakirina nirxên hevbeş pêdivî bi amûreka guncaw heye ku ew jî zimanekî standard e ku her kes jê fam bike. Ji ber vê ye ku em dibînin, wekî ku li jorê jî hat destnîşankirin, têgiha standardîzasyonê piştî sedsala 18an peyda bûye.

Herweha, li hêla din, hewce ye ku zimanê standard di pergala perwerdeyê da jî wekî zimanê dayîkê yê duyem were xwendin. Standardîzasyon, bikaranîna zimanê standard di hemû warên jîyana giştî (public life/kamusal yaşam) da, di sîstema dadwerî û ya qanûnî de bi rê ve dibe. Herwisa ew çêkirina/sêwirandina qanûnan û guherandinên makezagonî jî di hundirîne.⁷⁹

Hêjayê derbirîne ye ku di pêvajoya standardkirina zimanekî da, akademî û komeleyên zimanî, ji bo pêşvebirina zimên bêne damezirandin û di bin desthilatdarîya fermî an nefermî da kar bikin û her weha navendên çavkaniyên edebiyatê yên ku piştgirî bidin vê pêvajoyê, hebin.⁸⁰

⁷⁷ Bosnalî, “hg”. r. 27.

⁷⁸ Bosnalî, “hg”. r. 27.

⁷⁹ Nikolovski, “hg”. r. 6.

⁸⁰ Nikolovski, “hg”. r. 6.

Wekî encama vê beşê, em ê bala xwe bidin nivîsara⁸¹ Ramlan Ramlan. Herwekî ku me li jorê jî amaje pê kiribû, standardîzekirin ji zimanê axaftinê (taybetmendiyên zimanî yên fonolojîk) zêdetir bi zimanê nivîskî (mînak, ferhengî, morfolojîk û sentaktîk) ve pêwendîdar e. Ev ji hêla Wardhaugh (2006) ve tê piştgirîkirin ku dibêje standardkirin ew pêvajoyek e ku zimanek bi rengekî kodkirî ye.

Ev pêvajo, bi gelemperî bipêşxistina tiştên wekî rêziman, pirtûkên rastnivîsînê, ferheng û dibe ku edebiyatekê vedihewîne. Wekî din, Holmes (2001) dibêje ku zimanê standard wekî cureya ji curbicurîya standardê ye ku bi gelemperî ew e ku tê nivîsîn û herweha ku ji hinek rêkûpêkkirin an kodkirinan derbas bûye (mînak, di rêziman û ferhengê da) û ji hêla civakê ve wekî kodek bi prestîj tê nas kirin.

Ji ber vê yekê, li gor van her du riwangehan, mirov dikare hin taybetmendiyên zimên ên standardkirî destnîşan bike:

1) *Rêziman*: Di zimanekî da qaîdeyên ji bo guhartina forma peyvan û tevlihevkirina wan di hevokan da

2) *Rastnivîs*: Karê ku yek bi yek ji herfan bi awayekî rast peyvan çê dibe

3) *Peyv*: Yekîneyeka zimanî ye ku tê manaya tiştêkî û dikare bê axaftin an jî nivîsandin

4) *Bilêvkirin*: Awayê bilêvkirina zimanekî an peyvekê diyarkirî an dengêkî

5) *Pergala nivîsandinê*: Awayê nivîsandina pirtûk, cureyên nameyan, gotar, afîş, reklam, ragihandin, belavok û awayên din ên nivîsandina zanistî

⁸¹ Ramlan, "hg". r. 30-31.

2. KOMARA TIRKÎYEYÊ Û REWŞA KURDÎYA KURMANCÎ

Di vê beşa duyem da, em ê ji alîyê serpêhatîya standardbûna kurmancîyê ve, li ser qonaxeka giring rawestin. Lêbelê, di vê kêlîyê da, divê em destnîşan bikin ku, di çarçoveya hewldanên standardkirina kurdîya kurmancî da rol û giringîya Kovara Hawarê hêjayê analîzkirinê ye ku em ê di beşên jêrê da, vê yekê bi cih bînin.. Herwisa, xebat û rola Celadet Alî Bedirxanî jî wekî babet, dê cihê xwe di tezê da bigire.

Di rêwîtiya standardbûnê da, polîtîkayên zimanî yên Komara Tirkîyeyê li ser çarenivîsa kurmancîyê bi awayekî xurt karîger bûne. Loma, em ê ewil li ser polîtîkayên zimanî yên komarê bisekinin. Piştê, bê ka encamên ku van polîkayan li ser rewşa kurdîya kurmancî dane, çi ne? Em ê li hûr bibin.

Li Tirkîyeyê ji Tenzîmatê heta dawîya serdema “yek partî”yê (one-party/tek parti) di warê têkilîyên di navbera neteweperwerî û zimanî da mimkin e ku sê meylên cuda bînin tesbîtkirin. Li gor vê, serdema Tanzîmatê di nivîsê da wekî despêka meyla “sadekirin” ê tê çavdêrîkirin.

Serdema Jon Tirkan (Jön Türk) jî wekî hewldana xeyalkirineka neteweyî ya ku xwe dispire zîmanî, tê qebûlîkirin.

Qonaxa Komarê jî wekî serdemek e ku bi navgînîya zimanî tirkîkirina nifûsa bermayî ya ku ji Osmanîyan maye, xuya dike.¹

Bi awayekî vekirî xuya dike ku Komara Tirkîyeyê pala xwe daye neteweperwerîya tirk û ji bo ku nasnameya neteweyî pêk were, zimên wekî pîvan qebûl kirîye. Li vir, hewce ye ku têkilîya di navbera zimanî û nasnameya neteweyî bê analîzkirin.

¹ Hüseyin Sadoğlu, *Türkiye’de Ulusçuluk ve Dil Politikaları*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2003, r. 291.

Cexta neteweperwerîya Kemalîst ji alîyê politikayên zimanî ve li ser plansazîya madî (plansazîya corpusê) bûye. Lewra paralelîya ku di navbera zimanî û nasnameya neteweyî da hatîye danîn ne tenê belavkirina tirkîyê, herweha lêvegera tirkî bi bal cewherê xwe ve jî hewandîye. Herwisa, sazkirina neteweyê ya Kemalîzmê ne armanca tekane bû, bi heman awayî digel nasnameya neteweyî bi tevlêbûna şarîstaniya Rojavayî dixwast ku hişmendîyeka nû ava bike.²

Li jêrê em ê li ser polîtîkayên zimanî yên Komara Tirkîyeyê û bandorên wan li ser kurmancîyê rawestin.

2.1 Polîtîkayên Zimanî yên Komara Tirkîyeyê

Şoreşa Kemalîst ku teşe daye Komara Tirkîyeyê bi awayekî zelal li ser rêgezên wekî “neteweperwerî”, “rojawahezi” û “laîkî” bilind bûye. Di eslê xwe da ev her sê rêgez di serdema tevgerên modernbûna Osmanîyan da jî hatine niqaşkirin.³ Lê, li gor çarçoveya teza me em ê bala xwe bidin serdama Komarê.

Di bernameya reforma Kemalîstan da, reforma zimanê tirkî cihekî navendî digire û bêguman yek ji favorîyên (hezkiriyên) şexsî yên Atatürk bû. Armancên reformên ku di salên 1920an da dest pê kir, ew bû ku zimanek standard a neteweyî ava bikin, ku ji hêmanên biyanî bêpar be û hemû endamên civakê têbigihîjin, bihêsanî bi dest bixin, û têra xwe dewlemend û nermik be ku destûrê bide îfadekirina her mijarê.⁴

Politikayên zimanî û dînî yên Komarê di bin tesîra guhertinên radîkal ên hişmendî û yekîtiya neteweyî da mane. Herwekî ku tê zanîn teşebusa “xwerûkirin” a zimanî ji zimanên biyanî yek ji pirsgerêkên esasî yê neteweperwerîyan bû.

² Sadoğlu, *hb.* r. 294.

³ Sadoğlu, *hb.* r. 189.

⁴ Geoffrey Haig, “The invisibilisation of Kurdish: the other side of language planning in Turkey”, https://www.academia.edu/2134687/The_invisibilization_of_Kurdish_the_other_side_of_language_planning_in_Turkey_Haig_2004, r.21, TB: 25.11.2022

Daxwazên bi vî rengî li Tirkîyeyê jî rojevê dagir kiribû. Lêbelê, di serdema Komarê da şoreşa zimanî tevî ku bi piranî li ser peyvan disekinî jî, li gel vê, hezmandina nîrxên Rojavayî jî ji xwe ra kiribû armanc. Di vê pêwendê da, bo nimûne, guhertina alfabeyê li alîyekî xwendin û nivîsînê pratîktir û hesantir kiribe jî ya muhîm ev guhertin wekî mifteya entegrasyona çandî ya bi Rojava ra dihat pejirandin.

Di çarçoveya Rojavayîbûnê da bendewarîya Kemalîzmê ji şoreşa zimanî ew bû ku di demeka dirêj da guherîneka hişmendî pêk biîne. Ji ber vê yekê plansazîya zimanî ya ku di qonaxa Komarê da hatîye birêvebirin qîma xwe bi paqijkirina tirkî ji peyvên bîyanî neanîye, li gel vê xwastîye ku li ser hest û fikirîna kesan jî karîger bibe. Ango têgihên Osmanî-Îslamî jî ji xwe ra kirîye hedef.⁵

Herweha, li gor Hüseyin Sadoğlu hewldana polîtîkayên zimanî yên Kemalîst ên paqijkirina tirkî ji "raborîyê" hem di warê peyvan û hem jî di warê têgihan da dihat meşandin û ev yek jî dihat manaya piştgirîkirina şoreşên din ên di qada çandî da. Di dawîyê da, divîyabû ku zimanek wisa bihata afirandin ku neteweya tirk, bi qasî ku mimkin be, ji "hevîdîn"ên misilman ên din cudatir bibe û hem jî divîyabû ev ziman bi tamamî bi hest û ramanên laîk ên şaristanîya Rojava lihevhatî be.⁶

Li gor vegotina Salim Orhan, li Tirkîyeyê polîtîkayên zimanî ên di avakirina "nasnameyeka hevpar" da wekî amûreka bi bandor hatîye bikaranîn. Ziman di avakirina netewedewletê û di nasnameya neteweyî û yekîtiya wî ya tirk da wekî garantî hatîye dîtin. 'Tirk'ê ku bingeha nasnameya neteweyî ya Tirkan pêk diîne, di rastîyê da wekî 'tirkîaxêv' hatîye nîrxandin.

Vê neteweperwerîya zimanî bi xwe ra windabûna zimanên din ên ku dihatin axivîn, anîye. Yanî ji bo ku her kes bi tirkî biaxive, ji bilî tirkî asîmîlekirina zimanên din wekî

⁵ Sadoğlu, *hb.* r. 200-201.

⁶ Sadoğlu, *hb.* r. 202.

mecbûrî hatibû dîtin. Herwekî pêwîstiya vê rewşê, dewletê ji bo ku komên zimanên netirkî bi tirkbûnê/tirkî'yê asîmîle bike, gelek pratîkên zext û tundîyê sebandîye.⁷

Herwisa, hebûna tirkî ku wekî nasnameya tirkî dihat dîtin, ji bilî tirkî, hema bibêje pêdivî bi tunebûna zimanên din hebû.⁸

Di vê kêlîyê da, şiroveya Mustafa Ak ku ji bo paşxaneyê feraseta Komarê dike, balkêş e. Li gor wî, ji dîrokê ve, li Tirkîyeyê piştî tirkî zimanê herî zêde ku tê axaftin kurdî ye. Pergala Komarê îdîa dikir ku rêya avakirina neteweya tirk û dabînkirina yekîtiya neteweyî bi ziman e û tirkî yek ji hêmanên herî girîng ên tirkbûnê ye. Ji ber vê sedemê, zimanê kurdî ji ber ku li pêş sîyaseta yek zimanî astengî derdixist, hat paşguhkirin û wekî zimanê tune hat hesibandin. Herweha, piştî ragihandina Komarê, mafên sîyasî û qanûnî yên hevvelatîyên kurd û hebûna wan a etnîkî hat paşguhkirin. Herwisa, nêrîna ku 'li Tirkiyeyê tenê tirk dijîn', ku di salên pêşîn ên Komarê de derketibû holê, bi salan hebûna xwe domand.⁹

Li alîyê din, dixuye ku "projeya neteweya Kemalîst" ku bi awayekî aşkera bi axê ve girêdayî ye û xwe dispêre aîdîyeta sîyasî, mîna neteweperwerîyên din, bi tenê xwe naspêre bendên hemniştîmanî yên razber. Loma hêza ku Komara Tirkîyeyê ava kirîye hewl daye ku ji civakeka heterojen "neteweyeka tirk" biafirîne.¹⁰

Herçiqas, carinan tevî zêdebûna cextandina etnîkî û zimanî, neteweperwerîya Kemalîst di eslê xwe da wekî projeya entegrasyonîst "yekîtiya neteweyê û yekparebûna welatî" ji xwe ra kirîye armanc. Lêbelê, di salên 1930yî da neteweperwerîya Kemalîst di gotara xwe da "ziman" û "netewe" wekhev dike û ji vir pê da pêvajoyekî nû tê çavdêrîkirin.

⁷ Orhan, "hg". 2021, r. 171.

⁸ Orhan, "hg". 2021, r. 172.

⁹ Mustafa Ak, *Farklı Dil ve Lehçelerde Televizyon Yayıncılığı: Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da TRT Kurdi Algısı*, İstanbul Üniversitesi SBE, İstanbul, 2019, (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî), r. 43-44.

¹⁰ Sadoğlu, *hb*. r. 213.

Di vê çarçoveyê da Komara Tirkîyeyê ji bo pêkanîna armanc û polîtîkayên xwe hin gavên pratîk avêt.

Herwekî ku tê zanîn di makezagona 1921ê da tirkî wekî zimanê fermî yê dewletê hatibû qebûl kirin. Paşê, herweki pêngava ewil, di “Zagona Esasî ya Rêxistinê” (Teşkilat-1 Esasiye Kanunu) da, ku di 20ê Nîsana 1924an da tirkî wekî zimanê fermî yê yekane tê tescîl kirin. Herwisa, bi vê qanûnê ra sazîyên perwerdeyê û zimanê perwerdeyê hatin navendî kirin û gelek sazîyên ku ji bilî tirkî bi zimanên din perwerdeyê dida, hatin girtin.¹¹

Herwekî me li jorê jî destnîşankiribû neteweperwerîya tirk ku rasterast li ser polîtîkayên zimanî karîger bûye û ev yek ji riwangeha pêşengên kadroya Kemalîst jî weha xuya dike: Bo nimûne wezîrê dadê yê wê demê Mahmut Esat Bozkurt weha dibêje: “... Efendîyê vî welatî tirk e. Mafê kesê ne tirk li welatê tirkan heye, ew e ku bibe xizmetkar, bibe kole.”¹²

Herweha, di 17ê sibata 1931an da Atatürk di serdana Adana Türk Ocağıyê da li Adana’yê weha digot: “Tirk tê manaya zimên.” Bi vê derbirîna xwe Atatürk derî li “neteweperwerîya zimanî” vedikir.

Herwisa, di heman salî da li Adana Türk Ocağıyê da Atatürk weha jî gotîye: “Kesên ku dibêjin ez ji mileta tirk im berîya her tiştî û mitleqa divê bi tirkî biaxivin. Kesên ku bi tirkî neaxivin û îdîa bikin ku mensûbê çand û civata tirk in ne rast e ku mirov pê bawer bike.”¹³

Dîyar e ku neteweperwerîya Kemalîst ku berê îdîaya avakirina neteweyeka sîyasî dikir, di salên 1930î da bi gotara nû em fam dikin ku edî pêvajoya neteweperwerîyê ketîye qonaxeka nû û nîşandeka wê jî wekhev kirina “ziman” û “netewe”yê bû.¹⁴

¹¹ Orhan, “hg”. 2021, r. 180.

¹² Orhan, “hg”. 2021, r. 179.

¹³ Sadoğlu, *hb.* r. 214.

¹⁴ Orhan, *hb.* 2012, r. 100.

Ji ber giringî û karîgerîya wê hêja ye mirov li ser babeta alfabeyê raweste. Li gor tesbît û zanyarîyên Hüseyin Sadoğlu pêvajoya latînzekirina alfabeyê li jêr weha hatîye qewimîn:

Di nav şoreşên Komarê da pir hindik ji wan dikarin karaktera “rojavayî” û “neteweperwer” a Kemalîzmê bi qasî alfabeya latînî sembolîze bikin. Lewra qebûlkirina herfên latînî dihat manaya vekirinê ya derîyên cîhana şaristanî ku wekî armanc hatibû destnîşankirin. Şoreşa alfabeyî tirkîyê ji bin tesîra erebî-farisî xilas kir û loma tirkî bu xedan îmlayeka xweser.

Halbûkî niqaşên li ser alfabeyê xedî paşxaneyeka dûvdirêj e. Li gor îfadeya Falih Rıfkı Atay kêm kes wekî Atatürk li giringîya karîgerîya alfabeyê li ser “neteweperwerîya tirk” û “rojavayîbûn” ê haydar bûn.¹⁵

Li gor Atatürk di navbera hesta milî û zimên da paralelîyek heye û ji bo tirkî ji nîrê zimanên bîyanîyan xilas bibe divê xebatên bi hişmendî û bi pergal bi mebesta plansazîya zimanî bihên kirin.¹⁶

Hêja ye ku em destnîşan bikin di serdema Komarê da jî li ser latînzekirina alfabeyê niqaşên dûvdirêj û pîrhêl hatine kirin, lê, axirê di sala 1928an da –li ser esasê xebata Encûmena Zimanî (Dil Encümeni)- ji alîyê Meclîsê ve hat qebûlkirin û di rojnameya fermî da hat weşandin û ket merîyetê.

Herwisa, li gor xebata Encûmena navborî, biryar tê dayîn ku alfabeyek li ser bingeha latînî ji bo zimanê axaftinê yê Stenbolê were sepandin ku zimanê me yê hevpar û edebî ye û ji bo vê yekê pergaleka tîpên nû bê çêkirin.¹⁷

Bi midaxeleya li binyada madî/hundirîn a tirkî, ji alîyêkê ve bi xebatên wekî şoreşa alfabeyê û resenkirina zimanî ji alîyêkê ve bipêşxistin û “modernkirina” tirkî hatîye

¹⁵ Sadoğlu, *hb.* r. 215.

¹⁶ Sadoğlu, *hb.* r. 235.

¹⁷ Sadoğlu, *hb.* r. 225.

xwastin û ji alîyê din ve armanc ew bû ku di çerçoveya laîktîyê da tirkî ji têgihên dînî bê paqijkirin.¹⁸

Di serdema Komarê da plansazîya madî bi şoreşa alfabeyê dest pê kirîye. Di gavên pêş da îcar “rêzimansazî” (grammatication) û “ferhengsazî” (lexicalisation) tên pêkanîn. Di vê qonaxê da ji ber egerên pratîk ji dêvila Encûmena Zimanî (Dil Encümeni) ve Heyeta Zimanî (Dil Heyeti) saz kirin.

Ev sazi bi berpîrsîyarîya amadekirina ferhenga nû ya zimanê tirkî hat peywirdarkirin.¹⁹

Li gor riwangeh û daxwaza Mustafa Kemal îcar ji dêvila Heyeta Zimanî (Dil Heyeti) di sala 1932yan da Cemîyeta Vekolîna Zimanê Tirkî (Türk Dili Tetkik Cemiyeti) tê damezirandin. Li gor veguhastina Afet İnan Cemîyetê li ser du xalan sekinîye: Yek jê û ya ewil xebatên ku li ser hevgirtina zimanê nivîskî û yê devkî bû. Ya din jî tesbîtkirina rêzikên zimanê tirkî bi awayekî tekûz û xurtkirina peyv û têgihên zimanê tirkî bûn.²⁰

Di vê pêvajoyê da di 26ê Îlona sala 1932yan da Komcîvîna Neteweyî ya Zimanê Tirkî (I.Türk Dil Kurultayı) ya yekem hat li darxistin. Di vê civînê da kesên ku ji bo afirandina zimanê neteweyî plansazîyê mecbûrî didîtin û kesên ku li dijî vê nêrînê derdiketin li hember hev rabûn. Di dawîya civînê da tezên ku hatin pêşkêşkirin di çerçoveya sê kategorîyan da hat komkirin:

1. Tezên li ser pêkhatina zimanê tirkî û qonaxên wê
2. Tezên li ser çerçoveya reformên ku di tirkî da dê bîn kirin
3. Tezên li ser têkilîya di navbera tirkî û zimanên Hînd û Ewropî û zimanên cîhanê yên din

¹⁸ Orhan, “hg”. 2021, r. 179.

¹⁹ Sadoğlu, *hb.* r. 231.

²⁰ Sadoğlu, *hb.* r. 236.

Û herweha di heman civînî da biryar lê dan ku çalakîyên Cemîyetê (Türk Dili tetkik Cemiyeti) wek şeş şaxên cuda yên xebatê dê bê birêvebirin. Li gor vê şaxên xebat weha ne:

1. Lîngûîstîk-Fîlolojî 2. Etîmolojî 3. Gramer-Sentaks 4. Ferheng 5. Berhevkirin 6. Weşangerî²¹

Di 18ê Tebaxa 1934an da Komcîvîna Neteweyî ya Zimanê Tirkî da bi biryara Komcivînê navê Cemiyeta Vekolîna Zimanê Tirkî (Türk Dili Tetkik Cemiyeti) wekî Lijneya Lêkolîna zimanê Tirkî (Türk Dili Araştırma Kurulu) hat guherandin. Di vê civînê da serokê fexrî yê lijneyê di axivîna xwe da weha gotîye: “aniha jî şoreşa zimanî bînavber dê bidome”²²

Piştî Komcîvîna Neteweyî ya Zimanê Tirkî ya sêyemîn a sala 1936an navê sazîyê wekî Sazîya Zimanê Tirkî (Türk Dil Kurumu) hat guherandin. Sazîyê polîtîkaya ku dê bimeşîne, “bi feraseteka şoreşgerî û bi rêbazê zanistî bînavber xwerûbûn û geşbûn” bû.²³

Berî ku em li ser Teorîya Zimanê Rojê (Güneş Dil Teorisi) bisekinin pêwîst e ku ji hêla mijara me em behsa “Teza Dîrokê ya Tirk” bikin ku hevsazîyek di navbera her du teorîyan da heye. Li gor vê “ zimanê tirk “zimanê make” ye. Lewra “heta binyada zimanê tirk nehê famkirin meseleya zimanî ne mimkine ku bê famkirin.”

Di Komcîvîna Neteweyî ya Zimanê Tirkî (III. Türk Dil Kurultayı) ya sêyem (1936) da nêrînên “Teorîya Dîrokê ya Tirk” ku di warê zimanî da hatibûn dîyarkirin, hatin fermîkirin.

“Teorîya Zimanê Rojê” da ji bo însanên ewil roj roleka navendî dilîze; roj jedera jîyanê ye û ji bo famkirin û manadêyîna derûdorê faktorek e. Di civakên îptîdayî da di

²¹ Sadoğlu, *hb.* r. 238-239.

²² Sadoğlu, *hb.* r. 247.

²³ Orhan, *hb.* 2012, r. 108.

afirandina peyven ewil da rola rojê hebû. Li gor vê riwangehê ev jî delîlê afirandina zimanê seretayî ye ku ji alîyê tirkan ve hatîye pêkanîn.

Di vê serdemê da tê gotin ku ji Ewropayê, Afrîkayê heta Amerîkayê hemû çand û zimanan ji tirkî welidîne. Tişteki balkêş e piştî vê merheleyê sekreterê giştî yê Komcîvîna Neteweyî ya Zimanê Tirkî karîgerîya Teorîya Zimanê Rojê li ser plansazîya madî wekî “rehetkirin”ê wesifandîye. Lewra ji ber vê riwangehê êdî ne hewce bu ku tirkî ji peyvên zimanên bîyanî bê paqijkirin. Yanî hin polîtîkayên zimanî hatibûn sistkirin.

Egera “şoreşa zimanî” ew bu ku Komara nû zû bi zû bigihîje asta “şaristanîya hemdem” (muasır medeniyet/contemporary civilization). Di vê çarçoveyê da herçiqas peyvên Osmanî û çanda îslamî dihatin tesfîyekirin jî valahîya ku xwe da der bi têgihên Rojavayî lêbelê bi lefzên tirkî dihat dagirtin.²⁴

Dîyar e, piştî Komcîvîna Neteweyî ya Zimanê Tirkî ya sêyem di plansazîya zimanî da edî “sadekirin” wekî hedef hatibû destnîşankirin û li gel vê hikumetê jî giranîya xwe di vê sazîya navbiri da xurttir kiribu.

Di sala 1939an da ji ber mirina Atatürk û herba cîhanê ya duyem Komcîvîna Neteweyî ya Zimanê Tirkî ya çarem ancax di sala 1942yan da civîya. Biryara herî giring li gel “paqijkirin”a tirkî ji peyvên bîyanî ew bu ku divê zimanê dewlet û zanistî bê “tirkîzekirin”.

Herwisa, cudahîya di navbera zimanê nivîskî û devkî dê bê kêmkirin. Ji bo vê yekê, hemahengîya di navbera vezareta perwerdeyê û sazîyên din yê dewletê, tê ferzkirin. Di heman salî da biryara Qanûna Paşnavî (Soyadı Kanunu) tê daîn. Li gor vê qanûnê “her tirk digel navê xwe yê resen divê paşnevek hilbigire.” Di nav şoreşên Komarê da ev qanûn ji bo hazimandina nasnameya neteweyî jî giring bû. Ji ber vê yekê, cudahîyên di navbera dîn, mezheb, çîn û nasnameyên duyemîn da dê veşartî bimînin.²⁵

²⁴ Sadoğlu, *hb.* r. 248-251.

²⁵ Sadoğlu, *hb.* r. 256.

Ji kiryarîyên Komarê yek jê jî, wê demê tirkîkirin/Tirkîkirina navan ne tenê bi navên kesan sînardar bûn herweha, navên cih û waran jî dihatin Tirkîkirin. Dîyar e ku, navê cih û waran bîra civakê pêk dianî. Jibîrkirina dîrokê wekî yek ji hêmanên herî girîng ên gotara neteweperwerîyê, bi polîtîkayên zimanî, bi taybetî jî bi guhartina navan, di mînaka Tirkîyeyê da, gihîştîye şewaza xwe yê herî jêhatî. Pêvajoya guhartina navên cihan, li Tirkîyeyê, ji salên pêşîn ên Komarê ve hatîye kirin. Lê, paşê di dawîya sala 1940an da bi giştînameyekê (genelge) karê guherandina navan het fermîkirin.

Herweha, piştî derbeya 1960î navên gundan bi girseyî hatin nûkirin. Nav bi tirkî li wan hat danîn. Ên mayî jî piştî 1980yan hatin guhartin.²⁶

Herwisa, polîtîkaya “bicihkirin”ê (iskan/settlement) jî di vê serdemê da hatîye birêvebirin. Di vê çarçoveyê da Zagona Bicihkirinê (İskan Kanunu) di 10ê Hezîrana 1934an da hat derxistin. Di esasê xwe da ev zagoneka asîmîlasyonê bû û bi taybetî kurdan dikir hedef. Lewra "dilsoziya bi çanda tirkan ra" û "axivîna bi tirkî wekî zimanê dayikê" ferz dikir.²⁷

Li gel vê yekê, di çarçoveya polîtîkayên zimanî da divê em behsa “tirkîkirina zimanê îbadetê” bikin. Ev mijar berê jî mijara nîqaşê bû, lê herî dawî, bi Komarê ra tirkîkirina zimanê îbadetê ji aliyê sîyasetmedaran ve piştgirî hat kirin. Wergerandina zimanê îbadetê bo tirkî di pêvajoya avakirina neteweyê da roleka girîng listîye.

Di sala 1927an da li hemû mizgeftan bi tirkî dest bi xwendina xutbeyê kirin û di sala 1932an da piştî xutbeyan hewl hat dayîn ku metna “azan”ê bê wergerandin bo tirkî.

Tirkîkirina zimanê îbadetê tenê bi azan û qametê hat sînorkirin. Herçend, qanûnek ji bo parastina azana tirkî tunebûbe jî, ev bicihanîn heta 16ê Hezîrana 1950yî bi vî rengî dewam kir.²⁸

²⁶ Kerim Yıldız, *Kürtlerin Kültürel ve Dilsel Hakları*, Wer. Atilla Tuygan, Belge Yayınları, İstanbul, 2004, r. 25.

²⁷ Orhan, “hg”. 2021, r. 182.

²⁸ Orhan, *hb*. 2012, r. 118-119.

Li alîyekî din, hêmanên ku dixwazin bibin tirkên resen, bila tirkî hem wekî zimanê fermî binasin hem jî wekî zimanê zikmakî qebûl bikin. Di bin parêzkerîya Ocaxên Tirk (Türk Ocakları) da di sala 1928an da ne tenê hindikahîyên nemisilman, digel vê etnîsîteyên misilman ên netirk jî (wekî kurd), di bin sîwana kampanyaya “welatî, tirkî biaxive!” (Vatandaş Türkçe Konuş!) kirin hedef. Evan kampanyayan car caran dihatin aktîfkirin û di sala 1937an da gihîştin lûtkeya xwe.²⁹

Fîlîz jî di gotara xwe ya navborî da vê pêvajoyê weha derdibirîne:

Dewleta Kemalist li gor xwe çend tedbîran distîne. Li gor van tedbîran divê bi riya şaredarî û ocaxên Tirkan zimanê Tirkî li sûk û bazaran serdest be û ji bo zimanekî din rê nede. Kurd bi darê zorê jî be divê hînê Tirkî bibin, divê li van deveran dibistanên fermî vebin û mamosteyên qedirbilind werin tayînkirin. Divê herî zêde giringî bi dibistanên keçan bê dayîn û bi gelek diyarî û îkraman keç bên teşwîqkirin ji bo xwendinê.³⁰

Lê, herçend di salên pêşîn ên Komarê da di polîtîkayên zimanî ên têkildarî plansazîya statûya tirkî da tu guhartin çê nebûbe jî, di salên pêş da di polîtîkayên plansazîya madî da guhartin çêbûn.

Di serdema Partîya Demokrat (Demokrat Parti) da rol û fonksîyona Sazîya Zimanê Tirkî (Türk Dil Kurumu) ya navendî herçiqas biguhere û sist bibe jî, piştî derbeya 1960î careka din biqîmet bû. Bo nimûne ev sazî dîsa di derbareyê bikaranîna “tirkîya resen” dest bi weşana giştînameyan kir.

Herweha, di makezagona sala 1961ê da ku piştî derbeya leşkerî ya 27ê Gulana 1960an, hat erêkirin, di zimanê fermî yê dewletê da tu guherîn nehat kirin.³¹

Atmosfera sîyasî ya ku bi derbeya 12ê Îlonê afirand, bandor li polîtîkayên ziman jî kir. Bandora derbeyê li ser plansazîya madî ya tirkî û plansazîya statûkoyê cuda bûye. Serkêşîya derbeyê di polîtîkayên ku ji salên ewil ên Komarê ve li ser plansazîya statûyê

²⁹ Orhan, “hg”. 2021, r. 183.

³⁰ Filiz, “hg”. r. 100.

³¹ Orhan, *hb.* 2012, r. 119-121.

dihatin meşandin, tu guhartin çenekir û polîtîkayên qedexekirinê hîn diwartir kir. Bo nimûne polîtîkayên zimanî yên vê serdemê dawî li hewlên kesên ku modernîst bûn anî. Lewra polîtîkayên nû edî li dijî “arîkirina zimanî” bûn.³²

A mihîm li gor makezagona 1982yan “zimanê dewletê” tirkî bû. Ev yek cîyawazîyek giring bu. Lewra di makezagonên berê da îfadeya “zimanê dewletê yê resmî” hebû ku ew jî “tirkî” bû. Xuya ye ku zimanê hemû welatîyan tirkî dihat hesabandin û zimanê fermî zimanê zikmakî ye ew jî tirkî ye.

Herweha, di xala 42yemîn ya makezagona 1982yan maf û erka perwerde û hîndekarîyê hatîye lidarxistin. Di vê xalê da "Ji bilî tirkî tu zimanekî din nikare li sazîyên perwerde û hîndekarîyê ji welatîyên tirk ra wekî zimanê dayikê bê xwendin û hînkirin" cih girtîye.³³

Lêbelê, piştî salên 1990î herçend pir bisînor be jî, polîtîkayên qedexekirinê yên zimanî dest bi nermbûnê kir. Di vî warî de hin guhartinên qanûnî pêk hatin. Herweha, piştî salên 2000î ji ber pêvajoya endamtiya Yekîtiya Ewropayê (European Union/Avrupa Birliği) di derbareyê mafên zimanî da hin pêşketin çê bûn. Bo nimûne îfadeya “zimanekî ku bi qanûn hatîye qedexekirin” ji makezagonê hat derxistin. Herweha, azadiya weşana bi zimanên cuda di radyo û televîzyonan da mimkin bû. Li aliyê din ji bo hîndekarîya ziman û zaravayên ji bilî tirkî, destûr hat daîn ku kursên taybet bên vekirin. Di hezîrana 2004an da ji aliyê TRTyê ve li gel kurmancî û zazakî di çendîn zimanan da li ser televîzyonê weşan hat kirin. Herwisa, di sala 2009an da TRTyê kanalek xweser bi navê TRT-6 24 saat dest bi weşana kurdî (kurmancî-zazakî) kir.³⁴

Bi rêya qanûn û rêzêkan di warên din da jî hin guherîn çêbûn. Wekî mînak, edî girtîyên di girtîgehanda dikaribûn ku li ser telefonê bi kurdî biaxivin.

³² Orhan, *hb.* 2012, r. 124-125.

³³ Orhan, *hb.* 2012, r. 126-127.

³⁴ Orhan, *hb.* 2012, r.134-135.

Herweha, di propagandaya hîlbijartinên sîyasî da ji bilî tirkî ji bo zimanên din jî serbestî çêbû.

Wekî geşedaneke mihîm, damezirandina Enstîtuyên Zimanên Zindî (Yaşayan Diller Enstitüleri) bûn. Herweha din hin zanîngehan da ji bo xwendekarên lîsansê Beşên Ziman û Wêjeya Kurdî (Kürt Dili ve Edebîyatı Bölümleri) hatin vekirin.³⁵

Herweha, di sala 2012an da di dibistanên seretayî û navîn da wekî bijarte heftane du saet dersên kurdî hat daîn.³⁶

Wekî encam, mirov dikare bibêje ku polîtîkayên zimanî yên di pêvajoya damezirandina Komara Tirkîyeyê de hatine dîyarkirin, di dîroka Komarê da bê guhertinên esasî hatine parastin.

Li miqabilê sazîkirin/belavîkirin û meşrûkirina statûya tirkî ya yek zimanî, statûya zimanên din hatine daxistin û nêzêkahîyên asîmîlasyonê her di rewacê da bûne. Lêbelê, van nêzîkahî û polîtîtakayan di salên dawî da li gor şert û mercên serdemê hin guherîn çêbûne.³⁷

Bo nimûne, di destpêka salên 2000î da bi pêvajoya Yekîtîya Ewropayê ra, di derbareyê mafên zimanî da hin geşedan çêbûn û ji bilî tirkî hin qedexeyên li ser zimanên din hatin rakirin. Ev geşedan herçiqas di polîtîkaya zimanî ya Tirkîyeyê da nehên maneya guhertineke bîngehîn jî, li gor demên berê nahên paşguhîkirin.³⁸

Wekî encam, di vê çarçoveyê de, hewce ye ku em destnîşan bikin, polîtîkayên zimanî bi vesazîkirinên qanûnî (legal regulation/yasal düzenleme) teşe girtine. Vesazîkirinên makezagonî, çend gavên ku Komara Tirkîyeyê di pêvajoya lihevîkirina bi

³⁵ Ronayî Önen Baykuşak, *Türkiye’de Hakim ve Muhalif Politikanın Gerilim Alanlarından Biri Olarak Kürtçe Dil Meselesi*, Mimar Sinan Güzel Sanatlar Üniversitesi SBE, İstanbul, 2020, (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî), r. 98-99.

³⁶ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 100.

³⁷ Orhan, “hg”. 2021, r. 185.

³⁸ Orhan, “hg”. 2021, r. 188.

Yekîtiya Ewropayê ra avêtîye û vesazkirinên wezaretê perwerdeyê ku derheqê zimanî da pêk anîye, wekî nimûmeyên vê dîyardeyê ne. Herwisa li ser derxistina qanûnan, vesazkirinên rêzik û giştînameyan, sazîyên wekî Meclîsa Neteweyî ya Mezin a Tirkîyeyê (TBMM), wezaret, sazîyên zimanî yên fermî/nîv-fermî û Yekîtiya Ewropayê karîger bûne.³⁹

2.2 Bandora Polîtîkayên Zimanî yên Dewletê Li Ser Kurmancîyê

Di vê beşê da em ê li ser karîgerîya polîtîkayên zimanî yên ku li kurmancîyê hukum kirîye, rawestin.

Wekî çavdêrî eger mirov li dîroka Komarê binêre, dê xuya bike ku polîtîkayên zimanê tirk hem li gor hevkarîgerîyên (interaction/etkileşim) çandî û hem jî li gor pêkhatîyên dewletê, di rewîtiya xwe ya dîrokî da cihêreng bûye. Herwisa, di konjunktûrên cuda da bi awayên cuda van polîtîkayan hatine sepandin.⁴⁰

Di serdema ewil a Komarê da dîyar e ku, ji aliyê mijara me ve polîtîkayên zimanî yên Komarê Ji beşa jor jî tê têgihîştin ku gotar û polîtîkayên kadroyên damezirîner yên Komarê bikaranîna giştî ya tirkî berbelav kirine û wek zimanê tekane sepandine.

Pejirandina zimanê tirkî wekî zimanê zikmakî, bi tirkîkirina navên kêmineyan, mecbûrîkirina axaftina bi tirkî li cihên giştî (public sphere/kamusal alan), amûrên sîyasî bûn ku bi vê dixwastin tirkî bê giştîkirin.

Herwisa, ji ber heman nêzîkahî û polîtîkayan, ji bilî tirkî hem bikaranîna zimanên din (wekî kurdîya kurmancî) hat sînordarkirin hem jî li hember van zimanên din gelek tevdir hatin girtin û qedexeyên tund li ser wan hatin sepandin. Ev polîtîkaya yekzimanî ya dîyarkirî jî bi metnên qanûnî hatin birêvebirin.⁴¹

³⁹ Ziya Elmacı, *Türkiye Cumhuriyeti'nin Dil Politikası*, İnönü Üniversitesi SBE, Malatya, 2016, (Teza Doktorayê), r. 171-172.

⁴⁰ Elmacı, *hb.* r. 171.

⁴¹ Orhan, "hg". 2021, r. 180.

Salih Paşaoğlu jî motîvasyona Komarê weha analîz dike: Bi gelemperî “Netewedewletên” unîter “yekzimanîya fermî” tercîh dikin. “Yekzimanîya fermî”, bi qebûlkirina zimanê ku piranîya gel pê diaxive, dîyar dibe. Herweha ev yek, wekî ji kokê da çareserkirina pirsgirêkê jî hatîye nirxandin. Netewedewletên bi vî rengî bêtir stratejîyên “asîmîlasyonîst” bi kar tînin da ku zimanên din ên ku ji hêla kêmnîyan ve tê bikaranîn qels bixin û winda bikin. Salih Paşaoğlu lê zêde dike û destnîşan dike ku Fransa û Tirkîye welatên ku nimûneyên feraseta “yekzimanîya fermî” ne.⁴²

Li gor vegotina Salih Akın: “Qebulnekirina çand û zimanên ji xeynî zimanê Tirkî û çanda Tirkî cihê xwe heta di qanûna esasî ya Tirkîyeyê de jî girt. Ev qebulnekirin di 1924an de bi rêzikeke fermî re ku hemû dibistan, sazî û weşanên kurdî û bi ser de jî bikaranîna kurdî di kar û barên nivîskî de qedexe dikir, dest pê kir.”⁴³

Berî serdema dawî ji qanûnan jî em têdigihîjin ku bikaranîna kurdîyê hatîye qedexekirin. Bo nimûne, bikaranîna kurdîyê di cihên giştî, radyo, televîzyon, kitêb, her cure materyalên nivîskî da û ji bilî wan axaftina bi wî zimanî hatîye qedexekirin.

Lêbelê, berî nîşandayîna karîgerbûna kurmancîyê ji polîtîkayên zimanî yên dewletê, bi mînakên şênber, divê em destnîşan bikin ku dê di van deh salên dawî da dê bê çavdêrîkirin ku bi peymanên navneteweyî yên ku paraleli “cihanbûn”ê (globalisation/küreselleşme) derketine holê, ji bo sepandina polîtîkayên zimanî yên netewedewletan astengî derxistin û rêyên nû pêşnîyaz kirin. Ji ber vê yekê, gelek dewletan, nexasim Fransa û Tirkîye jî di polîtîkayên xwe yên asîmîlasyonîst da hin guhartinan çê kirin û ber bi serbestîyê ve polîtîkayên nû birêvebirin.⁴⁴

Emîr Hassanpour vê rewşa nîşankirî, di warê zimannasîyê da wekî “zimankujî” pênase dike. Li vir zimankujî herwekî sîyaseteka zimankujîyê dinimîne. Herwisa, “hin

⁴² Yaşar Salihpaşoğlu, “Türkiye’nin Dil Politikaları ve TRT-6”, *Gazi Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi*, Cild XI, Hejmar 1-2, 2007, r. 1036.

⁴³ Salih Akın, “Fêrkarîya Kurdî Ya Taybet Li Tirkîyeyê: Pirsgirêk û Pêşbîni”, *Yazınca*, Kovara Werger û Edebîyatê, Hejmar 8, Wer. Şerif Derince-Ergin Öpengin Boğaziçi Üniversitesi Yayınları, 2007, r. 103.

⁴⁴ Salihpaşoğlu, “hg”. r. 1036.

dewlet, bi qestî wan sîyasetan bi amûrên hiqûqî û îdarî dimeşînin ku zimanek ji holê rabe.”

45

Îcar, ji aliyê mijara me ve, polîtîkayên zimanî yên ku rasterast li ser çarenivîsa kurdîya kurmancî karîger bûne, divê bên destnîşankirin. Lewra em dizanin ku ji ber van polîtîkayên navborî kurdîya kurmancî ji hêla statû, standardbûn û meşrûbûnê ve karîger bûye û xwe bi saya erdnîgarî û demografîya ku hejmareka mezin ya axêverên ku tê da dijîyan, parastîye. Ev yek, tevî mehrûmbûna ji derfetên sazîyên bihêz, îmkanên dewletê û hebûna dibistanan pêk hatîye.

Amir Hassanpour jî destnîşan dike ku di 70 salên Komarê da dewletê bi polîtîkayên xwe yên sereke yên zimanî xwastîye ku kurd zimanê xwe biterikînin û bi tirkî biaxivin. Herweha, wekî ku li jêrê jî dê bê destnîşankirin, li gor tesbîten Hassanpour, di warên jîyana giştî, daîreyên hikûmetê û di dibistanan da qedexekirina li ser zimanan hêsantir bû. Balkêş e, di sala 1964an da “dibistanên leyli” (yatılı okul) hatin vekirin da ku xwendekar zimanên xwe ji bîr bikin.⁴⁶

Nexwe, wekî dîmeneka giştî em ê li ser hin sedemên din jî bisekinin da ku rewşa kurdîya kurmancîyê ji aliyê armanca tezê ve bê zelalkirin, paşxaneyê rewşa kurdîya kurmancî kêr zêde dê bê famkirin.

Di vê çarçoveyê da xala herî balkêş, di sala 1925an da bi "Plana Îslahata Şerqê" (Şark İslahat Planı) ra, li cihên giştî bikaranîna kurdî ku ji bilî tirkî yek ji zimanên din e, hat qedexekirin. Li gor veguhastina Cuma Çiçek, Mesut Yeğen plana navborî wekî “rêber” a Komara Tirkîyeyê dide wesifandin. Çiçek lê zêde dike ku ev plan ji bo kurd bihên asîmîlekirin, zimanê wan bimire û winda bibe, hatîye meşandin.⁴⁷

⁴⁵ Emîr Hassanpour, “Li Tirkîyeyê Zimnakuji û Zimanê Kurdî”, *Yazınca*, Kovara Werger û Edebîyatê, Hejmar 7, Wer. Şerif Derince, Boğaziçi Üniversitesi Yayınları, 2005, r. 21.

⁴⁶ Hassanpour, *hb.* 2005, r. 230.

⁴⁷ Cuma Çiçek, *Zimanek Çima Tê Qedexekirin?*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2013, r. 5-6; Orhan, “Bir Ulus-Devlet Örneği Olarak Türkiye’de Dil Politikaları ve Dil Hakları”, r. 181.

Li gor xala 13em a Plana Îslahata Şerqê, kurdî li kolanan jî hatibû qedexekirin. Li wîlayet û qezayan axivîna zimanekî jî bilî tirkî dihat cezakirin. Herweha, bi pêşbînîya heman planî, bi rêya perwerdeyê divîyabû ku kurd bihên tirkirin.

Li aliyekî din, li gor Salim Orhan, wêneya herî baş a ku polîtîkayên zimanî yên vê serdemê dinimîne, qanûna (Qanûna Weşanên Bi Zimanên Ji bilî Tirkî) ku di sala 1983yan da bi hejmara 2932yan hatibû derxistin. Wekî ku berê jî hat îfadekirin, polîtîkayên zimanî wekî navgîna “netewekirin” û “modernkirin”ê jî hatine meşandin. Loma zimanên ji bilî tirkî, bi mebesta “yekîti û yekparebûn”ê hatine qedexekirin.⁴⁸

Careka din ku em serî bidin Amir Hassanpour: “Qedexekirina kurdîya nivîskî ji qedexekirina kurdîya axaftinê serkeftîtir bû.” Lewra, kontrolkirina berhemên çapkirinê û yên destnivîsar hêsan bû. Lê, ev rewş jî di navbera salên 1967-1971 û 1975-1980yan da bi awayekî nisbî ber bi “serdemeka lîberal” ra diguhere. Bo nimûne, di her du serdeman da wekî nifşên nû, rewşenbîr û aktîvistên siyasî aşkera dibin; kovarên du-zimanî derdixin, ferhengên kurdî-tirkî û kitêbeka rêzimanê çap dikin. Lêbelê, diyar e ku ev pêvajoyên zehmetî û astengîyan derbas dibe.⁴⁹

Herwisa, bi polîtîkayên ku dihatin birêvebirin, di kêmkirina nifûsa kurdan da, tirkkirina/asîmîlekirina hejmareka zêde ya kurdan û lawazkirina çanda neteweyî (edebîyata nivîskî û devkî, muzîk û cil û berg) da dewlet serkeftî bûye.

Divê em destnîşan bikin ku tesbîten Hassanpour heta salên 1980yî derbasdar e. Li gor serdema ku Wî analîz kirîye, eger ku zimanê kurdî nemiribe jî talûkeya windabûna wî heye. Lewra “mirina zimanî” bi piranî ji sedemên der-zimanî pêk tê.⁵⁰

“Siyaseta ku mirin û windabûna zimanê kurdî û mefkûreya kurdayetiyê daye ber xwe, helbet di vê planê da nema û hema hema heta van salên dawî li gel hin guhertin û

⁴⁸ Orhan, “hg”. 2021, r. 182-186.

⁴⁹ Hassanpour, *hb.* 2005, r. 232.

⁵⁰ Hassanpour, *hb.* 2005, r. 235-236.

reformen di bingeha xwe de dewam kir.” Tevî vê tesbîta xwe, Çiçek behsa “Rapora Seyahata Şerqê ya Îsmet İnönü (1935)” jî dike. Li gor wî Îsmet İnönü di rapora xwe da nasnameya neteweyî ya bajaran analîz dike û nasnameya kurdî wekî tehdîdedî dinirxîne ew jî giringîyê dide polîtîkaya “îskan”ê û li gor wî divê plana berê divê were îslehkirin.⁵¹

Herweha, di “Rapora Rojilatî” da, ya ku piştî derbeye 1960î, ji aliyê Teşkilat Dewletê ya Plansazîyê (Devlet Planlama Teşkilatı) ve hatibû amadekirin, pêşniyazên asîmilasyonîst tê dîtin. Ceraka din li hember kurdî helwesteka daîmî xuya dike.⁵²

Me li jor behsa “Qanûna Weşanên Bi Zimanên Ji bilî Tirkî” kiribû. A mihîm ev e ku bi vê qanûnê, rêveberîya derbeyê, “meseleya zimên da hin astengên nû însa kirin.” Dîyar e, feraseta tirkbûn û tirkîtyê her li dar bûye.

Li gor tesbîtên Çiçek: “ Ev hikmên ku di makeqanûnê de û di qanûna bi hejmara 2932an de cih digirin bi awayekî tund hatin tetbîqkirin heta salên 1991ê, ku mirov dikare wekî destpêka reforman nîşan bike.”⁵³

Li gor riwangeha Ergin Öpengin jî, li Tirkîyeyê nîqaşên ku di van deh salên dawî da li ser rewş û statûya zimane kurdî disekinin, ji aliyê raya giştî ve tê zanîn. Helbet, ev dîyarde pir dereng pêkhat. Lê ya mihîm, Ergin Öpengin jî vê yekê bi polîtîkayên zimani û perwerdeyê ve girê dide.⁵⁴

Berî ku em behsa polîtîkayên zimani yê van salên dawî bikin, hewce ye ku em li encama polîtîkayên zimani binêrin da ku kurdîya kurmancî bê ka çawa karîger bûye û di çi rewşê da maye?

Polîtîkayên zimani ku bi kurtî li jor jî hat derpêşkirin, li ser warên bikaranîna zimani, fonksiyonên zimani û prestîja zimani bi şewazeka tesîrane rol lîstîne. Bo nimûne,

⁵¹ Çiçek, *hb.* r. 9-11.

⁵² Çiçek, *hb.* r. 11-12.

⁵³ Çiçek, *hb.* r. 15.

⁵⁴ Ergin Öpengin, “Türkiye’de Kürtçe’nin Durumuna Toplumdilsel Bir Bakış ve Anadilinde Eğitim”, *Birikim Dergisi* Sayı 253, 2010, r.28-36.

xizmetên gelemperî, hîndekarî û perwerde (ji dibistana seretayî heta akademîyê), bazar, medya, weşangerî, wêje qadên sereke ne ku qîmeta zimên bi van dîyardeya dîyar dibe. Hema hema beramberî 70 salî kurdîya kurmancî di van qadên navborî da di nav talûkeyê da maye. Ne li ber mirinê be jî standartbûna zimanî, zimanê nivîskî, wêje û prestîja wî her li paş maye, lawaz ketîye. Dîyar e ku “hegemonyaya zimanî” ya dewletê ye û di navbera tirkî û kurdî da têkîleyeka asîmetrîk hebûye.

Di derheqê lawazbûn û “xeteraya bo zimên” da, em ê di vê kêlîyê da bala xwe bidin analîza Opengîn ku ji Wardhaugh vediguhezîne:

Nîşaneyên lawazbûna zimên (language decline): Zimanekî ku lawaz dibe, çepera erdê wê teng dibe û axêverên wê yên yekzimanî (monolingual) her ku diçe kêmtir dibin. Kesên ku pê diaxivin dibin duzimanî (bilingual) lewre bi pêwîstiya fêrbûna zimanê serdest (dominant, fireh) dihesin. Ew gelheya duzimanî jî her ku diçe zêdetir pîr dibe. Zimanê serdest têdikeve nav her zêdetir ‘qadên jiyanê’ û her wiha her ku diçe xwe li ser zêdetir ‘fonksiyonên zimên’ ferz dike. Zimanê bindest (dominated language) her kêmtir tê bikaranîn û nihayet bi şiklê ‘zimanê malê’ dikeve nav xetereyê. Tê heye diglosia 2 (diglossia, du-glotî), bo demekê hukmî bike bi şiklê ku her zimanekî qadên xwe yên bikaranînê hebin, lê belê bes heke ew rewşa diglosyayê sabît nebe, zimanê serdest dê dewamê li meşa (pêşketin) xwe bike.⁵⁵

Herweha, bi destnîşankirina Mustafa Aydoğanî jî, polîtîkayên zimanî nehişt ku kurdî bibe zimanê perwerdeyê. Lê, digel vê yekê, zimanê kurdî wekî zimanê civaka kurd xwe parastibû. Herçend asîmîlasyon bi tundî li dar bû û zimanê kurdî bi tevahî qedexe bû jî, piraniya zarokên kurd heta van demên dawî bi kurdî mezin bûne. Ji ber ku, zimanekî nifş bi nifş bê veguhastin, dê her zindî bimîne. Kurdî jî wekî mîrateyeka çandî, bi taybetî heta 30 salên dawî bi ser ket.⁵⁶

Hêjayê destnîşankirinê ye ku kurdîya kurmancî, di çarçoveya Tirkîyeyê da, xwe bi du faktorên sereke, wekî ku li jor jî hat îfadekirin, parastîye: Cografya û demografî. Ev

⁵⁵ Ergin Opengin, “Parastin û Guherîna Zimên: Destpêkek bo Çarçoveyên Teorîk ên Parastin û Guherîna Zimên Hin Împlikasyonên Wan li ser Rewşa Zimanê Kurdî”, https://www.academia.edu/4205620/Parastin_%C3%BB_Guher%C3%AEna_Zim%C3%AAAn_Destp%C3%AAAkek_bo_Teoriy%C3%AAAn_Parastin_%C3%BB_Guher%C3%AEna_Zim%C3%AAAn_%C3%BB_hin_Sepandin%C3%AAAn_wan_li_ser_ziman%C3%AA_Kurd%C3%AE, r.2. TB: 29.12.2022.

⁵⁶ Mustafa Aydoğan, “Zayıf Dil Yok, Zayıf Kürt Çok”, *İnatçı Bir Bahar*, Berhv. Vecdi Erbay, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2012, r. 374-375.

her du faktor di parastina û kuştina zimanan da du faktorên esasî ne. Tê zanîn, dema ku zimanekî di cografyayeka mezin da ji aliyê nifûseka pir mezin ve bê bikaranîn, parastina wî dê mimkin be û asîmilîkirina wî jî dê pir zehmet be.⁵⁷

Evan pêvajoyên cihêreng ku di nav 70 salan da qewimîne, di sala 1991ê da digihêje qonaxeka nû. Sîyaseta dewletê ya ku pala xwe daye înkâr û polîtîkayên asîmilasyonê teşeyeka nû digire. Ji hêla dewletê ve mirov dikare behsa serdemeka reforman bike. Di vê pêwendê (context/bağlam) da, nişaneya qonaxa nû ya herî mihîm, fesihkirina qanûna bi hejmara 2932an bû.⁵⁸

Piştî yazdeh salan ev qonax gihîşt asteka nû. Lewra, li ser mafên zimanî bi Pêvajoya Yekîtiya Ewropayê hin pêşveçûn pêk hatin. Wekî pêngava ewil, di sala 2001ê de di xalên 26 û 28an ên makezagonê da îbareya "her kîjan zimanê ku bi qanûnê hatîye qedexekirin", ji makezagonê hat derxistin.⁵⁹

Herwisa, vê pêvajoyê Çiçek jî weha derdibirîne:

Piştî yanzdeh salan, di çarçoveya pêvajoya endambûna Yekîtiya Ewrûpayê (YE) de, di 03.08.2002an de, sêyemîn paketa adaptasyonê hate qebûlkirin, ku pê, hin derî ji bo zimanê kurdî vebûn. Ev paket ligel hin sînoran, rê li ber hînkirina zimanê kurdî di navendên taybet de (xal 11) û weşana bi kurdî di rayo û televîzyonan de (xal 8) vedikir. Jixwe, di sala 2004an de li çend bajaran navendên hînkirina zimanê kurdî vebûn û TRT-3 dest bi weşana kurdî kir.⁶⁰

Sala 2009an da pêngavên balkêş û mihîmtir hatin avêtin. "Ji ber ku di vê salê da hem TRT-6, yekemîn qanala dewletê ku 24 saet weşana bi kurdî dike, dest bi weşanê kir, hem jî bi riya enstîtuyên ji bo 'zimanên zindî' derîyên zanîngehan ji ziman û çanda kurdî ra vebûn."⁶¹

⁵⁷ Çiçek, *hb.* r. 30.

⁵⁸ Çiçek, *hb.* r. 21.

⁵⁹ Orhan, "hg". 2021, r. 189.

⁶⁰ Çiçek, *hb.* r. 22.

⁶¹ Çiçek, *hb.* r. 22.

Herweha, RTÜKê (Desteya Bilind a Radyo û Televîzyonê/Radyo Televizyon Üst Kurulu) destûr da ku qenalê televîzyonan ên taybet ku weşana bi kurdî bikin. Li alîyekî din, rê li ber girtî û hikumxwarîyan hat vekirin da ku li ser telefonê bi kurdî biaxivin.⁶²

Herwisa, divê em çend mînakên din jî destnîşan bikin: Disa di sala 2012an da zimanê kurdî wekî derseka bijarte ket dibistanên dewletê. Di 2013an da mafê parastina bi zimanê zikmakî di dadgehan da hat pejirandin. Herwisa, qanûna partîyên sîyasî hat guherandin da ku rê bide partîyan ku bikaribin bi ziman û lehçeyên ji bilî tirkî propaganda bikin.

Eger ku em lê bifikirin, ziman ji aliyê kêmneyan ve wekî yek ji amûrên herî giring ji bo parastina nasnameyên xwe yên cuda yên etnîkî tê hesabandin. Ji ber vê yekê, di maweya polîtîkayên zimanî yên asîmîlasyonîst da bikaranîna zimanê kurdî di ragihandina taybet û fermî da, di medya û perwerdeyê de mimkin nebûye.

Wekî encam, dîyar e ku, di dirûvdayîna polîtîkayên zimanî yên Dewleta Komara Tirkîyeyê da sê qonax dîyarker bûne: Di destpêkê da fikareya “netewebûn” û “rojavayîbûnê”, di salên 1980yî da tirsên “parçebûn”ê û herwisa, “Îdeala Yekîtiya Ewrûpayê” di van salên dawî da.

Polîtîkayên zimanî yên ku di bin endîşeyên "netewebûn", "rojavayîbûnê" û tirsê "perçebûnê" da teşe girtine, bi têgihîştina "yekzimanîya fermî" û "netewedewletê" ra li hev dihat. Em dizanin ku ev dîyarde heta roja îro jî li dar e.

Lê belê, polîtîkayên zimanî yên ku ji aliyê “Îdeala Yekîtiya Ewrûpayê” ve karîger bûye, di têgihîştina “neteweperwerî” û “yekzimanîya fermî” ya ku Tirkîyeyê ji destpêkê ve dimeşîne, da, bûye sedema şikestineke cidî. Nîşaneyê vê yekê ya herî zelal, pêşî di makezagonê da û piştê jî di qanûn û rêzîknameyan da gelek guherîn hatin çêkirin. Mînakên van guherandinan li jor hatibû destnîşankirin.⁶³

⁶² Orhan, “hg”. 2021, r. 189.

⁶³ Salihpaşoğlu, “hg”. r. 1045.

Ronayi Önen Baykuşak jî vê qonaxa nû weha dinirxîne: “Ev pêvajoyê bû sedem ku kurd wekî grûpeka etnîkî bê qebûlkirin û înkarkirina zimanê kurdî bê terikandin.”⁶⁴

Herî dawî, hêjayê kirpandinê ye, ku di van 30 salên dawî da tesîra polîtîkayên zimanî yê neyênî ber bi şert û mercên erênî ve guherî. Di sala 2009an da di warê zimên da reform li pey hev hatin kirin. Ev veguherîna polîtîkaya zimanî ya Tirkîyeyê di qada giştî da kurdî da xuyakirin, rê li ber asayîkirina wê jî vekir. Ev serdem ji salên 1990î dest pê dike, di salên 2000î da jî digihîje asteka baştir ; di weşangerîya kurdî da rûpeleka nû vedibe. Rojname, kovar û kitêbên çapkirin. Enstîtuyên kurdî li hin bajaran tîne saz kirin. Muzîk û şanoya kurdî geş dibê. Di warê plansazîya zimanî da gelek xebatên hêja hatin kirin; ferheng, pirtûkên gramerê û herwisa klasîkên kurdî hatin çap kirin. Herweha, tevger û sazîyên zimanî hatin damezirandin.⁶⁵

Li gor nirxandina me, ji bo standardbûn, geşedan û paşeroja kurdîya kurmancîyê pêngava herî jîyanî, vekirina Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê (Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü) ku li Zanîngeha Mardîn Artukluyê (Mardin Artuklu Üniversitesi) hat vekirin. Bi vî navî paşê li gelek zanîngehan gelek enstîtu hatin vekirin. Di beşa bê da em ê li ser rewşa kurdîya kurmancîyê û hewldanên şexsî û dezgehî, bi awayekî hûrgulî rawestî.

⁶⁴ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 80.

⁶⁵ Çiçek, *hb.* r. 25-26; Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 99.

3. SERBORÎYA HEWLDANÊN STANDARDKIRINA KURDÎYA KURMANCÎ

Herweki ku li beşên jorîn jî hat destnîşankirin, ziman yek ji sembolên herî xurt ên etnîsîteyê ye. Ji alîyekî ve, tê fikirandin ku kêmnîneya etnîkî, mimkin e ku bi zimanê xwe yê zikmakî bi nasnameyeka cuda bijî. Ji ber vê yekê jî kurdan manayeka cuda li pêwîstiya parastina zimanê xwe bar kirine. Ji ber heman sedemê, li Tirkîyeyê bernamêyên asîmîlasyonê li qadên der-hikûmetê jî hatin meşandin û tehde li kurdîya nivîskî û devkî hat kirin. Înkarkirina zimanê kurdî wekî mafekî fermî bûye sedema lawazbûna zimanê kurdî. Di derbareyê fermîkirina zimanên kêmnîneyan da Skutnabb Kangas weha dibêje: “Eger zimanek nehê bikaranîn dê fêrbûna wî jî ne mimkin be û terîfbûna bi zimanekî nenas zehmet e. Eger mafê fermî yê zimanekî nehê dayîn, ev tê manaya kuştina neyekser a wî zimanî.”¹

Bo nimûne, ev diyarde di mînaka rojnamegerîyê da jî reng vedide. Herwekî ku Kerim Yıldız ji destnîşan dike, rojnamegerî wekî qonaxekê di pêşketina qismî ya kurmancîya nivîskî da xwe nîşan dide. Lê, ji ber zextan, zimanê kurdî wekî berê, bi xetereya mayîndebûna wekî zimanekî devkî ya tradîsyonel ra, rû bi rû maye.²

Herweha, zimanekî, bo nimûne, ku wekî zimanê perwerdeyê nehê bikaranîn, nekarîbe bibe zimanê bazarê û di medyaya girseyî da têra xwe cih negire, hêdî hêdî dikevin bin bandora zimanê serdest û bikarhênerên wî zimanî dest bi dûrketina ji zimanê xwe dikin. Bi taybetî jî nifşên nû yên ku bi zimanê serdest perwerde dibin, dikarin ji bo demekê her du zimanan bi hev re bi kar biînin, ancax, her ku perwerdeya bi zimanê serdest belav dibe û asta perwerdeya kesên bi zimanê serdest perwerde dibin, bilind dibe, ev nifşê nû çî

¹ Yıldız, *hb.* 2004, r. 21.

² Yıldız, *hb.* 2004, r. 27.

bi zanebûn çî jî bi bêhişmendî dev ji zimanê xwe berdide û bi zimanê serdest xwe îfade dike.³

Herwisa, li Tirkîyeyê nebûna xebatên perwerdeya kurdîya kurmancî, pêşketina zimanê kurdî asteng kirîye. Ji ber vê yekê, wekî nimûne, li Tirkîyeyê, gelek kurdîaxêvan ramanên xwe yên teorîk bi tirkî anîne zimên, ne bi kurdî.⁴

Dîyar e ku li Tirkîyeyê, kurdîya kurmancî, gelek zehmetîyan kêşaye. Lê, piştî demeka dûvdirêj, îro, hêjayê cextandinê ye ku li gor serdemên berê, kurmancî gihîştîye asteka nû û em dikarin êdî, heta astekê behsa standarbûneka kurmancîyê bikin. Lêbelê, aşkera ye ku li gor zimanên cihanê yên berbelav û standardkirî rewşa kurmancîyê, ji ber egerên dîrokî, sîyasî, aborî, çandî û civakî, nekemilîye. Li gel vê yekê, dikare bê çavdêrîkirin, ku em ê li jêr jî destnîşan bikin, îro ji aliyê standardbûnê ve berê kurmancîyê ber bi “çêbûn”ê ve ye.

Loma, mijara me ya eslî ew e ku bê ka pêvajoya hewldanên standarkirina kurmancîyê çawa qewimîne, kes û aktorên sereke û sazîyên ku di vê pêvajoyê da karîger bûne, em ê bi awayekî giştî serborîya standarkirina kurmancîyê, rave bikin (Explanatory) û paşxane û dînamîkên vê pêvajoyê binirxînin.

Di vê kêlîyê da, wekî ku me got, em ê ji vir û pê ve li ser hewldanên şexsî û kolektîf bisekinin. Pêvajo û dînamîkên ku em ê derpêş bikin, li gel awayên din, li gor çarçoveya ku Ronayî Onen jî destnîşan dike, hêjayê nirxandinê ye. Onen di nivîsareka xwe da, hewldanên zimanî di çarçoveya “aktîvîzma zimanî” da dinirxîne. Loma, em ê di dawîya vê beşê da, mijara xwe li gor vê riwangehê jî binirxînin.

Li gor vegotina wê, “aktîvîzma zimanî hêzeke civakî ye ku veguherandina pergala zimanî ya civakekê armanc dike.” Herweha “ di vê peywendê de aktîvîstîn zimanî ew kes an jî kom in ku hewl didin ku statûya fermî ya zimanên bindestan ji nû ve saz bikin û /an

³Ayetullah Karabeyeser, “Bir Kitle İletişim Aracı Olarak Televizyonun Zazaca İçin Önemi”, *I.Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, Ed. Murat Varol, Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2011, r. 387.

⁴ Yıldız, *hb.* 2004, r. 30.

jî ji bo bipêşxistin û berbelavkirina wan zimanan kar û barên bibiryar bimeşînin (Spolsky, 2012).”⁵

Onen di derheqê “aktîvîzma kurdî”da jî tesbîtên balkêş dike. Li gor wê, armanca aktîvîzma kurdî ew e ku rewşa kurdî ya asîmetrîk li hember tirkîyê veguherîne. Herweha, helwesta zimanî ya civakî jî divê bi guhertin. Bi xebat û çalakîyên şexs û koman jî, mebest ew e ku, kurdî wekî zimanê perwerde û rêveberîyê bê bikaranîn. Bi vî awayî jî kurdî hem berbelav dibe û hem jî dê bibe nirxeka sembolîk di nav civakê da.

Ev aktîvîzma zimanî, li gor heman gotarê, xwedî paşxaneyeka dîrokî ye ku xwe dispêre Ahmedê Xanî û lir ser xeta wî, di serdema dawî ya Osmanîyan da jî, rewşenbîr û rêxistinên kurd, ji bo vejîna zimanî xebat kirine. Ev pêvajoyê di serdema Kovara Hawarê da digihîje qonaxeka giring.

Herwisa, di serdema Komara Tirkîyeyê da piştî serdemeka bêdengîyê, li gel zehmetî û astengîyan, ewilî xebatên şexsî, lê, dûre di van sih salên dawîn da, digel xebatên kesayetên kurd, bi xebatên dezgehî, wekî aktîvîzma zimanî, xwedî li mîrata zimanî hatîye derketin.⁶ Di beşên jerîn da hewlên standardkirina zimanî ku dê bîn berbirîn, wekî aktîvîzma zimanî jî dikare bê nirxandin.

3.1. Pêngava Ewil: Kovara Hawarê û Danîna Normên Ortografîk

Berî ku em li Kovara Hawarê û hûr bibin û li ser mijara normên ortografîk bisekinin, hewceye ku em ji aliyê mijara me ve, li serdema berî Kovara Hawarê, bi awayekî kurt binêrin da ku bê famkirin ku Kovar xelekeka berdewamîyêkê ya herî giring e û ji aliyê zimanî ve merheleyeka nû dinimîne.

Di dawîya serdema Osmanîyan da, rewşenbîrên kurd ku bi gelemperî zarokên malbatên xwenda û navdar bûn, bi kovar û rojnameyan, ku di navbera salên 1898-1918an

⁵ Ronayî Onen, “Rûpeleke Girîng di Aktîvîzma Zimanî ya Kurdî de; TZPKurdî”, *Zend*, Hejmar 29, Payîz-Zivistan 2022, Stenbol, r. 41.

⁶ Onen, “hg”. 2022, r. 42-46.

de bi kurdî û tirkî derdixistin, armanca wan ronîkirina kurd/ciwanên kurd û avakirina hişmendiyeke neteweyî di nav gelê kurd de bû.⁷

Di xebatên vê serdemê da mijarên wekî alfabe, ziman, hişmendî û netewetî tê dîtin. Di vî warî de rojnameya *Kurdistan û Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesi*, kovara *Rojî Kurdê* û komeleya *Hêvîyê* bûne bingeh.⁸

Di vê serdemê da, em têdigihîjin ku yek ji stûnên nîqaşên perwerdeyê jî arîşeya zimanî ye. Tiştine ku li ser pirsgerêka zimên dihatin nivîsîn, bi giştî li ser pêşketina zimên û pêkanîna wî wekî zimanê perwerdeyê bûn. Loma, ronakbîran jî li ser perwerdeya gelê kurd bi zimanê xwe nêrînên xwe dianîn zimên.

Li gor veguhastina Sevda Orak Reşitoğlu jî:

Di nav weşanên Komeleya Hêvîyê de jî li ser alfabe û fikirên giring hene, yek ji wan ew e ku herfên erebî ji bo nivîsîna bi kurdî ne guncayî in, ji ber vê jî divê alfabeyeke nû û herfên latînî bêne bikaranîn. Balkêş e ku hin rewşenbîrên ku bi zimanê rojavayî dizanin, di wê serdemê de bala xwe didin vê meseleyê û li ser disekinîn.⁹

Herweha, bi vegotina Orak Reşitoğlu, “Em dibînin ku berî Şerê Cîhanê yê Yekem daxwazên rewşenbîrên kurd ên der barê zimanê nivîskî de her diçe geştir dibe, di gel nêrînên cuda. Piştî şer ev nîqaş dîsa berdewam in, heta em dikarin bibêjin ku gurtir in.”¹⁰

Ji ber çarçoveya teza me em ê qîma xwe bi van agahîyan biînin. Lê, hêja ye ku bê derbirîn, di warê zimanî da berî Kovara Hawarê jî rewşenbîr û sazîyên kurd bi hişmendî tevgerîyane, çalak bûne û ji bo çarenivîsa zimanê xwe serê xwe êşandine.

Hêjayê kirpandinê ye ku, wekî ku em ê li jêrê jî destnîşan bikin, avakerê Kovara Hawarê Celadet Alî Bedirxan di bin bandora ramanên nivîsên van kovar û rojnameyan de maye. Herweki ku Îbrahîm Seydo Aydoxanî jî dibêje, “... Ji ber wê, di kemilîna têgihîştin

⁷ Onen, *hb.* 2018, r. 114.

⁸ Onen, *hb.* 2018, r. 4

⁹ Orak Reşitoğlu, *hb.* 2022, r. 65.

¹⁰ Orak Reşitoğlu, *hb.* 2022, r.68.

û amadekirina Hawarê de divê mirov bibêje ku bandora van hemû kovar û rojnameyan heye.”

Herweha, dîyar e ku rewşenbîrên kurd hem di serdema Hawarê da hem jî berî wê hewl dane ku hişmendiyeka kurdî di nav gel da çê be. Ji bo vê yekê, bi avakirina komeleyan, çapkirina kovar û rojnameyan xebatên giring meşandine. Armanca wan xwedîlêderketina ziman û neteweyê, bipêşxistina xwendin û nivîsîna bi kurdî bû. Ji ber ku wan dizanîbû bîyî perwerdeyê; xwendin û nivîsîn û ziman miletek nikare bi pêş bikeve û zarokên xwe bigihîne.¹¹

Di heypeyvîneka xwe da, da Serdar Ay di derheqê Hawarê û giringîya wê da, nirxandinek weha dike:

Dişa Hawar, dîyem kêlîka avaker a wêjeya kurdîya kurmançî ye ku xwe li ser tradîsiyona Xanî ava dike ku li gorî wê, ew « pêxemberê ola neteweyî û nijadî yê Kurdan e ». Dîyem kêlîk e, ji ber ku ew bi xwe dibêje ku Xanî yê yekem, pêxember e (Lewma ez di xebata xwe de, bi awayekî dûvdirêj li ser van herdû bavên vê wêjeyê disekinim ku hebûna wê bi wan e û di dilê dîroka wê de ne), ku alfabe û gramera zimanê kurdîya kurmançî ava dike ku dibe model. Bilêvkirina « kurmançî », piştî hejmara 27a xwe dide der û gellekî xûya dibe ji bedêla « kurdî » ve. Ji ber ku şert û mercên sîyasî, û zora hêzên heremî rê nedane pêwendîya Celadet, Hecîyê Cindî û Tewfîq Wehbî ku hewl didan di pêwendiyê de bin bo mesela yekîtiya zimanê kurdî û alfabeyê. Ji xwe di heman demê de Gelawêj (1939-1949) derketiye êdî ku bi kurdîya soranî ya bi alfaba erebî ye, û heya Celadet ji vê yekê heye, ku xwe bi awayekî kubar pê ne xweş dike û dikeribe.¹²

Îcar, di vê kêliyê da, em ê ewilî bi awayekî giştî behsa Kovara Hawarê bikin. Wekî ku tê zanîn, nexasim ji aliyê zimanî ve “qonaxa Hawarê” wekî “*serdemeka zêrîn*” hatîye nirxandin. Herwisa, li gel vê yekê em ê behsa avaker û pêşengê Kovara Hawarê, Celadet Alî Bedirxan jî bikin. Mebesta me ji vê yekê ew e ku em destnîşan bikin bê ka rol û giringîya Kovara Hawarê û Celadet Alî Bedirxan ji aliyê zimanî ve çi bû û karîgerî ya wan heta îro çawa pêk hatîye.

¹¹ Orak Reşitoğlu, hb. 2022, r.89-90.

¹² <https://www.kurdarastirmalari.com/yazi-detay-oku-117> (290822), TB: 30.12.2022.

Ji bo fikra avakirina Kovara Hawarê em ê serî bidin Ronayî Onenî:

Nevîyê Bedirxan Beg, Celadet Alî Bedirxan piştî têkoşîneke dîrûdirêj a siyasî bi hinek rêhevalên xwe re biryar da ku ji bo xatirê 'qelem'ê dev ji 'xençer'ê berdîn. Bedirxan baş dizanî ku pêwistî pê heye ku di nava kurdan de hesta dilsozîyê pêk bînin û ji bo serfirazîyê diviya zimanê kurdî bê venûkirin, perwerdeya bi kurdî bê bipêşvebirin û her wiha edebiyata nûjen bê vejandin. Ji bo ku biryara xwe bi cih bînin komeke rewşenbîran bi pêşewatîya Celadet Bedirxan li Şamê dest bi weşandina Kovara Hawarê kir.¹³

Hawar, tê zanîn ku yekem kovara kurdî ye ku bi herfên latînî hatiye çapkirin. Li gel ku çend caran weşana wê hatibe rawestandî jî, di navbera salên 1932 û 1943yan da hatiye weşandin.¹⁴

Hejmara ewil a Hawarê di 15ê gulana 1932yan da li Şamê derdikeve. Bi tevahî 57 hejmar tê çapkirin û bi hejmara dawî, di 15ê tebaxa 1943yan da weşana wê bi dawî dibe. Herweha, 23 hejmarên ewil hem bi herfên latînî hem jî bi herfê erebî çap dibe, lê, paşê jî hejmara 24an û pê ve tenê bi alfabeya latînî tê çapkirin.

Lê, em dizanin ku Kovara Hawarê bi awayekî berdewam nehatîyê çapkirin. Ji ber rewşên aborî, ango tunebûna kaxizê navber daye weşana xwe. Di serî da mehê du caran derdiçe. Piştê her diçe navbera çapkirina hejmaran firehtir dibe. Herwisa, di sala 1932yan da 14 hejmar, di sala 1933yan da neh hejmar tî çapkirin. Piştî neh mehan hejmara 34an di 1ê nîsana 1934an da derdikeve. Di heman salê da du hejmar tî çapkirin. 1935an da tenê hejmara 36an derdiçe. Piştî navbereka dirêj, hejmara 37an 15ê nîsana 1941ê da derdikeve. Di heman salî da 11 hejmar û di sala 1942an da 14 hejmar derdikevin. Herî dawî bi şeş hejmaran di sala 1943an da bi dawî dibe.¹⁵

¹³ Onen, *hb.* 2018, r. 93.

¹⁴ Süleyman Çetin, *Kovara Hawarê û Bandora Wê Ya Li Ser Zimanê Kurdî*, Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Van, 2016 (Teza Masterê ya Çapnebûyî), r. 41.

¹⁵ Onen, *hb.* 2018, r. 108.

Sûriye di bin desthilatdariya Fransayê de bû û fransî bi awayekî aktîf li wir dihat bikaranîn. Avakerên Hawarê gelek astengî û zehmetîyan kişandine. Dîyar e, di wê serdemê da çapkirina kovarekê pir zehmet bû. Pirsgirêkên çapkirin û alfabe ya latînî aşkera bûn. Li gel van kêşeyan ji bo derxistina kovarê divîyabû ku ji frensîya destûr bê xwastin. Ji bo ku alîkarî ji bikin hin şertên wan hebûn. Nivîsarên sîyasî jixwe xedexe bûn. Frensîyan jî bi çend awayan dixwastin ku civaka kurd kontrol bikin.¹⁶

Herçiqas me li jorê du-zimanîya Hawarê destnîşankir jî, wê demê di her du qisman da zimanê sereke zimanê kurdî bû. Hêjayê destnîşankirinê ye ku ji destpêkê û pê ve nivîsarên bi zimanê frensî jî hebûn.

Bo nimûne, di hejmara yekem da armancên kovarê bi frensî jî weha hatibû pêşkêşkirin: “Me ev kovara hanê, Hawar, bi taybetî ji bo armancên edebî û zanistî ava kirîye. Ewê valahîyeke mezin a neteweya kurd tijî bike. Ew bi tu awayî tevî siyasî nabe. Ew ê tenê li ser mijarên têkildarî kurdan û kesên biyanî bisekine, yê ku dixwazin bi ziman û neteweyên rojhilatî bibin nasyar.”¹⁷

Herwisa, di hejmara ewil a Hawarê da, armancên kovarê weha tê pêşkêşkirin:

1- Belavqirina Elfabêya qurdi di nav qurdan û hînkirina wê. Senifandina zmanazîna qurdî û hîn bi hîn di qomelê de belav qirin û pêşdetir di şîqlê qitêbê de derêxistin. 2- Sehîtiya zarên qurdî û berhevdanîna wan. Sehîti ser mirovatîya zmanê qurdî digel zimanên din en arî. Sehîti ser bingehên zmanê qurdî, ser dîrok û awayê rabûn û pêşveqetina wî. 3- Ber hevqirina çîroq, çîrîroq û her texlît laje û stranên qurdi û birêve belavqirina wan. 4- Senifandin û belavqirina diwanên qurdî. Bi van ve jinenigariyên şair û mirovên bijarte jî dê bîn belav qirin. 5- Sehîti ser reks û Keydeyên stranên qurdî. 6- Sehîti ser her texlît rêziqên qurdî û Qurdistanê, yê zemanê borî û yê îro û senifandina wan. Sehîti ser hatinên Kurdistanê û piş û sinhetên qurdî. 7- Dîroq û erdnigarî: Sehîti ser tevayîya dîroq û erdnigariya welatê Qurdistanê û ser dîroqa eşîran, berî, paşî û di wextê Mîr-Şeref de.¹⁸

¹⁶ Orak Reşitoğlu, *hb.* 2022, r. 87; 211.

¹⁷ Onen, *hb.* 2018, r. 108.

¹⁸ Armanc, “Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê”, *Hawar*, Cild I, (Amd.) Fîrat Ceweri, Weşanên Nûdem, Stockholm, 1998, r. 23.

Di Kovara Hawarê da mijarên sereke yên ku ji aliyê nivîskarên cîyawaz ve hatine nivîsîn weha ne: Ziman, alfabe, rêziman, ferheng, wêje, klasîkên kurdî, folklorî kurdî, wergerandin.¹⁹

“Di Hawarê da gelek cureyên cuda ên pexşanê hene; kurteçîrok, cerîbîn, rexne, nivîsên fikrî, bîranîn, nivîsên geştûgerê. Metneke şanoyê û gelek helbest jî hene. Nûçeyên ji Kurdîstanê û cîhanê jî li ser rûpelên Hawarê hene.”²⁰

Herwisa, Onen lê zêde dike:

“*Her wiha li ser rûpelên Hawarê gelek stran, helbestên folklorîk, mamik û gotinên pêşîyan jî hebun.*”²¹

Ji heman çavkanîyê em têdigihîjin ku di gelek hejmarên Hawarê da ferhengokek hebû û tê da peyvên ku di wê hejmarê da hatine bikaranîn, dihatin nasandin. Herwisa, yek ji mijarên ku herî zêde hatîye dubarekirin, mijara zimanî ye. Li gel vê, pêwîstîya yekîtî û hevkarîya kurdan jî tê dubarekirin. Wekî din, lêkolînên li ser dîrok û erdnîgarîya Kurdîstanê jî hatine kirin.²²

Eger em behsa nivîskarên Hawarê jî bikin, ew jî weha rêz dibin: Celadet Alî Bedirxan, Kamîran Alî Bedirxan, Rewşen Bedirxan, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Pîremêrd, Qedrîcan, Qedrî Cemîlpaşa, Reşîdê Kurd, Ahmed Namî, Hesên Hîşyar, Faîq Bêkes, Refîq Hîlmî, Dr. Ahmed Nafîz, Dr. Nureddîn Zaza, Fewfîq Wehbî, û Elî Seydo Gewranî.²³ Li gor Firat Dîlgeş, di 57 hejmarên Hawarê da 54 nivîskar, ji bilî nasnavên Celadet Alî Bedirxan, xuya dikin. Lê, em dizanin ku Celadet Alî Bedirxan bi gelek nasnavan jî nivîsarên wî hene. Nasnavê wî yê sereke jî Herekol Azîzan e.²⁴

¹⁹ Çetin, *hb.* r. 48-50.

²⁰ Onen, *hb.* 2018, r. 118.

²¹ Onen, *hb.* 2018, r. 119.

²² Onen, *hb.* 2018, r. 119-120.

²³ Çetin, *hb.* r. 51-80.

²⁴ Felat Dilgeş, “Celadet Alî Bedirxan ve Hawar Ekolü”, *Înatçı Bir Bahar*, Berhv. Vecdi Erbay, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2012, r. 60.

Di kovarê da zaravayê kurdî yê serdest kurmancî bû û piştê jî soranî bû. Bi taybetî jî di serdema ewil de gelek nivîsarên neteweperwerî bi soranî hebûn ku pîraniya wan ji aliyê Hevîndê Sorî ve dihatin nivîsîn. Nivîsarên bi soranî heta hejmara 18an zêdetir xuya dikirin, lê piştê her diçû kêmîr dibûn²⁵

Helbet derketina Kovara Hawarê xwedî paşxaneyekê ye. Di vê çarçoveyê da, li gor tesbîten rewşenbîr û akademîsyenan, piştî têkçûnên serhildanan, rewşenbîran berê xwe da “qelem”ê û meyla wan êdî li ser şerê bi “qelem”ê bû. Lewra, rewşenbîrên kurdan têgihîştin ku ancax bi qelemê nasname û hişmendîyeka hevpar dê karibin ava bikin. Ji ber vê yekê, rewşenbîrên derûdora Hawarê ji bo dîyarkirina çarenivîsa xwe, bi rêya zimanî û herweha edebîyatê vegotîneke “dij-kolonyal” ava kirin.²⁶

Li gor Celadet Alî Bedirxan û hevkarên wî, xurtkirina hestên kurdbûnê ya bi rêya zimanî, perwerdeya bi zimanê kurdî û teşwîqa edebîyatê dê bibûya sedema liberxwedaneka dij-kolonyal.²⁷

Li gor analîza Îbrahîm Seydo Aydoxanî jî, jêdera fikra kovargerîyê dibe ku weha be:

“Celadet Bedirxan bi xwe jî dinivîsîne ku ew ji 1919’an ve ye ku li ser alfabeya kurdî dixebitî. Em dizanin ku Celadet di dema weşandina Yekbûnê de bîst salî bû û endamê komeleya Hêviyê bû. Ji ber ku wî xortaniya xwe li Stenbolê derbas kiriye û bi xwendin û nivîsandinê ve têkildar bûye jî, em tê derdixin ku wî ew kovar û rojnameyên Kurdan yê serê sedsala bîstan hemû dîtine. Ji ber wê jî, têra xwe asayî ye ku ew di bin bandora ramanên nivîsên van kovar û rojnameyan de mabe. Ji ber wê, di kemilîna têgihîştin û amadekirina Hawarê de divê mirov bibêje ku bandora van hemû kovar û rojnameyan heye.”²⁸

Sevda Orak Reşitoğlu destnîşan dike ku:

Bi van nêrînen di Hawarê de em dibînin ku her rewşenbîrek di serdema xwe de hewl daye ku riya kurdan ronî bike û rê li ber wan bixe da ku xwe bi pêş ve bibin. Ji Ehmedê Xanî heta Celadet Bedirxan, her rewşenbîr li gorî xwe xebatek pîroz kiriye da ku kurd ji nezaniyê xelas bibin û her yek li ser zimanê kurdî sekiniye, lewre

²⁵ Onen, *hb.* 2018, r. 109.

²⁶ Onen, *hb.* 2018, r. 103.

²⁷ Onen, *hb.* 2018, r. 104.

²⁸ Îbrahîm Seydo Aydoğan, “Celadet Bedirxan, Çavkaniyên Hawarê û Kurdaniya bîrewer”, *Journal of University of Zakho*, Vol. 1, Pp. 21-40, 2013, r. 5.

avabûna neteweyekê, bidestxistina hişmendiyeke, bipêşketina miletekî ancax dikare bi zimên, bi zimanekî hevpar û nivîskî pêk bê.²⁹

Berî qedandina vê babetê, bi veguhastina Onenî, li gor Husên Hebeş, hin zanyar Hawarê wekî weşana Xoybûnê qebûl bikin jî, ew vê îdîayê red dike û dibêje delîlên vê yekê nînin.³⁰

Îcar, hem wekî avakerê Kovara Hawarê û hem jî wekî pêşengê xebatên zimanî divê em bi kurtî li gor çarçoveya tezê behsa Celadet Alî Bedirxan bikin.

Celadet Alî Bedirxan di 26ê nîsana 1894an da li Stenbolê tê dinyayê. Xwendina seretayî û navînî li Stenbolê tamam dike. Lê, ji ber ku malbata Bedirxanîyan, li ser buyera Ridvan Paşa, tèn sirgûnkirin, li dibistanên cuda perwerde dibe. Bi zimanê tirkî û erebî perwerde bûye. Lê, ji mamosteyên taybetî zimanê yûnanî, farisî, frensî û rûsî hîn bûye. Hê di ciwanîya xwe da dikeve nav jiyana siyasî û di xebatan da cih digire û pê ra jî têkiliyeka xurt bi nivîsînê ra datîne.

“Piştî lîseyê, berî Şerê Cîhanê yê Yekem, Celadet Bedirxan li Stenbolê beşa hiqûqê dixwîne. Piştî qedandina hiqûqê, li Edirneyê, li burokrasiya adliyê ya osmanî wekî katib dixebite.”³¹ Li Edirneyê li gel birayê xwe Kamiran kitêbeka bi navê *Edirne Sükutunun İç Yüzü* nivîsandîye. Piştê li Stenbolê rojnamegerî kirîye. Celadet Alî Bedirxan li Zanîngeha Stenbolê li ser hiqûqê lîsansa bilind kirîye û xwendina xwe li Mûnîhê domandîye. Ew di şerê Cîhanê yê Yekem da wekî serbazekî tevî artêşa Osmanî bûye. Wî li enîya Qawqasê şer kirîye û heta Tebrîz û Makûyê çûye. Di serdema piştî şer da bûye dij-kemalîstekî xurt, lewra wî dizanî desthilatîya nû ya tirk dê destûr nedaya Kurdîstaneka serbixwe, wan dê tenê ji bo xwe netewedewleteka tirk ava bikirana.

Herweha, di sala 1919an da Celadet Bedirxan û birayê xwe yê biçûk Kamiran li gel Edward William Charles Noelê (Major Noel) Brîtanî, li bajarên Kurdîstanê digerin.

²⁹ Orak Reşitoğlu, *hb.* 2022, r. 94.

³⁰ Onen, *hb.* 2018, r. 121.

³¹ Orak Reşitoğlu, *hb.* 2022, r. 79.

Armanca Celadet Bedirxan ew bû ku bihîzariya serxwebûnê li herêmê geş bikin. Ji bo vê li bajarên wekî Mêrdîn, Dîyarbekir û Meletiyê gerîyan. Herî dawî ew gera wan ji ber midaxeleyên Mistefa Kemal nîvco maye.

Piştî damezirandina Komara Tirkîyeyê di derheqê Sureyya, Celadet û Kamiran Bedirxan da ferman tê derxistin û Celadet digel birayê xwe Kamiran xwe digihîne Almaniyayê (îlon 1922). Bi qasî sê salan da li Almanya û Fransayê dimîne. Li Almanya zehmetiyên aborî dikêşe. Ji neçarî ji bo debara xwe di karên curbicur da dixebite. Serpêhatiyên xwe yên wê demê di rojnivîskekê da nivîsiye. Ev rojnivîsk bi navê “Günlük Notlar” di sala 1995an da tê weşandin.³²

Ev serdem li gor vegotina Sevda Orak Reşitoğlu weha diherike:

Mirov dikare salên wî yên li Almaniyayê ji rojnivîska wî bibîne her çi qas bi awayekî kûr nenivîsandibe jî. Celadet û Kamiran Bedirxan wexta diçin Almaniyayê, dev ji xwendina xwe bernadin. Her du jî qeyda xwe di beşa hiqûqê de çêdikin. Lê belê Almaniyaya wê serdemê di nav rewşeke pir xirab de ye, ji ber vê jiyana wan a li wê derê pir rihet derbas nabe. Celadet Bedirxan di wê rojnivîskê de behsa tunebûna pere û xwarinê, rewşa aboriya xirab a Almaniyayê dike ku di nav krîzeke mezin de ye, hevdîtînen xwe yên bi birayên xwe Kamiran, Tewfîq û Safder dike. Her wiha ji ber tunebûna pere behsa qewirandina ji zanîngehê dike ku wê çaxê di 31 saliya xwe de ye. Piştî diyar nake ku berdewam dike an na lê li gorî agahiyên Rewşen Bedirxan berdewam dike, dîplomaya xwe distîne, heta li Şamê parêzeriyê jî dike.³³

Herwisa, li Almaniyayê fêrî zimanê almanî dibe û digel vê diçe kursên cihêreng jî. Di sala 1925an da derbasî Misrê dibe. Piştî du salan wî yên li Lubnanê, di sala 1927an da dibe serokê hîlbijartî yê komeleya neteweperwerî Xoybûnê.

Di serdema dawîya serhildana Agirîyê da derbasî wê derê dibe. Ji Agirîyê jî, digel rêhevalên xwe diçe Tehranê. Şahê Îranê bi hatina wî dihise û ji bo ku Celadet karê siyasî

³² Onen, *hb.* 2018, r. 96-98

³³ Orak Reşitoğlu, *hb.* 2022, r. 81-82.

neke dixwaze wî bi karekî ve girê bide. Lê, Celadet ev yek qebûl nake û berê xwe dide Sûrîyeyê.

Dema ku Celadet Alî Bedirxan hatîye Sûrîyeyê, ew der di bin desthilatîya Mandayî ya Fransayê da bûye. Di heman heyamê da gelek rewşenbîrên kurd en neteweperwer ên ku berê li Stenbolê bûn berî Celadet Alî Bedirxan hatibûn Sûrîyeyê. Li Sûrîyeyê ramana neteweperwerîya kurdî bi bûyerên herêmî ve têkildar derketin holê. Dîyar e ku, bi hatina van rewşenbîran, di nava hejmara kêma kurdên Sûrîyeyê da fikra “komeka neteweperwer” berceste bûye.

Li gor Îsmet Şerîf Vanlî, rayedarên Fransî û Sûrîyeyî di nava kurdan da destûr dane çalakîyên çandî yên sîvîl, lêbelê, li seranserê welatî tu dibistanên kurdî nehatibû vekirin.³⁴

Herwekî li jor jî hat destnîşankirin, Celadet Alî Bedirxan di sala 1932yan da wekî avakerê Kovara Hawarê dest bi weşandina kovarê dike. C. Bedirxan li gel Hawarê, ji nîsana 1942yan heta adara 1945an kovara Ronahiyê jî derdixîne. Kovara Ronahiyê jî xwerû bi kurdî û bînavber 28 hejmar derketiye. C. Bedirxan di 15ê tîrmeha sala 1951ê da diçe ber dilovanîya Xwedê û li goristana Şêx Xalid Neqşebendî a li Şamê, li cem bapîrê xwe tê veşartin.³⁵

Hêja ye ku di dawîya vê beşê da em behsa berhemên wî bikin. Li vir em ê serî bidin Firat Cewerî, ku wî di destpêka Kovara Hawarê da, ku ji aliyê wî ve hatîye çapkirin, van berhemên rêz dike: “Elîfbaya Kurdî, Rêzimana Kurdî, Ferhenga Kurdî, Rêzana Elfabeya Kurdî, Rûpelnine Elfabê, Dibaca Mewlûdê, Dibaca Nivêjin Êzdîyan, Kektub ji Mustefa Kemal re, Ji Mesela Kurdîstanê, Wergera çîroka Conî û Cimêma. Bi dehan nivîs û gotarên çapkirî û neçapkirî.”³⁶

³⁴ Dilaver Döğër, *Bêjara Neteweparêz Di Kovara Hawarê De, Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Van, 2017, (Teza Masterê ya Çapnebûyî), r. 87. ; Onen, hb. 2018, r. 96-100; Dilgeş, hg, r. 51.*

³⁵ Döğër, *hb.* r. 87.

³⁶ Firat Cewerî Amd., *Hawar, Weşanên Nûdem, Cild I, Stockholm, 1998, , r.19.*

Herwisa Celadet Alî Bedirxan di nivîsarên xwe da, nasnavên ku bi kar anîye ev in: Herekol Azîzan, Hawar, Nêrevan, Xeberguhêz, Xwedîyê Hawarê, Seydayê Gerok, Bişarê Segman, Bavê Cemşîd.³⁷ Lê, li gor veguhastina Onen, Husên Hebeş di teza xwe doktorayê da behsa 13 navên Celadet Alî Bedirxan ên di Hawarê da dike. Îbrahîm Seydo Aydoğan lê zêde dike û li gor vegotina wî 35 nasnavên C.Bedirxanî hene.³⁸

Ji alîyê mijara teza me ve pêwistî bi analîzkirina rol û giringîya Kovara Hawarê, li gel Celadet Alî Bedirxanî, di warê standartkirina kurmancîyê da heye. Li jêrê, em ê hewl bidin bê ka bandora Hawarê û avakerê wê, çawa pêk hatîye û erk û fonksîyonên wan çi bûne, binirxînin.

3.1.1. Giringîya kovara hawarê û bandora wê li ser standardkirina kurmancîyê

Kovara Hawarê li gel aktorên xwe yên sereke wekî “tevgereka zimanî” jî bi hewl û çalakîyan, bi rêya bipêşxistina zimanê kurdî, hem avakirina nasnameya hevpar hem jî yekkirina zimanî ji xwe ra kirîye armanc. Wekî ku me behs kiribû, Kovara Hawarê ji weşanên din ên berî xwe yên di dewra Osmanîyan da, karîger bûye. Yanî, Hawarê jî hewl daye ku zimanekî yekbûyî çê bike da ku hişmendîya nasnameya hevpar hişyar bibe, biplan tevbigere.

Dîyar e, ji bo vê yekê pêwistîya zimanî bi plansazîya zimanî hebû ku ew jî ji du hêmanan pêk tê: Plansazîya korpûsê û plansazîya statûyê. Di paragrafên jêrîn da jî dê bê destnîşankirin ku kadroya Hawarê berî her tiştî li ser plansazîya korpûsê sekinîye. Lewra, hêmaneka sereke ya plansazîya korpûsê standardkirina zimanî ye ku dikare wekî afirandin û avakirina rêzikên hevpar ên zimanî bê pênasekirin. Plansazîya statûyê jî, li ser rola zimanî ya di civakê da bandorê dike.³⁹

Standardîzasyona zimanî ji alîyê geşedana zimanî, yekîtî û pêşveçûna neteweyekê, yek ji hêmanên herî giring e. Bi saya standardîzasyonê, zimanekî hevpar pêk tê, bi

³⁷ Dilgeş, “hg”. r. 60.

³⁸ Onen, *hb.* 2018, r. 117-118.

³⁹ Onen, *hb.* 2018, r. 142-143.

taybetî ji bo zimanê nivîskî û ev yek jî têgihîştina gelî ya ji hev hêsantir dike, rêya xurtbûna weşangerî û medyayê vedike.⁴⁰

Herwisa, Sevda Orak Reşitoğlu lê zêde dike û vediguhêze:

Laura Boulden(2007) li ser girêdana zimanê nivîskî û standardê disekine û dibêje, zimanê standard di ragihandinê da karê însanan hêsantir dike. Herçiqas mirov devokên cuda bi kar binin jî û ji van devokan fam bikin jî, nivîsîna van, tiştêk cuda ye û ew kesên ku bi devokên cuda diaxivin bi heman awayî nanivîsin. Ji ber vê ye ku xebateka hevpar giring e ji bo pejirandina devokekê. Herweha tîne ziman ku di standardbûnê da zimanê nivîskî pir giring e, lewra tiştê ku zimanî diparêze nivîs e û bi vî awayî ziman mayînde dibe.⁴¹

Weki ku Orak Reşitoğlu ji vedibêje, standardkirina zimanekî ji pêvajoyên dûr û dirêj derbas dibe. Hilbijartina zaravayekê, avakirina komîsyonên zimanî, amadekirina materyalên zimanê nivîskî di carekê da çê nabin û ji bo vê jî piştgirîya dewletê pêwîst e. Lewra zimanê ku tê standardkirin, divê wekî perwerde jî cihê xwe bigire, da ku bê qebûlkirin û belavkirin. Ji ber vê, zimanên wekî almanî, îngilîzî û fransî yên ku niha li cîhanê serdest in, bi piştgirîya dewletê bûne zimanên standard.⁴²

Herwekî ku li beşê jortir jî hat vegotin, di pêvajoya standarkirina zimanî da plansaziya zimanî wekî dîyardeyeka herî giring derketibû pêşberê me. Onen vê yekê weha rave kiribû:

Têgeha ‘plansaziya zimanî’ ji aliyê zimanzanê emrîkî Einar Haugen ve di dawiya salên 1950yî de hatiye danasîn û ji bo hemî hewlên hişmendî tê bikaranîn ku armanca wan guherandina reftara zimên a civateke zimanî ye. ‘Ji pêşniyara peyveke nû bigire heta afirandina zimanekî nû’ her hewldan di nava vê têgehê de cih digirin. Siyaseta zimanî tê wateya armancên berfirehtir ên zimanî, siyasî û civakî ku bingeha pêvajoya plansaziya zimanî pêk tînin.⁴³

⁴⁰ Sevda Orak Reşitoğlu, “Berawirdkirina kovara Hawarê û Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmancîyê ji aliyê rastnivîsînê ve”. Folklor û Ziman, Cild 3, Hejmar 1, 2022, r. 87.

⁴¹ Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. 87.

⁴² Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. 87.

⁴³ Onen, *hb*. 2018, r. 36.

Ji bo plansazîya zimanî, ku me li jor amaje pê kir, ji alîyê Einar Haugen ve çar model hatine dîyarkirin: 1- Hilbijartina dîyalektê (selection), 2- Kodkirin (codification) 3- Pêkanîn (implementation) û 4- Hûrgulîkirin (elaboration).

Li gor van çar modelan, divê zaravayek (dîyalekt) bê hilbijartin, alfabeya wê bê danîn, rastnivîsîn û rêziman bêne duristkirin, bi van rêbazên nû berhem bêne çapkirin û herî dawî ev ziman divê bi rêya çapemenî, weşangerî û dibistanan bê belavkirin.”⁴⁴

Îcar, em li jêguhastina Orak Reşitoğlu ya ku modela Haugen şirove dike, binêrin. Lewra ev jêgirtin jî alîyê mijara me ve gelekî raveker e:

“Juan Cobarrubias(1983) jî van her çar modelên Haugenî şirove dike. Li gor wî yek ji çar modelên plansazîya zimanî ya Haugenî hilbijartina normê ye, ango hilbijartina zaravayê ye. Ji bo perwerde û zimanê fermî dîyalekta herî guncaw tê hilbijartin. Ev dîyalekt divê ji her alîyê ve guncaw be. Kodkirin jî dîyalekta ku tê hilbijartin stabilîze dike û pêvajoya standardîzasyonê dest pê dike. Di pêvajoya standardîzasyonê da peywira ewil derxistina pirtûkên wekî ferheng, rêziman û rastnivîsînê ne û ev pêvajoyê bi piştgirîya akademî û kesên ku li ser vî karî dixebitin, pêk tê. Pêkanîn, çalakîyên bi piştgirîya dewletê, enstîtu, rojname, kovar, pirtûk û herweha bi navgînên ragihandinê pêk tê. Belavkirin jî pêşxistina kodên nû yên bi rêya zanistî û teknolojîk e. Berhemdayîna têgihên nû û belavbûna wê, pêkanîna herî berbelav e di modernîzasyona zimanî da.”⁴⁵

Herwisa, Orak Reşitoğlu lê zêde dike û dibêje:” *Lê wekî ku Fishman(2006) dibêje, her zimanek ne xwedîyê dewletekê ye, lê gelek ziman leksîkografek, rêzimanzanek, stîlîstek wan heye. Ev kes bi dilxwazî karê xwe dikin, lewra di hişê wan da ji materyalê zêdetir rûmeta etnoçandî heye. Tunebûna hêzeka mezin, motîvasyoneka hêzdar e ji bo destpêkirina plansazîya zimanî.*”

Herweha, li gor destnîşankirina sernava beşê jî, em ê di çarçoveya analîzîn jorîn da ji analîzên Orak Reşitoğlu piştgirîyê bigirin, da ku em feraset û hewldanên Celadet Alî Bedirxanî û hevalên wî fam bikin:

Wekî mînaka Fishman, di rewşeka bêdewlet da dixwaze zimanê nivîskî stabîle bike û herweha bi reformeka mezin; alfabeya erebî radike û şûna wê ya latînî ava dike.

⁴⁴ Orak Reşitoğlu, , “hg”. 2022, r. 88.

⁴⁵ Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. 88.

Wekî mînaka li jor, her zimanek xwedî rêzimanzanek yan jî stîlîstek e. Di rewşa kurdan da jî ew kes Celadet Alî Bedirxan e. Bê dewlet, bê dibistan, bê enstîtû, bê hêza otorîteyê, kovara Hawarê dike dibistan ji bo gelê kurd. Armanca wî hem zêdekirina hejmara mirovên xwenda, hem jî avakirina hişmendîya neteweyî ye. Armanca din a Celadet Bedirxanî ew e ku bi vê standardîzasyona zimanî têgihîştina mirovan a hevûdin nêzîktir bike. Di zimanên bê standard da herçiqas bi heman zimanî biaxivin jî, ji ber cudahiya devokan, herêmek ya din fam nake, heta ev rewş di nav însanên nexwenda da îro jî berdewam e.⁴⁶

Hêja ye ku em lê zêde bikin, herwekî ku li jorê jî me amaje pê kir ku endîşeyên zimanî bi Celadet Bedirxanî dest pê nekirîye. Lê, xebatên wî yên bêhempa wekî xelekeka zêrîn û dîyarker di dîrokê da xwedî cihekî taybet e. Lêbelê, hêj di dewra Osmanîyan da rewşenbîrên kurd li gor riwangeha û feraseta wê serdemê, dixwazin ku netewetîya xwe derxin pêş û ji ber vê yekê “di weşanên wekî Rojî Kurd, Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi, Serbestî û Jînê da daxwazên li ser hişmendî, xwendin û pêşveçûnê tên kirin. Bi taybetî di Jînê da ev daxwaz digihîjin lutkeyê, lewra piştî Şerê Cîhanê yê Yekem e ku Dewleta Osmanî têk diçe û kurd bi guherînan rewşa sîyasî bêtir xwe dibînin û dixwazin li ser vê gavên mezin biavêjin.”⁴⁷

Divê vê yekê em destnîşan bikin ku, fikra bidestxistina alfabeyê nû ya zimanê kurdî û hin meseleyên pêwendîdar piştî avakirina Komarê bi dawî bûn. Azadiya axaftin û nivîsandinê li ser van mijaran bi salan ji destê kurdên ku di nav sînoren Tirkîyeyê da dijîyan, hatibû girtin. Li aliyê din rewşenbîrên kurd ên ku ji Tirkîyeyê reviyên û li derveyî welêt jîyaneka nû ava kirin, tevî hemû zehmetîyan di afirandina alfabeyê nû da bi ser ketin. Bêguman, fikra nivîsandina zimanê kurdî bi alfabeyê nû, bi alfabeya latînî, ji aliyê Celadet Alî Bedirxanî hat bicihanîn. Bi keda wî ya dûvdirêj Kovara Hawarê bû mînaka yekem a weşana demkî (periodic) ya bi alfabeya latînî-kurdî ye. Bi vî awayî lêgerîna alfabeya herî guncaw a zimanê kurdî dê bi Hawarê bigihêje armanca xwe.⁴⁸

⁴⁶ Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. 89.

⁴⁷ Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. 91.

⁴⁸ Dilgeş, “hg”. r. 56.

Dîyar e ku, bi weşandin Hawarê ra “şoreşa alfabe”yê û nivîsîna kurmancîyê bi herfên latînî dest pê dike. Dawîya dawî, xebata Celadet Alî Bedirxan ya li ser alfabeyê, edî dikaribû bihata sepandin. “Lê, ev alfabe ne halê dawî bû, lewra nîqaşên wê di Hawarê da berdewam bûn, bi taybetî li ser tîpên /q/ û /k/yê di çend hejmaran da nivîs hene.” Lê, herî dawî ev mesele jî tê çareserkirin û îro jî alfabeya ku Celadet Bedirxanî danîye, li dar e.⁴⁹

Celadet Alî Bedirxanî ji bilî alfabeyê jî, li ser rêzimanê xebatîye. Bi vî awayî ji bo rastnivîsîna kurmancîyê rê vekirîye. Bi vegotina Orak Reşitoğlu

Hawar ji alîyê rastnivîsînê ve mijarên serbixwe pêşberî me nake. Em dikarin ji naverokê pê derxin ka bêje, lêker, daçek, navên taybetî û hwd çawa bi kar anîne, navên ziman, netewe, erdnîgarî bi hûrdek an bi girdekan nivîsîne. Ev ji bo me gelek giring in, lewra ev qayde di standardîzasyona zimanî da bingeh in. Wekî ku me dîyar kir, ev qayde dikarin ji naveroka Hawarê bêne dîtin, lê belê ji bo van sernavekî taybetî nehatîye vekirin, ji bilî çend mijaran ku bêhtir mijarên rêzimanê ne.⁵⁰

Ji bo çiroka xebatên alfabeyê bê ka çawa wekî kitêbek hatîye çapkirin, em guh bidin Celadet Alî Bedirxanî, ku di pêşgotina kitêba xwe ya bi navê “Elfabêya Kurdî” ku kitêba duyemîn a weşanên Hawarê bû, da weha dibêje:

Bi şeş hejmarên Hawarê ên pêşîn me bin rûpelên elfabê belav kiri bûn. Bi wan rûpelan me hîmê Elfabeya Kurdî didanî û ji xwenda û zanayên kurdan, fikrên wan liser elfabeyê pirsîyar dikirin. Ji ber wan rûpelan sed û pêncîh dest ma bûn. Min dil ne kir ko ew rûpelên ha winda bibin. Min ew dane hev û çend rûpelên din bi ser xistin, û pê kitêbokek hate pê. Ev kitêboka ha, bîra Elfabêya Kurdî a pêşîn e ko nîfşên dawîyê lê fedkirin û pê bizanin ko pêşiyên wan di çi tuneyiyê de elfabêya pêşîn da bûn çap kirin. Ji bona pêkanîna çermê wê diviya bû ko çend rûpelên din bikevin pêşiyê. Bi vê hêncetê min dil kir ji xwedevanên xwe re berpêkirina elfabêya me bi kurtî gilî bikim. Ev elfabêya hanê ko îrû em zmanê xwe pê dinivîsîn paşîya xebateke salinen drêj e. Ez vê elfabeyê ji keda xwe bêtir keda miletê xwe dihesibînim û pêşkeşî wî dikim. Ji xwe herçî yê wî ye, ji yê herkesî hêjatir û spehîtir e.⁵¹

Herweha, em dizanin ku Celadet Alî Bedirxan alfabeya kurdî parçe parçe di Hawarê da weşanîye û piştî, herwekî me destnîşan kir, wekî kitêbokek çap kirîye. Piştî vê

⁴⁹ Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. 90.

⁵⁰ Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. 91.

⁵¹ Celadet Alî Bedirxan, *Elfabêya Kurdî*, Avesta, Stenbol, 2011, r. 1.

kitêbokê jî hinek parçeyên din jî weşandîye. Di van hejmarên destnîşankirî da alfabeya kurdî hatîye weşandin: 1, 12, 17, 18 û 23⁵²

Hem ji bo endîşeya zimanî hem jî ji bo paratîkên standardbûna kurmancîyê, divê em bala xwe bidin şiroveyên Ergin Öpenginî yên di derheqê xebat û karîgerîya Hawarê da:

(...) Lewma, di salên 1930-40an de, bi hewl û xebatên Celadet Alî Bedirxan û komeke roşinbîran li Kurdîstana Sûrîyeyê, bo cara yekem endîşeya plansazîya zimanî ya kurdîyê tê dîtin. Matras (1991) nirxandinekê pêşkêş dîke sebarek bi kiryar û tesîra derdora Hawarê; lê belê divê bi kurtî bê diyarkirin ku di nav çarçoweya xebatên vê derdorê de, bi pîtên romanî û li ser esasê elîfbêya latînî ya tirkî elîfbêyêke kurdî hate duristkirin. Herwiha, xebatên wan (govarên Hawar, Ronahî, Stêr, gramereke berfireh, berhevokên kurteçîrokên, berhemên werger, hwd.) bingehê sîstemeke zimanî ya li ser rêya standardbûnê danîn.⁵³

Herwisa, ji aliyê tesîra Hawarê ku li ser standardbûna kurmancîyê kirîye, Öpenginî nirxandina xwe weha pêşkêş dîke:

Lê belê, tesîra van xebatan kêr bû li ser bikaranîna kurdîyê li Tirkîyeyê. Lewre, meydana siyasî her çî awayekî bikaranîna kurdîyê bi tawan dizanî; lewma, xebatên derdora Hawarê yên li ser (1) hîlbijartina normeke zimanî û (2) tedwîna/kodkirin (codification) qismî bi qonaxên sepandin û sabîtkirina normên zimanî nehatine temamkirin.

Di nivîsareka xwe ya din da Öpenginî nirxandineka weha jî dîke ku bi ya wî, xebatên zimanî yên Celadet Alî Bedirxan û birayê wî Kamûran Bedirxan, ku bi giranî li derûdora kovarên wekî Hawar (1932-1943), Ronahî (1942-45), Roja Nû (1943-46) Stêr (1943-45) pêk hatine, ji bo geşedana bînyadî ya zimanî gelekî giring bûye. Lê dîsa jî, ji ber ku kurdî di qada giştî da qedexe bû, li Tirkîyeyê bandora xebatên wan, heta salê 1990î bisînor bû.

⁵² Arif Zêrevan, "Pêşgotin", *Celadet Alî Bedir-Xan, Elfabêya kurdî&Bingehên gramera kurdmancî, Weşanên Nefel (çapa dijîtal), Stockholm 2002, r. 8.*

⁵³ Ergin Öpengin, *Rewşa kurdî ya sosyolînguîstîk li Tirkîyeyê, Avesta, Stenbol, 2011, r. 80.*

Lê, xebatên Bedirxanîyan di tayînkirina merheleyên normên plansazîya zimanî û kodkirinê da heta radeyekê pêk anîne.⁵⁴

Herwisa, Arif Zêrevan jî di destpêka kitêba Celadet Alî Bedirxan a bi navê “*Elfabêya kurdî&Bingehên gramera kurdmancî*” da weha dibêje: “Wekî ko xwendevan dê ferq bikin ‘Bingehên gramera kurdmancî’ ne timam e, hemî beşên gramere te de nînin. Bo nimûne beşa lêkeran, ya hokeran, ya daçekan, ya hevokazîyê û hinek beşên dî jî kêman in.”⁵⁵

Lê, hewce ye ku em van tesbîtan li yê Opengîn zêde bikin ku wekî din astengiyên ku Hawar lê bi ru bi rû maye, em fam bikin. Bo nimûne Çetin amaje pê dike ku:

Belavkirina çapemenîya Kurdî kêşeyeke pir mezine. Ji dîroka rojnamegerîya Kurdî diyar dibe ku, pêwendiyên di navbera çapemenîya Kurdî û xwendevanên çapemeniyê, her daîm bi tengasî û bi asteng bûye. Ji ber sedemên sîyasî û cografîk carnan bi temamî astengî ber belavkirinê hebûye, carnan jî pir bi sînodar bûye. Kovara Hawar, bi sîstema abonetiye digihîste destê xwendevanên xwe. Abonetî jî bo dewletên Tîrkiye, Îran (Ecemistan), Iraq, Sûriye û Welatên Qefqas dihate çê kirin. (...) Husên Hebeş dibêje: “Li gor belgeyên di destê min da hene Hawar gihîştîye Kurdên Tîrkiye, Îran, Iraq, Suriye û Qafkaskayê. Belavbûna kovare bi gelek rêyan bûye. Ji xwe di Rojavayê welêt bi serbestî belav dibû û bi taybetî herêma Cizîrê xwendevan û nivîskarên Kovare pir bûn. Li Tîrkîyê kovar bi dizî digihîste destên xwendevanan. Xêncî rewşenbîrên Kurd, rojnamevanekî ku li bakûr şeş meha mabû jî agahdar bibû ku kovara Hawar li Sûriyê tê weşandin. Hawar di destpêkê de bi serbestî digihîste destê xwendevanên Iraqê. Mîr Celadet ji dewleta Iraqê destûra rêdana belavkirina kovare standibû. Nêzikî salekî xwendevanên Iraqê bi serbestî û bi awakî rêkûpêk kovar werdigirtin. Nivîskar û rewşenbîrên wê demê bi zêdayî nivîsên xwe yî wêjeyî va kovar dewlemend dikirin. Li li gor mercên awarteyî yên gelê Kurd ew hevkarî zêde dirêj nebû, ji bo belavkirina kovare astengî çê bûn.”⁵⁶

Wekî encama vê beşê, diyar e ku Celadet Alî Bedirxan ji bo bipêşxistina ziman û çanda kurdî hinek endamên endamên Xoybûnê li dora fikra weşandina kovarekê civandin.

⁵⁴Ergin Öpengin, “Türkiye’de Kürtçe’nin durumuna toplumbilimsel bir bakış ve anadilinde eğitim”, https://www.academia.edu/4205659/T%C3%BCrkiye_de_K%C3%BCrt%C3%A7e_nin_durumuna_toplumbilimsel_bir_bak%C4%B1%C5%9F_ve_anadilinde_egitim, r.3-4, TB: 28.12.2022.

⁵⁵ Zêrevan, “hg”. 2002, r. 8.

⁵⁶ Çetin, *hb.* r. 45-46.

Wekî ku li jorê jî hat destnîşankirin, bi vî awayî armanca wî ya sereke, di nav kurdan da pêkanîna hişmendîya neteweyî û avakirina neteweyeka nû bû.

Di serî da, materyalên hînkirina bi zimanê kurdî û bi rêya alfabeya latînî modernkirina zimanê kurdî di rojevê da hebûn. Herwisa, van babetan rê li ber niqaşên li ser zimanzanî, rêziman û zaravayên kurdî vedikir. Celadet Alî Bedirxan ji bo zimanê kurdî rênivîseka bi herfên latînî amade dike û piştî li ser geşedana çanda kurdî hûr dibe; bi bîranîna tradîsyon û folklorê kurdan xwastî ye ku yekîtîya çandî ya kurdan pêk biîne.

Aşkera ye, Celadet Alî Bedirxan ji hejmara ewil ku armancên kovarê aşkera dike, heta dawîyê ew di derbareyê rola zimanî ya di yekîtîya Kurdîstanê da, gelek caran radiweste:⁵⁷

Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas qirin. Lewma qo ziman şertê heyînê ê pêşîn e. Hawar jû pêve bi her tiştî qo qurdanî û qurdîti pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatên re hitiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, hiner û sinhetê de dê bixebitin.⁵⁸

Herî dawî em têdigihîjin ku Hawar ji alîyê mijara me ve li ser hîmên wekî alfabe, rêziman, edebîyata û sazkirina ferhenga kurdî bû. Meseleya îmlayê jî wekî mijareke serbixwe nebe jî di naveroka hejmarên kovarê da şênber e.

Ji alîyê qonaxên ku Haugen destnîşankirîye, rewşa Hawarê bi awayekî giştî, weha bê analîzkirin dê ne şaş be: Di Qonaxa “hilbijartin”ê da zaravayê serdest kurmancî ye. Di qonaxa “kodkirin”ê da Hawar kêma zêde serkeftî ye. Hin mijarên gramer û îmlayê nîqaşbar bin jî, xebatên îroyîn li ser hîmên Hawarê tîna birêvebirin. Lê, li gor nîrxandina me di qonaxên wekî Pêkanîn (implementation) û Hûrgilîkirinê (elaboration) da li gor şert û mercên vê serdemê ev her du qonax pêk nehatine.

⁵⁷ Onen, *hb.* 2018, r. 105-107.

⁵⁸ Celadet Alî Bedirxan, “Armanca Awayê Xebatê û Nivîsandina Hawarê”, *Hawar*, Hejmar 1, Weşanên Nûdem, Stockholm, 1998, r. 1.

Herwisa, ji bo karîgerîya Hawarê li ser çarenivîsa kurmancîyê bê çavderîkirin, divê em li berhem, kovar, rojname, û weşanên ku piştî wê derketine binêrin. Bi kurtî em dikarin bibêjin ku ji alîyê alfabe, rêziman, rastnivîs û ferhengê ve Hawarê reng daye serdemên piştî xwe.

Tê zanîn ku piştî Hawarê bédengîyek dûvdirêj çê bû. Ancax piştî salên 1960-70yê em dikarin behsa xebatên şexsî bikin. Li jor jî hat pêşkêşkirin ku ev sih salên dawî hêjayê baldayîne ye ku em ê li beşê jêrîn vê yekê pêk biînin.

3.2 Pêngava Duyem: Xebatên Piştî Kovara Hawarê

Wekî tevgera zimanî kadroya Hawarê, mîna pêşrewên xwe yê serdema dawî ya Osmanîyan, di warê bipêşxistina zimanê kurdî da çalak bûne. Wekî me li jorê jî destnîşan kir, dîyar e ku di meseleya zimanî da jî berdewamîyek heye. Herwisa, em dikarin bibêjin ku ekola Kovara Hawarê jî bi helwest û xebatên xwe yê zimanî li ser nifşên pey xwe karîger bûye.

Ji destpêka sala 20em û pê ve xebatên rewşenbîrî di qada standardkirina zimanî û nasnameya hevpar da her hebûne. Kadroya Hawarê jî bi serkêşîya Celadet Alî Bedirxanî hewl da ku zimanekî yekbûyî çê bike. Dîyar e ku tevgera zimanî ya serdema Hawarê, li gor pêşrewên xwe, bi plantir bû. Ji bo ku vê armancê pêk were, hewcedarî bi plansazîya zimanî hebû. Hewceyê destnîşankirinê ye ku, ev kadro, di plansazîya satûyê da na, lê, di meseleya plansazîya korpûsê da çalak bû. Bi gelemperî, wekî ku hat destnîşankirin, di warên wekî pergaleka nivîsînê, ferhengsazî û afirandina têgihên nû û weşandina xebatên rêzimanî da, ev serdem, serdemeka berhemdar bû.⁵⁹

Îcar, li gor van pîvanên destnîşankirî, piştî Hawarê, nexasim di qada standardkirina zimanî da çi xebat hatine kirin, ji bo parastin û bipêşxistina kurmancîyê xebatên şexsî û

⁵⁹ Onen, *hb.* 2018, r. 142-143.

dezgehî çî ne, divê bê analîzkirin. Ev yek, îhtîmalek, dê asta standarbûna kurmancîyê, digel serborîya wî, li me ronî bike.

3.2.1 Xebatên şexsî û kolektîf

Li gor honaka (fiction) teza me, em ê xebat û tevgerên şexsî û dezgehî, weki du beşên sereke, ji hev cuda binirxînin.

3.2.1.1 Xebatên şexsî

Di qada standardbûna zimanî da, bêguman, xebatên hin kesayetên kurd jî dîyarker in. Van xebatan di warê alfabe, îmla (orthography), rêziman û ferhengszazîyê da rû dane. Bo nimûne, Celadet Alî Bedirxan, ji van kesan ê herî navdar e û di qada standarkirina kurmancîyê da wekî damezirîner tê qebûlkin.

Îcar, di çarçoveya plansazîya zimanî da, van xebatên navborî, beramberî plansazîya madî (corpus) tîn ku yekser, li gor terîfkirina Einar Haugen, têkildarî qonaxa kodkirinê (codification) ne. Lêbelê, ji ber ku di beşên pêwendîdar da em li ser van qonaxan rawestibûn, niha em ê bala xwe bidin xebatên bi vî rengî yên şexsan.

Celadet Alî Bedirxan: Wekî ku tê zanîn, nîqaşên di derbareyî alfabe-yê da ewilî di dawîya serdema Osmanîyan da rû didin. Bo nimûne,

Li nav kurdan bi awayekî ciddî nîqaşên derbarê alfabe-yê da, di kovara Rojî Kurd(1913) da hatine kirin. Abdullah Cevdet di nivîsa xwe ya “Xîtabek” da qala rewşa kurdan û meseleya alfabe-yê dike û ji bo çareserîya rewşa kurdan a xerab weha dibêje: ‘A ewil divê rêjeya xwendin û nivîsînê bi kêmanî bibe ji sedî çil. A dudan, qebûlkirina herfan e ku zarokê heft-heşt salî herî zêde di mehekê da hînî xwendin û nivîsandinê û rastxwendina tiştên dixwîne bike û terkkirina wan herfan e ku heta niha me ew bi kar tanîn.’⁶⁰

⁶⁰ Mikail Bülbül, “Weke Qada Rengvedaneke Neteweperwerîyê di Pratikên Tirk û Kurdan de Nîqaşên Li Ser Alfabe-yê”, Amd. Nüket Esen, Ramazan Çeçen, *Sempozyûma Edebîyata Berawirdî “Ji Duh Heta Îro Di Edebîyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî”*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mêrdîn 2015, r. 179.

Herwisa, Xelîl Xeyalî jî di 1913an da di nivîsa bi navê “Ziman” da dibeje deh tişt hene ku kurd lazim e bikin. Di wê nivîsê da du madeyên ewilî ev in: “1. Ji bo xwendin û nivîsandinê herf 2. Ser terzek nû alîfbayek”.⁶¹ Dîyare ku paşxaneya dîrokî ya pîrsa alfabe yê hebû û Celadet Alî Bedirxan jî wekî xelesa herî giring û damezirîner xwe dide der û piştî demekê vê pîrsê çareser dike.

Bi vegotina Bülbül, “Celadet Alî Bedirxanê ku alfabe ya Latînî ku em îro bi kar tînin çêkirîye dema qala yekîtiya neteweyî ya kurdan dike (1932) ku wê çawa çêbibe, “Yekbûna kurdan jî bi yekîtiya zimanê kurdî çêdibe. Yekîtiya zimanî jî bi yekîtiya herfan dest pê dike” dibêje.⁶²

Aşkera ye ku Celadet Alî Bedirxan ev alfabe ji bo zaravayê kurmançî saz kiribû, lê, wekî ku di Hawarê de jî diyar dibe, ev alfabe dê ji bo zaravayên din jî, ku di serî da soranî tê, bihataya bikaranîn.⁶³

Ji bo mijara alfabe yê ya Celadet Alî Bedirxanî Sevda Orak Reşitoğlu jî weha dibêje:

Em dikarin sala 1932yan wek şoreşa alfabe û nivîsa kurmançî bihesibînin, lewre di wê salê de ye ku Celadet Alî Bedirxan alfabe ya xwe ya ku bi salan bû li ser dixebitî, di Hawarê de weşand. Lê ev alfabe ne halê dawî bû, lewre nîqaşên wê di Hawarê de berdewam bûn, bi taybetî li ser herfên “q” û “k”yê di çend hejmaran de nivîs hebûn. Lê dawîya dawî ev mesele jî hat çareserkirin û îro jî em alfabe ya ku Celadet Bedirxan danî bi kar tînin.⁶⁴

Wekî li jorê jî hat derbirîn ku standardkirina zimanekî bi piştgiriya dewletê û avakirina sazî û komîsyonyonan encameka baş diwelidîne, lê, dîyar e ku rewşenbîrên serdema Hawarê, vê yekê bi “kovarekê” pêk anîne. Ango Celadet Alî Bedirxanî vî karê radîkal hilgirtîye ser milên xwe, û li gel hevalên xwe kovareka nû ya bi navê Hawarê derxdixe û digel xebatên rêzimanî û ferhengî, alfabe ya latînî bi kar diîne.

⁶¹ Bülbül, “hg”. 2015, r. 179.

⁶² Bülbül, “hg”. 2015, r. 177.

⁶³ Aydoğan, “hg”. 2013, r.30.

⁶⁴ Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. i.

Herweha, li gor lêkolîna Orak Reşitoğlu,

Hawar ne tenê kovareke edebî ye ku tê de helbest û çîrok têne dîtîn, her wiha wek pirtûkeke dersê ye ku di gelek hejmaran de herfan dide nasîn û qaydeyên zimên vedibêje di bin banê rêzimanê de. Ev jî nîşan dide ku derdê Celadet Bedirxan ne tenê ew bû ku gelê kurd hînî xwendin û nivîsandinê bibin, wî dixwest bila gelê wî qaydeyên zimanê xwe jî bizane û li gorî wê binivîse. Ev xebata rêzimanî ya Celadet Bedirxan îro bingeha rêzimana me ye.⁶⁵

Li gor veguhastina Orak Reşitoğlu, “alfabeya Celadet Bedirxan ji sih û yek herfan pêk tê. Alfabeya wî ewil bi vê rêzê hatiye dayîn û tenê bi herfên hûrdek in: a b c e ç d i g h x ê j î k q u l m n o p r s ş t û f v w y z

Piştî rêza herfên hûrdek hatiye guhartin bi vî awayî:

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z”⁶⁶

Sevda Orak Reşitoğlu lê zêde dîke:

Kovara Hawarê di serî de alfabeyê bi awayê herfên hûrdek dide. Di hejmara 25an de ji ber daxwaza xwîneran destnivîsa alfabeyê bi herfên girdek û hûrdek diweşîne. Lê di alfabeyê de, ya bi şeweyê herfên girdek tenê 28 herf hene, /Ê/, /Î/, /Û/ jê kêma in, her çî qas di ya bi awayê hûrdek de hebin jî. Lê belê di hejmara 27an de, di beşa rêzimanê de herfên hûrdek û girdek hatine nasandin û di yên girdek de ev her sê herf hene.⁶⁷

Herwisa, em fam dikin ku, “Mîr Celadet Alî Bedir-Xanî elfabeya kurdîyê parçe-parçe di ‘Hawarê’ de weşandiye û paşê jî ew wekî kitêbok derêxistiye. Piştî ko wî elfaberya kurdîyê wekî kitêbok derêxistî jî hinek parçeyên dî di ‘Hawarê’ de weşandine.”⁶⁸

Hêjayê destnîşankirinê ye ku alfabeya kurmançî ya latînî ku Celadet Alî Bedirxanî saz kirîye, nêzikî ya tirkî ye. Vê yekê ji bo kurdên Tirkîyeyê fêrbûna alfabeyê hêsantir kirîye.

⁶⁵ Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. 116.

⁶⁶ Orak Reşitoğlu, *hb*. 2022, r. 105.

⁶⁷ Orak Reşitoğlu, “hg”. 2022, r. 106.

⁶⁸ Zêrevan, “hg”. 2002, r. 8.

Îbrahîm Seydo Aydogan jî di derheqê gramerê da amaje bi giringîya Celadet Alî Bedirxan, dike:

Dibe ku mirov bibêje qey girîngiya Celadêt ji gramera wî û alfabe ya latînî tê. Lêkolîn me aşkere dikin ku bi rastî jî gramerên ku îroj têne nivîsandin hê jî ne ew qasî têr in ku gramera Celadêt bidin jibîrkirin û hemû jî di bin siya wê de dimînin.⁶⁹

Arîf Zêrevan ku di pêşgotina jinûveçapkirina kitêba “*Elfabeya kurdî û Bingehên gramera kurdmançî*” da weha derdibirîne:

Mîr Celadet Alî Bedir-Xan ji 14 salan pirtir li ser elfabe ya kurdî xebitiye û ew li gor denganiya zimanê kurdî edilandiye. Wî dengên hemî zaravayên kurdîyê baş nas dikirin û baş dizanî ka çi birha (tehsîra) denganiya zimanên biyanî li denganiya kurdîyê bûye.⁷⁰

Wekî ku em ji “pêşgotin” a navborî têdigihîjin, parçeyên alfabe ya kurdî di Hawarê da di pênc hejmaran da hatîye weşandin. Herwisa Celadet Alî Bedirxan “Bingehên gramera kurdmançî” jî parçe parçe di van hejmaran da weşandiye: 27-35, 37, 40, 42-48, 50-51 û 53-54. Zêrevan amaje pê dike ku kitêba “Bingehên gramera kurdmançî” bi kurmançî hatîye ravekirin. Û herweha kitêba behskirî tamam nîne. Lewra hemû beşê gramerê tê da cih negirtine. Awayê kitêbê yê kamil ji aliyê Roger Lescotî ve bi ravekên frensî hatîye çapkirin.⁷¹

Îro “gramera kurmançî” bi awayekî tekûz û çapkirî peyda dibe. Li gor Roger Lescot, ku ew jî yek ji nivîskarên Hawarê û rojhilatnasekî fransî bû, ev xebat xwe dispêre keda Celadet Alî Bedirxanî ya 20 salî. Xuya ye ku bi hevkarîya Celadet Alî Bedirxanî û Roger Lescotî xebata rêzimanê heta radeyekê hatîye. Kêmanîyên xebatê, piştî wefata Celadet Alî Bedirxanî ji aliyê Roger Lescotî ve tînin temamkirin. Bi awayekî tekûz di sala 1970an da bi navê “Grammaire kurde (Dialecte kurmandji) tê çapkirin.⁷²

⁶⁹ Aydogan, “hg”. 2013, r.27.

⁷⁰ Celadet Alî Bedir-Xan, *Elfabeya kurdî & Bingehên gramera kurdmançî*, Nefel, (Çapa Dîjîtal) Sweden, 2002, r.7.

⁷¹ Zêrevan, “hg”. 2002, r. 8.

⁷² Celadet Alî Bedirxan- Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, Avesta , İstanbul, 2009, r. vi-vii.

Şehmus Kurt jî di nivîsara xwe da, vê berhema navborî weha analîz dike:

Celadet Alî Bedirxan wek avakar û pêşengê rêzimana Kurdiya Kurmancî tete nasîn û nêrînên wî bûyîne bingeha gelek xebatên ziman û rêzimanî ên piştî wî (Akin, 2013; Aydoğan Î. S., 2013). Ev pirtûka Celadet Alî (Bedir-Xan, 1998) ji aliyê Arif Zêrevan ve hatiye amadekirin û berhevoka nivîsên Celadet Alî Bedirxan ên kovara Hawarê ne. Zêrevan ew nivîsên ku di wextê xwe da ji aliyê Celadet bixwe ve jî hatine weşandin, yekûyek bêyî guherandin wergirtine nava pirtûkê û jê re pêşgotinek nivîsîye ku tê de armanca xwe û rêbaza xwe ya berhevkirina vê pirtûkê tîne ser zimanî. Pirtûk bi temamî 122 rûpel e û ji bilî pêşgotinê ji sê beşan pêk tê. Beşa ewil Elfabeya Kurdî ye û nivîsên Celadet ên li ser danasîna elfabeya kurdî di vê beşê da ne. Beşa duyem Bingehên gramera kurdmancî ye ku mijarên rêzimana Kurmancî pêşkêş dike. Beşa sêyem jî Servehî ye ku Zêrevanî cih daye hinek nîqaşên rêzimanî.⁷³

Kemal Badilli: Kemal Badilli siyasetmedar û zimannasekî kurd e ku di sala 1923yan de li bajarê Ruhayê ji dayik bûye. Dibistana seretayî û ya navîn li Ruhayê, lîseyê jî li Qabataşa Stenbolê dixwîne, paşê dîsa li Stenbolê Fakulteya Hîquqê ya Zankoya Stenbolê diqedîne û dibe parêzer. Di hîlbijartinên sala 1961ê da ji “Partiya Tirkiyeya Nû (Yeni Türkiye Partisi) dibe parlementer û diçe Enqereyê, ji xeynî mebûsiyê li ser zimanê kurdî gelek serê xwe diêşîne û di sala 1965an da pirtûka xwe ya bi navê “Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer - Kurmancî diweşîne her weha helbestên wî jî hene û di sala 1975an da diçe ber dilovanîya Xwedê.⁷⁴

Li gor vegotina Ronayi Önen Baykuşakê, Ev pirtûka navborî, wekî yekem pirtûka rêzimanê ya li ser zaravayê kurmancî, tê zanîn ku di serdema komarê de li Tirkiyeyê hatiye çapkirin. Nivîskar di pêşgotinê da dibêje ku ji salên lîseyê, dest bi xabatê dike. Ew dîyar dike ku berhem encama xebateka dûvdirêj e. Herweha, behsa cudahiyên devokên zaravayê kurmancî dike û dîyar dike ku wî di pirtûkê da bi giranî devoka Cizîrê bi kar anîye.⁷⁵

Herweha,

⁷³ Şehmus Kurt, “Hilsengandinek li Ser Pirtûkên Rêzimana Kurmancî ji Aliyê Rêbazên Hînkirina Rêzimanê ve”, Nûbihar Akademî, Cild 4, Hejmar 14, 2020, r.54-55.

⁷⁴ https://ku.wikipedia.org/wiki/Kemal_Badilli, TB.: 01.11.2022

⁷⁵ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 154.

Ev pirtûk bi navê Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer(Rêzimana Kurdî ya Bi Şîroveya Tirkî) li ser rêzimana Kurdî ye. Ji alîyê Kemal Badilli ve hatîye nivîsîn û di sala 1965an cara pêşîn hatîye çapkirin. Kemal Badilli hewl daye ku gramera zimanê Kurdî bi Tirkî şîrove bike.⁷⁶

Musa Anter: Nivîskar, helbestvan û rojnamevanekî kurd e. “Diyar min digot, ‘Piştî Fermana Fileha tu hatîdinyayê.’ Ji ber ku komkujiya Ermeniyana di sala 1915an de destpêkir û di sala 1917an de qediya. Ez dikarimbibêjim ku yan 1917 yan jî di 1918an de hatime dinyayê.”⁷⁷ Anter li gundê Zivingê (Nisêbîn) hatîye dinyayê. Wî hîn di temenekî piçûk da, bavê xwe wînd kir û li ber destên dayika xwe Fesla Anter mezin bû. Dibistana xwe ya seretayî li Mêrdînê û ya navîn û lîseyê li Edenê qedandibû. Piştî xwendina lîsê jî bo felsefeyê bixwîne diçe Stenbolê û di zanîngehê de, gelek xwendevanên kurd nas dike. Anter li ser daxwaza Fayîq Bucak dev ji felsefeyê berdide û qeyda xwe li beşa hiqûqê çê dike. Di gelek kovar û rojnameyan da nivîsar û serpêhatiyên wî têne weşandin. Roja 20ê îlona sala 1992an li Dîyarbekirê tê kuştin.⁷⁸

Xebata wî ya zimanî ku bi navê “Ferhenga Khurdî-Tirkî” hatîye weşandin, “ di sala 1963yan şûnde li girtîgeha Enqerê ya Mamakê dinivîse. Qasê 11 hezar peyvan di xwe de dihewîne. Piştê ku ji girtîgehê dertê di sala 1967an de diweşîne. Taybetiya vê ferhengê ew e ku tu çavkanî, pirtûk, ferheng û tiştên hwd. di destê Apê Mûsa de tunebûne û wisa nivîsiye.”⁷⁹

Herweha, li gor derbirîna Ümit Işık:

Di rêzkirina vê ferhengê de hevalekî wî ji Hewlêrê Cemal Alemdar alikariya wî kiriye. Gelek di zorî, nexweşî û şertên dijwarî de nivîsiye. Ferheng jî 11.000 peyvan pêk tê. Vê ferhengê jî bo hevalê xwe yê Faîk Bucak ku li rihayê hatiye şehîd kirin diyar kiriye. Di pêşgotina ferhengê de bahse astengiya xwe kiriye: ‘Gelekî di zorî, ne xweşî û tuneye da min ev ferheng nivîsî. Li ber çava ferhengek kevn nînbû û bi serda jî ez de bendexanê, qul û qulêra da bûm. Ji ber vê yeke, wê kêmaî û ne li rêyê min

⁷⁶ Mülazım Özcan, *Di Salên 1980-2000an De Li Tirkîyeyê Rewşa Ziman û Edebîyata Kurdî û Têkiliya Wan Li Gel Teverên Civakî Yên Kurdistan, Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Van, 2018 (Teza Masterê ya Çapkirî)*, r. 36.

⁷⁷ <https://candname.com/bi-zimaneki-nayezanin-danasina-zanayeki-ape-musa/>, TB: 01.11.2022.

⁷⁸ https://ku.wikipedia.org/wiki/Musa_Anter, TB: 01.11.2022

⁷⁹ <https://candname.com/bi-zimaneki-nayezanin-danasina-zanayeki-ape-musa/>, TB:01.11.2022

hebin. Ji xwe ferheng, bi jînêra dighin û distewin. Ev ferhengêd xelkê î pêşda, 10-15 caran hatine çapkirin û de her carê da kêmaî û ne li rêzî û ne li rêyên wan, rast kirine. Go ez mam sax, yan xwedyêddin, hey bi caran ji nûda emê vê ferhengê çap bikin. Wekîdin ez bahwer dikim ku ev ferheng, ji welatyên min î Tirkîyê ra sûde (fêdeye). Ji nêzik va zanim go bi milyona velatî ji ber go ji zimanêhev nizanin, bir kulin. Bi vê ferhengê û bi pey vê da a go ezê çap bikim (Ferhenga Tirkî- Khurdî) go piçkokî kulêd wan sivik bibin, ezê pir baxtiyar bibim. Zanînekî vekirîye go mirov bi zarê hev nizanibin hînê hev nabin.’ (Anter,1967: 4).⁸⁰

M.Emin Bozarşan: Bozarşan, di sala 1935an da, li Lîceyê (Dîyarbekir) ji dayîk bûye. Piştî xwendina xwe temam kirîye, dest bi meletiyê kirîye. Dû ra li wê herêmê, dest bi muftî kirîye. Piştî sala 1979an derket derveyî welêt, li Swêdê bi cih bû û xebatên xwe li vî welatî domand.

Pirtûka ewil a Bozarşan ya bi Kurdî, ‘Alfabe’ ye. ‘Alfabe’, di sala 1968an de li Stenbolê hat çapkirin. Ev pirtûk, yekem pirtûka alfabeyê ye ku bi herfên latînî li Komara Tirkîyeyê hatiye çapkirin. Herwisa, çapa duyem a ‘Alfabe’yê jî di sala 1980an da, li Swêdê çêbû. ⁸¹

Em dizanin ku Bozarşan wekî nivîskar, lêkoler û wergêr ji bo zimanê kurdîya kurmancî xebatên bêhempa kirine. Di destpêka “Alfabe”ya xwe da weha dibêje: “Amanca vê Alfabê ev e ku bi awakî hêsan xwendin û nivîsînê hînê xelkê, xasma hînê xortan bike. Lê divê ku ev hînkirin bi alîkarîya xwendayan bê pêkanîn. Lewra xelk jî ber xwe ve nikare hînê xwendin û nivîsînê bibe.”⁸²

Arîf Zêrevan: Nivîskar, lêkoler û zimannasekî kurd e. Di derheqê Zêrevan da, di berhema wî ya bi navê Bingehên Rastnivîsandina Kurdîyê (kurmancî) da weha tê gotin:

27-ê kanûna paşiyê sala 1965-ê li Kurdîstanê hatiye dinyayê û wî di ber xwendina ya nêvê û lîseyê re li nik babê xwe dersên gramera zimanê erebî, hedîs û tefsîr xwendiyê. Ew îlona 1986-ê, 21-salî, wekî mişextî çûye Swêdê û li wêderê bi cih bûye. Wî Fakûlteya Rojnamevaniyê li Ûniversîteya Stocckholmê xilas kiriye û paşê jî

⁸⁰ Ümit Işık, “Lêkolînek Li Ser Ferhengên Kurdî (1655-1990)”, *anemon, Muş Alparşan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Cilt 3, Sayı 1, Haziran 2015, r. 164-165.

⁸¹ https://ku.wikipedia.org/wiki/Mehmed_Em%C3%AEn_Bozarşan , TB:03.11.2022.

⁸² M.Emin Bozarşan, *Alfabe*, İstanbul, 1968, r.3.

salekê li televîzyona Swêdê, Sveriges television, xebitiye. Ev kitêb berhema wî ya pêşiyê ye ko dikeve destê xwendevanên kurd.⁸³

Wekî ku hat behskirin ku “rastnivîs” (îmla) ji bo standardkirina zimanekî roleka sereke hildigire. Lewra, bi qebûlkirin û belavkirina rastnivîsînê, fêrbûn û fêrkirina rêbazên zimanî hêsantir dibe.

Arif Zêrevan jî ji van kesan e ku di qada zimanî da xebatên binirx kirine. Ji bo berhema wî Orak Reşitoğlu weha dibêje:

Berhema Arif Zêrevan ya bi navê Bingehên Rastnivîsandina Kurdîyê (kirmancî) di sala 1997an de li Swêdê çap bûye. Zêrevan dibêje hin zimanên wek îngilîzî û tirkî xwe dispêrin tradîsyonan. Lê yên wek fransî û swêdî jî xwe dispêrin rêbazên gramerê ku Celadet Alî Bedirxan jî wiha kiriye, her wiha dibêje wî jî xwe spartiyê rêbazên gramerê.⁸⁴

Xuya ye ku Zêrevan li gor termînolojîya ku Celadet Alî Bedirxanî bi kar anîye, tevgerîyaye. Di pêşgotina berhema xwe da armanca nivîsîna vê kitêbê weha derbiriye:

Di dawîya salên heştîyê de ez pê hesiyam ko di warê rastnivîsandinê da tevilheviyek heye. Hemî kovar û rojnameyên bi kurmanciyê derdiketin wekî êk nedinivîsîn û her niviskarekî/ê bingehên rastnivîsandina wî zimanê biyanî yê ko wî/wê dizanî bi kar tanîn. Ji bo tesbîtkirin û pêşniyarkirina hinek bingehan ji kurdîyê re, min sibata 1995-ê dest bi lêkolînekê kir. Min ewilî bingehên rastnivîsandina zimanê farnsî, ingilîzî, swêdî û tirkî peyda kirin. Paşê jî min hemî hejmarên <Hawar>, <Ronahî> û <Roja Nûyê> bi hûrahî berçav kirin, da bizanim ka Celadet Alî Bedir-Xan û birayê wî Kamiran Alî Bedir-Xan çî bingeh bi kar anîne.⁸⁵

Herweha, Zêrevan ji bo rêbaza xebata xwe, vê yekê lê zêde dike: “Di vê kitêbê de, hingî ji min hatiye, min termînolojiya Celadet Alî Bedir-Xan, bi kar anîye. Heger min kurdiya termekê peyda nekiribe, min navekê raveker jê re dîtiye û ji ferhengokan diyar dibe ka me’neyên wan çî ne.”⁸⁶

Berhema Zêrevanî ji 160 rûpelan pêk tê û di dawîya kitêbê da “ferhengok”ek kurdî-ingilîzî-swêdî-tirkî heye.

⁸³ Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdîyê (kirmancî)*, Nefel, Stockholm 1997, r. 16.

⁸⁴ Orak Reşitoğlu, *hb.* 2022, r. 170.

⁸⁵ Zêrevan, *hb.* 1997, r. 13-14.

⁸⁶ Zêrevan, *hb.* 1997, r. 14.

Herî dawî nirxandina Ergin Opengin jî hêjayê kirpandinê ye: “ Lê xebateke xweser ya bi rengê rêbereke rênivîsê encax sala 1997an derçû, ku *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (kirmancî)* ya Arif Zêrevanî bû. Xebata Zêrevanî li ser xalên bingehî yên rênivîsê (nivîsîna navên millet, ziman, dîn, hwd.) her li dû qaîdeyên *Hawarê* bû; bi rengêkî, birojkirin û berfirehkirineke wan bû ku hin aliyên nû yên nivîsevanîyê jî bi xwe ve bigire.”⁸⁷

Dr. Kamuran Alî Bedirxan: Kamuran Alî Bedirxan birayê Celadet û Sureyya bû. Di 21ê tebaxa 1895an de li Stenbolê hatiye dinyayê. Wî li Almanyayê hiqûq xwend û piştê doktoraya xwe ya hiqûqê jî da. Piştî jîyana wî ya Şamê li Beyrûtê bi cih bû û li wir parêzerî kir. Ji bilî ku gelek nivîs û wergerandinên wî di kovara *Hawarê* de hatine weşandin, wî di sala 1943an de li Beyrûtê rojnameyên *Roja Nû* û *Stêr* derxistin. Piştê çû Parîsê li wir di sala 1948an de bû mamostayê Institut national des langues et civilisations orientales (INALCO) ê. Kamuran Alî Bedirxanî ku hemû jiyana xwe dabû çand, ziman û wêjeyê kurdî, di sala 1978an da li Parîsê wefat kir.⁸⁸

Berhema bi navê “*Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*” li ser ziman û gramera kurmancî di sala 1977an de li Tirkîyeyê hatiye çapkirin. Kitêb ji aliyê Kamuran Bedirxan ve hetîye amadekirin. Li gor derbirîna weşanger,

Dr. Kamuran Ali Bedirxan vê pirtûka rêzimanê ya biçûk ku ji aliyê wî ve hatiye amadekirin, cara yekem di sala 1974an de di nav weşanên Kovara Ronahî (Ronahî) da ku li Swîsreyê derdiket, hatiye weşandin. Di vê pirtûka ku, bi zaravayê Kurmancî hatiye amadekirin, da, bi kurtî rêzîkên zimanê kurdî hatine dayîn.⁸⁹

Kemal Burkay: Burkay,

Helbestvan û siyasetmedarekî kurd e. Di sala 1937an da li Dêrsimê, qeza Mêzgirê, gundê Dirban ji dayîk bûye. Di sala 1956an da îmtihanên lîsê jî da û li fakûlteya Huqûqê, li Enqerê qeyd bû. Him li gundan mamostetî kir (du sal li Kurdistanê,

⁸⁷ Ergin Öpengin, “Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdeçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydoğan”, *Derwaze*”, Hejmar 1, Stenbol, 2017, r. 181.

⁸⁸ İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbihar, İstanbul, 2014, r.93.; https://ku.wikipedia.org/wiki/Kamiran_Al%C3%AE_Bedirxan, TB: 01.11.2022

⁸⁹ Kamuran Ali Bedirxan, *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*, Özgürlük Yolu, 1977, r.5.

gundekî Wanê, salekî jî li gundekî Enqerê) him jî kete îmtihanên huqûqê. Huqûq jî di sala 1960 da xilas kir. Heta niha jî 30 zêdetir pirtûkên wî û bi dehan jî brûşûrên (pirtûkîk, yan jî pirtûkên piçûk, bin sed rûpelî) wî çap bûne.⁹⁰

Di destpêka kitêba Kemal Burkayî (Baran) ya çapa dijîtal da weha tê gotin:

Ev ‘Dersên Zmanê Kurdî’ yek ji berhemên Kemal Burkay e. Berî sala 1980 li welat hatibû hazirkirin û cara peşîn, li der welat di sala 1980 da dest pê kir û di Dengê KOMKAR da û bi navê ‘Baran’ meh bi meh hat weşandin. Piştra di sala 1988 da di nav weşanên Roja Nû da wek kitêb çap bû. Piştî wê jî li ‘stambolê’ di nav Weşanên Deng da derket, eleqeyek mezin dît û giha çapa çaremîn.⁹¹

Di derbareyê vê berhemê da hewce ye ku em serî bidin lêkolîna Orak Reşitoğlu ku mijarê zelaltir bike:

“Berhema Dersên Zmanê Kurdî ya Kemal Burkay cara ewil di 1988an de li Stokholmê çap bûye. Çapa li ber destê me ya şeşemîn e ku di 2004an de li Stenbolê derketiye. Her çî qas navê wê bi kurmancî jî be, vegotina berhemê bi tirkî ye.

Em nikarin bibêjin ku ev berhemeke rastnivîsê ye. Berhem, tevî metnên kurmancî cih daye peyvên kurmancî-tirkî û her wiha mijarên rêzimanê. Ji alfabe yê dest pê dîke, bi kişandina lêkeran, hîndekariyan û bikaranîna hevokan berhem geş bûye.”⁹²

Halil Aktuğ: Nivîskar “li bajarê Şirnex li navçeya Basa (Güçlükonak) di sala 1954an de hatiye dinyayê. Xwendina dibistana sereke li Basa, dibistana navend, lîse û xwendina xwe ya zanîngehê li bajarê Sêrtê û li Eskişehirê tamam kir.”⁹³

Herwisa, Nivîskar di qada kurdî da xwedî du berheman e. Di derheqê berhema wî ya “Rastnivîsa Kurdî” da em ê careka din, wekî çavkanî, pala xwe bidin xebata Orak Reşitoğluyê ku weha derbiriye: “ Yek ji rastnivîsên ku piştî Celadet Bedirxan derketiye

⁹⁰ https://ku.wikipedia.org/wiki/Kemal_Burkay, TB: 31.10.2022

⁹¹ Kemal Burkay, *Dersên Zmanê Kurdî, Roja Nû*, <https://www.tirsik.net/danegeh/pirtuk/kemal-burkay/Dersen%20Ziman%20Kurdi.pdf>,), r.1, TB: 31.10.2022.

⁹² Orak Reşitoğlu, hb. 2022, r. 174.

⁹³ https://www.avestakitap.com/index.php?p=Products&wrt_id=10124, TB: 31.10.2022

Rastnivîsa Kurdî (Kurmancî) ya Halil Aktuğ e ku di 2019an de ji weşanên Sîtavê derketiye. Ev berhem hem bi kurmancî, hem bi tirkî hatiye vegotin, ango beranberî her rûpeleke kurmancî, yeka tirkî heye. Berhem 533 rûpel e, lê mijarên rastnivîsê heta 165an e, ji 166an pê ve heta dawiya pirtûkê li gorî rêza alfabeyê peyv hatine dayîn. Lê armanca vê ne diyar e, lewre ne ferheng e, ango hemberî peyvên raveyeke bi kurmancî an jî tirkî tune ye. Bi tenê peyvên kurmancî hatine rêzkirin.”⁹⁴

Berhema Aktuği ya din jî bi navê “Gramera Kurdî (Kurdî-Tirkî) – Kûrtçe Gramer (Kûrtçe-Türkçe), ji aliyê Weşanxaneyê Avestayê ve di sala 2013an da hatîye çapkirin. Kitêb 496 rûpel e. Di danasîna kitêbê da ji nivîskar weha hatîye gotin:

Mereq bû ji re ka zimanî kurdî çi demî bi kîjan medeniyet û bajarvaniyê gahaye vê astê û rêzimana kurdî hatiye serastkirin. Ji ber vê mereqa xwe demeke dirêj li ser rêziman û gramera kurdî rawestiya. Ev kitêba di destê we de berhema xebata wî ya li ser gramere ye.⁹⁵

Di derheqê vê berhemê da Şehmus Kurt weha dibêje:

Zimanê vegotinê yê pirtûka Aktuğ, Kurdiya Kurmancî û Tirkî ye. Ji serî heta dawiyê rûpelek bi Kurmancî hatiye vegotin, paşî li rûpelê hember heman mijar bi zimanê Tirkî hatiye vegotin. Di pirtûkê tu metnên xwendinê û rahênan nînin lê dîsa jî mirov dikare vê pirtûkê ji yeka zimannasiyê wêdetir, pirtûkeke hînkirina rêzimanî bihesibîne ji ber ku wek rêbaza hînkirinê li vê derê rêbaza wergera rêzimanê (grammar translation method) hatiye bikaranîn.⁹⁶

Mistefa Aydoğan: Nivîskar û zimannasekî kurd e. “di sala 1957an de li gundê Qelaçiyê (Dîneser-Mêrdîn) bûye. Piştî xwendina xwe ya dibistana mamostatîyê û ya li enstîtuya perwerdeyê, li derûdora Dîneserê pênc salan mamostefî kir. Bi Kûdetaya 12ê Îlonê ra daket Binxetê û heta çûna xwe ya ber bi Swêdê û li wê derê mafê penaberîyê wergirt. Li Swêdê li Unîversîteya Uppsalayê beşa tercimanîyê qedand û li Unîversîteya

⁹⁴ Orak Reşitoğlu, *hb.* 2022, r. 178.

⁹⁵ https://www.avestakitap.com/index.php?p=Products&wrt_id=10124, TB: 31.10.2022

⁹⁶ Şehmus Kurt, “hg”. 2020, r.58.

Stockholmê beşê zimannasîyê xwend. Bi dû ra jî li Unîversîteya Uppsalayê beşê zimannasîyê û filolojîyê qedand.⁹⁷

“Rêbera Rastnivîsîn”ê ya nivîskar, di sala 2012an da ji alîyê Weşanxaneya Rûpelê ve, li Stenbolê, tê çapkirin. Zimanê kitêbê, kurdîya kurmancîye û ji 298 rûpelan pêk te. Ji navê berhemê jî dîyar e ku, li ser rastnivîsa kurmancî hatîye amadekirin.

Em dikarin bibêjin ku ji bo amadekirina kitêbê, motîvasyona nivîskarî di van hevokan da dîyar e:

Ji bo nivîsîneka baş, birêkûpêk, fambar û herweha ji bo berlêgirtina tevlihevî û sergêjîyan qayîdeyên zelal –çi yên ku xwe bispêrin rêzimanê, çi jî yên ku xwe bispêrin hevîkîrî û lihevîkirinê- şert in. Lewra gava ku qayîdeyên rastnivîsînê yên li ser bingehên navbirî hebin, xwendin hêsantir û zelaltir dibe. Rê li ber têgihîştinên şaş venabe. Herweha naveroka zimanê nivîskî jî bi mebesta xwe ra guncayî dihê ragihandin.⁹⁸

Herweha ji bo vê xebatê jî di gotara xwe ya navborî da Ergin Opendin weha dibêje:

Rêbera Rastnivîsînê (bi kurtî Rêber), bi berfirehiya naveroka xwe ve, wisa hatiye amadekirin ku bibe referanseke tekûl û giştgir ji bo meydana nivîsîna bi kurmancî, çi di asta şexsan de çi di asta dezgehên çap û weşanê de. Hevterîb li gel vê armanca xwe, berhemê ji têbînî û fikrên çend pisporên din ên zimanê kurdî jî istifade kiriye. Rêbera Aydoganî ji bo pîraniya xal û pirsên dubendîdar yên nivîsîna bi kurmancî awayên standard pêşniyaz dike û bi berfirehiya xwe ya mijaran ve xîtabî bikarhînerên muxtelîf dike.⁹⁹

Di vê keliyê da, hêjayê destnîşankirinê ye ku xebata nivîskarî, dê ji bo “Rêbera Rastnivîsînê” ya Weqfa Mezopotamyayê ku ji alîyê “Komxebata Kurmancîyê” ve hatîye amadekirin, bibe bingeh ku am ê li jêrê li ser vê babetê rawestin. Herweha, ew jî yek ji endamên Komxebata Kurmancîyê ya Weqfa Mezopotamyayê ye.

Samî Tan: Nivîskar û zimannasekî kurd e. Bi vegotina Nivîskarî,

Samî Tan di sala 1965an da li gundê Axçelîyê yê bi ser navçeya Kolikê ya Semsûrê ve çavên xwe li vê cîhana gewrik vekirine. Xwendina xwe ya seretayî, navincî û amadehî li bajarê Mersînê kuta kiriye. Di sala 1986an da li Zanîngeha Bogazîçî di

⁹⁷ Mistefa Aydogan, *Xemname*, Lîs, Ankara, 2020.

⁹⁸ Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, Rûpel, İstanbul, 2012, r. 20.

⁹⁹ Öpendin, “hg”. 2017, r. 181.

beşa dîrokê da dest bi xwendina bilind kiriye. Lê belê ew beş nîvçe hiştiye, di sala 1992yan da pêşî bi pardemî li Rojnameya Yenî Ulkeyê, paşê di tîrmeha 1993yan da bi awayekî profesyonel di Rojnameya Welat da dest bi rojnamegerîya kurdî kiriye. Piştî girtina rojnameya Welat, di beşa nûçeyên cihanê ya Rojnameya Ozgur Ulkeyê da xebitiye. Di rojnameyên Welatê Me û Azadiya Welat da wekî edîtor xebat kiriye. Ji sala 1997an heta 2005an wekî gerînendeyê giştî û sernivîser di rojnameya Azadiya Welat da xebat kiriye. Gotarên wî di gelek rojname û kovarên kurdî da hatine weşandin. Di sala 2002yan da wekî serperîştê beşa kurdî û berpirsê karê nivîsaran ê Ajansa DÎHAYê kar kiriye. Ji sala 2007an heta 2016an wekî rêveber û serok di Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê da xebatên lêkolînî û akademîk pêk anîne. Di kovara Zendê da bi dehan gotarên wî yê lêkolînî hatine weşandin. Tan derçûyê beşa Ziman û Wêjeya Farisî û Beşa Zimannasîyê ya Zanîngeha Stenbolê ye. Her wiha di 2016an da jî li Zanîngeha Artûklûyê di beşa Ziman û Çanda Kurdî da lîsansa bilind a bitez kuta kiriye.¹⁰⁰

Rêzimana Kurmancî (2011) ya Samî Tan,

Berê bi navê Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî, di sala 2005an da hatibû çapkirin. Ev çapa ku li vê dere hatiye nixandî, çapa nû ya berfirehkirî ye. Pirtûk bi temamî 408 rûpel e. Ji bilî pêşgotin û pêşekê pirtûk bi giştî jî 20 beş û ferhengokeke têgihên rêzimanî pêk tê. Zimanê pirtûkê yê ravekirinê Kurdiya Kurmancî ye.¹⁰¹

Kitêb wekî çapa sêyem ji aliyê Weşanxaneyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di sala 2015an da hatîye weşandin. Ji bo agahîyên berfireh em ê careka din serî bidin analîza Kurt ku weha dibêje:

Her wekî Celadet Alî Bedirxan kirî, Samî Tan jî tenê mijarên xwe pêşkêş dîke û ji aliyê zimannasîyê ve dixwaze îdîayên xwe piştrast bike û li tu cihan ne metnên xwendinê ne jî hîndekarî cih nagirin. Her çend di navbera wan da hinek cudahiyên fikrî û termînolojîk hebin jî (Aydoğan Î. S., 2013), Tan li gelek cihên pirtûka xwe aşkere diyar dîke ku di warê zimannasîya Kurdî da wî daye pey şopa Celadet Alî Bedirxan. Ji ber van taybetiyên xwe rêzimana pirtûka Samî Tanî dîkeva nav pênaseya Rêziman II'yê. Bi gotineke dî, mebest ne hînkirina rêzimanê, lê pêşkêşî û nîqaşên zimannasîyê ne.¹⁰²

Mikaîl Bilbil – Bahoz Baran: Kitêba ku bi navê “Rêzimana Kurmancî”, ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve di sala 2008an da hatîye weşandin, xwedî du nivîskaran e. Kitêb digel ferhengoka xwe 144 rûpel e.

¹⁰⁰ Samî Tan, *bi rêya Whatsappê*, TB: 04.11.2022

¹⁰¹ Kurt, , “hg”. 2020, r.55.

¹⁰² Kurt, “hg”. 2020, r.55-56.

Mikaîl Bilbil nivîskar, zimannas û akademîsyenekî kurd e. Di sala 1978an da li gundê Mêrdînê, li Cîrnîkê çê bûye û li Qoserê mezin bûye. Li Zanîngeha Çûkorovayê Beşa Mamostetîya Koma Felesefeyê xwendîye. Li Zanîngeha Mardîn Artûklûyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî da xelas kir û doktora xwe jî li ser hevoksaziya kurdî li Zanîngeha Zaxoyê qedand. Niha di Weqfa Mezopotamyayê da wekî kordînator xebatên zimanî dike. Herweha ew yek ji endamên Komxebata Kurmancîyê ya Weqfa Mezopotamyayê ye.

Bahoz Baran nivîskar, zimannas û weşangerekî kurd e. Di sala 1982yan da li navçeya Amedê, li Liceyê çê bûye. Li Zanîngeha Dîcleyê beşa mamostetîya xelas kir. li Zanîngeha Mardîn Artûklûyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî da xelas kirîye. Ew jî, yek ji endamên Komxebata Kurmancîyê ya Weqfa Mezopotamyayê ye.

Bahoz Baran: Bahoz Baran kitêbeka bi navê “Rêzimana Kurmancî” di sala 2012an da wekî weşana Belkîyê çap dike. Çapa duyem jî di sala 2018an da ji aliyê Weşanên Wardozê ve tê çapkirin. Di çapa duyem da karîgerîya xebatên zimannasên ku di bin banê Weqfa Mezopotamyayê da xebat kirine, çê dibe.¹⁰³

Li gor Kurt:

Pirtûka Bahoz Baran (Baran, 2012) a bi navê Rêzimana Kurmancî xebateke berfirehkirî ye ku li ser xebateke nivîskarî ya berê hatiye avakirin.8 Ew bixwe vê yekê di pêşgotinê da tîne ser zimanî. Ji bilî pêşgotinê û danasîna zimanê Kurdî û zaravayê Kurmancî ev pirtûk ji 24 beşên serbixwe pêk tê û bi temamî 346 rûpel e.

Zimanê vegotinê yê berhemê jî kurmancî ye.

Kadri Yıldırım: Zimannas û akademîsyenekî kurd e. 5ê sibata 1959an da li Licêya Diyarbekirê hatîye dinyayê. Dibistanên seretayî, navîn û lîseyê li Dîyarbekir temam kirîye. Akademîsyen, nivîskar û parlamenterê kurd e. Ji bilî zimanê kurdî zimanên wekî tirkî, erebî, farisî û îngîlîzî dizanîbû.

¹⁰³ Kurt, “hg”. 2020, r. 57.

Fakulteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Harranê xwendîye. Doktoraya xwe jî li heman Zanîngehê qedandîye. Piştî 13 sal jî mamostetî kir. Ew li Zanîgehên Dîclê û Artukluyê da wekî mamoste xebitî. Kadri Yıldırım der bareyê zimên, dîrok û wêjeya kurdî da gelek pirtûk nivîsandîye. Di 26ê adara 2021an da li Dîyarbekirê wefat kir.¹⁰⁴

Berhema wî ya bi navê “Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi) ji aliyê Zanîngeha Artukluyê ve di sala 2012an da cara ewil, tê çapkirin.

Pirtûka Kadri Yıldırım (Yıldırım, 2012) ji bilî pêşgotinê ji destpêk, şeş beş û du pêvakan pêk tê, pirtûk bi temamî 448 rûpel e. Di Destpêkê da Yıldırım hinek têgihên sereke yên wekî elfabe, rêziman, ziman, zarave û devok dide nasîn ku her yek di bin jêreserenavekî cuda da hatiye ravekirin.¹⁰⁵

Herweha Zimanê vegotinê yê vê pirtûkê kurmançî û tirkî ye. Mebesta kitêbê wekî fêrkirina rêzimanê xwe dide der.

Zana Farqînî: Nivîskar, zimannas û ferhengszakê kurd e. Di sala 1967an da li Farqînê hatîye dinyayê. Dibistana seretayî û ya navîn li Farqînê, dibistana lîseyê û zanîngeh jî li Stenbolê qedandîye. Li Zanîngeha Stenbolê Beşa Civaknasîyê xwendîye û lîsansa bilind jî li Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî da xelas kirîye.

Herweha, di Rojnameyên wekî Welat, Welatê Me û Azadîya Welat da rojnamegerî û rêveberî kirîye. Piştî dawîlêanîna rojnamegerîya xwe ji sala 1997an pê ve di Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê da dest bi lêkolînên xwe kirîye. Giranîya xebatên wî li ser zimanê kurdî bû. Ferhenga Kurdî-Tirkî ya ku wî amade kiriye, ferhenga herî berfireh e ku heta niha hatîye nivîsandin. Ew jî, yek ji endamên Komxebata Kurmancîyê ya Weqfa Mezopotamyayê ye.¹⁰⁶

¹⁰⁴Kadri Yıldırım, *Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)*, Avesta, İstanbul, 2013; https://ku.wikipedia.org/wiki/Qedr%C3%AE_Y%C4%B1ld%C4%B1r%C4%B1m , TB:15.12.2022.

¹⁰⁵Şehmus Kurt, “hg”. 2020, r.56.

¹⁰⁶Önen Baykuşak, *hb*. 2020, r. 439. ; https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Zana_Farq%C3%AEn%C3%AE ; <https://indyturk.com/node/523481/t%C3%BCrki%CC%87yeden-sesler/en-kapsaml%C4%B1->

Berhema sereke ya ku di qada ferhengazîyê da, nivîskar amade kirîye û ji alîyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatine weşandin ev e: “Di ser amadekirina ferhenga me ya Kurdî-Tirkî re 18 sal derbas bûne ku çapa wê ya pêşî jî Nîsana 2004’an e. Heta niha bêyî guherînek te de bê kirin, bi awayê hemançapî, çar çapên wê hatine kirin.”¹⁰⁷ Ferhenga behskirî di sala 2022an da bi awayekî edilandî û berfirehkirî, hat çapkirin. Di çapa nû da “175 hezar û 358 serê madeyê yê kurdî û 48 hezar û 735 jî berdewamên serê van madeyan cih digirin.”¹⁰⁸

Herwisa berî ferhenga behskirî jî, di sala 2000an da berhema “Türkçe-Kürtçe Sözlük (Ferhenga Mezin Tirkî Kurdî)” ya Farqînî ji alîyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatîye weşandin. Ev ferheng jî ji 60 hezar madeyan pêk tê.¹⁰⁹

D.Îzolî: Ferhengazekî kurd e. “Ez ji Dersime nehîya Moxindî ji gundê Hulman kurê Bapîr kurê Xelîl kurê Osman kurê Heyto me.(...) Li gor nifûsa min ez di sala 08-03-1940 ji dayêk dibim û navêmin Husên datînin. Paşê jî ev paşnava "Yıldız" ji alî hukumatê ve li min şanî dikin.”¹¹⁰

Bi ferhenga îzolî, cara peşin e ku, bi Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî ferhengê baş der tê. (1) Di beşa Kurdî-Tirkî da qasî 30 000 bêje û biwêjên Kurdî (îdiom wekî wan), di beşa Tirkî -Kurdî da jî 25 hezar bêje cî digre. Bi alîye sistematîk jî îzolî xwe gelek westandîye, cîsnî nêr û mê ji bo navan û beşên gotinan (wekî lêker, nav, cînav, rengdêr û hwd...) nîşan daye. Ev ferheng ji bo Kurdên Tirkîyê hewcedariyek gelek mezin bû û Îzolî bi vê xebatê, şik tune karekî hêja kirîye. Cara peşin di sala 1987 da bi deste nivîskar û gor imkanên xwe 500 hew çap bûn û zû xilas bû. Nuha bi nivîsandin û şikleke çêtir ji nuh va çap dibe. Îzolî ji bo çapa nu li ser ferhengê xebitîye û ew firehtir kirîye.¹¹¹

Li gor tespîtên Işık jî rewş weha ye:

Ferhenga D.Îzolî ya pêşî di sala 1987an de hatiye çapkirin. Lê xebata Îzolî li ser ferhengê gelek dirêj e, heta sala 1962yan diçe. Ferhenga D.Îzolî ya rastkirî û berfirehkirî jî di sala 1992an de ji aliye waşanên dengê ve tê weşandin. Di pêşgotina

k%C3%BCrt%C3%A7e-t%C3%BCrk%C3%A7e-s%C3%B6zl%C3%BCk%C4%9F%C3%BCn-derleyicisi-zana-farqin%C3%AE , TB:15.12.2022.

¹⁰⁷ Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2022, r. 9.

¹⁰⁸ Farqînî, *hb*, r.10.

¹⁰⁹ <https://web.archive.org/web/20161124100743/http://www.radikal.com.tr/turkiye/kurtce-basit-bir-dildir-aciklamasina-sert-tepki-1124181> , TB:22.12.2022.

¹¹⁰ D.Îzolî, *Ferhengî Kurdî-Tirkî, Türkçe-Kürtçe*, Weşanên Deng, Stenbol, 1991, r. 4.

¹¹¹ Îzolî, *hb*, r.6.

ferhengê de heyfa xwe li çî aniye nişe kirî: *'Ev ferheng, di roja îro de gavek e, gava duduyan e. Bi awakî din ava bûye. Armanca xwe ev e ko bêjeyan çêtir bisenîfîne û helbijêrîne û zanistî bike. Lê dîsa jî şermezarî li ser me ranake. Herweha ev jî Kurdî-Tirkî ye. Evîniya dile min ev bû ko bi tenê Kurdî ev rûpelên hanê tijî bibûwana. Hêvî û daxwaza min ev e ko di rojên pêşhatî de zimanzaneke hemwelatîyê min gava sisiyan bavêje û bi Kurdî-Kurdî ferhengeke pêk bîn.*¹¹²

Herwisa, “Di naveroka vê ferhengê de nêzî 30.000 bêjeyên Kurdî û nêzî 25.000 bêjeyên Tirkî hene; ligel lêkolîn û li ser dûgelên dinya û rêzmanî hatiye kirin, girîngiya vê xebatê berçav dike.”¹¹³

Feqî Huseyn Sağniç: Nivîskar û zimannasekî kurd e. Di sala 1926an da li Gundê Xorosê hatiye dinyayê. Gundê wî li ser Hîzana Bedlîsê ye. Li medreseyan dersên erebî kurdî dixwîne. Jo ber hizrên xwe yên sîyasî hepsî dibe. Dikeve nav tevgerên sîyasî. Di salên wî yî yên Stenbolê da di Navenda Çanda Mezopotamyayê da dersên kurdî dide û paşi ew jî dibe yek ji damezirînerên Enstîtûya Kurdî ya Stenbole. Di kovar û rojnameyan da nivîsarên wî têne weşandin. Di sala 2003yan da li Stenbolê wefat dike û li Tetwanê tê definkirin.¹¹⁴

Berhema wî ya bi navê “Hêmana Rêzimanê Kurdî” di sala 1991ê da, ji aliyê Weşanxaneyê Melsa ve li Stenbolê tê weşandin. Zimanê berhemê xweru kurmancî ye û 240 rûpel e.

A.Bali: Nivîskar, lêkolêr û zimannasekî kurd e. Li bakurê Kurdîstanê di sala 1940î da ji dayîka xwe bûye. Li gundê Gurê, zarokatîya wî derbas dibe. Perwerdebûna wî bi kêşe bûye. Piştî ku lîseyî diqedîne, diçe Zanîngeha Ankarayê û li wir Beşa Ziman û Wêjeyê dixwîne. Di sala 1973an bi neçarî diçe Ewropayê û li wir jî Zanîngeha Berlînê Polîtologî (Rêzanî) dixwîne û di sala 1983'an de xwendina xwe temam dike. Doktoraya xwe jî li ser

¹¹² Işık, *hb*, r. 165.

¹¹³ Işık, *hb*, r. 166.

¹¹⁴ https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Feq%C3%AE_Husey%C3%AE_n_Sagni%C3%A7, TB: 15.12.2022.

rêzimana kurdî dike. Berhema wî ya bi navê “Rêzimana Kurdî” di sala 1992yan da ji aliyê Weşanxaneyê Alanê ve hatiye weşandin.¹¹⁵

Azîz Samur: Zimannasekî kurd e.

Di 18ê Adara 1981ê de, li Silivaya Diyarbekir hatiye dinyayê. Perwerdeyên xwe yê destpêk, navîn û lîseyê li heman çiyê dîtin. Li Zanîngeha Wanê, ji Beşa mamostetiya Polê; li Zanîngeha Eskîşehîrê, ji Beşa Ziman û Edebiyata Tirkî bawernameyên lîsansê girtin. Di 2012an li Zanîngeha Mêrdînê, bi teza ‘Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê’ bawernameya lîsansa bilind wergirt.¹¹⁶

Berhema wî ya bi navê “Rêziman û Rastnivîsa Kurdiya Kurmancî” di nav weşanên Nûbiharê da, di sala 2014an da, cara ewil, derdikeve.

Derbareyê pirtûkê da Kurt weha dibêje:

Pirtûka Azîz Samûr (Samur, 2014) ji bilî pêşgotinê ji 40 beşan pêk tê û bi temamî 317 rûpel e. Samûr pirtûk wek 40 dersên moduler amade kiriye û di her beşê da dersekê pêşkêş dike. Di her beşê da metna danenivîsê heye ku nivîskarî bi zanebûn ji bo hînkirina mijara dersê hatiye hîlbijartin. Her wisa di dawiyê her dersê da rahênanên bi navê hînek û test hene ku dixwazî bi mînak û pirsan ve mijara dersê bêtir bidin fehmkirin.¹¹⁷

Torî (Mehmet Kemal Işık): Nivîskarekî kurd bû.

Di sala 1931ê da li Midyadê tê dinyayê û 17ê cotmeha (çirîya pêşîn) 2010an da li Stenbolê wefat dike. Li dibistana ‘Dicle Köy Enstitüsü’ (Erxanî) mamostetiyê xwend. Berhema wî ya bi navê “Ferheng Kurdî-Tirkî, Türkçe-Kürtçe” di sala 1999an da ji aliyê weşanên Berfinê ve li Stenbolê tê çapkirin. Ferhenga kurdî-tirkî ya wî 12,800 peyvan dihundurîne. Çapa duyem di sala 2000î da tê weşandin.¹¹⁸

Çetin Taş: Nivîskar rêzimmannasekî kurd e. Berhema wî ya bi navê “Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî” di sala 2013an da cara ewil ji aliyê Weşanxaneyê Dîwanê ve tê çapkirin. Berhem 349 rûpel e. Nivîskar,

¹¹⁵ <http://www.saradistribution.com/a.bali.htm> , TB: 15.12.2022.

¹¹⁶ Aziz Samur, *Rêziman û Rastnivîsa Kurdiya Kurmancî*, Nûbihar, Stenbol, 2022.

¹¹⁷ Kurt, “hg”. 2020, r. 58.

¹¹⁸ https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Mehmet_Kemal_I%C5%9F%C4%B1k , TB:28.12.2022.

Di sala 1978'an de li navçeya Çildêranê ya bi ser Wanê ve ji dayîk bû. Dibistana seretayî, navîn û amadehîyê li Çildêranê xwend. Di sala 2001'an de ji Zanîngeha Suleyman Demirel, beşa "Zanîstên Siyasî û Rêveberiya Giştî" qedand. Ji Sala 2006'an heta sala 2010'an li "Komeleya Lêkolîn û Pêşvebirina Zimanê Kurdî" mamostetî kir.¹¹⁹

Nivîskar lîsansa xwe bilind jî, li Zanîngeha Mardîn Artûklûyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî da xelas kirîye.

Pirtûka Çetîn Taş (Taş, 2013) ji bilî pêşgotinê ji 20 beşan pêk tê. Pirtûk xwedî jêrenavekî wisa ye: Di Bîst Waneyan de Bingeha Rêziman Kurmancî Hîn Bibin. Ji vî jêrenavî jî diyar e ku ev pirtûk bi mebestên hînkirina rêzimana Kurdiya Kurmancî hatiye amadekirin. Lewma Taşî her beşeke pirtûkê wekî waneyekê amade kiriye û wisa bi nav kiriye. Ji bilî herdu waneyên ewil ku têde cûreyên bêjeyan yên bingehîn ên wekî elfabe, tîp, kîte, peyv, wateya peyv û kirpandin tête nasandin û herwisa beşa 20an a ku li ser xalbendîyê disekine, di hemî waneyên dîtir da hem metnekî xwendinê yê ku li gorî mijarê hatiye hîlbijartin heye hem jî yek, du an jî sê beşên hîndariyan li ser heman mijarê cih digirin.¹²⁰

Murad Ciwan: Nivîskar û lêkolînerê kurd e. Di sala 1956an da li Dîyarbekirê hatiye dinyayê. Xwendîngeha Mamostetîyê diqedîne. Enstîtuya Perwerdeyê li Dîyarbekirê û Fakulteya Hiqûqê jî Li Zanîngeha Stenbolê, her yekê salek, dixwîne. Piştî 1980î yî diçe Swêdê. Li wir ewilî karê tercumanîyê dike. Di tevgerên siyasî de cih digire û piştê berê xwe dide karên nivîskarî, rojnamegerî û kovargerîyê. Di qada zimanî, dîrok û edebîyatê de xebatan dike.

Berhema wî, bi navê "Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi" serê ewil li Stockholmê, di sala 1992an da ji alîyê Weşanxaneyê Jîna Nû ve tê çapkirin. Ev berhem bi şêweyeka berfirehkirî di sala 2014an da li Dîyarbekirê tê çapkirin. Berhem bi zimanê kurdî-tirkî ye.¹²¹

3.2.1.2 Xebatên dezgehî

Di vê beşê da em ê behsa xebatên dezgehî yên ku bi standardbûna zimanî ve pêwendîdar in, bikin. Dîyar e ku xebatên bi vî rengî, ji yên ku şexsan kirine, karîgertir in. Herweha, îro ku em dikarin behsa standardbûna kurmancîyê bikin, ev yek, li gel keda

¹¹⁹ Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Dîwan, Stenbol, 2013.

¹²⁰ Kurt, "hg". 2020, r. 58.

¹²¹ <https://www.avestakitap.com/murad-ciwan>, TB:21.12.2022.

şexsan, jê bêhtir, bi xebatên sazûmanî û kolektîf mimkin bûye. Îcar, em ê li jêrê, di babetên destnîşankirî da bi gelemperî amaje bi xebatên kolektîf bikin.

Di xebatên dezgehî da kîjan devoka kurmançiyê tê bikaranîn, pirseka navendî ye. Herwisa polîtîkayên rastnivîsîna weşangerîya kurdî, bi gelemperî, çi ye? Ji normên Hawarê û Koma Kurmançî ya Enstîtuya Parîsê heta Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmançiyê, kîjan norm derbasdar e? Li gor me, ev yek, hêjayê lêkolîneka serbixwe ye da ku qonaxên rastnivîsîna ku li Tirkîyeyê karîger in, bê têgihîştin.

Lê, di astekê da em dikarin bibêjin ku qonaxên rastnivîsîna kurmançiyê li hev bandor kirine. Ango, Hawarê li Koma Kurmançiyê bandor kirîye û xebatên Koma Kurmançiyê jî di xebatên Komxebata Kurmançiyê û akademîya kurdî da reng vedaye.

Herweha, mirov dikare bibêje ku weşanxaneyên kurd, di weşanên xwe da, bi gelemperî, li gor govera “Silivî-Serhedî” tevgerîyane. Ji bo mijar zelaltir bibe, em ê serî bidin tesbîtên Mikail Bülbül ku ew xwedî perspektîfeka balkêş e. Ji bo kurdîya kurmançî li ser pîrsa kîjan goverê (subdialect) radiweste û li gor Wî, sê gover ji bo kurmançî hene:

“ 1. *Berfiratî*: (Sirûc, Kobanê, Efrîn, Hewag, Semsûr, Meletî, Mereş, Elezîz, Sêwas, Erzingan, kurmançîya Xoresanê, Piranîya Anatolya Navîn)

2. *Silivî-Serhedî*: (Wêranşar, Qoser, Nîsêbîn, Qamişlo, Amûdê, Serê Kanîyê, Şengal, Mêrdîn, Dîyarbekir, Êlih, Mûş, Wan, Bilîs, Agirî, Îdir, Erzirûm, Qers, Maku, Salmas, Xoy, Kurdên Kafkasya û Asyaya Navîn)

3. *Botan-Behdînan*: Cizîr, Dêrka Hemko, Silopya, Şirnexî, Sêrt, Hîzan, Zaxo, Duhok, Amêdî, Akre, Urmîye, Colemêrg”¹²²

Herwisa, ya giring ew e ku van xebatên dezgehî, gelo beranberî kîjan qonaxên standardkirina kurmançiyê tî, li gor pîvanên Haugen, em ê destnîşan bikin.

¹²² Bülbül, *hp*. 2020.

3.2.1.2.1 Kovar

Ji alîyê dîroka çapemenîya kurd a serdema Osmanîyan da, xala balkêş ew e ku ferqa di navbera “rojname” û “kovar”ê da ewqas ne beloq bû. Lewra, şêweya weşangerîya wê serdemê wekî çalakîyeka “têkel” xuya dibû. Weşanên peryodîk hem wekî rojname hem jî wekî kovar dihatin nirxandin.¹²³

Kovargerîya kurdî di nav weşangeriya kurdî da xwedî roleka sereke ye. Paşxaneyê kovargerîya kurdî xwe dispêre Kovara Rojî Kurd (1913) ku wekî kovareka Komeleya Hêvî (Kürt Talebe-Hevi Cemiyeti) dest bi weşanê dike. Di heman demê da kovarên wek Yekbûn (1913), Hetawî Kurd (1913)15 û Bangî Kurd jî (1914) derdikevin.¹²⁴ Mînakên din ên sereke Jîn û Hawar in. Ji Hawarê û pê ve, çî siyasî çî çandî curbecur kovarên kurdî derdikevin.

Îcar, Kovara Hawarê (1932) ku li beşên jorîn jî hat derbirîn, digel taybetmendiyên wê yê din, di qada weşangerîya kovaran da jî serdemeka nû dinimîne. Em dizanin ku wekî dibistanekê, di fêrkirina alfabeya latînî da, roleka sereke hilgirtîye ser milên xwe. Xebatên wê, nexasim, ên ku di dikevin çarçoveya “kodkirina zimanî” da bandorê li serdemên piştî xwe jî kirîye. Di pêşengîya Celadet Alî Bedirxanî da di warê alfabe, rêziman û ferhengê da roleka navendî listîye. Herwisa, li gor van xebatên kodkirinê jî normên îmlayê jî sepandîye.

Keskin di vê babetê da weha dibêje:

Piştî kovara Jînê, di nav kovarên kurdî de ya herî bibandor kovara Hawarê ye ku di sala 1932an de bi tîpên latînî dest bi weşanê kiriye û heta 1943an jî dewam kiriye. Kovar heta îro jî wek bingeha rastnivîs û gramera kurdiya latînî tê dîtin. Her weha kovara Ronahî jî dîsa di nav kovargerîya kurdî de cihekî sereke digire. Ew jî di sala 1942ande dest bi weşanê dike û heta 1945an jî weşana xwe didomîne. Her du kovar jî ku wek kovarên sirgûnê jî tên binavkirin (Acar 2013) ji aliye Celadet Ali û Kamiran Bedirxan li Şamê tên çapkirin.¹²⁵

¹²³ Fetullah Kaya, *Kürt Basını*, Hivda, Stenbol, 2010, r. 220.

¹²⁴ Necat Keskin, “Kovargerîya Akademîk a Kurdî li Tirkiyeyê û Pirsgirêkên Wê”, *Mukaddime*, (DOI: 10.19059/mukaddime.369647), 2018, r.35.

¹²⁵ Keskin, “hg”. 2018, r. 36.

Kovargerîya kurdî jî, ji bo standardkirina kurmançiyê, herwekî weşangerîya kitêbên kurdî roleka sereke dilîze. Wekî ku me amaje pê kiribû, ji aliyê “pêkanîn” a zimanê standard ve, hilberîna kovaran hezemandin û pejirandina wî zimanî hêsantir dike û ew ziman di civakê da bi cih dibe. Wekî ku em ê li jêrê jî destnîşan bikin ku kovar bi taybemendiyên xwe, ji aliyê pêkanîna zimanê standard ve, herwekî rojnameyan, wekî dibistan hatine nirxandin.

Dîyar e ku piştî salên dûvdirêj, herwekî ku me li jorê jî bi awayekî kurt destnîşan kiribû, di nêveka duyam a salên 1970î hin tevger û komeleyên sîyasî, li gel xebatên xwe yên sîyasî di warên çandî û edebî de jî hin xebat û hewldanan pêk anîne. Di van salan da, kovarên teorîk û sîyasî derketine. Lê, li gel vê yekê hin xebatên çandî, hunerî û edebî jî hatine kirin. Her yek ji van tevger û komên sîyasî weşaneka wan a sîyasî û teorîk hebû. Carina di van weşanên wan ên teorîk da hin babetên çandî û edebî û hin nimûneyên kurdî jî derdiketin. Lê, piştî demekê êdî hewldanên taybet ên li ser çand û edebîyatê jî dest pê kirin.¹²⁶

Di warê kovargerîya kurdî da jî nirxandinên Keskînî jî weha ne:

Ji aliye din ve gava mirov li kovargerîya kurdî ya li Komara Tirkîyeyê dinêre dîrokeke gelekî dûr nabîne. Ev yek bêguman bi pergala û nêrîna dewletê ve girêdayî ye lê dîsa jî di nav xwendekarên kurd de hewldanên tevgerên weşanê çêbûne ku *Îlerî Yurt* (1959) û *Deng* (1963) wek du mînak dikarin bî destnîşankirin. Navbera salên 1959 û 1980î jî bo kurdan dema şiyarbûn û birêxistinbûnê bû ku ev yek jî bêhtir li derdora kovarên “sîyasî” pêk dihat û her yek ji van kovaran dibu dengê partî an jî rêxistinekê. Li gorî “rihê demê” ev rêxistin û her weha kovarên wan jî bi naveroka xwe “çep” bûn û mijarên wan jî bêhtir sîyasî bûn.¹²⁷

Herwisa, Özcan jî van salên destnîşankirî weha derdibirîne:

“Lê eger em ji aliyê çandî û edebî ve bala xwe bidinê di van salên navbera 1970-1980an li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê cara ewil kovara *Tirêj* wekî destpêk ceribandîneke girîng e. Kovara *Tirêj* di sala 1979an de li Îzmîrê dest bi weşanê kirîye. Di van salan de ev kovara pêşîn e ku hemû bi Kurdî û wekî kovareke çandî hunerî hatiye weşandin. Di vê kovarê de di gel zaravayê kurmançî hin nivîsarên bi zaravayê dimilî jî derketine. Lê piştî derbeya leşgerî ya 1980 êdî nikare bê derxistin, tenê 4 hejmarên wê derdikevin. 3 hejmarên wê li Îzmîrê hejmarek wê jî li Stockholmê tê

¹²⁶ Özcan, *hb.* r. 34.

¹²⁷ Keskin, “hg”. 2018, r. 36.

çapkirin (Malmîsanij û Lewendî, 1992: 274). Di vê kovarê de gelek nivîsarên çandî, helbest û kurteçîrok derdikevin. Mîrov dikare bêje ku di vê serdemê de helwesta modern ya çandî û edebî cara pêşîn bi vê kovarê re xwe dide der.”¹²⁸

Li gor Ronayî Onen Baykuşak, ev metnên ku di Kovara Tîrêjê da hatine weşandin, di serdema Komara Tîrkiyeyê da, cara ewil e ku bi navgînîya van metnan, rewşenbîrên kurd ji bo xwedîlêderketina zimanî, bang li kurdan kirine. Herwisa, banglêkirinên bi vî rengî piştî salên 2000î jî dê her li dar be. Û balkêş e ku di hejmara duyem da, behsa hêsanîya nivîsîna bi kurdî, dewlemendîya peyvan û dariştina wan, hatîye kirin.¹²⁹

Hewce ye ku em amaje pê bikin, ku pêvajoya weşangerîya kovaran wekî du qonaxan derdikevin pêşberî me. Yek jê ew qonaxa e, ku kovarên ji alîyê kurdan ve dihatin derxistin, yan bi tenê navê wan kurdî bû û qet cih nedidan nivîsên kurdî, yan jî gelek hindik ji wan dihatin weşandin. Qonaxa din ew e, ku êdî kovarên xwerû bi kurdî piştî sala 1991ê da derdikevin û heta roja me ya îro jî her ku diçe berfireh û dewlemendtir dibe.¹³⁰

Di qonaxa ewil da kovarên ku xwerû bi tirkî û sîyasî ne, ne mijara vê tezê ne. Kovara sîyasî ku bi tirkî û kurdî hatîye nivîsîn “Kovara Dengê” ye (1989). Lê, weşana vê Kovarê hê jî, digel navberdayînê, didome û wekî kovareka sîyasî, çandî û zimanî gihîştîye hejmara xwe ya 127an. Herwisa, “Kovara Newrozê” jî di sala 1991ê da li Stenbolê dest bi weşanê dike. Kovareka sîyasî çandî ye û zimanê weşana wê ji tirkî-kurdî ye. “Kovara Govendê” jî di sala 1991an da li Diyarbekirê dest bi weşanê dike. Kovareka çandî û hunerî ye û zimanê kovarê jî kurdî-tirki ye.

Di salên 1990î da kovareka din derdikeve pêşberê me. Ew jî yek ji giringtirîn kovaran, “Kovara Rewşen”ê ye ku Dîlawer Zeraq di derbareyê derketina Kovarê da van agahîyan dide:

Piştî ku di sala 1991ê de, Komara Tîrkiyeyê qanûna ku ji bilî zimanê Tirkî axaftina bi zimanên dîtir qedexe dike, ji meriyetê radike (a rast, sist dike), mijarên wekî mafên zanav û nasnameya çandî û zimanî û xebat û çalakiyên di vî warî de, bêtir dikeve

¹²⁸ Özcan, *hb.* r. 35.

¹²⁹ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 172.

¹³⁰ Özcan, *hb.* r. 50.

rojewa Kurdan û cî û girîngiya xwe dide der. Wekî encama vê yekê, di sala 1991ê de, li Stenbolê, saziyeke çandî ya bi nave Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) tê damezirandin. Vê saziyê, digel xebat û çalakiyên sînema, şano, muzîk, govend (dansên gelêrî) girîngiyeke taybet dide çand û zimanê Kurdî û wekî nîşaneyê vê girîngîpêdanê; di bin banê NÇMyê û di Sibata sala 1992yan de yekem hejmara kovara Rewşenê diweşe. Kovara Rewşenê, ji hejmara 1ê heta bi hejmara 13an yek bi yek, jê û şûnde wekî, hejmara 14-15an, du bi du û heta bi hejmara 22-23yan, bi tevayî 18 hejmaran derdiçe.”¹³¹ Li gor heman nivîsarê helwesta Kovarê weha ye: “*Em girîngiya herî mezintirîn didin zimanê Kurdî*

Li gor vegotina Özcanî jî, rewş weha ye:

Kovara Rewşenê” di sala 1992yan de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Ev Kovar dikare wekî berhemeka qonaxa duyem a weşangerîya kovaran bê pejirandin. Ev kovar di warê çand û hunera kurdî da wekî mîladekê ye. Ji ber ku li Tirkîyeyê cara pêşîn bi vê kovarê ra, li ser çand, edebîyat û hunera kurdî tradîsyonek dest pê dike û digel vê yekê, gelek xwendevan, nivîskar û helbestvan ji nifşên nû derdikevin ser qada çand û hunera kurdî. Tevî ku di hejmarên pêşîn ên vê kovarê da hinek nivîsên tirkî û naveroka sîyasî hene jî, piştî demekê kovar bi temamî dibe kurdî û naveroka wê jî dibe mijarên çand, edebîyat û hunera Kurdî. Ev kovar ji aliyê Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) ve li Stenbolê hatîye derxistin. Herwisa, Kovar di destpêkê da bi kurdî (kurmancî - kirmancî) û tirkî ye. Paşê kovar bi temamî wekî kovareka xwerû bi kurdî ya çandî, edebî û hunerî bi salan weşana xwe didomîne. Di kovarê da gelek nimûneyên ji berhemên şanoyê, helbestên kurdî, wergerandinên ji edebîyata cîhanî, kurteçîrok, nivîsên li ser ziman û gramera kurdî û berhevokên ji folklorê kurdî tîn weşandin.¹³²

Herwisa, mînakê qonaxa duyem a din, a kovargerîya kurdî, “Kovara Nûbihar”ê ye. “Kovara Nûbiharê cara ewil di sala 1992yan hate weşandin. Armancên kovaran curbicur in. Yek ji van armancan jî hînkirin û bipêşvebirina ziman e. Ev mijara ewil, bi taybetî di derbareyê perwerdeya ziman da ye.”¹³³

Tahirhan Aydın di nivîsara xwe ya destnîşankirî da, di derbareyê mijarên ku Nûbihar li ser radiweste, weha dibêje:

Ji nivîsan jî tê famkirin ku armanca ewil a derketina Kovara Nûbiharê xizmeta ziman û nasnameya kurdî ye. Ji bo vê armancê heta îro 156 hejmarên kovarê derketine.

¹³¹ Dilawer Zeraq, “Nifşa Ciwan ya Xweavakirî: Nifşa Rewşenê”, *Kürd Araştırmaları*, Hejmar 6, Havin 2021, r. 87.

¹³² Özcan, *hb*, r. 52-58.

¹³³ Tahirhan Aydın, “Kovar, Ziman û Perwerde -Kovara Nûbiharê û Zimanê Kurdî”, *Kadim Hikmet Dergisi*, Hejmar 5, Sal, 2021, r.102.

Kovar bi taybetî giringîyeka mezin dide hînbûn û hînkirina zimanê kurdî. Ji ber vê yekê, di hejmarên xwe yên destpêkê da, bi taybetî li ser mijarên zimanî yên wekî alfabe, rêziman, ferheng û mafê zimanê dayikê rawestîyaye. Îro jî Nûbihar, zimanê kurdî wek dîyardeya herî giring a nasnameya kurdî dibîne.¹³⁴

Ji heman nivîsarê em fam dikin ku mijara zimanî ji bo Nûbiharê mijareka navendî ye. Lewra, “Kovara *Nûbiharê* digel mijarên dîn, çand, sîyaset, edebîyat, kurtejiyan, helbest û hwd giringîyeka mezin daye mijarên zimanî jî. Di vê çarçoveyê da li ser mijarên wekî alfabe ya kurdî, rêzimana kurdî, ferhenga bêjeyên bîyanî/dijwar, bêjeyên hevwater û dijwater rawestîyaye.”¹³⁵

Îro, Kovara Nûbiharê ev sih sal in ku weşana wê li dar e û gihîştîye hejmara xwe ya 160yî, ji aliyê Weşanxaneyê Nûbiharê ve tê weşandin.

Xelekeka binirx a kovargerîya kurdî jî “Kovara Zend”ê ye. Bi vegotina Özcanî,

Ev kovar di sala 1996an de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Zend kovara Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ya zanistî û lêkolînî ye. Zend bi temamî bi zimanê Kurdî derketîye. Zend kovara pêşîn ya zanistî û lêkolînî ye ku li bakur û Tirkîyeyê hatîye derxistin. Hejmara pêşîn ya Zendê di 21 Adar 1994an de derdikeve. Di nav nivîsarên Zendê de di serî de li ser ziman û çanda Kurdî, li ser gelek babetan gotarên zanistî hatine weşandin. Ev kovar jî di nav weşanên Kurdî yên vê serdemê de cîyekî xweser û girîng digire. Zend serê pêşîn di sala 1994an de wekî prova 2 hejmar tê derxistin. Paşê jî sala 1996an pê ve bi formateke nû heta niha jî weşana Zendê di gel hinek navber û astengîyan dewam dike.¹³⁶

Herweha, Kovareka bi navê “Pelîn”ê jî di sala 1998an da li Stenbolê derdikeve. Ev kovar jî wekî naverok di warê ziman û çanda kurdî da nivîsaran diweşîne. Zimanê Kovarê xwerû bi kurdî ye, lê, piştî du salan weşana wê bi dawî dibe.¹³⁷

Herwisa, ev deh salên dawî, bi vekirina enstîtuyên zimanên zindî “kovarên akademîk” jî dest bi weşanê kirine. Ji hêla mijara me ve hêja ye ku em serî bidin nivîsara

¹³⁴ Aydın, “hg”. 2021, r.102.

¹³⁵ Aydın, “hg”. 2021, r.107.

¹³⁶ Özcan, *hb.* r. 64.

¹³⁷ Özcan, *hb.* r. 65.

Necat Keskinî, ku bi gotina wî, “Di heman demê de bi hebûna xwe ev kovar di warê kovargerîya kurdî a li Tirkîyeyê de destpêkeke nû pêk tînin.”¹³⁸

Di destpêka nivîsara xwe da, têkildarî mijara me, tesbîteka weha dike:

Di lihevhatina li ser ziman û pêşketina zimanê akademîk de weşangerî û xebatên akademîk cihê girîng digirin. Bi riya weşanan dikare bê gotin ku ziman zindî dibe û bi weşanên akademîk jî ziman dewlemendtir dibe. Weşan "ziman" jî herêma xwe derdixe û digihîne hemû civakê ku civakê bi xwe dixê nava "texeyyul"ekê de (bnr. Anderson 2004). Di heman demê de, jî bi riya weşanên edebî ku bêhtir zimanê rojane di wan de tê bikaranîn, ziman zindî dimîne.¹³⁹

Dîyar e ku kovarên akademîk ên kurdî li Tirkîyeyê dîyardeyaka nû ye. Herwisa, ev cure kovar jî aliyê rê û rêbazên xwe ve zanistî ne û bi taybetmendiyên xwe jî kovarên din cihê ne; divê objektîf û xwedî referans bin.

Necat Keskin kovarên akademîk dike du cure: Kovarên nîv-akademîk û yên akademîk. Ji bo yên nîv-akademîk weha dibêje:

Di vê çarçoveyê de, kovarên wek Kovara Zarema, Wêje û Rexne û Ewro (Zazakî) wek kovarên nîv-akademîk ên kurdî dikarin bîn nirxandin. Ev kovar dikare bê gotin ku ji bo bersivdana pêwîstiyên deme derketine û hîna jî hem ji bo xwendekaran û hem jî bo xebatên kurdî xwedî roleke girîng in. Her çiqasî di van kovaran de hewldaneke “akademîk” bê xuyakirin jî, gava bi kovarên “akademîk” re miqayeseyek tê kirin, tê dîtin ku jî aliyê lijneya akademîk, rêzîkname, pêvajoya qebûlkirina gotaran, nirxandin û weşandina wan, jî aliyê cihgirtin an jî armanca cihgirtina di îndeksan de ji kovarên “akademîk” cuda ne. Loma ev kovar dikarin wek nîv-akademîk bîn nirxandin û di vê xebatê de jî bi vî awayî hatine binavkirin.¹⁴⁰

Aşkera ye ku kovarên akademîk ku li Tirkîyeyê tên weşandin kêma in. Lewra, “Li Tirkîyeyê di halê hazir de bi tevahî pênc kovar weşana xwe didomînin û di nav van kovaran de ya ku herî pêşî dest bi weşanê kiriye û di vî warê de rêyek vekiriye Nûbihar Akademî ye.”¹⁴¹

¹³⁸ Keskin, “hg”. 2018, r. 31.

¹³⁹ Keskin, “hg”. 2018, r. 32.

¹⁴⁰ Keskin, “hg”. 2018, r. 37.

¹⁴¹ Keskin, “hg”. 2018, r. 38.

Edîtorê Nûbihar Akdemîyê, Abdurahman Adak, di hejmara yekem da, di derbarê derketin û armanca kovarê da weha nivîsiye:

Aşkera ye ku divê qonaxa xebatên Kurdî de, pêwîstî bi kovareke bihekem û akademîk heye ku bi Kurdî û Îngilîzî weşanê bike. (...) Li aliyekî dî di salên dawî de li hinek zanîngehên Tirkiyeyê di warê xebatên Kurdî de bernameyên lîsansa bilind vebûne û ji bo ku mamoste û xwendekarên van bernameyan gotarên xwe yên akademîk biweşînin pêwîstî bi derxistina kovareke akademîk çêbûye. Faktorên bi vî rengî kir ku ji bo derxistina Nûbihar Akademiyê gavên pêwîst bîn avêtin. (...) Nûbihar Akademî li ser mîrata tecrubeya weşanxaneya Nûbiharê, dixwaze di warê kovargerîya akademîk a xebatên Kurdî de bibe pêşeng û bibe platformeke objektîf ku hemû lêkolîner xebatên xwe yên akademîk tê de biweşînin.¹⁴²

Ji aliyê Weşanên Nûbiharê ve di sala 2014an da dest bi weşana xwe kir. Zimanê Kovarê li gel hemû zaravayan, kurdî û îngilîzî ye. Heta niha 17 hejmar (sala nehem) weşandiye. Salane du car derdikeve.¹⁴³

Di xebata xwe ya navborî da Keskin di derheqê kovara kurdî ya yekem ku ji aliyê zanîngehekê hatiye weşandin weha derdibirîne:

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi -Kovara Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê- yekemîn kovar e ku wek fermî ji hêla enstîtuyê Zimanên Zindî ve hatiye weşandin û çapkirin. Hejmara yekem ya kovarê di sersala 2015an de derdikevê û heta niha 4 hejmar derketine. Edîtorê kovarê M. Zahir Ertekin armanca derketina kovarê wiha tîne ziman; “*Kêmbûna kovarên a kademîk yê ku bi kurdî an jî li ser kurdolojiyê weşanê dikin yek ji wan sebebên e ku kovara me dest bi weşanê kir. Bi vê mebestê dixwaze qadekî ji akademisyenan re veke da ku gotarên xwe yên akademîk bidin çapkirin û li ser kurdan û kurdî çavkaniyekê dirist bike.*”

Kovar niha gihîştîye hejmara 15em. Salane du car tê weşandin û zimanê Kovarê jî pîrzimanî ye: Kurdî (kurmançî-Kirmanckî) û tirkî.¹⁴⁴

Kovara duyem ku ji aliyê zanîngehan ve tê weşandin jî:

Kovareke din a akademîk a kurdî ku vê dawiyê dest bi weşanê kiriye jî *The Journal of Mesopotamian Studies* –Kovara Xebatên Mesopotamî-JMS ye. Kovar ji hêla Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardin Artukluyê ve tê derxistin. Damezrîner û edîtorê yekem ê kovarê Mustafa Öztürk bîngeha derxistina kovarê weha tîne ziman;

¹⁴² Keskin, “hg”. 2018, r. 38.

¹⁴³ <https://www.nubihar.com/behterkovar/8593-nubihar-akademi-17> , TB:28.12.2022.

¹⁴⁴ <https://dergipark.org.tr/pub/buydd> , TB:28.12.2022.

‘Piştî damezirandina van beşan lêkolînanî û akademîsyentiya kurdî êdî ji atmosfera amatoriye qelibî ser zemîneke cidîtir. Helbet akademîsyentî hebe divê çapgerî jî hebe. Akademîsyenên ku bi kurdî dinivîsîn an jî li ser mijarên kurdolojiyê dinivîsîn hewceyê bi kovarên kurdî dîtin; qe nebe diviya ku xebatên xwe yên, çî bi zimanê kurdî û çî li ser mijarên kurdî, li derekê bidin çapdayin.’ Kovar, salê du caran derdikeve û ji ber ku di bin banê enstîtuye de sê beş hene (kurdî, erebî, suryanî) gotarên di kovarê de tên weşandin jî têkildarî xebatên van beşan e. Dîsa bi vê yekê ve têkildar kovar pêşkiyê dide gotarên bi zimanê kurdî, erebî û suryanî, lê yên inglîzî û tirkî jî qebûl dike. Ligel vê yekê heta niha di kovarê de gotarên kurdî, erebî û tirkî tên dîtin, yên bi suryanî û inglîzî nehatine weşandin.¹⁴⁵

Kovar bi du awayan diweşe ku ew jî awayên dijîtal û çapkiri ne. Hewisa, heta niha (2022) 14 hejmar derketine.¹⁴⁶

Ji nav kovarên akademîk, a din jî ku em ê behsa wê bikin,

Kovara Derwaze di nav van kovarên navborî de ya ku herî dawî derketiye. Her çiqasî hatibe diyarkirin ku dê di sersala 2016an de derbikeve jî, hejmara yekem di gulana 2017an de bi halê çapkiri pêşkêşî civaka akademiya kurdî hatiye kirin. Dîsa di nav kovarên navborî de, ji bilî IJOKS- ku rewşa wê jî hinek cuda ye ji yên dinya ku ne girêdayî saziyekê ye, û serbixwe derdikeve kovara Derwaze ye. Yeke din ku kovarê ji yên berî xwe cuda dike jî zimanê gotarên kovarê ye. Kovar tenê bi kurdî (piranî jî bi kurmancî û soranî) gotaran diweşîne ku bi vî awayî dixwaze di nav zaravayên kurdî de danûstandinekê çê bike. Ev yek di “peşgotin”a kovarê de wiha tê îfadekirin; *‘Derweza bi tenê nivîsarên bi kurdî belav dike, bi piranî bi kurmancî û soranî, ku bi vî rengî dixwaze danûstandinên hizrî û têgehî bi rengê konsantre bi rê ve biçin û her hejmareke kovarê ji bilî pêşkêşkirina hejmareke nivîsarên bi wêşên zanistî herwiha bibe meydana çalak a bikaranîna şewezarên kurdî di warên zanistî de (Edîtoriya Derwaze 2017:6).*¹⁴⁷

Ji kovarên akademîk ku herî dawî em ê li ser bisekinin, Kovara bi navê “Kurdîyat”ê, ku kovareka ji aliyê Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Wanê, salê du car, tê weşandin. Nivîsarên Kovarê bi zimanê kurdî û tirkî ne. Ji 2020an heta niha (2022) 5 hejmar derketine.¹⁴⁸

Herî dawî, eger em qonaxên kovargerîya kurdî ji zayîna wê heta niha binirxînin, mirov dikare bibêje ku: Kovarên serdema Osmanî kovarên ziman û edebîyatê di rewşên

¹⁴⁵ Keskin, “hg”. 2018, r. 40.

¹⁴⁶ <http://jms.artuklu.edu.tr/tr/pub/archive> , TB:28.12.2022.

¹⁴⁷ Keskin, “hg”. 2018, r. 41.

¹⁴⁸ <https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdîyat>, TB:27.12.2022.

xirab da bûn. Lê, vê rewşê Kovara Hawarê guherand û ev ziman û wêjeyê ji mirinê rizgar kir. Herweha, li ser xeta giştî ya Hawarê, kovarên wekî Tîrêj, Nûdem, Rewşen, Jiyana Rewşen û Nûbiharê, bi taybetî di kurdîya kurmancî da, ziman û edebiyatê bilind kirin. Herwisa, em dikarin bifikirin ku kovarên îro, digel ên akademîk ji bo kurdîya kurmancî wekî dibistan, di standardkirina zimanî da jî roleka girîng dilîzîn.¹⁴⁹

3.2.1.2.2 Weşanxane

Herwekî ku tê zanin, ji ber rewşa kurdan a sîyasî û civakî xebatên weşangerî û çapemenîyê di nav kurdan da, gelek dereng dest pê kirine. Herwisa, wekî bê zanîn, weşangerî û berhemên çapkirî di standartbûna zimanî û di pêşketina xebat û tevgerên rewşenbîrî de roleka girîng dilîzin. Wekî rastîya dîrokî, ji ber ku çapemenî û çapxane di nav kurdan da tunebûye, xebat û berhemên kurdî jî gelek dereng hatine çapkirin û belavkirin. Heta salên destpêka sedesala 20an tu çapxane yan jî weşanxaneyeka aîdê kurdan tunebû.¹⁵⁰

Di beşên jortir da me behsa polîtîkayên zimanî yê ku Komara Tirkîyeyê meşandîye, kiribû. Ev pêvajoya behskirî li ser “çarenivîsa” kurdîya kurmancî bandoreka mezin kirîye. Wekî ku hat destnîşankirin, ancax bi rakirina qanûna bi hejmara 2932an ji rewacê, bi gelemperî, weşangerîya kurdî piştî salên 1991ê ket serdemeka nû ku wekî reform jî dihat binavkirin. Îcar em ê rewşa weşanxaneyên kurdî di vê çarçoveyê da binirxînin. Herwisa, dîyar e ku di salên 90î da xebatên li ser çand û zimanê kurdî bi gelemperî li Stenbolê dest pê dikin û gelek berhemên ziman û çandî tîr çapkirin. Ev deh salên dawî êdî weşangerîya kurdî wekî du-navendî xuya dike: Stenbol û Dîyarbekir.

Îcar, di derheqê tîkîliya di navbera pêşketina zimanî û weşangerîyê da, tesbîta Özcan weha ye:

Çapemenî û berhemên çapkirî di standartbûna ziman û di pêşketina xebat û tevgerên rewşenbîrî de roleka girîng dilîzin. Ji ber ku çapemenî û çapxane di nav Kurdan de tunebûye xebat û berhemên Kurdî jî pirr dereng hatine çapkirin û belavkirin. Heta

¹⁴⁹ Dawîd Yeşilmen, “Kürtçe Dergicilik”, https://www.kurdilit.net/?page_id=2501&lang=tr, TB: 07.09.2022

¹⁵⁰ Özcan, *hb.* r.17-18.

salên destpêka Sedsala 20an tu çapxane yan jî weşanxaneyek aîdê Kurdan tinebû. Çapxane û weşanxaneyên ku hebûn yan aîdê dewletê bûn yan jî aîdê mîsyonerên Ewropî bûn. Ji ber wê jî çend kitêbên ku di vê qonaxê de bi Kurdî hatine çapkirin ji alîyê van kes yan jî dezgehên ve hatine çapkirin.¹⁵¹

Em dikarin weşangerîya kurdîya kurmancî di pêwenda (context) yek ji qonaxên standardkirina zimanî ku ew jî “pêkanîn” (implementation) e, binirxînin. Lewra, di vê babetê da bikaranîna zimanê hîlbijartî di hemî warên jîyana giştî da, berceste dibe.

Wekî ku hat diyarkirin, ji alîyêkî din ve jî, “pêkanîn” bi rêya dibistan, pirtûk û hwd. qebûlkirin û hezîmandina formên nû îfade dike. Herweha, bi gelemperî hilberîna materyalan wekî pirtûk, rojname, belavok, malper, weşanên radyoyê jî, vedihewîne.

Eger em li gor vê çarçoveyê, li rewşa kurmancîyê binêrin, diyar e, ji destpêka Komara Tirkîyeyê heta sala 1960î em nikarin behsa weşangerîya kitêb, kovar û rojnameyên kurdî bikin. Wekî ku tê zanîn, piştî bêdengîyeka mezin hin rewşenbîrên kurd di salên 60î û 70yî da hewl dan ku kitêb û kovaran biweşînin, lê, ji ber tevdîrên Dewletê yên tund, bi ser neketin. Midaxele û derbeyên leşkerî yên salên 71ê û 80yî jî hewlên weşangerîya kurdî qut kirin.¹⁵²

Di nivîsareka xwe da Ronayî Onen ji bo vê serdemê weha dibêje:

Di salên 1950î de li Tirkîyeyê bi hatina Partîya Demokrat a li ser rêveberîyê pêlên modernîzasyonê pêk hatin. Ev yek ji hin rewşenbîrên kurd ên demê re bû hêvîyek ji bo kurdan (Kutlay, 2012: 28-29). Bi ser re rêjeya ciwanên kurd ku li metropolên tirkîyan diçûn zanîngehan zêde bû. Bi vî awayî di demê de tebeqeyê siyasî ya rewşenbîrên kurd pêk hat. Ciwanên ku li bajarên Tirkîyeyê xwendina zanîngehê wergirtine, bi axaftina bi kurdî di nava xwe de û lidarxistina çalakîyên curbicur ên çandî, dest bi xwedîderketina li nasnameya kurdî kirine (Demir, 2005: 25). (...) Di wê demê de ji alîyê rewşenbîran ve çend weşan derçûne ku tê de qala paşvemana herêmên kurdan hatîye kirin.¹⁵³

Ji bo salên 1950yî mirov dikare behsa xesasîyeteke zimanî bike, lê, ji alîyê xebatên zimanî ve, ji ber egerên destnîşankirî, ne serdemaka berhemdar e. Di salên 1960yî da jî

¹⁵¹ Özcan, *hb.* r. 18.

¹⁵² M.Malmîsanîj, *Türkiye ve Suriye’de Kürtçe Kitap Yayıncılığının Dünü ve Bugünü*, Vate, İstanbul, 2006, r.16-17.

¹⁵³ Onen, “hg”. 2022, r. 43.

heman pêvajo li dar e. Kom û tevgerên sîyasî, li gel çalakîyên xwe yên sîyasî, bi gelemperî, li derûdora parastina heyîna zimanî tevgerîyane. Û herweha, li gor vegotina Onenê, di salên 1970yî da jî tevgerên ku ji bo mafên kurdan tevdigerên hin weşanên bi kurdî çap dikin. Di van weşanan da çend rûpelên bi kurdî cih digirin. Kurdî wekî zimanê propagandayê tê bikaranîn. Lê, di salên 1980yî da, piştî darbeya leşkerî edî tevgerên kurd dikevin nav bêdengîyê û xebatên çandî jî qut dibin.¹⁵⁴

Wekî me li jorê jî destnîşan kir, piştî sala 91ê astengîyên li pêşîya weşangerîya kurdî bi şêweyeka îzafî siviktir bûn û rê li ber weşanxaneyên kurdî vebû.

Li gor xebata Özcan,

Paşê di sala 1989an pê ve û bi taybetî piştî ku qedexeya li ser zimanê Kurdî rabû hêdî hêdî weşanxaneyên Kurdî hatine avakirin. Hin weşanxane heta îro jî hê karê xwe didomînin, lê gelek weşanxane jî piştî demeke kurt hatine girtin. Weşanxaneyên Kurdî yên ku li vê qonaxa dawî ya heta sala 2000an hatine avakirin ên sereke ev in:

Deng : Stenbol, Avabûn, 1989 *Doz* : Stenbol, Avabûn, 1990 *Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê* : Avabûn, Stenbol, 1992 *Nûbihar* : Stenbol, Avabûn, 1992 *Avesta* : Stenbol, Avabûn, 1995 *Pêrî* : Stenbol, Avabûn, 1997 *Aram* : Stenbol, Avabûn, 1997. Helbet em dizanin ku ji xeynê van, hinek weşanxaneyên din jî hatine avakirin û her wisa hinek weşanxaneyên Tirkî jî hin kitêbên Kurdî çap kirine. Bi taybetî piştî salên 2000an li hin bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkîyê gelek weşanxaneyên din jî vebûne. Lê qesta me bêtir weşanxaneyên Kurdî yên berî salên 2000“î ne. Piştî salên 2000an pê ve û van salên dawîyê çand weşanxaneyên wekî Belkî, Lîs û J&J li Dîyarbekirê weşangerîya Kurdî dikin û herwisa van salên dawîyê li Wanê jî weşanxaneya Sîtav weşangerîya Kurdî dike. Di vî derbarî de M. Malmîsanij dibêje ku di vê serdemê de heta salên 2006an nazîkî 40 weşanxaneyên Kurdî vebûne, lê piraniya wan piştî çapkirina çend kitêban ji ber sedemên aborî yan jî qanûnî hatine girtin Piştî salên 2000an pê ve hin weşanxane navendê xwe li Dîyarbekirê ava dikin (Malmîsanij, 59-61). Di vê serdemê de di gel van weşanxaneyên Kurdî hin weşanxaneyên din ên Tirkî jî hene ku kitêbên Kurdî çapkirine. Ev weşanxane ji ber ku di nav bergeha vê xebatê de nîn in emê li ser van ranewestin. Di gel vê qasê bi taybetî piştî salên 2000an pê ve bi pêşketina înternetê re weşanên Kurdî yên dijîtal jî dest pê dikin. Niha li ser gelek malperan gelek berhemên Kurdî tîne weşandin.¹⁵⁵

Diyar e ku di geşebûna zimên û edebîyatê da rola weşanxaneya pir giring e. Ji alîyê “hîlbijartin”, “kodkirin” û “pêkanîn”ê ve roleka sereke dilîze. Bi dehan weşanxane û bi

¹⁵⁴ Onen, “hg”. 2022, r. 44-45.

¹⁵⁵ Özcan, *hb.* r. 78-79.

sedan pirtûkên çapkîrî xizmeteka hêja, ji bo pêşvebirina asta standardbûna kurmancîyê, pêk hatîye. Ev yek bi saya her cure berheman; wekî roman, çîrok, helbest, kurteçîrok û hwd., mimkin bûye.

Di derbareyê hejmarên çapkîrîna berheman da, Özcan weha derdibirîne:

Bi aweyekî giştî dema em li rewşa vê serdemê binêrin û rewşa xebat û berhemên wê serdemê wiha ye. Di nav dehsalên piştî salên 1991-1992an de li bakur û Tirkîyeyê, bi qasî ku min tesbît kirine di derbarê Kurdan de bi qasî 1500 heb kitêb hatine çapkîrin. Ji van kitêban 160 heb bi Kurdî ne. Ji van 160 kitêbên Kurdî 90 heb kitêbên dîwan, çîrokên gelêrî, roman yan jî kurteçîrok in. Ji van jî 15 heb romanên Kurdî ne (yek jê wergera kitêba M. Gorkî, Karkerên Nonê ya (Dimilî) ye. Kitêbeke piyesê ya Felat Dilgeş jî bi navê Kula Dêrsimê hatiye çapkîrin.¹⁵⁶

Li gor xebata Malmîsanij, di salên 2000î da ji 40î zêdetir weşanxane hatin sazîkirin. Ji vana ancax 15 weşanxane ji dehan zêdetir kitêb weşandine. Heta 2006an weşanxaneyên ku 20î zêdetir kitêbên kurdî weşandine ev in: Aram, Avesta, Deng, Doz, Elma, Weşanên Enstîtuya Kurdî, Nûbihar û Pêrî. Herweha heta 2006an herî zêde kitêbên kurdî ji aliyê weşanxaneyên Avesta û Pêrî ve hatine weşandin.¹⁵⁷

Li gor vegotina Cemil Oğuzî ji, di derheqê lîsteya kitêbên ku, li gor hin salan, hatine weşandin, rewş weha ye: Hejmara kitêbên (kurmancî û kirmanckî) ku ji aliyê 22 weşanxaneyan ve hatine weşandin; di sala 2016an da 190, di sala 2017an da 171, di sala 2018an da 232 ne. Ji van weşanxaneyan, bi 66 kitêban, herî zêde weşanxaneya J&J kitêb weşandine. Li derûdora bi 20 kitêban, weşanxaneyên wekî Avesta, Nûbihar û Lîs li dû vê Weşanxaneyê tîn.¹⁵⁸

Ji hêlaka din, pîrsgirêkên weşanxaneyan ku ru bi rû dimînin ne mijara teza me ye lê hewce ye ku em balê bikişînin ser rewşa weşangeriya kurdî ku ji 2015an û vir ve ber bi jêr ve diçe. Li gel sedemên din, sedema sereke ya vê rewşê, li gor weşangeran, aborî ye.

¹⁵⁶ Özcan, *hb.* r. 83.

¹⁵⁷ Malmîsanij, *hb.* r. 59-60.

¹⁵⁸ Cemil Oğuz, “Kürtçe kitap yayıncılığının 2018 panoraması”, <https://www.evrensel.net/haber/369941/kurtce-kitap-yayinciliginin-2018-panoraması>, TB: 06.11.2022

Bo nimûne, ji bo ku qenaetek çê bibe, li gor nûçeya Diyarnameyê sala borî (2021) li Tirkîyeyê bi tevahî 377 pirtûkên cuda yên bi kurdî hatine çapkirin.¹⁵⁹

Bi tesbîten Cemil Oğuz: “Kurdan sala 2022'yan bi 343 pirtûkan teman kiriye. Par 377 pirtûk ketibûn nava lîsteya me, loma em dikarin bêjin li gor salek berê dor sedî dehan kêmbûneke çêbûye. Dîsa jî ligel hemû zehmetiyan weşanxaneyên kurdan ber xwe dane.”¹⁶⁰

Digel vê çarçoveya ku me derpêş kir, di vê kêliyê da, divê em ê behsa mînaka Weşanxaneya Peywendê bikin da ku giringîya di navbera weşanxane û “akademîya kurdî” careka din bê dupatkirin. Li gor derbirîna birêveberîya Weşanxaneya Peywendê, piştî sala 2019an da nêzikî 80 kitêb çap kirine ku pîranîya van kitêban “tezên akademîk” bûn. Herweha, xuya ye ku vç polîtîkayê dê bidomînin. Dîyar e ku ev helwest ji aliyê weşanxaneyên din jî bê nîşandan, dê bandoreka erênî li ser xebat û xwendakarên master û doktorayên kurdî bike.¹⁶¹

Ji bo dawîya vê beşê, divê em balê bikêşin ser dîyardeyeka din ku ew jî, di serdema azadîya îzafî ya weşangerîya kurdî da dîyar bû ku pîrsgirêkeka din heye: Ji ber ku kurdîya kurmancî qedexa bû û pê perwerde tunebû, berî her tiştî kêşeya nivîsîna bi kurmancî xwe da der. Derfetên îfadekirina nivîskaran qels bûn û di warê zanist û termên nû da nivîskaran zehmetî dikişandin. Ev yek li gor salan di rêjeya çapkirina kitêban da şênber dibû.¹⁶²

Herweha, weşanxaneyên kurd, li gel van pîrsgirêkên navborî, bi saya înternetê bazara xwe dikarin berfireh bikin, di “fuarên kitêban” da cih bigirin û ji bo danasîna kitêb û nivîskaran, ji îmkanên reklamdayîne sûd werbigirin.

¹⁵⁹ Mevlüt Oğuz, “Li Bakur û Tirkîyê Weşangerî Ber bi Têkçûnê ve Diçe”, The Hall Kurdi, E-kovara çandî ya mehane, hejmar 7 Tirmeh 2022, r.29-30.

¹⁶⁰ <https://diyarname.com/news.php?Idx=55919>, TB:06.11.2022.

¹⁶¹ <https://www.indyturk.com/node/531756/haber/k%C3%BCrt%C3%A7e-haz%C4%B1rlanan-y%C3%BCksek-lisans-ve-doktora-tezlerinden-45i-kitapla%C5%9Ft%C4%B1r%C4%B1ld%C4%B1> TB: 14.07.2022

¹⁶² Malmîsanij, *hb.* r.51.

3.2.1.2.3 Şano

Şano wekî cureyekî edebîyatê bûye parçeyekî kulîyata kurdî ya modern. Şanogerîya kurdî li gor dewletên cîran, dereng dest pê kirîye. Ji alîyê ragihandina girseyî ve jî, bandora şanoyê li gor sînemayê kêmîtir e. Derengmayîna şanogerîyê bi paşdemayîna avakirina “nasnameya neteweyî” ve tê girêdan.¹⁶³

Li Tirkîyeyê, herçend, rêça şanoya bi kurdî heta salên 1970yî jî biçê, di salên 1980yî da bi xebatên Navenda Çanda Mezapotamyayê (NÇM), şanoya kurdî geş dibe.¹⁶⁴ Ev rewş piştî salê 1990î her diçe geştir dibe. Îro li bajarên wekî Stenbol, Dîyarbekir, Van, Batman û hwd. listikên şanoyê di sahneyên biçûk da ji alîyê komên şanoyê yê cîyawaz ve, tên listin.¹⁶⁵

Çetoyê Zêdo vê rewşê weha rave dike:

Geşedana şanoya kurdî, bi ziman û temaşevanê xwe, ji temsîla destpêka xwe ya li Stenbolê (1991) heta îro bi gavên biçûk jî be, bênavber tecrube kirîye. Pêkhatina hunera şanoya kurdî, li Tirkîyê û Bakurê Kurdîstanê bi dîroka nêz ya siyasî û bi xwedîtiya sazîyên çand û hunerî têse girtîye. Li Bakurê Kurdîstanê bêstatubûna kurdan û qedexebûna li ser kurdî, bûye sedem ku heta 1991ê şanoya kurdî li Tirkîyê hebûna xwe nîşan nede. Ji avakirina Komara Tirkîyê heta 1991ê, weke hemû mijarên kurdî, şanoya wê jî qedexe ye û ne berbiçav e. Ji ber qedexebûna li ser ziman û çanda kurdî heta sala 1991ê, şanoya kurdî li Tirkîyê û li Bakurê Kurdîstanê (ji bilî şanoyên bi formên gelêrî) pêk nehatiye. Ev jî heye ku heta 1991ê li Tirkîyê û Bakurê Kurdîstanê, berhem û temsîlên şanoya Kurdî yê perçeyên din jî nayên zanîn. (...) Şanoya kurdî ya li Bakurê Kurdîstanê û li Tirkîyê; ji destpêka 1991ê heta niha em dikarin bi sê serdeman ji hev veqetînin:

- Li Bajarên Tirkîyê Gavên Destpêkê (1991-2002)
- Pêkhatina Şanoya Kurdî li Bakurê Kurdîstanê (2002-2009)
- Pêvajoya Nû û Hewldanên Berbelavbûna Şanoyê (2009-2016)¹⁶⁶

¹⁶³ Hassanpour, *hb.* 2005, r. 497-498.

¹⁶⁴ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 192.

¹⁶⁵ <https://cetoyezedo.blogspot.com/2019/02/pesbaziya-sanoya-kurdi-ji-li-car.html?spref=tw>, TB:01.01.2023.

¹⁶⁶ <https://cetoyezedo.blogspot.com/2019/06/di-sedsaliya-sanoya-kurdi-de-ji-caran.html>, TB:01.01.2023.

Dîyar e ku em îro dikarin behsa şanoya kurd bikin ku, bo nimûne, Festîvala Şanoyê ya Amedê ya 8em (2022) hat lidarxistin. Ji dewletên cîran, şanogerên kurd beşdarî vê festîvalê bûn. Herweha li Wan, Stenbol, Batman û Dîyarbekir komên şanoyê hene û hunerên xwe bi cih diînin.¹⁶⁷

Ji alîyê bicihkirina zimanê standard û parastina devok û hêmanên folklorîk, şano jî xwedî fonksiyoneka giring e. Bêguman, bikaranîna zimên di şanoyê da jî, prestîja wî zimanî dinimîne.

3.2.1.2.4 Rojname

Li gor çarçoveya teza me, eger em li pêwendîya di navbera “rojname” û zimên da binêrin, em ê têkilîyeka yekser û xurt bibînin. Wekî ku tê zanîn rol û erka rojnamegerîyê di nav civakê da her giring bûye. Lewra, “rojname” li ser jîyana civakê bibandor e. “Rojname” dema ku erkên xwe yên adetî bi cih diîne, bi zimanê ku diemilîne û bi hewendina cureyên edebî yên ku wekî roman, helbest, şano û hwd. karîgerîya xwe ya li ser civakê her roj nû dike.

Li gel bikaranîna zimanî ve, rojname, bikarhênerê rêziman, ferheng û rastnivîsînê ye jî. Lê, ya herî mihîm jî, wekî ku me li jorê, di beşên alaquadar da amaje pê kiribû, ji alîyê “standardkirina zimanî” da, ji bo qonaxa “pêkanîn”ê jî, “rojname” roleka navendî dilîze. Zimanê ku “rojname” bi kar diîne ji bo standardkirina zimanî erkeka jîyanî pêk diîne. Wekî dê bê zanîn, bi gelemperî weşangerî û nexasim kovargerî û rojnamegerî di belavbûn û hezmandina zimanê standard da, li gel dezgehên din xwedî fonksiyon in.

Rojnamegerî dîyardeyeka modernîteyê ye. Di hişmendîya neteweyî, zimên û edebîyata kurdîya kurmancî da giringîyeka wê ya taybetî heye. Lê, dîyar e ku di nav kurdan da dereng dest pê kirîye. Di vê çarçoveyê da, li gel rawestan li ser pêvajoyê, wekî nimûne, em ê li gor giringî û karîgerîya wan, behsa hin rojnameyan jî bikin.

¹⁶⁷ <https://www.gazeteduvar.com.tr/amed-tiyatro-festivali-basladi-haber-1585764> , TB: 01.01.2023.

Li Rojava, piştî îcadkirina “çapxane”yê, di sedsala 17em da bi awayekî rasteqîne çapemenîyê dest pê kirîye. Di vê serdemê da dikare behsa “rojnamegerî”yê bê kirin. Li alîyê din, nimûneya ewil a serdema Osmanîyan jî piştî du sed salan tê dîtîn (1831). Herwisa, wekî ku tê zanîn, “rojnamegerîya kurd” jî, dê di sala 1898an da şênber bibe. Divê bê destnîşankirin ku herçiqas hin xebat hebin jî, herwce ye ku rojnamegerîya kurdî hêjayê lêkolîn û nirxandinên serbixwe ne.¹⁶⁸

Li gor Mesûd Serfîraz jî, “Rojname û kovarên çapkirî ku bi awayekî bi lez digihijîne ber destê sedan, hezaran û belkî hê zêdetir kesan, di belavkirina fikr û ramanan de, di avakirina rayeke giştî û zimanekî hevpar de roleke sereke dilîzîn. Kurd di dawîya sedsala 19an de dibin xwedîyê vî amûrî.”¹⁶⁹

Wekî ku me amaje pi kir, rojnamegerîya kurdî pala xwe dide sala 1898an. Di serdema dawî ya Osmanîyan da, li mişextîyê, li bajarê Qahîreyê rêwîtiya rojnamegerîya kurdî bi weşana Rojnameya Kurdistanê dest pê dike. Piştî 31 hejmaran di sala 1902an da jî weşana wê li Cenewreyê bi dawî dibe. Avakerê wê Mîqdad Mîdhed Bedirxan e. Ji ber zexta desthilatdarîya Osmanî, Rojnameya Kurdistanê ji neçarî gelek cih diguherîne. Li welatên cîyawaz ên Ewropayê, wekî Cenewre, London û Folkstonê weşana xwe bi destê Abdurrahman Bedirxan didomîne. Herçiqas, Rojname karê xwe yê bingehîn bi cih biîne jî; li gel nûçegîhanîya xwe, li ser rewşa aborî û civakî ya kurdan jî radiweste. Mîqdad Bedirxan dixwaze ku giringîya “zanyarî”yê û “têgihîştîna”ê bi kurdan bide famkirin.¹⁷⁰

Bi vegotina Fetullah Kaya jî di serdema Qahîreyê da armanca Mîqdat Mîdhat Bedirxan ew e ku rojnameyê bi mebesta perwerdeyê bi kar biîne. Lewra, li gel haydarkirina xwînerên xwe ji geşedanên cîhanî, nîşandayîna “îlm û merîfet” û handana xwendin û nivîsînê jî wekî armanc daye ber xwe.¹⁷¹

¹⁶⁸ Kaya, *hb.* r. 35-38.

¹⁶⁹ Mesûd Serfîraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane*, Peywend, Stenbol, 2015, r. 36.

¹⁷⁰ [https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Kurdistan_\(rojname\)](https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Kurdistan_(rojname)) , TB: 25.12.2022.

¹⁷¹ Kaya, *hb.* r. 70-72.

Zimanê Rojnameyê bi herfên erebî, ewilî xwerû bi kurdî, piştê kurdî-osmanî û kurdî-tirkî ye.

Naveroka rojnameya Kurdistanê pîrr dewlemend nebe jî, li ser çand û dîroka kurdan, rewşa sîyasî û civakî ya wê demê gelek nivîsên balkêş û sereke têde hatine belavkirin. Mem û Zîn, wek matbu cara yekemîn di nav rûpelên Kurdistanê de beş bi beş têde çapkirin; li ser dîroka Mîrên Botan rêzenivîsek dirêj ji alî Evdirehman Bedirxan ve hatîye nivîsandin û belavkirin; li ser perwerdeyîya zarokan, hînbûna pîşe û hunerên nû û hişyariya milletê kurd nivîsên cûr bi cûr hatine belavkirin.¹⁷²

Dîyar e ku bi saya vê Rojnameyê, di nav kurdan da, wekî dîyardeyeka modern, hişmendîya zimanî û hezkirina ji xwendina bi zimanê xwe pêk hat. Ev yek bi nameyên xwînerên Rojnameyê jî tê piştraskirin.¹⁷³

Wekî rojnameya duyem a serdema Osmanîyan, di sala 1908an da, bi navê “Kurd Te’avun ve Terakkî Gazetesi (Rojnameya Arîkarî û Pêşveçûna Kurdan)” derdikeve. Ev Rojname ji aliyê “Kurd Te’avun ve Terakkî Cem’îyyeti” ve tê weşandin. Xwedî û berpisê wê Suleymanîyelî Tewfîq (Pîremêrd) û sernivîskarê wê jî Dîyarbekirli Ehmed Cemîl e. “Tê de fikra Osmanîtiyê xuya dike, lê di asta kulturî de neteweperwerîyeke kurdî jî heye.”¹⁷⁴ Li gor Serhad B. Rênas jî, “di wê demê de ev rojname gelek deng veda û bandoreke mezin li ser gelê kurd kir.”¹⁷⁵

Piştî Rojnameya Kurdîstanê Rojnameya duyem e ku bi kurdî (kurmancî-soranî) tê weşandin. Cara ewil e ku di vê Rojnameyê da soranî jî tê bikaranîn. Herweha, weşana wê jî heftane ye û wekî Rojnameyeka legal, berwajî Kurdîstanê, bi hêsanî dihat belavkirin. Rojname herî kêr 9 hejmar derketîye. Mijarên wekî ziman û edebîyat, ji bo perwerdeya bi zimanê kurdî daxwaza xwendingehê, dihatin nîqaşkirin.¹⁷⁶

¹⁷²<https://candname.com/rojnamegeri-u-wesangeriya-kurd-di-navbera-salen-1898-1923-de/>, TB: 25.12.2022.

¹⁷³ <https://journo.com.tr/ilk-kurtce-gazete-kurdistan>, TB: 25.12.2022.

¹⁷⁴ Serfîraz, *hb.* r. 41.

¹⁷⁵ Serhad B. Rênas, *Medyaya Kurdî û Medyaya Nû*, Ronahî, Stenbol, 2013, r. 41.

¹⁷⁶ Kaya, *hb.* r. 79-82.

Piştî serdema Osmanîyan, li Tirkîyeyê, ji ber polîtîkayên ku Komarê dimeşand, ji bilî hewldanên biçûk, rojnamegerîya kurdîya kurmancî, maweyeka pir dirêj bêdeng ma. Ev yek heta salên 1950yê berdewam bû. Herçiqas bi zimanê tirkî be jî em dikarin behsa rojnamegerîya kurdan bikin. “Dicle Kaynağı” (1949), “Şark Mecmuası” (1950) û piştî Rojnameya “İleri Yurt” (1958) ku helbesta navdar ya bi navê “qimil” dihewand, nimûneyên vê pêvajoyê ne. Herwisa li gel nimûneyên din, rojnameyên ku derketine, bi zimanê tirkî û bi gelemperî wekî “organên propagandayê” yên partî û komên kurd bûn. Wekî ku me li jorê jî behs kir, ev yek heta sala 1979an da bi derketina “Kovara Tîrêj”ê diguhere ku ev kovar, xwerû bi zimanê kurdî tê weşandin.¹⁷⁷

Piştî derbeye leşkerî ya 1980yê, rojnamegerîya kurdan bi şêweya hewldanên partî û rêxistinî û bi zimanê tirkî xwe dide der. Karîgerîya şert û mercên vê serdemê li ser rojnamegerîya bi kurdî dîyarker bû. Di destpêka salên 1990î da jî zimanê tirkî di weşangerîya kurd da li dar bû. Lê, nimûneyeka awarte hebû ku bi navê “Rojname” rojnameyeka xwerû bi kurdî derket. Lê, ev Rojname piştî hejmara yekem, weşana wê bi dawî dibe. Piştî vê Rojnameyê, di sala 1992an da Rojnameya “Welat” xwerû bi kurdî, dest bi weşanê dike. Ji ber pirsgerêkên zagonî bi navê “Welatê Me” (1995), heta sala 1996an, weşana xwe didomîne. Piştî girtina “Welatê Me”, di sala 2006an da “Azadiya Welat” dest bi weşana xwe ya rojane dike. Rojnameya “Azadî” (1992) jî ku du zimanî ye (kurdî-tirkî) bi heman pirsgerêkan bi heft navan derdikeve.¹⁷⁸

Nimûneyeka din, di sala 2007an da wekî rojnameyeka rojane, “Dengê Welat” hat weşandin. Ji alîyê rojanebûnê da wekî mînaka duyem, a vê serdemê, hatîye qebûl kirin. Armanca vê Rojnameyê ya serek bipêşxistina zimanê kurdî bû û herweha mijarên wekî çand, huner, sîyaset, edebîyat û civak di Rojnameyê da cih digirtin.¹⁷⁹

¹⁷⁷ Rênas, *hb.* r. 45-47.

¹⁷⁸ Rênas, *hb.* r. 52-54.

¹⁷⁹ Kaya, *hb.* r. 208-209.

Niha, rojane û xwerû bi kurdî (kurmançî-kirmanckî) rojnameya ku tê weşandin, “Rojnameya Xwebûn”ê ye. Di sala 2019an da dest bi weşanê kir. Li ser babetên wekî edebîyat, ziman, çand, aborî û sîyasetê radiweste. Li Tirkîyeyê, tekane ku bi kurdî diweşe, ev Rojname (çapkirî û dijîtal) ye.¹⁸⁰

Dîyar e ku ji ber rewşên sîyasî û aborî yê guherbar, rojnamegerîya kurdî negihîştîye asteka qanîhker. Hejmara rojnameyên kurdî, bazara weşangerîya kurdî, derfetên belavkirinê, kaxiz, pisporî û karzanî (expertise), resmal (capital) û hwd. wekî pirsgerêkên ango îmkanên çapemenîya/weşangerîya kurdî xuya dikin. Hewrwisa, digel rojnameyên ku me li vir behsa wan nekiriye, rojnamegerîya kurdî, her di nav têkoşîneka sîyasî, zagonî û aborî da maye.

3.2.1.2.5 Sînema

Wekî tê zanîn sînema şaxeka hunerî tê qebûlkin. Îro êdî behsa “endustrîya sînemayê” tê kirin. Lewra, bi ekonomîya xwe îro li seranserê cîhanê xwedî bandoreka mezin e. Herwisa, sînema bi produksiyonên xwe jî, li ser hest û ramanên mirovan bibandor e. Wekî cureya amûreka ragihandina girseyî, bi qasî televîzyon, radyo û şanoyê li ser civakê karîger dibe.

Wekî me di beşên jorîn da jî amaje pê kir, polîtîkayên zîmanî yê ku dihatin meşandin çawa li ser zimanê kurdî bandor kirîye, herwisa, li gel van polîtîkayên zîmanî, astengiyên polîtîk û aborîyî jî rê li ber “sînemaya kurd” girtîye.

Herwekî radyo û televîzyonê, di sînemayê da jî bikaranîna zîmanekî nîşandeka prestîj û meşrûiyeta wî zîmanî ye. Bikaranîna zîmanê kurdî dikare wekî reftareka dij-asîmîlasyonî jî bê qebûlkin.¹⁸¹

Li gor Salih Akin,

¹⁸⁰<https://m.bianet.org/bianet/medya/261007-kurtce-gazeteyle-kurt-toplumuna-ulasmak-istedik>, TB:28.12.2022.

¹⁸¹ Hassanpour, *hb.* 2005, r. 495.

Em dikarin sînemeya kurdî bi salên 1990ê bidin destpêkirin. Digel ku berîya van salan jî gelek film, wek Zarê ku di sala 1925an de li Ermenîstanê hatîye kişandin, bi babetên kurdî re eleqedar bûn, heta salên 1990ê di filmên kurdî yên ji aliyê derhênerên kurd ve hatine teswîrkirin û çêkirin de, zêdebûnek bi vî rengî nehatibû dîtin û xwe di nav sîneamatografiya navneteweyî de bi cih nekiribû.¹⁸²

Ji bo fonksiyona sînemaya kurdî jî weha lê zêde dike: “Wek amûreke temsîliyetê ji bo eşkerekirina mercên jiyanê yên hejar, paşdemayina heremên Kurdan û siyaserên dewletên zordar, sînema ji aliyê derhênerên kurd ve jo bo çendîn fonksiyonan hate însturamîzekirin.”¹⁸³

Li gor lêkolîna Ekrem Yıldız jî:

Di destpêka salên 1990î da rabûna qedexeyên qanûnî yên li pêşiya zimanê kurdî li Tirkîyeyê, rê vekir ku di van bîst salên dawî da zimanê kurdî wekî zimanê hunerê berbelav bibe. Ji destpêka salên 2000î heta îro di filmên hindêk derhênerên tirk û derhênerên kurd da, kurdî wekî zimanê yekem yan jî zimanê duyem hatiye bikaranîn. Her çiqas berî salên 2000î zimanê kurdî di çend filmên tirkî da hatibe bikaranîn jî, ji ber şert û mercên polîtîk, bi taybet piştî salên 2000î, filmên kurdîziman zêde bûne.¹⁸⁴

Herwisa ji bo bikaranîna zimên di sînemayê da weha lê zêde dike:

Bikaranîna zimanê kurdî di filmên kurdî da bi rêya kurdîaxêviya karakteran û bikaranîna muzîka kurdî di filman da, li ser naveroka filmên kurdî tesîrê dike. Bi gotineka din, bicihkirin û bikaranîna zimanê kurdî di filmên kurdî da peywendiyeka surîştî durist dike di navbera naverok û karakterên filmên kurdî da. (...) bikaranîna zimanê kurdî di filmên kurdî da bi erka şikandina kodên polîtîk yên veşartina kurdîniyê û deşîfrekirina kodên kurdîniyê dibe amrazekî serekî. Lewma, bi taybet di filmên kurdî yên li Tirkîyeyê da, zimanê kurdî ji pêkhateyeka surîştî ya filmîk zêdetir, gelek caran bi erka nîşandan û deşîfrekirina kodên kurdîniyê tê bikaranîn.

Dîyar e ku sînemaya kurdî, bi gelemperî, bi motîvasiyona egerên polîtîk û endîşeyên zimanî û çandî tevdigere. Ji ber taybetmendiyên wê, zimanê sînemayê pîrzaravayî û

¹⁸² Salih Akin, *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*, Avesta, İstanbul, 2013, r.184.

¹⁸³ Akin, *hb.* 2013, r.187.

¹⁸⁴ Ekrem Yıldız, *Kurtefilm Wekî Cih û Amûrê Bikaranîna Zimanê Kurdî*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019, (Teza Masterê ya Çapnebûyî), r. V.

herêmi be jî bikaranîna zimanê standard jî tê dîtin. Wekî amûren ragihandina girseyî yê din karîger nebe jî, sînema ji bo statû û prestîja zimanî bi bandore e.

3.2.1.2.6 Radyo

Radyo jî di nav amûrên ragihandina girseyî de cihê xwe digire. Ji aliyê parastin û bipêşvebirina zimanî da, wekî televîzyonê, ji bo zimanên kêmine ango bindest gelekî giring e.

Îro, wekî televîzyonê, radyo jî ji bo parastina hebûna zimên û belavkirina çandê roleka sereke dilîze. Ev yek ji armanca bikaranîna radyoyê ji aliyê dewletên bi bandor ve li hember zimanê kêmineyan jî xuya dike. Lewra, weşanên radyoyê wekî amûreka povajoyên asîmîlasyonê tê xebitandin.

Li hêla din, wekî ku me behs kir, têkilîyeka xurt di navbera weşangerîya radyo-televîzyonê û hêmanên standardkirina zimanî da heye. Di van amûrên weşangerîyê da zimanê standard tê bikaranîn. Û bikaranîna vî zimanî, her diçe, di nav civatê da dibe nîşana statûyê. Di nav kurdan da, ji ber pir-diyalektî û cot-standardîyê, têkilîya ku me destnîşankir, bêhtir aloz e.¹⁸⁵

Li Tirkîyeyê, di sala 2002yan da, “Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê” (RTÜK) bi rêzîknameyekê, ji bo TRTyê, rê li ber weşanên ji bilî tirkî vekir. Lê ev destûr bi çend awayan sînorkirî bû. Di sala 2003yan da jî, ji bilî TRTyê sazîyên din ên televîzyon û radyoyan, derfeta weşanên ji bilî tirkî bi dest xistin. Di vê çarçoveyê da di sala 2004an da TRTyê dest bi weşana kurdî kir. Herweha, sînorên li ser weşangerîya kurdî ya TRTyê di sala 2009an da hatin sistkirin. TRT 2009an da 24 saet dest bi weşana kurdî ya radyoyê kir. Di 2010 da edî weşanên bi zaravayên din ên kurdî, ji bo dezgehên ku destûr dixwastin, mimkin bû. Lê, gelek ji van, paşê, bi KHKyan hatin girtin.¹⁸⁶

¹⁸⁵ Hassanpour, *hb.* 2005, r. 435.

¹⁸⁶ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 90-91, 95.

Radyoya TRT-Kurdîyê ji sala 2009an vir da, bi gelemperî weşana muzîka kurdî dike. Herwisa, bi rêya satelît û înternetê jî digihîje her derî. Herwisa ji alîyê kes û dezgehên sîvîl jî radyoyên ku bi kurdî weşanên dikin hene. Lê, piraniya van radyoyan herêmî ne û weşana nûçe û muzîka kurdî dikin. Ji bo van salên dawîn em dikarin bibêjin ku weşangeriya radyoyê jî ji îmkanên înternetê sûd werdigire û ji bo wan sînorên wekî “cîh” û “dem”ê êdî tune ye.

Lê, divê em destnîşan bikin ku di mînaka kurdan da, têkilîya radyoyê û bipêşxistina zimanê standard lawaz e û wekî televîzyonan bi bandor nînê.

3.2.1.2.7 Televîzyon

Wekî ku me li jorê jî destnîşan kir, Komara Tirkiyeyê ji avabûna xwe, bi feraseteka netewedewletê hewl daye ku li gor vê ferasetê polîtîkayên zimanî biafirîne. Herweha, bîngeha van polîtîkayên zimanî jî li ser tirkî ava kir. Lê, di pêvajoya endamtîya Yekîtîya Ewropayê da bi guhertinên qanûnî yên pêwîst, ji bilî tirkî, bi ziman û zaravayên din jî rêya weşangeriya televîzyonê hat vekirin.¹⁸⁷

Wekî amûreka ragihandina girseyî, ji bo giringîya televîzyonê mirov dikare bibêje ku pêşketinên di cîhana “ragihandin”ê da, bi taybetî di nîveka duyem a sedsala 20em da, bi awayekî şexsî û civakî bandoreka mezin li mirovatiyê kirîye. “Ragihandina girseyî” (mass communication) êdî bûye amûra jiyane ya jêner. Di nav “medyaya girseyî” da jî, nexasim televîzyon, ji ber ku bi hêsanî tê gihîştin (reachable) û bikarhatin (consumption), medyaya girseyî herî zêde bandorê li ser civakan dike.¹⁸⁸

Li gor tecrîbeyên îroyîn mirov dikare bibêje ku karîgeriya televîzyonê li ser zimên gelek mezin e. Lewra, bandora her cure bernameyên televîzyonan li ser bikaranîna zimanî dîyar e û herwisa helwesta zimanî ya civakê jî dibe ku ber bi zimanê standard ango sereke ve biguherînin.

¹⁸⁷ Ak, *hb.* r. 41.

¹⁸⁸ Karabeyeser, “hg”. r.385.

Li gor riwangeha Karabeyeser jî:

Medyaya girseyî gelek caran di qada zimanî da xwedî nirxeka birûmet e. Zimanê ku ji hêla van amûran ve tê bikaranîn bi gelemperî bêyî hewcedariya filtrekirinê ji aliyê temaşevanan ve tê pejirandin. Amûrên ragihandina girseyî xwedî hêza bilêvkirin, hilberandin an jî guhertina peyvan in. Medya di standardkirina zimanî da ne çalak be jî, ji ber ku di qada bikarnînê da berbelav e, gelek caran dikare ji sazîyên zimanî bibandortir be.¹⁸⁹

Di çarçoveya têkilîya zimên û televîzyonê da du nimûneyên balkêş hene ku hewceye em amaje pê bikin: Di standardkirina zimanî da, li Îngîlîzîstanê, televîzyona BBCyê roleka mihîm listîye û herwisa li Tirkîyeyê jî, di pejirandina “devoka Stenbolê” da bi heman şeweyê diyarker bûye. Aşkera ye ku televîzyon di “pêkanîna” zimanekî da, di nav amûrên ragihandinê da, xwedî bandoreka mezin e. Li hêla din, hêja ye ku mirov wekî xetereyekê destnîşan bike ku televîzyon dema ku zimanekî bi pêşve dixê, dibe ku di heman demê da pêşketina zimanên din bide sekinandin jî.

Heta sala 2004an ji bilî bi zimanê tirkî, di zimanên din da tu weşanên televîzyonê tunebû. Di sala 2004an da di TRT-3yan da, ancax bi 30 deqîqeyan kurmançî û kirmanckî derfeta weşanê hat bidestxistin. Piştê, di sala 2009an da TRT-6 (paşê TRT-Kurdî) dest bi weşana bi kurdî kir. Di TRT-6ê da her cure bername hebûn: Ji sîyasetê bigire, heta nûçe, tenduristî, spor û herweha aborî dihatin weşandin.¹⁹⁰

TRT-6 cara ewil bû ku di dîroka Komara Tirkîyeyê da wekî kanala TRTyê, ji bo kurdan weşaneka bênavber dikir, hatibû damezirandin. Di sala 2015an da navê kanalê wekî TRT Kurdî hat guhertin. Herweha, weşanên TRT Kurdîyê bi sê zaravayan tê kirin. Lê, zaravayê sereke kurmançî ye û pîranîya bernameyan bi vî zaravayê ye. Wekî ku me li jorê jî behs kir, bernameyên TRT Kurdîyê ji nûçe, zarok, perwerde, çand û huner, rêzefilm, spor, sînema û şahîyê pêk tê.¹⁹¹

¹⁸⁹ Karabeyeser, “hg”. r. 389.

¹⁹⁰ Karabeyeser, “hg”. r. 389.

¹⁹¹ Ak, *hb*. r. 49-50.

Di xebateka sehayî da alîkarîya TRT Kurdîyê ji bo kurdî hatîye pîvandî. Li gor vê xebatê, ji %57.2 kesên ku beşdarê anketê bûne, bandora TRT Kurdîyê li ser zimên a erênî piştrast kirine.¹⁹²

Wekî me li jorê jî destnîşan kir, amûrên weşangerîya kurdî, jo bo zimanê kurdî yê standard derfeteka modern derdibirîne. Lewra hêza amûrên ragihandina girseyî li ser telefiz û dariştina peyvan zêde ye. Bi hin taybetmedîyên xwe televîzyon ji sazîyên zimanî zêdetir karîger in.¹⁹³

Herwisa, bi dehan salan e ku bi saya “weşangerîya satelît”ê rê li ber weşangeriya kurdî ji vebû. Bi derfetên satelîtê, kurdên Tirkîyeyê ji Ewropayê, weşangerîya bi kurdî ya “sîyasî” kirin. Wekî din, ji Îraq, Îran û Suriyeyê jî televîzyonên ku bi kurdî weşanan dikin li ser civakên kurdan ku di nav van çar dewletan û dewletên din ên ku kurd tê da dijîn, bandor lê dikin.

Bo nimûne, di sala 2009 da kanalên ku bi rêya satelîtê, ji Ewropa û welatên cîran ên din, ku weşanên bi kurdî dikirin ev bûn: Roj TV, Mezopotamya TV, MMC TV, Newroz TV, Kurdîstan TV (Îraq), Zagros TV (Îraq), Kurdsat TV (Îraq), Galî Kurdîstan (Îraq), Peyam (Îraq), Newroz TV (Îraq), Sahar TV (Îran), Rojhilat TV (Îran), Komele TV (Îran) û Kurd 1.¹⁹⁴

Di vê çarçoveyê da hêja ye ku em behsa Zarok TV bikin. Zarok TV ku di sala 2015an de dest bi weşana dike, li Tirkîyeyê yekem televîzyon e ku ji bo zarokan weşanê dike. Kanala ku navenda wê li Dîyarbekirê ye, li gel xêze-filman cih dide bernameyên ji bo zarokan.¹⁹⁵

¹⁹² Ak, *hb.* r. 114.

¹⁹³ Karabeyeser, “hg”. r. 389.

¹⁹⁴ Esra Arsan, *Türkiye Kürtlerinde TRT Şeş Algısı: Anadilde Yayıncılık Üzerine Bir Araştırma*, İstanbul Bilgi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İstanbul, 2014, r. 31.

¹⁹⁵

https://tr.wikipedia.org/wiki/Zarok_TV#:~:text=Zarok%20TV%2C%2021%20Mart%202015,y%C3%B6n%20programlar%20da%20yer%20almaktad%C4%B1r,TB:29.12.2022

Dîyar e ku van televîzyonan ji bo zarok û mezinan wekî dibistanên zimanî erkeka binirx bi cih diînin. Ev yek jî, “pêkanîn” a zimanî her diçe dê hêsantir bike.

Di dawîya vê beşê da ji bilî bernameyên “nûçe”yan û yên din, divê em balê bikêşin ser giringîya “rêzefilm”an jî. Wekî me li jorê jî amaje pê kir ku televîzyon bi awayekî giştî ji bo pejirandina normên zimanî bi bandor e. Li gel vê, bi saya rêzefilman awayê axivîna kesan, bikaranîna qalibên zimanî, şarezatîya têgihîştina zimanî û bikaranîna wî mimkin dibe. Temayên ku di rêzefilman da tê emilandin xwe dispêrên jîyana rasteqîn a civakê. Û herweha rêzefilm nîşaneyê guherînên “cîvakî-çandî” jî ne. Wekî ku tê zanîn, rêzefilm wekî peryodîk tên weşandin û digel taybetmendiyên xwe li ser civakê bibandor in. Bo nimûne, dikare bi raçavkirin ku hin rêzefilmên TRT-Kurdîyê hem çanda kurdî, ku di nav jîyana metropolan da di bin xetereyê da maye, vedijîne û hem jî zimanê ku bi kar diîne, wekî zimanê standard berbelav dike.

3.2.1.2.8 Înternet

Teknolojîya înternetê piştî sala 1993an li cihanê dest bi belavbûnê dike. Di sala 1995an da êdî bi awayekî giştî tê bikaranîn. Ji ber taybetmendî û îmkanên ku dabîn dikir, di nav çend salan da, li seranserê cîhanê hat pejirandin.

Li gor serê sala 2022yan li seranserê cîhanê, hejmara bikarhênerê înternetê gihîştîye 4,95 mîlyar kesan. Li hêla din, bikarhênerên “medyaya civakî” jî 4,62 mîlyar kes in. Bo nimûne, ji platformên medyaya cîvakî, wekî “Facebook” ji aliyê nêzikî sê 2,910 mîlyar kesan û “Youtube” jî, ji aliyê 2,562 mîlyar kesan zêdetir tên bikaranîn.¹⁹⁶

Li Tirkîyeyê jî piştî sala 2000an bikaranîna înternetî zêdetir berbelav bû. Li gor sala 2022yan rêjeya bikarhênerê înternetê, ji bo kesên ku temenên wan di navbera 16 û 74an da

¹⁹⁶ <https://recrodigital.com/dunyada-ve-turkiyede-internet-sosyal-medya-kullanimi-2022/>, TB: 29.12.2022.

ne, ji sedî 85 e. Herwisa rêjeya bikaranîna platformên navdar jî weha ne: Youtube %67,2, Instagram % 57,6 û Facebook % 50,4.¹⁹⁷

Herweha, îro zimanên ku di internetê da herî zêde ku tên bikaranîn, îngîlîzî, çînî, spanyolî, japonî, almanî, rusî, fransizî, portekîzî, koreyî û erebî ne.¹⁹⁸

Înternet jî wekî amûreka “ragihandina girseyî” tê qebûlkirin. Lê, bi taybetmendiyên xwe ji her cure ragihandinên girseyî yê din karîgertir e.

Wekî ku tê zanîn teknolojiya internetî “onlîne” e. Bi saya internetê di nav kesan da têkilî û ragihandina “hevbandorî” (interactive) û “pevragihandin”a (communication) “onlîne” mimkin bûye. Ne tenê kes, herwisa, di nav her cure sazî û dewletan da jî heman têkilî mimkin e. Herwisa, internet, ji aliyê rabûna astengiyên wekî “cîh” û “dem”ê ve jî, bûye amûra herî giring ya vê serdemê.¹⁹⁹

Îcar, ji aliyê mijara me ve, em dikarin bibêjin ku internet ji bo rojnamegerî û kovargerîya onlîne amûreka modern û kêrhatî ye. Çapemenîya dijîtal bi saya vê teknolojiyê pêk tê. Ji bo perwerdeya zimên û herwisa, qonaxa “pêkanîn”ê ya standardkirina zimanî jî derfeteke pir hêja ye. Herçend, ne di asteka têrker da be jî, xebatên zimanî li ser internetê belav dibin û internet wekî îmkan tê nirxandin.

Îro internet jo bo kes û civakan, ji aliyê “gihînbarî” (accessible) û bidestxistina zanyariyan wekî zemîneka “demokratîk” tê nirxandin. Ji ber vê yekê, civak û zimanên neserdest bi saya internetê rewşa xwe ber bi başiyê ve dikarin biguherînin û bi bernameyên onlîne, berbelavkirina bikaranîna zimanê xwe pêk bînin. Herwisa, bi amadekirina

¹⁹⁷ <https://www.aa.com.tr/tr/gundem/turkiyede-internet-kullanlarin-orani-yuzde-85e-yukseldi/2669851#>

¹⁹⁸

https://tr.wikipedia.org/wiki/Dillerin_%C4%B0internet_%C3%BCzerindeki_kullan%C4%B1l%C4%B1m%C4%B1#:~:text=W3Techs%20taraf%C4%B1ndan%20yap%C4%B1lan%20ara%C5%9F%C4%B1rmaya%20g%C3%B6re,%2C%20Frans%C4%B1zca%2C%20%C4%B0talyanca%20ve%20Portekizcedir.,TB:29.12.2022.

¹⁹⁹ Rênas, *hb.* r. 114.

materyalên dijîtal jî, perwerdeya kurdî ya onlîne bi saya înternetê mimkin e. Di van salên dawî da, ji alîyê kes û sazîyan ve hewlên bi vî rengî hene.

Bo nimûne, bi saya înternetê û teknolojîya îroyîn, perwerdeya “mobîl”, hînkirin û fêrbûna zimanî jî mimkin bûye. Lewra, di roja me da, li ser telefonên mobîl (cell phone/mobile phone) bi rêya “sepan”an (applications) wekî ferheng, alfabeya kurdî, mijarên rêzimana kurdî û rastnivîsîn, bernameyên curbicur, tên weşandin. Xebatên bi vî rengî, ji alîyê kesên kurdîhez û dezgehan ve tên meşandin û bi rêya înternetê li seranserî cîhanê belav dibin.

Herweha, dikare bê çavderîkirin ku :

Bi derfetên serdema înfomatîkê ra ji bo zîmanê kurdî xebatên li ser ferhengê hatine kirin, derbasî li ser înternetê bûn. Bi saya înternetê, ferhengê kurdî yê online ji herkesî ra û di her demê da gihanîya wan pêkan bû. Lêkolînên li ser ferhangan dihên kirin, têkildarî qada ferhengnasîyê ne ku di van salên dawî da wek zanistekê serbixwe xebatên xwe dimeşîne.²⁰⁰

Di vê babetê da pêwîst e ku mirov behsa Ajansa Anadoluyê (Anadolu Ajansı) jî bike ku wekî ku tê zanîn, ev ajans sazîyeka fermî ya dewletê ye. Herweha, ajans ji bilî tirkî bi duwazdeh zimanên din li ser înternetê jî weşanê dike; li gel soranî, bi kurmancî jî weşana dijîtal heye. Li ser malpera kurmancî nuçegihanîya sîyaset, aborî, zanist, spor û hwd tê kirin. Dîyar e ku ev malper jî bikaranîna kurdîya kurmancî û xuyanga zimanî zêde dike.²⁰¹

Wekî encam, em dikarin bibêjin ku, bi hêza înternetê, îro ji bo kurmancîyê “pêkanîn” û “hûrgilîkirin” zêdetir mimkin bûye. Û her diçe prestîja zimanî jî zêde dibe.

²⁰⁰ Têkoşîn Aydenîz, *Ferhengên Kurdî yê Online –Lêkolîneke Çendani-*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2020, Projeya Lîsansa Bilinda ya Bêtez a Çapnebûyî, r. I.

²⁰¹ <https://www.aa.com.tr/kk>, TB: 29.12.2022.

3.2.1.2.9 Sazîyên kurdî yên zimanî

Di vê beşê da em ê li ser xebat û çalakîyên sazîyên kurdî yên zimanî rawestin. Lewra, rol û erka van sazîyan, ji alîyê bipêşxistin û standardkirina zimanî da jîyanî û jêneger e. Ji bo zimanekî bêstatû û ji piştgirîya dewletê bêpar, ev yek, bêhtir giring e.

3.2.1.2.9.1 Sazîyên sivîl ên zimanî

Berî ku em li ser sazîyên fermî yên zimanî bisekinin, em ê li xebatên sivîl hûr bibin. Lewra, bi saya ev cure sazîyan, kurmancî prestîja xwe ya civakî, her ku biçe, dê zêde bibe.

3.2.1.2.9.1.1 Enstîtuyên kurdî

Wekî ku me li jorê jî destnîşan kiribû, hewldanên têkildarî standardkirina kurdîya kurmancî, di çarçoveya qonaxên “plansazîya zimanî”, ango “plansazîya corpus”ê da pêk hatîye. Îcar, enstîtuyên kurdî, wekî rêxistinên sivîl, bi xebatên xwe yên zimanî rola “kodkirina zimanî” hilgirtine. Em ê bi kurtî behsa enstîtuyên ku di vê qadê da çalak bûn, bikin.

Divê, serê ewil em behsa “Enstîtuya Kurdî ya Parîsê” bikin. Di malpera xwe da, di derbareyê Enstîtuyê da weha tê gotin:

Enstîtuya Kurdî ya ku di sibata 1983an de hatiye ava kirin, saziyeke çandî ya serbixwe û laik e, nesyasî ye. Ew ronakbîr û hunermendên kurd ên xwedî bîrûbaweriyên cihê û pisporên rojavayî yên cîhana kurdî di bin banê xwe de dihewîne. Armanca wê ew e ku gelê kurd di warên ziman, dîrok û samana wî ya çandî de agahdar bike, alîkar be ji bo hevguncîna koçberên kurd ên li Ewropayê û civatên binecî û Kurdan di gel çanda wan, welatê wan û rewşa wan a îroyîn bi rayagiştî ya biyanî bide nas kirin.²⁰²

Li gor heman malperê damezirînerên Enstîtuyê entelektuel û hunermendên kurdî in. Li gel Kendal Zana, hin ji wan ev in: Yilmaz Guney, Cegerxwîn, Hejar Mukriyanî, Tawfiq

²⁰² <https://www.institutkurde.org/ku/info/em-k-icirc-nes-1232551025>, TB: 29.12.2022.

Wahby, Prof. Qanatê Kurdo, Ordîxanê Celîl, Heciyê Cindî, Remzi Raşa, Dr. Nûredîn Zaza, Dr. Ismet Şerîf Wanlî.²⁰³

Di heman salê da di nivîsareka xwe da Mehmet Uzun Enstîtuyê wekî “organîzasyoneka neteweyî” nirxandîye û weha nivîsîye: “Damezrandina Enstîtuya kurd di ware kulturî de bûyereke girîng e. Ji ber ve yeke jî, pîraniya kurdan bi damezrandina Enstîtuya kurd kefxweş bûn. Em jî pîrozbahiyên xwe ji Enstîtuya kurd re re bikin û hevîdar bin ku Enstîtu bikaribe bi rê keve û xebatên heja bike”²⁰⁴

Herwisa, Clemence Scalbert Yücel jî destnîşan dike ku:

Mesela yek ji armanca Enstîtûya Kurdî ya Parisê ku di sala 1983 de hatiye vekirin ew bû: Ziman, mîrata çandî û diroka Kurd bi xelkê Kurd re bidin naskirin û nedin jibîrkirin. Ji bo ku vê armancê bi cih bîne, lêkolîn jî dimeşîne. Bi salan e berhemên rewşenbirên Kurd û akademisyenên ku li ser Kurdan kar dikin berhev dike; kovareke zanistî jî diweşîne (Etudes Kurdes).²⁰⁵

Ji aliyê mijara mijara teza me ve, em ê balê bikêşin ser du xebatên giring ên Enstîtuyê. A ewil ku di çarçoveya “kodkirina zimanî” da xebateka gramerê ye: “Kürtçe Grameri / Grammaire kurde / Rêzimana Kurdî ya Celadet Bedirxan û Roger Lescot, bi tirkî ji bo Kurdên bakur û Tirkan, ku heta niha şêş çaran hatiye çap kirin.”

A duyem, ku xebateka zimannasîyê ye ku têkildarî qonaxên “kodkirin” û “hûrgulîkirin”ê ne:

Kurmancî: kovara zimannasîyê ya şêş mehî ye, ku her carê 3000 heb çap dibe, encamên semînerên zimannasîyê yên ku hersal bihar û payizî kom dibin, belav dike. 57 jimarên wê yên ku heta niha çap bûne weke ferhengeke ansiklopedik, bi kurdî-tirkî-ingilîzî-fransîzî çap bûne. Berê bîst û paşê jî çil jimareyên pêşîn ên vê kovarê, ku weke pirtûkek 1396 rupelî, di gel ferhengekeke çar zimanî ya ji 12.000 peyv û fihristeka bi her çar zimanan pêk hatibû hate çap kirin û belav kirin.²⁰⁶

²⁰³ <https://www.institutkurde.org/ku/info/em-k-icirc-nes-1232551025>, TB: 29.12.2022.

²⁰⁴ Mehmed Uzun, “Hêz û Bedewîya Pênûsê”, Nûdem, Swêdê, 1993, r. 63.

²⁰⁵ Clemence Scalbert Yücel, “Geşbûn û Xweserîbûna Qada Xebatên Kurdî, Konferansa Xebatên Kurdî”, *Konferansa Xebatên Kurdî*, Ed. Muhammet Gözütök, Ayhan Işık, Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê û Weqfa Îsmail Beşikçi, 25 Gulan 2013, r. 67.

²⁰⁶ <https://www.institutkurde.org/ku/info/l-ecirc-kol-icirc-n-amp-wesanger-icirc-wesan-1232551029>

Herwekî ku Akin jî destnîşan dike, Kurmancî xebata Komîsyona Kurmancî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ye. Di sala 1987an da endamên Komîsyonê tèn zêdekirin. Komîsyona Kurmancî di çarçoveya mîsyona bipêşvebirin û parastina zimanê kurdî da wekî avabûneka rêxistînî dixebite.

Lê, ya herî balkêş Komîsyona Kurmancî li ser xeta giştî ya ekola Hawarê xebatên xwe dimeşîne. Îlhama xwe ji reforma Celadet Alî Bedirxanî ya alfabeya latînî werdigirin û normên wî yê ortografîk wekî referans qebûl dikin.²⁰⁷

Akin armanc û hedefên Komîsyona Kurmancî jî weha dedibirîne: “Gencîneya ziman, standardkirina rênivîs û rêzmanê û ji bo xwendin-nivîskariya modern a kurdî bête pêkanîn, kodên nivîskî bêne çêkirin.”²⁰⁸

Dema em bala xwe bidinê, em ê bibînin ku Enstîtu bi helwesta xwe, li mîrasa Celadet Bedirxan a zimanî xwedî derketîye û bi xebatên xwe hewl daye ku xebata Celadet Bedirxan bi pêş ve bibin.

Dê bê dîtî ku normên ku Celadet Alî Bedirxanî danîye, ji Hawarê (Suriye) dê derbasî Kurmancîyê (Parîs) bibe û ji wir jî dê berê xwe bide Stenbolê, dawîya dawî jî Dîyarbekir û Mêrdîn dê bibin navendên xebatên zimanî ku li ser normên Celadet Alî Bedirxan geş dibin. Li jêr mebesta me dê were famkirin.

Ji bo vê pêvajoyê Samî Tan weha dibêje:

Xebatên Koma Kovara Kurmancî ya Enstîtuya Parîsê di warê rêziman û rastnivîsandina kurdîya kurmancî de bingeheke xurt danî. Wekî rengvedana van xebatan piştî salên 90î, kurdî pêşî li Stenbolê, paşê jî li Amedê û bajarên din ên Bakur di warê xwendin û nivîsandina kurdî de pêşketinên berbiçav pêk hatin. Di salên 90î de piştî ku qedexeya li ber nivîsandina bi kurdî sist bû, gelek berhem bi kurdî hatin weşandin, sazîyên mîna Ensîtuya Kurdî ya Stenbolê, Navenda Çanda

²⁰⁷ Akin, *hb.* 2013, r. 131.

²⁰⁸ Akin, *hb.* 2013, r. 134.

Mezopotamyayê, Kurt-Kav ava bûn. Her wiha gelek derdorên rewşenbîrî yên kurd pirtûk û kovar weşandin.²⁰⁹

Wekî qonaxeka nû ya xebatên zimanî, “Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê” derdikeve pêş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi pêşengîya komek rewşenbîrên kurd, roja 18ê nîsana 1992yan li Stenbolê tê damezirandin. Armanca damezirandina Enstîtuyê, bi awayekî zanyarî li ser dîrok, çand, huner, ziman û hwd. rawestandîna bû. Koma damezirandina Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji van kesan pêk dihat: Musa Anter, Yaşar Kaya, Feqî Huseyîn Sagniç, İsmail Beşikçi, Abdurrahman Durre, İbrahim Gurbuz, Cemşîd Bender û Suleyman İmamoğlu.²¹⁰

Tevî ku xebatên wê yên li ser dîrokê qels mabûn jî, xebatên wê yên li ser zimên û çandê, heta ku di sala 2016an da bi biryarnameyeka qanûnî hate girtin, bênavber dewam kir.²¹¹

Di xebata Özcan da pêvajoya avakirina Enstîtuyê weha tê derdibirîn:

Enstîtuya Kurdî jî helbet wekî gelek sazîyên din ji ber astengîyên qanûnî wekî fermî li ser bingeha şiketeke limited ya bi navê “Zend Bilim Kültür Eğitim Limited Şirketi”de tê avakirin. Lê di rastîya xwe de Enstîtuya Kurdî wekî enstîtu tê birêxistin (Kurtedîroka Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, (2002). Stenbol, 11-13). Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî vekî gelek sazî û dezgehên vê serdemê bi armanca xurtkirina têkoşîna mafên neteweyî ya gelê Kurd tê avakirin.²¹²

Herwisa, bi awayekî giştî, xebatên Enstîtuyê weha ne:

Di nav xebatên enstîtuyê de, bi taybetî xebatên amadekirina ferheng û materyalên perwerdehîya zimanê Kurdî cîyekî girîng digire. Xebatên tomarkirin û çapkirina berhemên zargotina Kurdî û xebatên li ser edebîyata klasîka Kurdî jî cîyekî girîng girtîye. Di gel van xebatên nivîskî di bin banê enstîtuyê de bi berdewamî kurs û perwerdehîya zimanê Kurdî tê domandin û gelek xwendevan, mamoste û nivîskar di encama van xebatên enstîtuyê de giheştine. Her wisa di pêvajoya domdarîya enstîtuyê de gelek panel û konferans ji aliyê enstîtuyê de li ser babatên Kurdî hatine birêvebirin

²⁰⁹ <https://www.gazeteduvar.com.tr/weki-zimaneki-kurdi-u-rastnivisina-zimane-kurdi-haber-1570923>, TB: 24.11.2022

²¹⁰ https://ku.wikipedia.org/wiki/Enst%C3%AEtuya_Kurd%C3%AE_ya_Stenbol%C3%AA, TB: 24.11.2022

²¹¹ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 193.

²¹² Özcan, *hb.* r. 71.

û beşdarî li gelek sempozyûman hatiye kirin (Kurtedîroka Enstîtuya Kurdî, 130).²¹³ Berhemên Sereke yê ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ve hatine amade kirin û çapkirin ev in: 1. Büyük Türkçe-Kürtçe Sözlük (Ferhenga Mezin ya Tirkî-Kurdî)/Amadekar: Zana Farqînî. 2. Ferhenga Kurdî-Tirkî/Amadekar: Zana Farqînî 3. Ferheng/Sözlük Kurdî-Tirkî, Türkçe-Kürtçe/Amadekar: Zana Farqînî 4. Ferhenga Biwêjan/Mustafa Boraq 5. Deyimler Sözlüğü, Ferhenga Biwêjan/Dilawer Zeraq 6. Hînger (Asta Yekem/Asta Duwem/Asta Sêyem) 7. Dîroka Wêjeya Kurdî/Feqî Huseyn Sağniç 8. Rojî Kurd (Transkrîbe û Werger) 9. Kovara Zend û gelek berhemên li ser çand û wêjeya Kurdî.”²¹⁴

Xuya ye ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji bo ziman, çand, folklor û dîroka kurdî gelek berhem îname. Xebatên ferheng sazîya Enstîtuyê ji bo “kodkirina zimanî” gelek hêja ne. Herweha “Kovara Zend”ê jî, li gel mijarên din, bi nivîsar û lêkolînên zimanî, hişmendîyeka zimanî hişyar kirîye. Wekî ku li jorê jî hat destnîşankirin, xebatên zimanî li ser xeta Hawar û Komîsyona Kurmancî ya Parîsê hatine meşandin.

Herweha, di sala 2004an da li Dîyarbekirê “Enstîtuya Kurdî ya Amedê” (Diyarbakır Kürt Enstitüsü) hat damezirandin. Enstîtuyê digel vekirina kursên kurdî, li ser zimên û edebîyata kurdî xebatan kirîye. Bo nimûne, panel û atolyeyên zimanî û bi hevkarîya “Şaredarîya Mezina a Dîyarbekir”ê li ser “standardkirina Zimanê Kurdî” konferansên navnetewî li dar xistine. Herwisa, Enstîtuyê kovar û berhemên zimanî jî weşandîye.²¹⁵

Armanca Enstîtuyê, ji bo berdewamkirina xebatên ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê pêşengî lê dikir, li bajarên kurdnişîn jî pêk biîne. Lewra, felsefeya damezrandina wê jî dişibihe Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û diyar e ku armanca wê ya sereke lêkolîn û bipêşxistina ziman û çanda kurdî ye. Lê, li gor Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, ev enstîtu bi kadro û xebatên xwe bihêz nebûye.²¹⁶

²¹³ Özcan, *hb.* r. 72.

²¹⁴ Özcan, *hb.* r. 73.

²¹⁵ <http://mamosteye-zimane-kurdi.blogspot.com/2013/01/enstituya-kurdi-ya-amede.html>;
https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Enst%C3%AEtuya_Kurd%C3%AE_ya_Amed%C3%AA,
TB:31.12.2022.

²¹⁶ Süleyman Sıdal, *Yeni Toplumsal Hareketler Bağlamında Türkiye’de Kürtçe Anadilde Eğitim Talepleri: TZP Kurdi Örneği (2006-2011)*, Galatasaray Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İstanbul, 2019, (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî), r. 126.

3.2.1.2.9.1.2 Kursên kurdî û hewldanên sazîyên din ên zimanî

Di qebûlkirin û hezîmandina zimanê standard da rola “kursên kurdî” jî aşkera ye. Bi hînkirina zimên, berbelavkirina bikaranîna zimên diqewime. Herweha, bi rêya van kursan fêrbûna normên wî zimanî mimkin û hêsantir dibe û bi saya kesên ku ji van kursan derdiçin, van norman belavtir dibin.

Berî ku em behsa “Kurdî-Der”ê bikin, hewce ye ku em qala ezmûna kursên kurdî yên ku di navbera salên 2003-2005 an da li dar bûn, bikin. Bi vegotina Onenê,

bi vê yekê re kurdan li bajar û bajarokên wekî Riha, Diyarbekir, Batman, Stenbol, Edene, Qoser, Wan, Bazîd û hwd kursên kurdî vkirin. Ev kurs girêdayî Wezareta Perwerdehiyê bûn, sertîfikayên ku di dawîya kursan de dihatin dayîn ji aliyê sazîyên dewletê ve dihatin pejirandin. Lê di 2005an de bi biryarekê ev kurs hatin girtin. Wekî sedem hate balkişandin ku ‘li cîhanê tu gel zimnaê xwe li kursan hîn nabin’.²¹⁷

Pişt, demekê, di destpêka sala 2006an ve li gelek bajarên ku kurd li wê dijîn, wekî însiyatîfeka sîvîl, ji bo perwerdeya kurdî komeleyên bi navê “Kurdî-Der”ê bi aweyekî fermî tê birêxistin û li gelek bajaran şaxên wê tên vekirin.

Bo nimûne, serê ewil li Dîyarbekirê bi navê “Kürt Dili Araştırma ve Geliştirme Derneği” (Komeleya Lêkolîn û Pêşvexistina Zimanê Kurdî, Kurdî-Der), di 25ê tebaxa 2006an da vedibe. Heta sala ku (2016), bi “biryarnameyeka fermî” tê girtin, xebatên xwe domandiye.²¹⁸

Herwisa, ji bilî Dîyarbekir, di van bajar û qezayan da jî şaxên wê komeleyê hatine vekirin: Wan, Mêrdîn, Batman, Hakkarî, Agirî, Sêrt, Îzmîr, Antalya, Mêrsîn, Tetwan, Siwreg, Cizîr, Farqîn, Qoser, Nisîbîn û hwd.

Van rêxistinan di bin banê TZP-Kurdî da û bi pêşengîya TZPKurdîyê hatibûn avakirin. “TZP-Kurdî rêxistineke sîwan bû. Di dawîya 2007an da, 27 Şaxên Kurdî-Derê

²¹⁷ Onen, “hg”. 2022, r. 47.

²¹⁸https://tr.wikipedia.org/wiki/K%C3%BCrt_Dili_Ara%C5%9Ftirma_ve_Geli%C5%9Firme_Derne%C4%9Fi, TB: 31.12.2022.

hebûn. Li navenda Dîyarbekirê, navçeyên wê û li bajar û hin navçeyên wan, me şaxên Kurdî-Derê vekirin”²¹⁹

Ji bo şert û mercên ku TZPKurdî diwelidîne, Onen weha dibêje:

TZPKurdî ji ber pêwistîyekê derket holê, krîzek hebû, kursên fermî bi ser neketin û hatin girtin. Di serî de aktîvîzma ziman giring bû. Li alîyekî ji bo bidestxistina mafên demokratîk û çandî û têkoşîna perwerdeya bi zimanê dayîkê û her wiha avakirina hişmendiya ziman û pûçkirina polîtîkayên bêqîmetkirina ziman ên ji alîyê pergalê ve hatine afirandin, xebat hatin meşenadin.²²⁰

Li gor Önen Baykuşakê jî “Hewldana herî mezin a ji bo belavkirina zimanê kurdî atolyeyên zimanê kurdî bû ku li gelek bajar û navçeyan bi rêya Kurdî-Derê hatin avakirin û ji bo hînkirina kurdî ji girseyên berfireh re hatin avakirin.”²²¹

Li go nivîsara “Ji Edîtor”ê ya di hejmara dawî ya Kovara Zendê da, giringîya “Tevgera Ziman û Perwedehiya Kurdî (TZPKurdî)” weha tê gotin: “TZPKurdîyê di navbera salên 2006 û 2016an de di qada parastin û pêşvebirina zimanê kurdî de gelek xebatên girîng kirine. TZPKurdî yekem tevgera girseyî ye ku xebatên aktîvîzma zimanî û siyaseta zimanî kirine û hişmendiya zimanî di nav gel de belav kiriye; ev yek girîngiya wê zêdetir dike.”²²²

Di vê çarçoveyê da xebatên di fêrkirina zimên da, hewlên Komeleya Nûbiharê jî hêjayê destnîşankirinê ye. Navenda Komeleyê li Dîyarbekir e û li Batman, Mêrdîn û Wanê jî şaxen xwe hene. Di navend û şaxen xwe da, li gel çalakîyên wekî çandî û hunerî, kursên kurmancî jî li dar dixê. Di van salên dawî da, bi derfetên înternetê, bi awayekî onlîne jî, xebatên curbicur didomîne.²²³

²¹⁹ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 293.

²²⁰ Onen, “hg”. 2022, r. 48.

²²¹ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 323.

²²² Ronayî Onen & Eyyub Subaşi, “Ji Edîtor”, *Zend*, Hejmar 29, Stenbol, Payîz-Zivistan 2022.

²²³ [https://komanubihar.org/?cat=1, TB:25.12.2022.](https://komanubihar.org/?cat=1, TB:25.12.2022)

Herwisa, piştî salên 2000î li bajarên ku kurd lê dijîn, ji alîyê şaredarîyan ve hin kursên kurdî hatin lidarxistin. Li gel vê, di “navendên perwerdeya giştî” (Halk Eğitim Merkezleri) da jî derfeta kursên kurdî çê bû.²²⁴

Li Stenbolê jî, xebatên zimanî yên “Komeleya Lêkolînên Kurdî” jî hêjayê kirpandinê ne. Ev Komele di çar astan da kursên kurdî (pirzaravayî) û digel vê jî kursa mamostetîyê dide. Li gel weşangerî û çalakîyên din ên wekî zimanî, folklorîk û hunerî, di qada fêrkarîya kurdî da jî roleka giring dilîze; atolyeyên hînkirina xwendin û nivîsîna kurdî û hînkirina kurdî li dar dixê.²²⁵

Digel van sazî û hewlên wan ên di fêrkirin kurdîya kurmancîyê da, xebatên sazîyên din ên zimanî jî hêjayê nirxandinê ye. Di vê pêwendê da, ku me li jorê jî behs kiribû, hewce ye ku em amaje bi rol û giringîya TZP-Kurdîyê (Kürt Dili ve Eğitim Hareketi) bikin.

“Piştî salên 2006-2007an pê va disa di bin sîwana hin zaziyên çandî û siyasî yên Kurdî de Teverga Ziman û Perwerdehiya Kurdî/TZP-Kurdî tê avakirin û li gelek bajarên ku kurdnişîn wekî însiyatifeke sivîl li ser perwerdehiya Kurdî xebatan dike”²²⁶

Wekî ku Ronayî Onen jî vediguhêze, di rêzîknameya tevgerê ya ku di sala 2006an da hat belavkirin da armanc wisa hatibû diyarkirin; “TZP Kurdî ji bo parastin û bipêşvebirina zimanê kurdî xebatê dike. Armanca wê bi riya xebatên lêkolînî û zimanzaniyê bipêşvebirina zimanê kurdî, bi riya propagandayê pêşvebirina hişmendiya kurdî û bi riya xebatên hîndekariyê jî bilindkirina asta zanîn û naskirina zimanê kurdî ye.”²²⁷

²²⁴<https://www.kurdistan24.net/tr/story/79773-K%C3%BCrt%C3%A7e-%C3%B6%C4%9Fretmenleri:-Halk-E%C4%9Fitim-Merkezleri-K%C3%BCrt%C3%A7e-i%C3%A7in-bir-f%C4%B1rsat>, TB:26.12.2022.

²²⁵ <https://www.komeleyakurdi.org/kr>, TB:26.12.2022.

²²⁶ Özcan, *hb.* r. 96.

²²⁷ Ronayî Onen, “Perwerdeya Zimanî Di Aktivîzma Zimanî Da; Tecrubeya TZP KURDÎ”, Akademîya Îsmail Beşikçi, Payiz 2 2020, r. 33.

Ji vê yekî jî xuya dike ku, TZP-Kurdî berbelavkirina bikaranîna zimanê kurdî ji xwe ra kirîye armanceka sereke. Herweha, bi rêya xebatên ku ji xwe ra kirîye armanc, xwastîye ku “hişmendîyeka zimanî” di nav civaka kurdî da pêk were. Ji alîyekî din ve jî, TZP-Kurdî bi navgîniya Kurdî-Derê “kargeh”ên zimanî vedike û bi sedan xwendekar perwerde dibin. Herweha ji bo stadardkirina kurdî jî hewl dide ku keresteyên zimanî amade bike.

Di heman gotara xwe da Onen weha lê zêde dike:

Ji bo zimanê kurdî bigihêje asteke modern û wekî zimanê rêveberî û perwerdehiyê saz bibe dê xebatên lêkolînî û zimanzanîyê bihatina kirin. Bi ser da ji bo berbelavkirina bikaranîna zimên jî dê xebatên hişmendîyê di nav gel da bihatina kirin û dîsa xebatên hindekarîyê di rojevê da bû ev herdu xal jî bi fikara bilindkirina nirxa sembolîk a zimên ve girêdayî bû.²²⁸

Herwisa, di derbareyê xebatên TZP Kurdîyê da tesbîtên Onen weha ne:

Ji bo berbelavkirina bikaranîna zimanê kurdî perwedeya zimên hewce ye û ji bo wê jî perwerdekar divêt in. Ji lewre TZP Kurdî di gihandina mamosteyên kurdî da jî xebat kiriye. Hema bêje li temama şaxên KURDÎDER’an asta mamostetîyî jî vebûne. Di vê astê da rêzikên rêzimanî di asteke bilind da hatine nîqaşkirin, li gorî derfetan dersên dengsazî, peyvsazî, watenasî û hwd hatine dayîn. Dîsa li gorî derfetan rê û rêbazên hînkirina zimanî wekî zimanê yekem û duyem hatine nîqaşkirin. Perwerdekarên asta mamostetîyê li ser mijara zarava û devokan jî rawestîyane.²²⁹

Li alîyekî din, wekî tevgerên zimanî, mirov dikare amaje bi “Platforma Zimanê Kurdî” û “Însiyatîfa Mamosteyên Zimanê Kurdî” jî bike.

Platforma Zimanê Kurdî ya ku di sala 2018an de ji aliyê hin partî û rêxistinên li Dîyarbekirê hatiye damezirandin. Di hemû warên jîyanê da bikaranîna kurdî teşwîq dike û ji bo vê armancê çalakîyan li dar dixê. Her sal bi boneya 15ê Gulanê “Roja Cejna Zimanê Kurdî” daxuyaniyek nivîskî belav dike. Ji bo ku kurdî bibe zimanê perwerdeyê, bang li berpirs û rayedarên Dewletê dike.

Însiyatîfa Mamosteyên Kurdî jî nexasim di derbareyê dersên bijarte ya Kurdî (Kurmancî-Zazakî) da daxuyanîyan belav dike û malbatên kurd hişyar dike ku ji bo

²²⁸ Onen, “hg”. 2020, r.33.

²²⁹ Onen, “hg”. 2020, r.38.

zarokên xwe dersa kurdî hîlbijêrin. Herwisa, bang li rayedarên Dewletê dikin da ku bila kurdî bibe zimanê perwerdeyê û hejmara mamosteyên kurdî yê fermî bêt zêdekirin.²³⁰

Herwisa, wekî însiyatîfeka sîvîl û platforma zimanî, divê em behsa “Tora Ziman û Çanda Kurdî” jî bikin. Ev Platform di sala 2019an da li Dîyarbekirê hat sazîkirin. Di 2020an da jî bi civîneka berfirehkirî, di derheqê xebatên xwe da weha daxuyanî da:

Di komcivîna lemîn da mijarên wek mafên zimanî, pêwendîya ziman û nasnameya neteweyî, avakirina rê û rêzikên xebatên sîvîl, arîşeyên navxweyî û derveyî yê ziman û çanda kurdî, astengiyên bîngêhîn ên li ber ziman û çanda kurdî û rênexşe, statû û rêzikên xebata Torê bi berfirehî hatin gengeşekirin.

Herwisa, divê em behsa xebat û çalakîyên Weqfa Îsmâil Beşîkçî (Îsmail Beşîkçi Vakfî/ IBV) bikin ku ev weqîf li ser navê wî di sala 2011an da li Stenbolê hatîye damezîrandin. Digel xebatên xwe yê din, weqfa navborî di sala 2019an da biryar dide ku salê du caran bernameyên bi navê “Akademiyên Îsmâil Beşîkçî” yê bi zimanên tirkî û kurdî li dar bixe. Li gor vê biryarê, di mehên biharê de “Akademiyên Biharê” yê bi tirkî û di mehên payîzê da jî “Akademiyên Payîzê” yê bi kurdî pêk diîne. “Di van bernameyan da hatiye hewldan ku mijarên qada Xebatên Kurdî yê li zanîngêhên Tirkiyeyê cih nabînin, nayên an jî nikarin werin nîqaşîkirin, li derdoreke azad werin pêşkêşîkirin û nîqaşîkirin.”

Herweha li gor malpera weqfê, Akademîya Payîzê ya 2019an da mijarên weha têt nîqaşîkirin: “Di bernameyê de mijarên cuda yê qada Xebatên Kurdî, yê bi sernavên “Standardîzasyon û Netewebûn”, “Bawerî û Jinên Helbestvan”, “Arşîvên Farisî û Kurd”, “Helbest û Netewe”, “Perwerdehî û Nasname”, “Rola Rexneyê”, “Netewesaziya Kurdan”, “Sînema û Nasname” cih girtin. Di dawîya akademîyê de ji akademîsyenan gotarên li ser mijarên wan hatin ricakirin û 5 akademîsyenan bo vê pirtûkê gotar nivîsandin.”

²³⁰ <https://www.facebook.com/muderrishane/photos/a.199898630164518/1876859939135037/?type=3>; <https://bianet.org/kurdi/perwerde/228019-inisiyatifa-mamosteyen-kurdi-dive-zimane-kurdi-bibe-zimane-perwerdehiye>, TB: 25.12.2022.

Di Akademîya Payîzê ya 2020an da jî bernameya “Perwerde û Hînkirina Kurdî: Tecrûbe-Model-Pêşniyaz” tê li darxistin ku ji aliyê akademîk û zanyarên curbicur ve mijarên cihêreng hatine pêşkêşkirin. Herwisa van bernameyên destnîşankirî, wekî gotar paşê tên çapkirin û belavkirin ku wekî çavkanîyên hêja ji bo lêkolera bibin palpişt.²³¹

Wekî nimûneya hereketeka zimanî HEZKURD (Kürt Dil Hareketi/ Hereketa Zimanö Kurd) jî ev du salên bi îdîa û çalakîyên xwe balê dikişîne. Di sala 2020an da li Dîyarbekirê bi daxuyaneke avabûna HEZKURDê hat dîyarkirin. Armancên wê yên sereke “fermîbuna zimanê kurdî”, “perwerdeya bi kurdî” û “îadeya navên kurdî” nin. Herwisa ji bo bilindkirina statuya zimanê kurdî gelek çalakîyan jî pêk diîne. Bo nimûne, ji bo hîlbijartina zaravayên kurdî di dibistanan da, gelek çalak e û serkêşîya kampanyayan dike.²³²

Herweki ku Önen Baykuşak ji destnîşan dike, çî sazîyên kursan, çî dezgeh û platformên zimanî be, xebat û çalakîyên wan ên zimanî, di çarçoveya plansazîya zimanî da dikare bê nirxandin. Lewra, hin ji van xebat û çalakîyan rasterast wekî xebatin “plansazîya statûyê” û “plansazîya corpusê” xuya dikin.²³³

Divê em lê zêde bikin ku van xebatên birêxistinkirî bûn sedema xuyang û bikaranîna zimanê standard/nivîskî ku ev yek jî hişmendîyeka zimanî bi xwe ra anî. Di pêvajoya van salên dawî da di helwesta civaka kurd a zimanî da guherîn çê bûn. Wekî ku li jorê jî me behsa çarçoveya “plansazîya zimanî” ya Haugen kiribû, van xebatan yekser têkildarî “plansazîya statûyê” ne. Herçiqa bikaranîna zimanî di qadên fermî û perwerdeyê da hêj ne mimkin be jî, hişmendîyeka zimanî her diçe zêde dibe û wekî di beşên pêwendîdar da ku me destnîşan kir, di qada “plansazîya corpus”ê da jî destkeftîyên berceste aşkera ne.

Mînaka Weqfa Mezopotamyayê

²³¹ <https://ismailbesikciyakfi.org/>; <https://ismailbesikciyakfi.org/ibv-yayinlari/kitaplarimiz/perwerde-hinkirina-kurdi-tecrbe-model-pesniyaz>, TB: 25.12.2022.

²³² <https://www.basnews.com/tr/babat/632138>, TB: 25.12.2022.

²³³ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 322.

Wekî destpêka vê binbeşê em ê balê bikişînin ser nirxandinên Ergin Öpengin ku di derbareyê “rastnivîsînê da” di nivîsara xwe da weha nivîsiye:

Gava ku Celadet Alî Bedirxan û hevkarên xwe dest pê kir di kovara Hawarê de elifbêya kurdî ya bi herfên latînî bi kar anî, qaîdeyên serekî yên nivîsînê, anku yên rênivîs an rastnivîsînê jî danîn û tedbîq kirin. (...) Hem di vê kovara navhatî de hem jî di nav nivîsevaniya kurmancî ya dehsalên paştir de, piraniya qaîdeyên Hawarê hatine parastin, lê belê gelek jî hatine guhartin. Bi taybetî piştî “vejîna” nivîsevaniya kurdî li diyasporayê li salên 80yan, hewlên muxtelif ji bo standardkirina kurmanciyê hebûn, ku standardkirina rênivîsê wek pêngava wê ya yekem dihate dîtin. Lewma ji Semînera Kurmancî û rojnameya wê ya Kurmancî pê de rêformên de facto an jî fiilî yên rênivîsa kurmancî dest pê kir û her weşan an dezgeheke nû tercîhên xwe yên rênivîsê li yên heyî zêde kirin. Rêzimanên kurdî jî gelek caran beşek ji qaîdeyên rênivîsê re vediqetand. (...) Lê xebateke xweser ya bi rengê rêbereke rênivîsê encax sala 1997an derçû, ku Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (kurmancî) ya Arif Zêrevanî bû. Xebata Zêrevanî li ser xalên bingehî yên rênivîsê (nivîsîna navên millet, ziman, dîn, hwd.) her li dû qaîdeyên Hawarê bû; bi renekî, birojkirin û berfirekîrîneke wan bû ku hin aliyên nû yên nivîsevaniyê jî bi xwe ve bigire. Naveroka berhemê jî bi renekî zelal hatibû raçandin û pêşkêşkirin; lê belê, diyar e ji ber hindê tercîhên nivîskarê berhemê, ku nisbeten ji meyl û prêzeyên nivîsînê yên nivîskar û xwendevanên kurmancî dûr bûn (bn. ko li şûna ku-ya berbelav, an jî bikaranîna nîşandeka iqtibasê wek »...« li şûna “...”, hwd.), ew rêber li nav kurdên bakur pir nehate teqîbkirin. (...) Li ser vê paşxaneyê ye ku, sala 2012an, xebata Mistefa Aydoganî ya bi navê Rêbera Rastnivîsînê⁵ derçû. Rêbera Rastnivîsînê (bi kurtî Rêber), bi berfirehiya naveroka xwe ve, wisa hatiye amadekirin ku bibe referanseke tekmlî û giştgir ji bo meydana nivîsîna bi kurmancî, çî di asta şexsan de çî di asta dezgehên çap û weşanê de. Hevterîb li gel vê armanca xwe, berhemê ji têtîbî û fikrên çend pisporên din ên zimanê kurdî jî istifade kiriye. Rêbera Aydoganî ji bo piraniya xal û pirsên dubendîdar yên nivîsîna bi kurmancî awayên standard pêşniyaz dike û bi berfirehiya xwe ya mijaran ve xîtabî bikarhînerên muxtelif dike. Lê belê, bi taybetî di mentîqa (rationale) danîna norm an awayên standard de berhem mirovî bi temamî qanî û tetmîn nake.²³⁴

Ji tesbîten Öpengin jî dê bê famkirin ku di warê “rastnivîsînê” da xebata ku Weqfa Mezopotamyayê kirîye, wekî xelesa dawî ya vê pêvajoyê dikare bê qebûlkirin. Em ê vê “xelesa dawî” wekî kurte derpêş bikin.

²³⁴ Öpengin, “hg”. 2017, r.180-181.

Ji alîyê hewlên standardkirina kurmancîyê û xebatên zimanî yên ku rasterast dikevin çarçoveya “kodkirin”ê ve, giringîya Weqfa Mezopotamyayê li ber çavan e û hêjayê destnîşankirinê ye.

Weqfa Mezopotamyayê di sala 2013an da li Dîyarbekirê ji alîyê 16 kesên reweşenbîr ên kurd ve hat damezirandin. Lê, desteya damezirînerên Weqfê ji 286 kesan pêk tê. Vîzyona Weqfê ya sereke, sazkirina zanîngeheka ku perwerdeya pirzimanî pêk biîne, bû. Heta niha ev yek pêk nehatibe jî, li jêrê jî em ê destnîşan bikin; xebatên ku Weqfê heta niha kirine ji bo zanîngeheka armanckirî, keresteyên pêwist û hêja ne.²³⁵

Eger ji alîyê xebatên Weqfê ve, li van salên dawî binêrin, wekî serdemeka “berhemdar” (productive) dikare bê nirxandin. Bo nimûne, di çarçoveya rêzimana nûjen da li ser morfolojî, morfo-sentaks û sentaksa kurmancîyê gelek ders hatin dayîn. Armanca ew bû ku di çarçoveya rêzimana nûjen ya kurmancî û babetên zimannasîyê da, perwerdeyê bidin û alîkarîya vekoleran bikin.²³⁶

Lê, wekî beşeka plansazîya zimanî, di çarçoveya “plansazîya corpusê” da ku ew jî têkildarî “kodkirina zimanî” ye, du xebatên çapkirî yê Weqfa Mezopotamyayê hêjayê kirpandinê ye. A ewil ku berhemeka “ortografîk” e. Bi navê “Rêbera Rastnivîsînê, Komxebata Kurmancîyê”, ji alîyê Weqfa Mezopotamyayê ve di sala 2019an da hat weşandin. Ji bo ev cure berhemana Tahirhan Aydın weha rave dixe: “ Bi giştî ji bo rê û rêbaz, rêzik û qayîdeyên ku ji bo nivîsînê hatine dîyarkirin ra “rêzikên nivîsînê” tê gotin. Ji bo berhemên ku hem rêzikên nivîsînê û hem jî yên rastnivîsînê dihewîne ra jî îfadeya “rêbara rastnivîsînê” hatiye emilandin.”²³⁷

Ji bo giringîya Rêbera navborî, Aydın lê zêde dixe û weha derdibirîne:

²³⁵ <https://www.wmezopotamyaye.org/ku/weqif/2-vizyon>, TB: 25.12.2022.

²³⁶ <https://www.wmezopotamyaye.org/ku/d/naveroken/84-kursa-rezimana-kurmanci-u-zimannasiye-ya-bi-sertifika-3.html>, TB: 25.12.2022.

²³⁷ Tahirhan Aydın, “Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmancîyê”, Kurdiname Akademîk, Hejmar: 3, 2020, r. 138.

Ev rêber, ji bo yekitî û standardkirina zimanî navgîna herî bihêz e. Ji ber ehemîyeta vê mijarê, li gelek dewletan, ev kar ji alîyê dezgehên fermî ve tên kirin û ji bo van karan, ji zimannas, wêjenas û perwerdekarên gelek pispor, mitexesis û rewşenbîr tên tayînkirin. Sazîyên fermî, vî zimanî bi kar tînin. Zanyar û rewşenbîr, bi vî zimanî dinivîsin, perwerde bi vî zimanî tê kirin.²³⁸

Amadekarê vê berhema hêja “Komxebata Kurmancîyê” ye. Koma ku ji zimannas û lêkoleran pêk hatîye, ji alîyê Weqfa Mezopotamyayê ve hatîye organîzekirin. Herweha,

Kom ji her çar parçeyên axa kurdan ji hin zimannas û lêkolîneran pêk tê. Di listeya lijneyê da ev her çar parçe bi “Başûr, Bakur, Rojhilat û Rojava”yê hatine binavkirin. Endamên lijneyê ev in: Bahîz Omer Ehmed (Başûr) Bahoz Baran (Bakur), Behrûz Şucaî (Rojhilat), Deham Evdîlfetah (Rojava), Dilawer Zeraq (Bakur), Dilbirîn Evdîla (Başûr) Evdîlwehab Xalid Mûsa (Başûr), M. Malmisaniy (Bakur), Mahmûd Lewendî (Bakur), Mehdî Caferzade (Rojhilat), Mihemed Teqewî (Rojhilat), Mistefa Aydogan (Bakur), Mîkaîl Bilbil (Bakur), Newzad Hîrorî (Başûr), Samî Tan (Bakur), Şoreşvan Adil (Başûr), Zana Farqînî (Bakur), Zulkuf Ergun (Bakur). Wekî tê dîtîn hejmara endamên nûneran ne wek hev in. Ji Bakur 9, ji Başûr 5, ji Rojhilat 3 û ji Rojava 1 kes. Navên beşdarên komxebatê li gel pisporî, herêm û hejmara wan ya beşdarîya civînan hatine dayîn. Em hêvî dikin ku ev xebatên bi vî rengî, ji alîyê temsîliyê ve hinek xurttir bibin. Lê mirov dikare bibêje ne mimkun e ku xebatên weha, ji alîyê kesekî bîn çêkirin û dîsa ne mimkun e ku fikr û nêrînen kesekî bi temamî bîn qebûlkin.²³⁹

Motîvasyona Komxebata Kurmancîyê jî weha hatîye dîyarkirin: “Dive bihe zanin ku pewistiya nivisina kurmanciye bi standardeke heye u ji bo standardeke ji qayideyen rastnivisine şert in.” Herwisa ji bo rêbaz, bingehe û pêvajoya xebatan, di Rêberê da van agahîyan hatine derpêşkirin:

Ji bo nivîsîna ve rebere, me ji 14.03.2015an heta 12.07.2017an li Mêrdin, Dîyarbekir û Stenbolê heft civîn pek înan ku her yekê se car rojan dewam dikir. Bingehe mînaqeseyên her heft civînan kitêba Mistefa Aydogani (Rebera Rastnivîsîne) bû. Loma rojeva her heft civînan jî bi awayekî giştî xwe spartîye xalên naveroka ve kitêba navbirî. Divê bihê zanîn ku di her xalê da ew awayen heyî yên cuda hatin mînaqesekirin ku di axaftin û nivîsîna kurmancîyê da dihên bikarînan. Beşdarên Komxebatê bi awayekî giştî li ser bingehe lihevkerîne gihîştine vê encamê. Lê li gel wê jî divê bihê dîyarkirin ku li ser hin xalan bîr û rayên cuda hebûn.²⁴⁰

²³⁸ Aydın, “hg”. 2020, r. 138.

²³⁹ Aydın, “hg”. 2020, r. 139. ; Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsîne*, Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol, 2019, r. 13-14.

²⁴⁰ Komxebata Kurmancîyê, *hb.* r. 18.

Herwisa, Weqfa Mezopotamyayê kovereka bi navê “Folklor û Ziman”, bi edîtorîya Mustafa Aslan û Mikail Bûlbûl diweşîne. “Folklor û Ziman ku di bin banê Weqfa Mezopotamyayê da, salê du caran (nîsan û çirîya pêşîn) derdikeve û kovareka bihekem û navneteweyî ye. Di kovarê da xebatên akademîk yê li ser folklor û zimanê kurdî cih digirin.”²⁴¹

Zimanê Kovarê (2020) kurdî û pîrzaravayî (kurmançî-kirmanckî-soranî) ye. Nexasim, nivîsarên zimanî li ser “fonolojî, morfolojî, sentaks, morfosenaks, zimannasîya civakî (sosyo-lînguîstîk), zimanzanîya îranî hwd.”, radiwestin.

Ji hêla mjara teze ve, xebata sêyem a Weqfa Mezopotamyayê ku bi navê “Kurdîzan-1”, di sala 2022an derçû, di warê hînkariya kurdîya kurmançî da, bi rêbazeka modern balê dikêşe. Nivîskarê vê berhemê, Tahirhan Aydın, Abdurrahman Adak, Zülküf Ergün û Mikail Bûlbûl in. Di derheqê berhema navborî da, li ser malpera Weqfê van agahîyan hatine dayîn:

Kurdîzan ji bo asta destpêkê ji du pirtûkan pêk tê. Yek, Pirtûka Dersê ye, ya din jî Pirtûka Xebatê ye. Pirtûka Dersê li ser hînkirina temayên curbicur û mijarên rêzimanê radiweste, lê Pirtûka Xebatê tenê li ser rahênên van temayan û mijarên rêzimanê radiweste. Di Kurdîzanê da ji bo birêxistin û hêskirina hînkariyê, pergala unîte û dersan hatîye bikaranîn. Pirtûk ji du unîteyan û her unîte jî ji 14 dersan pêk tê. Bi tevahî 28 ders di Kurdîzanê da hene. Kurdîzan ji bo perwerdeya dibistanê, bernameyên lîsansê, lîsansa bilind, kursên taybetî û xebatên takekesî hatîye plankirin. Di Kurdîzanê da rêbazên "ji hêsanîyê ber bi zorîyê ve", "ji sadeyîyê ber bi alozîyê ve" hatine bikaranîn. Kurdîzan, wekî pirtûka hînkariya zimanî, bi awayekî hevseng, bipêşvebirina her çar şîyanên bingehîn ên zimanî ji xwe ra dike armanc ku ew jî guhdarkirin, axiftin, xwendin û nivîsîn in. Di pirtûkê da rêbaza pevalînê (spiral approach) hatîye bikaranîn. Mijarên pêşîn di nava mijarên paşîn da hatine dubarekirin. Bi rêya dubarekirinê, mijarên berê bi dupatkirin û bibîranînan hatine xurtkirin. Her dersek, bi metin yan jî diyalogekê dest pê dike, piştî wê mijareka rêzimanê cih digire û bi dû ra rahênan tên. Herweha di dawîya her pirtûkekê da ferhengokek hatîye bicihkirin. Di vê ferhengê da manayên tirkî û îngilîzî yê bêjeyan hatine dayîn.²⁴²

²⁴¹ <https://www.wmezopotamyaye.org/ku/d/wesan/16-folklor-u-ziman-1.html>, TB:26.12.2022.

²⁴² <https://www.wmezopotamyaye.org/ku/d/wesan/30-kurdizan---1.html>, TB:26.12.2022.

Digel xebatên hêja yên Weqfa Mezopotamyayê, divê em behsa xebateka giring a ku hêj temam nebûye, bikin. Ev xebat wekî xebateka “komî” ji aliyê Weqfê ve tê birêvebirin. Mirov dikare vê xebatê wekî “Ferhenga Rastnivîsînê” bi nav bike ku ji aliyê 20 kesên wekî rewşenbîr, zimannas û akademîsyenan ve tê amadekirin. Ji sala 2018an heta îro ev xebat didome û wekî xebateka sehayî (qadî) li 60 herêman peyv tî berhevkerin ku di eslê xwe da ev ferheng xwe dispêre van peyvyan. Dîyar e ku piştî qedandina vê komxebatê dê berhemeka bêhempa derkeve holê ku ev jî ji bo “kodkirina zimanî” bibe çavkanîyeka sereke.²⁴³

Herwisa, Weqfa Mezopotamyayê karê weşangerîyê jî dike ku di warê ziman û folklorê da kovar û kitêban diweşîne.

3.2.1.2.9.2 Sazîyên Fermî yên Zimanî

Herwekî ku me li cihên cihêreng destnîşan kiribû ku xebatên zimanî ango xebatên kurdolojîyê yên dezgehî, çî sîvîl çî fermî, ne temendirêj in. Xebatên ku hatine kirin jî “*li ser pisporîya mamosteyan û li ser dilxwazbûna xwendekaran ku dixwazin çî bixebitin şîr dibe.*”²⁴⁴

Bêguman, ji bo standardkirina zimanî, ev deh salên dawî wekî mîladekê bê qebûlkerin, dê ne şaş be. Ev serdem jî bi vekirina Zanîngeha Artûklûyê bê destpêkirin, dê dê di cih da be. Lewra ji bo zimanê kurdî jî derbasdar e ku xebatên zimanî li her derê cîhanê pêwistî bi akademîsyanan û xebatên akademîk heye. Herweha, hewlên sazîyên sîvîl ên zimanî bi serê xwe ne tîrker e. Belkî, divê hemû sazî, çî sîvîl, çî resmî di nav hevgerînekê da bin. Bi awayekî sirûştî dê hemû sazî, ji bo hev, wekî temamker divê tevbigerin.

²⁴³ Mikail Bülbül, *bi rêya Whatsappê*, TB: 06.12.2022

²⁴⁴ Resul Geyik û yên din, “Xebatên Akademîk yên Kurdolojîyê li Tirkîyeyê (2009-2019)”, *Kovara Kurdînameyê ya Navneteweyî*, Hejmar 1, 2019, r.18.

Di beşa jêrîn da em ê bala xwe bidin akademîya kurdî ango beşên ziman û edebiyata kurdî yên lîsansê û enstîtuyên zimanên zindî da ku em fam bikin bê ka ji aliyê mijara me ve çi erk û fonksiyonan pêk anîne.

3.2.1.2.9.2.1 Beşên ziman û edebiyata kurdî yên lîsansê û enstîtuyên zimanên zindî yên zanîngehan

Hêj di sala 2013an da, di pêşkêşîya xwe da Clemence Scalbert Yücel weha dibêje:

Niha rewş pir guheriyê: hêdî hêdî, di salên 2000'î de, hêsantir bû ku kes li ser Kurdan bixwîne, lê tenê di çend zanîngehan de. Di gelek zanîngehên Tirkîyê de, hîn jî zehmet e ku mirov li ser Kurdan bixwîne. Di van salên dawî de jî, li çend zanîngehên Kurdistanê, beşên ziman û edebiyata Kurdî hatin vekirin. Ew, karekî hêja didomînin di aliyê perwerdehî, zimên û lêkolînan de, lê dîsa jî, ne bê pirsgirêk û nakokî ye.²⁴⁵

Lê, îro mimkin e ku em behsa “akademîya kurdî” bikin. Lewra, li bajarên “kurdnişîn”, di heft zanîngehan da (ji bilî Sêrtê) ev yek li dar e. Ji bo zelalkirina mebesta me, bi awayekî giştî em ê serî bidin nivîsara Necat Keskînî ku “akademîya kurdî” weha rave dîke:

Di vê çarçoveyê de, beşên ziman û edebiyata kurdî yên enstîtuyên zimanên zindî rê dide ku mirov li Tirkîyeyê behsa akademiyeke kurdî bike. Ji akademiya kurdî mebest ew e ku vekolîn û lêgerînên derbarê ziman, edebiyat û çanda kurdî de bi zimanê kurdî, bi navê kurdî, bi rêbazên zanistî bîn kirin. Ev yek jî îro li Tirkîyeyê bêhtir di bin banê Enstîtuyên Zimanên Zindî û beşên Ziman û Edebiyata Kurdî/Ziman û Çanda Kurdî de tên kirin ku tenê li Zanîngehên herêmên “kurdnişîn” in.²⁴⁶

Di heman nivîsara Keskîn da serborîya rêlibervekirina akademîya kurdî jî agahîyên weha dide:

Piştî sazkirina TRT 6ê, di dawîya heman salê de, 7ê meha kewçêra 2009an, di lijneya wezîran de biryara vekirina “Enstîtuya Zimanên Zindî” di bin banê Zanîngeha Mardin Artuklu de hat standin. Ev yek di dîroka Tirkîyeyê û kurdên Tirkîyeyê de ji bo ziman, edebiyat û çanda kurdî xaleke girîng bû ku rêya lêkolîn û xebatên akademîk li ber ziman û çanda kurdî vedikir. Tevî hemû kêmasiyan an jî bêderfetiyan, û ligel hemû bertek û rexneyan “beşa kurdî” an jî “kurdolojî” kelecaneke mezin derxist meydanê. Piştî Zanîngeha Mêrdînê, li Zanîngehên din jî hem enstîtu ji bo perwerdeya

²⁴⁵ Scalbert Yücel, “hg”. r. 67.

²⁴⁶ Necat Keskîn, “Serborîya Akademiya Kurdî Li Tirkîyeyê û Pirsgirêkên Wê”, *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, Cild 10, Hejmar 1, Nisan 2018, r. 472.

bilind û hem jî beşên lîsansê hatin damezrandin. Ji ber vê yekê jî mirov dikare avakirina Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardin Artukluyê wek destpêka “akademiya kurdî” ya li Tirkiyeyê bi nav bike.²⁴⁷

Wekî ku Keskîn jî destnîşan dike:

Îro di sê Zanîngehên Tirkiyeyê yê li bajarê kurdan de beşên lîsansê yê bi navê Ziman û Edebiyata Kurdî yê ku xwendekaran digirin hene ku ew jî Zanîngeha Mardin Artuklu, Zanîngeha Bîngol û Zanîngeha Muş Alparslanê ne. Her weha, li Zanîngeha Munzur a Tunceliyê (Dersîm) û Zanîngeha Bîngolê beşên Ziman û Edebiyata Zazakî (Zaza Dili ve Edebiyatı) jî hatine vekirin û xwendekaran distînin.²⁴⁸

Herweha ji bo Enstîtuyên Zimanên Zindî jî rewş weha ye:

Di dema niha de, “Enstîtuyên Zimanên Zindî” tenê li çar Zanîngehan hene; Mardin Artuklu, Bîngol, Siirt (Sêrt) û Wan Yuzuncu Yıl. Di nav van de ya Zanîngeha Siirtê (Sêrt) tenê wek nav heye lê tu perwerde an jî girtina xwendekaran tune ye û ne aktif e. Li Zanîngeha Dicleyê û Zanîngeha Muş Alparslanê, enstîtu tune ne, lê bernameyên master û doktorayê di bin banê Enstîtuya Zanistên Cîvakî de tên birêvebirin. Di vê xebatê de bal dê bêhtir li ser “enstîtuyên zimanên zindî” û bernameyên wan be.²⁴⁹

Enstîtuya Zimanên Zindî ya Artûklûyê di havîna 2010an da bi bernameya perwerdeyê ya 3 mehan, bi dayîna sertîfîkaya mamostetîya kurdî, dest bi perwerdeyê kir, paşê di sala 2010-2011an da jî bi 20 xwendekarên lîsansa bilind a bitez dest bi perwerdeya bilind kir. Piştî bi bernameyên masterê ya bitez û bêtez bi sedan mamoste hatin gihandin. Li gel vebûna enstîtuyên zimanên zindî yê zanîngehên din, bi hazaran kes ji bernameya masterê ya bêtez serî lê dan (2012). Bo nimûne Zanîngeha Artûklûyê 500 xwendekar, a Bîngolê jî 140 xwendekar qebûl kirin.²⁵⁰

Di salên 2013an da beşên ziman û çanda kurdî yê lîsansê jî, tevî ku bi puanên zêde xwendekar dihatin girtin, hemû kontenjan hatin dagirtin.

Herweha di sala 2015an da ewilî lin Zanîngeha Mûşê û paşê li zanîngehên wekî Dicle û Bîngolê bernameyên doktorayê dest pê kir.

²⁴⁷ Keskin, “hg”. Nisan 2018, r. 472.

²⁴⁸ Keskin, “hg”. Nisan 2018, r. 476.

²⁴⁹ Keskin, “hg”. Nisan 2018, r. 477.

²⁵⁰ Önen Baykuşak, *hb.*2020, r. 366.

Dîyar e ku “akademîya kurdî” ji salên 2010an pê ve, xebatên kurdî yên binirx pêk anîye. Ewilî, di qada kurdî da ji 100î zêdetir tez hatine nivîsîn. Di lîteratûra kurdî da ziman bi pêş ket. Bi konferans, panel û semîneran “dengê zimanê kurdî” bilind bû. Arşîvên kurdî çê bûn û ev jî bo xebatên kurdî bûn çavkanî.²⁵¹

Bi gotineka din, li gor gotarên ku xebatên akademîk ên kurdolojîyê analîz kirine, em dikarin bigihijên wê encamê ku ji sala 2010an pê ve heta roja îro bi sedan tezên akademîk ên kurdolojîyê (kurmancî, kirmanckî, soranî) û herweha gotarên akademîk hatine nivîsîn. Loma, îro edî mirov dikare qala “bîblîyografi”ya xebatên kurdî yên akademîk bike.

Wekî me li jorê jî behs kiribû, ji bo pêşketina ziman û xebatên akademîk jî bi rêya kovarên akademîk, weşangerîya zanîngehan jî hêjayê dubarekirinê ye: “Bi riya weşanan dikare bê gotin ku ziman zindî dibe û bi weşanên akademîk jî ziman dewlemendtir dibe.”

Herwisa, akademîya kurdî bi tezên lîsans, master û doktorayê, bi gotarên akademîk, herweha, bi çalakîyên akademîk û bi amadekirina keresteyên zimanî û hwd., ji bo plansazîya zimanî roleka sereke lîstîye.

Li gor tesbîtên Tan jî rewş weha hatîye destnîşankirin:

Bi saya serê van xebatan, bo nimûne di warê rêziman û rastnivîsê de yekgirtina kurdîya kurmancî bi rêjeyeke ji sedî 70-80 pêk hatiye. Rêz û rêçikên ku bi xebatên rewşenbîrî û akademîk derketine holê bi rêya amûrên ragihandin, berhemên nivîskî, xebatên fêrkirinê ketine beşeke nava civakê. Baş tê zanîn ku xebatên pêkanîna zimanekî yekgirtî û pergaleke nivîsandinê ya yekgirtî bi gelemperî bi destê dewletan, wekî encama plansazîyeke zimanî diçin serî. Lê belê kurdan karîye bêyî piştevanîya hêzeke dewletî, tevî hemû astengîyên netewe-dewletekê di vî warî gavên berbiçav biavêjin.²⁵²

²⁵¹ Önen Baykuşak, *hb.* 2020, r. 367.

²⁵² <https://www.gazeteduvar.com.tr/weki-zimaneki-kurdi-u-rastnivisina-zimane-kurdi-haber-1570923>.
TB: 24.11.2022.

Herweha, di encama xebatên van salên dawî da, dîyar e ku, prestîja zimanê kurdî zêde bû û di qada giştî da xuyanga bikaranîna kurdîya kurmancî şênber bû. Lewra, xebatên sazîyên sivîl û akademîya kurdî li hev hat û sînerjîyek çê bû. Îro ji “duh” bêhtir, di warê standardkirina kurdîya kurmancî da rewşa heyî baş e. Herwisa, îro, ji bo parastin û bipêşxistina zimanê , li gel astengîyan, îmkan jî hene; bi weşanxane, rojname, televîzyon, kovar, înternet, sazîyên zimanê û akademî ya kurdî wekî îmkan li pêşberê cîhana kurdî ne.

4. ENCAM

Di navbera ziman û neteweyê de pêwendiyeka rasterast heye. Zimanê neteweyî, di gelek waran da wekî aborî, çand, perwerde û hwd. karîgerîya xwe li ser raman û hestên hevpar ên endamên neteweyê dike. Di heman demê de zimanê neteweyekê, hilgir û veguhêzê çand û dîrok û mît û nerîta neteweyekê ye. Herwisa, ziman ji bo kes û civakê wekî referans yek ji xalên hevpar ê sereke ye, belkî jî ya herî giring e. Lewra ziman hem teşe dide nasnameya takekesî û hem jî di hevgirtina civakî da roleka giring dilîze.

Zimanê hevpar jî bi xwe re pêdiviya zimanekî standard tîne ku yekîtiya neteweyê dabîn bike. Ev yekîti ber bi neteweperwerîyê ve diguhere ku zimanê standard di vê pêvajoyê da xwedî roleka mezin e. Piraînya gelên ku niha wekî netewe têne pênasekirin, bê guman ji pêvajoya standardkirina zimên derbas bûne.

Di dîroka mirovahîyê da bikaranîna zimên ji bo armancên sîyasî tenê di serdema modern da tê dîtin. Ev dîyarde hevahengê derketina bizavên neteweperwerîyê ye jî. Ji ber giringîya zimanî îdeolojîya neteweperwer ji bo teşedayîna qada giştî (public sphere/kamusal alan) midaxele li zimên dikin.

Neteweperwerî û modela dewleta wê ya ku netewedewlet e, giringîyeka taybet dide yekîtiya zimanî. Zimên xwedîyê du xalên serdest e: Berî her tiştî ziman sembolek e; ew sembola nasnameya hevpar di çîroka “netewe”yê da ye. Ew sembola hişmendîya “em”ê ye. Hişmendîya “em”bûna netewedewletê ancax bi axivîna bi yek zimanî di nav welatî da mimkin dibe. Wekî din ji bo bicihbûna slogan û hêvîyên neteweperwerîyê di tebeqeyên civakî da pêdivî bi “zimanê neteweyî” heye.

Herwisa, li gor vê riwangehê bikaranîna heman zimanî ji hêla elît û kesên ji rêzê ve dibe sedem ji bo civîna li derdora daxwaz, hestên giştî û armancên hevpar. Yekîtiya zimanî ne tenê giringîyeka sîyasî û çandî ye, di heman demê da pêwîstîyeka aborî û pêdivîyên pratîk e jî. Lewra, ji bo ku aborîya neteweyî di nava welatî da çê bibe û hebûna xwe bidomîne, pêwîstî bi derbasdarîya heman zimanî li tevahîya welêt heye.

Erk û fonksîyona zimanî ya duyem jî: Ziman amûrek e. Ew ji bo guhertin û veguhertina nifûsa welêt navgînek e. Ku ev nifûs jî herçiqas wekî “heman netewe” bê pejirandin jî ji nasnameyên etnîkî û zimanî yên cihêreng pêk tê. Eger ku karîgerî û belavbûna bikaranîna vê amûrê zêde bibe cihêwazîya di nav civakê da her ku biçe dê lawaz bibe û bi awayekî jênegere zimanê standard û hilberîna çandî pêk bê.

Ji ber ku ziman hem simbol û hem jî amûrek e, her netewedewlet ji bo ku veguherîna civakî di rêça monîst-standard da, ya ku tê xwastin, midaxeleyî zimên dike. Herwisa ziman tê birêvebirin, manîpulekirin û heta ji nû ve tê afirandin. Ji bo ku her kes bi vî zimanê neteweyî biaxive, mekanîzmayên cihêreng têne xebitandin. Di vê çarçoveyê da hemû xebatên dewletê bi yek zimanî tên meşandin û zimanê bijartî li ser kesên, ku li welêt bi zimanên cuda diaxivin, tê ferzkirin.

Herwisa, taybetmendîya neteweperwerîyê ew e ku yekîtiya zimanî wekî hêmaneka bingehîn ji bo afirandina tifaqên ferazî (virtual) radixe ber çavan. Di vê rewşê da dîsa weşangerîya kapîtalîst dibe hilgirê vê pêvajoyê û bi alîkarîya bipêşxistina xebatên zimannasîyê hişmendîya civakê ya li ser zimanê hevpar ava dike.

Çîroka zimanê standard dûvdirêj e; modernîte, netewe, netewedewlet û neteweperwerî paşxaneyê vê dîyardeyê pêk diîne.

Wekî ku em dizanin zimanê standard berhema serdema modernîteyê ye. Modernîte ji aliyê zimanê standard jî li ser neteweyên din karîger bûye. Ango, dîyardeyên ku li Rojavayê pêk hatine, paşê li seranserê cîhanî belav bûne.

Di zimannasîyê da standardkirina zimanî tê manaya sêwirandin (design) an lêgerîna qaîdeyên rastnivîsînê (orthography) û rêzimanê yên ku ji bo hemû bikarhêneran, hevpar in û bi vî rengî armanc ew e ku bikaranîna wî di gelek warên jîyana mirovan da berfireh bibe. Armanca zimanê standard ew e ku hevgirtina çandî, sîyasî û civakî bi awayekî plankirî û sêwirandî pêk biîne û wek cureyekê referansê li ser xaka ku tê da fermî ye, peyda bibe.

Standardîzasyon ew pêvajo ye ku tê da ziman ji bo formên xwe yên zimanî û hem jî ji bo fonksiyonên ragihandinê yên civakî tê standardkirin. Zimanek bi pêvajoya standardbûnê dibe standard. Ev pêvajo, bi gelemperî, ku bigihîje asteka baş hin prosedûrên amadekirî û birêkûpêk pewist in.

Standardkirin, ji zimanê axaftinê zêdetir bi zimanê nivîskî ve têkildar e. Standardkirin ew pêvajoyek e ku zimên bi rengekî kodkirî ye. Ev pêvajo bi gelemperî pêşketina tiştên wekî rêziman, pirtûkên îmlayê, ferheng û dibe ku edebîyatekê vedihewîne. Hereweha, bi hîlbijartina yek ji formên herêmî, di formên dîyalektê da standardkirin dikare were bicihanîn û afirandina formeka nû ya standard bi gelek hêmanên ku ji guhertoyên cuda yên dîyalektên herêmî hatine wergirtin.

Îcar, zimanê standard ji pêvajoya polîtîka û plansazîya zimanî diwelide ku polîtîkayên zimanî, biryarên dewlet an sazîyekê, di derheqê zimanê fermî û bikaranîna zimanê din da ye û plansazîya zimanî jî, hewldan û gavên pratîk ji bo bicihanîna polîtîkayên zimanî ye. Einar Haugen ji bo terîfkirina pêvajoya plansazîya zimanî çarçoveyek kêrhatî geşe pê daye. Çarçoveya ku Haugen dîyar kirîye, wekî pîvan hatîye qebûlkirin û dîyar e ku, bi gelemperî, di xebatên akademîk da “şoreşên zimanî” li gor van pîvanan tên analîzkirin. Ew jî: Hilbijartin, Kodkirin, Pêkanîn û Hûrgilîkirin in. Xebatên standardkirina zimanî dikevin çarçoveya “kodkirin”ê ku tê manaya avakirina standardeka zimanî ji bo koda hîlbijartî ya zimanî ku bi piranî li ser sê pêngavan tê dabeşkirin: Îmla, rêziman û ferheng.

Dîyare ku her netewe di warê standardbûna zimanî da rêbazeka li gor taybetmedîyên xwe şopandîye. Bo nimûne, di serdema dawî ya osmaniyan de hin rewşenbîrên tirk ji bo modernbûn, Rojavayîbûn û ji ber sedemên pratîk xwastine ku alfabeya xwe biguherin û ya latînî qebûl bikin. Lê, ev pêvajo demeke dirêj dewam kir û di wê serdemê da neçû serî. Ancax di serdema Komarê da di sala 1928an da alfabeya latînî hate qebûlkirin.

Balkêş e, di nav kurdên serdema Osmanîyan da jî daxwaza zimanê standard û guherîna alfabeyê bi ya tirkan re hevdem e. Di weşanên kurd da, li Stenbolê, rêça vê yekê

tê çavdêrîkirin. Hêj berî Şerê Cîhanê yê Yekem di nav kurdan da xebatên li ser zimanî dihatin kirin. Lêbelê, mijara alfabeyê di nav rewşenbîr û elîtên kurdan da meseleyeka nîqaşbar bû. Nîqaş li ser alfabeyên erebî ya sivikîrî, kirîlî û urdûyî geş bûbû.

Piştî Şerê Cîhanê netewerperwerîya kurdî geştir bû û li gel vê daxwazên li ser zimanê standard zêdetir bûn. Lê xebatên bi vî rengî neçûn serî. Ev guherîn ancax di qonaxa Kovara Hawarê da bi awayekî pratîk dest pê kir. Ango, li Şamê cara ewil alfabeya kurmançî ya latînî ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve hat sepandin. Alfabeya Celadet Alî Bedirxanî ji bo ku kurdên li Tirkîyeyê çêtir jê fam bikin û zûtir bielimîn, ji xeynî çend herfan dişibîya ya tirkî. Li gel vê gava radîkal, Kovara Hawarê ji aliyê rastnivîs û xebatên bingehîn ve jî bû wekî dibistanek. Lewra hîmê standardîzasyona zimanî hatibû danîn.

Celadet Bedirxan di Hawarê da li ser giringîya alfabeyê disekinî û digel wê xwendevanên xwe fêrî rêziman û ferhengê jî dikir. Tevî ku di Hawarê de mijarên alfabe û rêzimanê bi awayekî zanistî hatibin vegotin jî, di derheqê rastnivîsînê da zêde agahî tune ye û wekî mijareka sereke nehatiye pêşkêşkirin. Hêjayê gotinê ye ku standardîzasyona kurdîya kurmançî bi guherîna alfabeya erebî bi ya latînî, dest pê kirîye.

Li hêla din, di rêwîtiya standardbûna kurmançiyê da rola polîtîkayên zimanî yên Komara Tirkîyeyê berbiçav e û van polîtîkayên ku hatine meşandin, li ser çarenivîsa kurmançiyê bi awayekî xurt karîger bûne. Lewra, bi awayekî vekirî xuya dike ku Komara Tirkîyeyê pala xwe daye netewerperwerîya tirk û ji bo ku nasnameya neteweyî pêk were, zimên wekî pîvan qebûl kirîye. Bi gotineka din, li Tirkîyeyê polîtîkayên zimanî wekî amûreka bi bandor hatîye bikaranîn. Ziman di avakirina netewedewletê û di nasnameya neteweyî û yekîtiya wî ya tirk da wekî garantî hatîye dîtin.

Herweha, ev netewerperwerîya zimanî ya Komarê, bi xwe ra windabûna zimanên din ên ku dihatin axivîn, anîye. Yanî ji bo ku her kes bi tirkî biaxive, ji bilî tirkî asîmîlekirina zimanên din wekî mecbûrî hatibû dîtin. Herwekî pêwîstîya vê rewşê, dewletê ji bo ku komên zimanên ne-tirkî bi tirkbûnê asîmîle bike, gelek pratîkên zext û tundîyê sepandîye. Ango, hebûna tirkî ku wekî nasnameya tirk dihat dîtin, ji bilî tirkî, hema bibêje pêdivî bi

tunebûna zimanên din hebû. Herwisa, ji ber heman nêzîkahî û polîtîkayan, ji bilî tirkî hem bikaranîna zimanên din (wekî kurdîya kurmancî) hat sînordarkirin hem jî li hember van zimanên din gelek tevdîr hatin girtin û qedexeyên tund li ser wan hatin sepanandin. Ev polîtîkaya yekzimanî ya dîyarkirî jî bi metnên qanûnî hatin birêvebirin. Bo nimûne, bikaranîna kurdîyê di cihên giştî, radyo, televîzyon, kitêb, her cure materyalên nivîskî da û ji bilî wan axaftina bi wî zimanî hatîbe qedexekirin.

Lêbelê, ev pêvajoya destnîşankirî, di sala 1991 da digihêje qonaxeka nû. Sîyaseta dewletê ya ku pala xwe daye înkâr û polîtîkayên asimîlasyonê teşeyeka nû digire. Ji hêla dewletê ve mirov dikare behsa serdemeka reforman bike. Di vê pêwendê da, nişaneyên qonaxa nû ya herî mihîm, fesihkirina qanûna bi hejmarê 2932an bû.

Piştî, “Îdeala Yekîtiya Ewrûpayê” li ser polîtîkayên zimanî karîger bûye, di têgihîştina “neteweperwerî” û “yekzimanîya fermî” ya ku Tirkîyeyê ji destpêkê ve dimeşîne, bûye sedema şikestineke cidî. Nişaneyên vê yekê ya herî zelal, pêşî di makezagonê da û piştî jî di qanûn û rêzîknameyan da gelek guherîn hatin çêkirin.

Herwisa, di van 30 salên dawî da tesîra polîtîkayên zimanî yê neyênî ber bi şert û mercên erênî ve guherî. Di sala 2009an da di warê zimên da reform li pey hev hatin kirin. Ev veguherîna polîtîkaya zimanî ya Tirkîyeyê di qada giştî da kurdî da xuyakirin, rê li ber asayîkirina wê jî vekir. Ev serdem ji salên 1990î dest pê dîke, di salên 2000î da jî digihêje asteka baştir ; di weşangerîya kurdî da rûpeleka nû vedibe. Rojname, kovar û kitêb tîn çapkirin. Enstîtuyên kurdî li hin bajaran tîn saz kirin. Muzîk û şanoya kurdî geş dibe. Di warê plansazîya zimanî da gelek xebatên hêja hatin kirin; ferheng, pirtûkên gramêrê û herwisa klasîkên kurdî hatin çapkirin. Herweha, tevger û sazîyên zimanî hatin damezirandin.

Wekî zimanekî bêdewlet û bêstatû, kurdîya kurmancî ev sed sal in bi hewlên şexsî û dezgehî, ji aliyê standardbûnê ve hatiye astekê. Xebatên hêja yê plansazîya corpusê an kodkirina zimanî di encama van hewlan da derketine holê. Lê, ev nahê wê manayê ku berhemên piştî Hawarê derketine, ji aliyê standardê ve hevgirtî ne, ev yek li gor nivîskar,

komxebat û berhemên cihêreng cudahîyan nîşan dide. Herwisa, herçiqas îro tevahîya xebatên bi vî rengî xwe bispîrên Celadet Alî Bedirxanî jî em nikarin bibêjin ku standardbûna kurmancîye ji sedî sed pêk hatîye.

Rewşa baş a heyî ya nîsbî ku gelek destkeftîyên zimanî binimîne jî, ji ber polîtîka û qedexeyên pratîk, hevî ew e ku helwest û polîtîkayên akademîya kurdî û sazîyên zimanî li gel nêzikahîya nivîskar, rewşenbîr, lêkolêr û weşanxaneyên kurdî li hev bînin û bikaribin vê peywira mihîm hilbigirin ser milên xwe, da ku berdewamîya zimanî û hewlên standardkirina zimanî pêk bê. Herwisa, her cure medya, rojname û kovarên akademîk jî xwedî rolên jîyanî ne. Herî dawî, armanca vê xebatê destnîşankirina rewş û dînamîkên standardkirina kurmancîyê û serborîya wê bû ku ji bo xebatên bi vî rengî bibe bingeh û egera xebatên nû.

ÇAVKANÎ

- Ak, Mustafa, Farklı Dil ve Lehçelerde Televizyon Yayıncılığı: Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da TRT Kurdi Algısı, İstanbul Üniversitesi SBE, İstanbul, 1996, (Teza doktorayê ya çapnebûyî).
- Akıncı, Abdulvahap, *Modern Ulus Devletlerin Doğuşu*, Dumlupınar Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Kütahya 2012.
- Akin Salih, *Fêrkarîya Kurdî ya Taybet li Tirkîyeyê: Pirsgirêk û Pêşbîni*, Yazınca Kovara Werger û Edebiyatê, Wer. Şerif Derince-Ergin Öpengin, Boğaziçi Üniversitesi Yayınları.
- Akin, Salih, *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*, Avesta, İstanbul 2013.
- Arsan, Esra, *Türkiye Kürtlerinde TRT Şeş Algısı: Anadilde Yayıncılık Üzerine Bir Araştırma*, İstanbul Bilgi Üniversitesi SBE, İstanbul 2014.
- Aydenîz, Têkoşîn, *Ferhengên Kurdî yê Online –Lêkolîneke Çendanî-*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn, 2020, (Projeya lîsansa bilinda a bêtez a çapnebûyî).
- Aydın, Tahirhan, *Kovar, Ziman û Perwerde -Kovara Nûbiharê û Zimanê Kurdî*, Kadim Hikmet Dergisi.
- Aydın, Tahirhan, *Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmancîyê*, Kurdîname Akademîk.
- Aydoğan, İbrahîm Seydo, *Celadet Bedirxan, Çavkaniyên Hawarê û Kurdaniya bîrewer*, Journal of University of Zakho.
- Aydoğan, Mistefa, *Rêbera Rastnivîsînê*, Rûpel, İstanbul, 2012.
- Aydoğan, Mistefa, *Xemname*, Lîs, Ankara, 2020.
- Aydoğan, Mustafa, *Zayıf Dil Yok, Zayıf Kürt Çok*, İnatçı Bir Bahar, Berhv. Vecdi Erbay, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2012.
- Balçık, Mehmet Berk, *Milliyetçilik ve Dil Politikaları, "Modern Türkiye'de Siyasi Düşünce: Milliyetçilik"*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2002.
- Bayhan, Halil, *Ulus Devlet, Modernizm ve Postmodernizm*, Dicle Üniversitesi, Diyarbakır, 2006, (Teza masterê ya çapnebûyî).

- Bedirxan, Celadet Alî - Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, Avesta, 2009, İstanbul.
- Bedirxan, Celadet Alî Bedir-Xan, *Elfabeya kurdî&Bingehên gramera kurdmancî*, Nefel, (Çapa dijîtal), 2002.
- Bedirxan, Celadet Alî, *Armanca Awayê Xebatê û Nivîsandina Hawarê*, Hawar, Hejmar 1.
- Bedirxan, Celadet Alî, *Elfabêya Kurdî*, Weşanên Avesta 2011, Stenbol.
- Bedirxan, Kamuran Ali, *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*, Özgürlük Yolu, 1977.
- Bosnalı, Sonel, *Dil Planlaması ve Standartlaşma Kapsamında Yeni Lisan Hareketine Toplumbilimsel Bir Yaklaşım*, Amd. Hülya Argunşah-Oğuzhan Karaburgu, 100.Yılında Yeni Lisan Hareketi ve Milli Edebiyat çalışmayı Bildirileri, Türk Edebiyat Vakfı Yayınları, İstanbul, 2011.
- Bozarslan, M.Emîn, *Alfabe*, İstanbul, 1968.
- Bülbül, Mikail, *Weke Qada Rengvedaneke Neteweperwerîyê di Pratîkên Tirk û Kurdan de Nîqaşên li Ser Alfabeyê*, Amd. Nüket Esen, Ramazan Çeçen, Sempozyûma Edebîyata Berawirdî “Ji Duh Heta Îro Di Edebîyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî”, Weşanên Zanîngeha Mardin Artukluyê, Mêrdîn, 2015.
- Ceweri, Fırat Amd. *Hawar*, Weşanên Nûdem, Cild:1 Stockholm, 1998.
- Clemence Scalbert Yücel, Geşbûn û Xweserîbûna Qada Xebatên Kurdî, Konferansa Xebatên Kurdî, Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê, 25 Gulan 2013.
- Cobarrubias, Juan, *Language Planning: The State of the Art, in Progress in Language Planning: International Perspectives*, Edited by: Juan Cobarrubias, Joshua A. Fishman, Walter de Gruyter&Co., Berlin 1983.
- Coşkun, Vahap, M.Şerif Derince, Nesrin Uçarlar, *Dil Yarası*, Disa Yayınları, Diyarbakır, 2010.
- Coşkun, Vahap, *Ulus-Devletin Dönüşümü ve Meşruluk Sorunu*, Liberte yayınları Ankara, 2008.
- Çeçen, Ramazan, *Di Nav Modernîzasyonên Der-Ewrûpî de Tecrubeya Kurdan*, Nûbihar Akademî, Hejmar 6, Stenbol, 2016.
- Çetin, Süleyman, *Kovara Hawarê û Bandora Wê ya li Ser Zimanê Kurdî*, Zanîngeha Wan Yuzuncu Yilê, Van, 2016, (Teza masterê ya çapnebûyî).

- Çiçek, Cuma, *Zimanek Çima Tê Qedexekin?*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2013.
- Deumert, Ana, *The Process of Language Planning, Introducing Sosyolinguistics*, by Rajend Mestherie, Joan Swann, Ana Deumert and William L. Leap, Published by Edinburgh University Press, Edinburgh, 2004.
- Döger, Dilaver, *Bêjara Neteweparêz Di Kovara Hawarê De*, Zanîngeha Yuzuncu Yilê, Van, 2017, (Teza masterê ya çapnebûyî).
- Elmacı, Ziya, *Türkiye Cumhuriyeti'nin Dil Politikası*, İnönü Üniversitesi, Malatya, 2016, (Teza doktorayê ya çapnebûyî).
- Erdem, Zeynep, *Modern Ulus Devlet Anlayışının Epistemolojik Temeli ve Eleştirisi*, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin, 2017, (Teza masterê ya çapnebûyî).
- Erözden, Ozan, *Siyasi İktidarın Meşruiyet Temeli Perspektifinde Avrupa'da Ulus-Devlet*, İstanbul Üniversitesi, İstanbul, 1996, (Teza doktorayê ya çapnebûyî).
- Farqînî, Zana, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2022.
- Felat Dilgeş, *Celadet Alî Bedirxan ve Hawar Ekolû*, İnatçı Bir Bahar, Berhv. Vecdi Erbay, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2012.
- Fırat, Deniz, *Ulus Devlet, Dil Ve Kimlik Politikaları Bağlamında Anadili Kürtçe Ve Arapça Olan Öğretmen Ve Akademisyenlerin Anadilinde Eğitime İlişkin Görüşleri*, Ankara Üniversitesi, Ankara, 2015. (Teza masterê ya çapnebûyî).
- Filiz, M.Şirin, *Weke Zimaneke Kêmar Serpêhatiya Statuya Zimanê Kurdî*, Nubihar Akademî, Hejmar 4, Sal 2016.
- Fishman, Joshua A., *Language Policy and Language Shift*, Edited by Thomas Ricento, An Introduction to Language Policy: Theory and Method, Blackwell Publishing, London, 2006.
- Geyik, Resul, Esat Şanlı, Roger Acun, Ruken Çalıştiran Karabat, Ahmet Kan, Veysel Yıldızhan, *Xebatên Akademîk yên Kurdolojîyê li Tirkîyeyê (2009-2019)*, Kovara Kurdînameyê ya Navneteweyî, Hejmar 1, Sal 2019.
- Giddens, Anthony, *Modernliğin Sonuçları*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 1994.
- Hassanpour, Amir, *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, Wer. İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan, Avesta Yayınları, İstanbul, 2005.

- Hassanpour, Emîr, *Li Tirkîyeyê Zimnakujî û Zimanê Kurdî*, Yazınca Kovara Werger û Edebîyatê, Wer. Şerif Derince, Boğaziçi Üniversitesi Yayınları, , Hejmar 7, Sal 2005.
- Hawar, *Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê*, Hawar, Amd. Fırat Ceweri, Weşanên Nûdem, Cild 1, Stockholm, 1998.
- Işık, İbrahim S., *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbihar, Stenbol, 2014.
- Işık, Ümit, *Lêkolînek li Ser Ferhengên Kurdî (1655-1990)*, Anemon, Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Cild 3 Hejmar 1, 2015.
- Îzolî, D., *Ferhengî Kurdî-Tirkî, Türkçe-Kürtçe*, Weşanên Deng, Stenbol, 1991.
- Karabeyeser, Ayetullah, *Bir Kitle İletişim Aracı Olarak Televizyonun Zazaca İçin Önemi*, I.Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu, Ed. Murat Varol, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl, 2011.
- Kaya, Fetullah, *Kürt Basını*, Hivda, Stenbol, 2010.
- Keskîn, Necat, *Serboriya Akademiya Kurdî Li Tirkîyeyê û Pirsgirêkên Wê*, e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi, Cild 10, Hejmar 1, Nisan 2018.
- Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê*, , Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol, 2019.
- Kurt, Şehmus, *Hilsengandinek li Ser Pirtûkên Rêzimana Kurmancî ji Aliyê Rêbazên Hînkirina Rêzimanê ve*, Nûbihar Akademî, Cild 4, Hejmar 14, Sal 2020.
- Malmîsanij, M., *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayıncılığının Dünü ve Bugünü*, Vate, İstanbul, 2006.
- Oğuz, Mevlüt, *Li Bakur û Tirkîyê Weşangerî Ber bi Têkçûnê ve Diçe*, The Hall Kurdi, E-kovara çandi ya mehane, hejmar 7, Tirmeh 2022.
- Onen, Ronayî, *Perwerdeya Zimanî di Aktîvîzma Zimanî da; Tecrubeya TZP KURDÎ*, Akademîya İsmail Beşikçi, 2020, Payîz 2.
- Onen, Ronayî, *Rûpeleke Girîng di Aktîvîzma Zimanî ya Kurdî de; TZPKurdî*, Zend, Hejmar 29, Sal Payîz-Zivistan 2022, Stenbol.
- Onen, Ronayî, *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*, Şehmuz Kurt Wer., Weşanên Peywend, Stenbol, 2018.

- Orak Reşitoğlu, Sevda, *Berawirdkirina kovara Hawarê û Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmancîyê ji alîyê rastnivîsînê ve*. Folklor û Ziman Cild 3, Hejmar 1, 2022.
- Orak Reşitoğlu, Sevda, *Mînaka Standardkirina Zimanekî Hevpar: Hawar*, Zanîngeha Dîcleyê, Diyarbakır, 2022, (Teza doktorayê ya çapnebûyî).
- Orhan, Salim, *Bir Ulus-Devlet Örneği Olarak Türkiye’de Dil Politikaları ve Dil Hakları*, Ed. Bülent Bilmez, Türkiye’de Dil Hakları ve Dilsel Çoğulluk, İstanbul Bilgi Üniversitesi yayınları, İstanbul, 2021.
- Orhan, Salim, *Dil Politikaları Ve Dil Hakları Üzerine Teorik Çerçeve*, İnönü Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi, Cild 8, Hejmar 2, Sal 2017.
- Orhan, Salim, *Dil Politikaları ve Türkiye’de Uygulamaları*, Ankara Üniversitesi, Ankara, 2012, (Teza masterê ya çapnebûyî).
- Önen Baykuşak, Ronayi, *Türkiye’de Hâkim ve Muhalif Politikanın Gerilim Alanlarından Biri Olarak Kürtçe Dil Meselesi*, Mimar Sinan Güzel Sanatlar Üniversitesi SBE, İstanbul, 2020, (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî).
- Öpengin, Ergin, *Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdeçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan*, Derwaze, Hejmar 1, Stenbol, 2017.
- Öpengin, Ergin, *Rewşa kurdî ya sosyolînguîstîk li Tirkîyeyê*, Avesta, Stenbol, 2011.
- Öpengin, Ergin, *Türkiye’de Kürtçe’nin Durumuna Toplumdilbilimsel Bir Bakış ve Anadolinde Eğitim*, Birikim Dergisi, Hejmar 253, Sal 2010.
- Özcan, Mülazım, *Di Salên 1980-2000an De Li Tirkîyeyê Rewşa Ziman û Edebîyata Kurdî û Têkilîya Wan Li Gel Tevgerên Civakî Yên Kurdan*, Zanîngeha Yuzuncu Yilê, Van, 2018, (Teza masterê ya çapkirî).
- Özkan Kerestecioğlu, İnci, *Modern Devlet ve Milliyetçilik*, Berhv. H.Birsen Örs, Modern Siyasi İdeolojiler, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2014.
- Rênas, Serhad B., *Medyaya Kurdî û Medyaya Nû*, Ronahî, Stenbol, 2013.
- Sadoğlu, Hüseyin, *Türkiye’de Ulusçuluk ve Dil Politikaları*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2003.
- Salihpaşoğlu, Yaşar, *Türkiye’nin Dil Politikaları ve TRT-6*, Gazi Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi, Cild 11, Hejmar 1-2, Sal 2007.

- Samur, Aziz, *Rêziman û Rastnivîsa Kurdiya Kurmancî*, Nûbihar, Stenbol, 2022.
- Serfiraz, Mesûd, *Kurd, Kitêb, Çapxane*, Peywend, Stenbol, 2015.
- Standard Language, Encyclopdia of linguistics*, Philipp Strazny Ed. Published in Great Britain By Fitzroy Deraborn, 2005.
- Taş, Çetin, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Dîwan, Stenbol, 2013.
- Uzun, Mehmed, *Hêz û Bedewîya Pênûsê*, Nûdem, Swêdê, 1993.
- Yaşar, Aslan, Gamze, *Ortaçağdan Günümüze "Modernite": Doğuşu Ve Doğası*, Adıyaman Üniversitesi SBE Dergisi, Adıyaman 2011, Hejmar 7.
- Yıldırım, Kadri, *Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)*, Avesta, İstanbul, 2013.
- Yıldız, Ekrem, *Kurtefilm Wekî Cih û Amûrê Bikaranîna Zimanê Kurdî*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn, 2019, (Teza masterê ya çapnebûyî).
- Yıldız, Kerim, *Kürtlerin Kültürel ve Dilsel Hakları*, Wer. Atilla Tuygan, Belge Yayınları, İstanbul, 2004.
- Zeraq, Dilawer, Nifşa Ciwan ya Xweavakirî: Nifşa Rewşenê, Kürd Araştırmaları, Hejmar 6 Sal Havin 2021.
- Zêrevan, Arif, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdîyê (kurmancî)*, Nefel, Stockholm, 1997.
- Zêrevan, Arif, *Pêşgotin*, Celadet Alî Bedir-Xan, Elfabêya kurdî&Bingehên gramera kurdmancî, Weşanên Nefel (çapa dijîtal), Stockholm, 2002.

Çavkanîyên Dîjîtal

Aslan, Ahmet, *Ulus-Devlet Nedir?*, <https://perspektif.eu/2019/06/22/ulus-devlet-nedir>.

Burkay, Kemal, *Dersên Zmanê Kurdî*, Roja Nû, <https://www.tirsik.net/danegeh/pirtuk/kemal-burkay/Dersen%20Ziman%c3%aa%20Kurdi.pdf>

Bülbül, Mikail Netewesazî, *Ziman û Standardîzasyona Zimanan*, 2020, https://akademi.yeniyasam.org.tr/p/user_course/detail/id=21

Bülbül, Mikail, bi rêya Whatsappê

Haig, Geoffrey, *The invisibilisation of Kurdish: the other side of language planning in Turkey*, https://www.academia.edu/2134687/The_invisibilization_of_Kurdish_the_other_side_of_language_planning_in_Turkey_Haig_2004_

<http://jms.artuklu.edu.tr/tr/pub/archive>

<http://mamosteye-zimane-kurdi.blogspot.com/2013/01/enstituya-kurdi-ya-amede.html>

<http://www.saradistribution.com/a.bali.htm>

<https://bianet.org/kurdi/perwerde/228019-inisiyatifa-mamosteyen-kurdi-dive-zimane-kurdi-bibe-zimane-perwerdehiye>

<https://candname.com/bi-zimaneki-nayezanin-danasina-zanayeki-ape-musa>.

<https://candname.com/rojnamegeri-u-wesangeriya-kurd-di-navbera-salen-1898-1923-de>

<https://cetoyezedo.blogspot.com/2019/02/pesbaziya-sanoya-kurdi-ji-li-car.html?spref=tw>

<https://cetoyezedo.blogspot.com/2019/06/di-sedsaliya-sanoya-kurdi-de-ji-caran.html>

<https://dergipark.org.tr/tr/pub/buydd>

<https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyati>

<https://dijilopedi.com/2021-dunya-internet-sosyal-medya-ve-mobil-kullanim-istatistikleri/>

<https://indyturk.com/node/523481/t%C3%BCrki%C3%A7yeden-sesler/en-kapsaml%C4%B1-k%C3%BCrt%C3%A7e-t%C3%BCrk%C3%A7e-s%C3%B6zl%C3%BC%C4%9F%C3%BCn-derleyicisi-zana-farqin%C3%AE>

<https://ismailbesikcivakfi.org/>

<https://ismailbesikcivakfi.org/ibv-yayinlari/kitaplarimiz/perwerde-hinkirina-kurdi-tecrbe-model-pesniyaz>

<https://journos.com.tr/ilk-kurtce-gazete-kurdistan>

<https://komanubihar.org/?cat=1>

https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Enst%C3%AEtuya_Kurd%C3%AE_ya_Amed%C3%AA

https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Feq%C3%AE_Husey%C3%AE_n_Sagni%C3%A7

[https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Kurdistan_\(rojname\),](https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Kurdistan_(rojname),)

https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Mehmet_Kemal_I%C5%9F%C4%B1k

https://ku.m.wikipedia.org/wiki/Zana_Farq%C3%AE_n%C3%AE

https://ku.wikipedia.org/wiki/Enst%C3%AEtuya_Kurd%C3%AE_ya_Stenbol%C3%AA

https://ku.wikipedia.org/wiki/Kamiran_Al%C3%AE_Bedirxan,

https://ku.wikipedia.org/wiki/Kemal_Badilli,

https://ku.wikipedia.org/wiki/Kemal_Burkay

https://ku.wikipedia.org/wiki/Mehmed_Em%C3%AE_n_Bozarslan

https://ku.wikipedia.org/wiki/Musa_Anter

https://ku.wikipedia.org/wiki/Qedr%C3%AE_Y%C4%B1ld%C4%B1r%C4%B1m

<https://m.bianet.org/bianet/medya/261007-kurtce-gazeteyle-kurt-toplumuna-ulasmak-istedik>

<https://recrodigital.com/dunyada-ve-turkiyede-internet-sosyal-medya-kullanimi-2022/>

https://tr.wikipedia.org/wiki/Dillerin_%C4%B0internet_%C3%BCzerindeki_kullan%C4%B1l%C4%B1m%C4%B1#:~:text=W3Techs%20taraf%C4%B1ndan%20yap%C4%B1lan%20ara%C5%9Ft%C4%B1rmaya%20g%C3%B6re,%2C%20Frans%C4%B1zca%2C%20%C4%B0talyanca%20ve%20Portekizcedir.

https://tr.wikipedia.org/wiki/K%C3%BCrt_Dili_Ara%C5%9Ft%C4%B1rma_ve_Geli%C5%9Firme_Derne%C4%9Fi

https://tr.wikipedia.org/wiki/Zarok_TV#:~:text=Zarok%20TV%2C%2021%20Mart%202015,y%C3%B6nelik%20programlar%20da%20yer%20almaktad%C4%B1r

<https://web.archive.org/web/20161124100743/http://www.radikal.com.tr/turkiye/kurtce-basit-bir-dildir-aciklamasina-sert-tepki-1124181>

<https://www.aa.com.tr/kk>

<https://www.aa.com.tr/tr/gundem/turkiyede-internet-kullananlarin-orani-yuzde-85e-yukseldi/2669851#>

https://www.avestakitap.com/index.php?p=Products&wrt_id=10124

[https://www.avestakitap.com/index.php?p=Products&wrt_id=10124,](https://www.avestakitap.com/index.php?p=Products&wrt_id=10124)

<https://www.avestakitap.com/murad-ciwan>

<https://www.basnews.com/tr/babat/632138>

<https://www.facebook.com/muderrishane/photos/a.199898630164518/1876859939135037/?type=3;>

<https://www.gazeteduvar.com.tr/amed-tiyatro-festivali-basladi-haber-1585764>

<https://www.gazeteduvar.com.tr/weki-zimaneki-kurdi-u-rastnivevisina-zimane-kurdi-haber-1570923>

<https://www.indyturk.com/node/531756/haber/k%C3%BCrt%C3%A7e-haz%C4%B1rlanan-y%C3%BCksek-lisans-ve-doktora-tezlerinden-45i-kitapla%C5%9Ft%C4%B1r%C4%B1ld%C4%B1>

<https://www.institutkurde.org/ku/info/em-k-icirc-nes-1232551025>

<https://www.institutkurde.org/ku/info/em-k-icirc-nes-1232551025>

<https://www.institutkurde.org/ku/info/l-ecirc-kol-icirc-n-amp-wesanger-icirc-wesan-1232551029>

<https://www.komeleyakurdi.org/kr>

<https://www.kurdarastirmalari.com/yazi-detay-oku-117> (290822)

<https://www.kurdistan24.net/tr/story/79773-K%C3%BCrt%C3%A7e-%C3%B6%C4%9Fretmenleri:-Halk-E%C4%9Fitim-Merkezleri-K%C3%BCrt%C3%A7e-i%C3%A7in-bir-f%C4%B1rsat>

<https://www.nubihar.com/behterkovar/8593-nubihar-akademi-17>

<https://www.wmezopotamyaye.org/ku/d/naveroken/84-kursa-rezimana-kurmanci-u-zimannasiye-ya-bi-sertifika-3.html>

<https://www.wmezopotamyaye.org/ku/d/naveroken/84-kursa-rezimana-kurmanci-u-zimannasiye-ya-bi-sertifika-3.html>

<https://www.wmezopotamyaye.org/ku/d/wesan/16-folklor-u-ziman-1.html>

<https://www.wmezopotamyaye.org/ku/d/wesan/30-kurdizan---1.html>

<https://www.wmezopotamyaye.org/ku/weqif/2-vizyon>

Nicolle, Steve, Sociolinguistics: Language Planning and Policies,
https://www.academia.edu/6695472/Sociolinguistics_Language_Planning_and_Policies,

Nikolovski, Zoran, Language Planning And Language Standardization,
https://www.researchgate.net/publication/296334037_Language_Planning_And_Language_Standardization

Nkopuruk, Imikan, *Status Planning, Corpus Planning And Acquisition Planning: Detailed Discourse with Examples from Two African Countries-Tanzania and Bokina Faso*, Tai Solarin University of Education,
https://www.researchgate.net/publication/327541764_Status_Planning_Corpus_Planning_and_Acquisition_Planning_Detailed_Discourse_with_Examples_from_Two_African_Countries-Tanzania_and_Bokina_Faso/link/5b94af1a299bf147392dc8c9/download ,

Oguz, Cemil, 2022: *Hemû pirtûkên bi kurdî yê salê*,
<https://diyarname.com/news.php?Idx=55919>

Oguz, Cemil, *Kürtçe kitap yayıncılığının 2018 panoraması*,
<https://www.evrensel.net/haber/369941/kurtce-kitap-yayinciliginin-2018-panoraması>,

Opengîn, Ergîn, *Parastin û Guherîna Zimên: Destpêkek bo Çarçoveyên Teorîk ên Parastin û Guherîna Zimên Hin Împlikasyonên Wan li ser Rewşa Zimanê Kurdî*,
https://www.academia.edu/4205620/Parastin_%C3%BB_Guher%C3%AEna_Zim%C3%AAAn_Destp%C3%AAkek_bo_Teoriy%C3%AAAn_Parastin_%C3%BB_Guher%C3%AEna_Zim%C3%AAAn_%C3%BB_hin_Sepandin%C3%AAAn_wan_li_ser_ziman%C3%AA_Kurd%C3%AE,

Öpengin, Ergin, *Türkiye’de Kürtçe’nin durumuna toplumbilimsel bir bakış ve anadilinde eğitim*,
https://www.academia.edu/4205659/T%C3%BCrkiye_de_K%C3%BCrt%C3%A7e_nin_durumuna_toplumbilimsel_bir_bak%C4%B1%C5%9F_ve_anadilinde_egitim,

Ramlan Ramlan, *Language Standardization In General Point Of View*, Article in Budapest International Research and Critics Institute (BIRCI-Journal) Humanities and Social Sciences, 2018,
https://www.researchgate.net/publication/329967792_Language_Standarization_In_General_Point_of_View,

Tan, Samî, bi rêya Whatsappê

Yeşilmen, Dawîd, *Kürtçe Dergicilik*,
https://www.kurdilit.net/?page_id=2501&lang=tr,